

# Zarema

rexne û teorî

Sal: 1/Hejmar: 1/Gulan, Pûşber, Tîrmeh, Tebax 2014



و



# ZAREMA

Kovara Rexne û Teoriyê





## ZAREMA

Kovara Çarmehane ya Rexne û Teoriye

Hejmar: 1

ISSN: 2148-4392

Gulan-Pûşber-Tîrmeh-Tebax

Xwediya kovarê Fahriye Adsay

Edîtor Fahriye Adsay

Lijneya weşanê: Burhan Yek, Mihemed Şarman, Ferzan Şêr, Hesenê Dewrêş, Umran Aran

Berpîrsiyarê nivîsên soranî: Erol Şaybak

Berpîrsiyarê nivîsên zazakî: Abdullah Çelik

Berpîrsiyarê nivîsên wergerê: Mîrza Baran, Fahriye Adsay, Sevda Orak Reşitoğlu

Berpîrsiyarê kinbeşan: Mihemed Şarman, Erol Şaybak, Cumhur Ölmez

Sererastkirin: Burhan Yek, Sevda Orak Reşitoğlu

Wêneya bergê: Ahmet Karabulak, Guernicadan Helepçeyê Sifir Kilometre

(Ji Guernicayê Heya Helebçeyê Sifir Kilometre)

Berg û mîzanpaj: Atiye Yaprak

**Têbinî:** Mafê çapkirina gotaran li gor biryara lijneya weşanê ye. Lê nivîskar ji naveroka nivîsên xwe berpîrsiyar in. Nivîsên ji kovarê re bên şandin, biweşin an neweşin, li nivîskar nayê veşandin. Bêyî ku navê kovar û nivîskar bê nîşandan, nikare jêgirtin bê kirin.

**Çapxane:** Berdan Matbaası

Sadık Daşdöğen Davutpaşa Cad. Güven San. Sit. C Blok, No:239

Topkapı/İstanbul

Tel: (0212) 613 12 11

**Şertên Abonetiye:** ji bo salekê li nav welêt: 30 tl, li derveyî welêt: 30 Euro

**Hesabê Banqeyê/ İban:** TR190001001150358639175002

**Hesab No:** 35863917 Ziraat Bankası/Ofis Şubesi Diyarbakır

**Navnîşan:** Öztaş Sitesi, 252. Ada, BO-7 Blok, No:9 Şilbe Toplukonutları/Diyarbakır

**Tel:** (0505) 527 92 17 – (0507) 313 08 12

[www.facebook.com/kovarazarema](http://www.facebook.com/kovarazarema)

[zaremakurd@gmail.com](mailto:zaremakurd@gmail.com)

# ZAREMA

Kovara Rexne û Teoriye





## NAVEROK

KINBEŞ 1.....	9
KINBEŞ 2.....	10
KINBEŞ 3 Musîk.....	13
KINBEŞ 4.....	14
ZILAMEK Û ZIMANEK, Herekol Azîzan .....	23
VEJANDINA ZIMANÊ IBRANÎ, Jeff Kaufman .....	26
EMÊ! TU DIKARÎ DI TARIYÊ DE JÎ BI TIRKÎ BIAXIVÎ, Mihemed Şarman.....	36
HESTIYÊ ZIMÊN TUNEYE LÊ DIKARE HESTIYAN BIŞKENÎNE Amir Hassanpour.....	43
REXNE ÇI YE?, Roland Barthes .....	46
FETISÎNA DI NAV PIRTÛKAN DE, Fexriya Adsay .....	50
DI HIN BERHEMÊN KURDÎ DE ŞOPÊN ÇANDA DEVKÎ, Hesenê Dewrêş.....	60
DI ROMANA CEMŞÎD XAN DE BÎR, MELANKOLÎ Û ŞÎN, Ayhan Öztunç .....	70
RASTIYA VEŞARTÎ YA XWEDAYEKÎ KOLONİYAL LI SER ORYANTALÎZMA EDWARD SAID Û GOTINÊN GUNEHKAR A HESENÊ METÊ HIN RAMAN, Joanna Bocheńska .....	77
SERBORIYA KÊMNIVÎSKARIYA LEHENGEKÎ: ÊŞ Û AZARA (NE)NIVÎSANDINÊ, Mîrza Baran .....	85
DI NAVBERA MÎNORÎ Û MAJORIYÊ DE Û JÊ WÊDETIR, Ferzan Şêr.....	100
HEVPEYVÎN BI MEHMET DÎCLE RE, "Jibîrkin Mirin Bi Xwe Ye" .....	109
DI NAVBERA HEBÛN Û NEBÛNÊ DE SÎNEMAYA KURDÎ SÎNEMAYA KURDÎ LI GOR KÎJAN PRENSÎBAN DIKARE BÊ BINAVKIRIN?, Yılmaz Ozdil .....	115
CERIBANDINA NIRXANDINEKÊ LI SER XERABIYA BEKOYÊ AWAN, Burhan Yek.....	121
KALAŞNÎKOF SER DE TARÎX MEZG Û XOVÎRRAKERDIŞ, Abdullah Çelik .....	129
REWÎ GORRANKARÎY QALLIB Û NAWERROK LE ŞÎ'IRÎ HACÎ QADIRÎ KOYÎ DA, 'Ebdulxaliq Yeqûbî .....	133
HEVPEYVÎN BI BÛBÊ ESER RE, "Tenê Girî Ne Qedexe Bû" .....	146
GIRYAN: LE NÊWAN QALE MERE Û MÎR MEHMUDÎ BABAN DA Cebâr Cemal Xerîb .....	155
REWŞENBÎRÊN ÇEPGIR Û KURD: EDWARD SAID, HAMID DABASHI Û TARIQ ALÎ, Barzoo Eliassi .....	162
KANIYA FENTEZIYAN, Mihemed Şarman .....	166
KURTEJIYANÊN NIVÎSKARÊN VÊ HEJMARÊ .....	173
JÎ BO HEJMARA DUYEM MIJARA DOSYÊYÊ, Axaftinên Postkolonyal.....	176





Ji Herêma Mûziryan Şeroanekî Kurd  
 Ji malpera Îbrahîm Xelîl Baran (<http://ibrahimhalilbaran.tumblr.com/>)

Merheba xwînerên Zaremayê,

Civaka kurd di warê nêrîn, fikr û raman, wêje, çand û hunerê de di nav veguherîneke mezin de derbas dibe. Di van waran de têra xwe danehevek çêbûye ku divê êdî bên tehlîlkirin, rexnekirin ku berhemên nû ji hêza rexneyê îstifade bikin. Di dav çarçove û pîvanên rewşenbîrî de em kurd bi hev dût re bipeyivin û zimanekî navxweyî ku wê xîtabî civaka mûxayyel a ji Silêmaniyê heta Amedê ji Efrînê heta Mahabadê bike, ava bikin. Ger em ê li paşeroja xwe xwedî derkevin, divê ji niha de cîhanek me ya nivîskî hebe ku em tê de ne tenê qala mexdûriyet û zilma li me bûye vebêjin, lê êdî em bi zimanekî kirdeyî li ser xwe bifikirin, bipeyivin û binivîsin. Em li ser avakirina paşerojekê fikr û projeyên ku lingên wan li ser axa xwe biafirînin. Xebatên di warê kurdan de ji nêrîn û helwestên kolonyal bên rizgarkirin û alternatîfên ku ji dînamîkên hundirîn derdikevin bên pêşkêşkirin. Em ê di Zaremayê de bi dil û çavên xwe, lingên me li ser axa me, ji nav civaka xwe bi nêrîneke post-kolonyal xwedî li çand û hunera xwe derkevin û derfetên nû biafirînin.

Di vê hejmarê de nivîsên li ser wêjeyê bêtir cih girtin. Lê di hejmarên din de em ê hewl bidin cûrbicûriya nivîsan zêde bikin û bi xwendin û şîrovekirinên li ser sînema, muzîk, populer kultur, hunera aktuel naverokê berfirehtir bikin. Helbet wê giranî, bi hemû zaravayên kurdî, li ser nivîskarên kurd û hilberandinên wan be lê em ê bi riya wergerên teorîk jî deriyên xwe ji daneheva zimanên biyanî re vekirî bihêlin. Taybetî ji xebat û teorîyên post-kolonyal ên ku aliyê neteweyên di tecrubeya kolonîbûnê re derbas bûne, bê îstîfadekirin.

Di kovara me de ji bilî gotaran çend heb kinbeş jî hene. Ev kinbeş bêyi rêk rêbazê akamedîk piranî li ser niyeta ku em xwendevanê Zaremayê jî beşdarê metbaxa kovarê bikin. Em dixwazin kovar ne tenê bi nivîsên nivîskaran re birê ve biçe, bi beşdariya xwendevanan bi saya van kinbeşan dînamîzmekê bi dest bixin. Ev kinbeş di nava vê hejmarê me de cih girtine; pirsên kinbeşa standart in û kîjan xwîner bixwaze dikare li ser navê me ji xwe bipirse û bersivên xwe ji mere bişîne.

Zarema wê ne kovarake jihevrewêşkirinê be, dibe ku şîrove û rexneyên me hin kesan aciz bike. Em dixwazin aciz bikin û bê zanîn ku hilberandina kurdî gunehan sivik nake. Ew dewra ku kurdî nûsîn bi serê xwe helwestek girîng bû, me ew li pey xwe hiştiye. Vêga bi kurdî çî çawa tê nivîsandin an hilberandin, ev girîng e lê bi ziman û nêrînek analîtîk ku rê li ber nîqaşên nû veke û asoyên fikirîn û nivîsandinê berfirehtir bike.

Edîtor



## KINBEŞ 1

### KÎLERA ÎRFAN AMÎDA YA NIVÎSÊ

(Nivîskar vêga çi dikin?)

- Îrfan Amîda niha li ser çi dixebite?

- Piştî romanê bi rastî min xwest ku têra xwe tiraliyê bikim û hinekî jî bihêlim ku tiştên li ser diramim hinekî an jî hinekî jî zêdetir dema xwe bigirin û bimeyin. Lê di vê navberê de li ser helbesta nîfşê kovara *Tîrêjê* dixebitim ji bo teza xwe. Piştî ku min ew xebat qedand û bêhneke ku hemû şaneyên min vejîne, stend, ezê dest bi xebateke dî bikim. Ez dibêim qey hêdî hêdî dema xwe berdide û dê derbasî qonaxa meyandinê bibe, yanî dixwazim piştî xebata tezê dest bi romaneke nû bikim...

- Îrfan Amîda dikare ji bo xwendevanên kurd çend berhemên pêşniyaz bike?

- Helbet. A rast baş e ku em dikarin navê pir pirtûkan bidin. Ji ber vê yekê ez jî niha dikarim navê gelek pirtûkên kurdî bidim. Hem ên helbestê hem ên çîrokê hem jî ên romanê. Lewra hêdî hêdî em ji qonaxa nirxandina zimên derbasî nirxandina berhemê dibin di wêjeya kurdî de û vê yekê (baş e ku) berhem bi me dide kirin. Beriya her tiştî ji bo min divê di ser berhemê re em bikaribin bersivên pirsên wekî, nivîskêr çi vegotiyê? Çima ev metin vegotiyê? Û çawa vegotiyê? bidin. Bi ya min em


îro ji bo gelek berhemên kurdî dikarin van bersivên bibînin; yanî berhem ji hêla naverok û têşe û şewaza vegotina xwe li ser zemînekê rûdinê êdî. Zemîneke felsefî û hunerî. Qarekter, mekan, zeman, ziman û têkiliya di navbera wan de kêma zêde hevgirtinekê dihewîne. Ji aliyekî dî ve jî têkiliya xwe û xwîner jî li gorî hîmên hunerî xurt dike, destûrê dide ku xwîner jî derbasî berhemê bibe û bi hişê xwe yê kolektîv û takekesî bike ku berhem wateya xwe û rastiya xwe bibîne, ango pirê caran nahêle berhem îzole bibe. Bi ya min ev jî serkeftinek e. Vê yekê ez di "Komên Xwendinê" ên curbicur de dibînim. Yek ji wan berhemên bi ya min *Rojnivîska Spinoza* a Şener Özmen e, yek jê jî *Mîrnameya Jan Dost* e û yeka dî ji van berhemên jî *Zarokên Ber Çem* a Ciwanmerd Kulek e. Ku hûn sê berhemên bixwazin dikarin van berhemên bibêjim di bêhnekê de.

## KINBEŞ

Kîlora nivîskêr/ Xwendevanên vê hejmarê/ Guhdarê vê hejmarê/ Nûçeyên edebiyatê.



## KINBEŞ 2



## Pirsên xwendevanan\*

1. Tu kî yê? Tu dikarî bi kurtî behsa xwe ji me re bikî?
2. Berhema dawiyê ku te bi kurdî xwend kîjan bû?
3. Ji bo çî te ev berhem xwend, tiştêk bû sedemê hilbijartina te?
4. Te ev berhem çawa dît, dixwazî li ser berhemê çî bibêji?
5. Tu dixwazî tiştêkî ji xwediyê berhemê re bibêji?

## Bi Xwendevanan Re Hevpeyvîn

Pêwendiya di navbera nivîskar û xwînerî/ê de eger şibandinek di cih de be wek pêwendiya goşt û xwînê ye. Xwendekariya ku karibe bibe otokontrolê li ser nivîskar û berhemê, dê di heman demê de bibe bingeha guherîn û pêşveçûnan di cihana hunerî û wêjeyî de jî. Wek kevneşopiyekê di cihana wêjê û hunerê de her tim bi nivîskaran re li ser berhem û

kesayetiya wan a wêjeyî hevpeyvînên tîn çêkirin. Lê di kovaran de, bi riya hevpeyvînan nêrîna xwîneran, nirxandin û şiroveyên wan ên li ser metnên wêjeyî, hunerî zêde cih nagirin. Me jî berovajî vê kevneşopiyê xwest ku guh bidin dengê xwîneran û di her hejmara kovara xwe de hevpeyvînekê bi xwînerê/ê re pêk bînin. Bi ya me ev çend dê bibe sedem ku him dengê xwîneran bigihêje hev û him jî dê nivîskar vî dengî bibihîzin, gotinên xwe carek din li teraziyê bidin û bikemilînin. Girêdayî vê daxwazê ji bo hejmara yekem me hevpeyvînek bi xanima delal û xosewîst Gulê Toru re pêk anî.

- Belê ji kerema xwe tu dikarî bi kurtasî xwe bidî nasîn?

-Belê ez Gulê Toru, li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di beşa Kurdî de xwendekara lîsansa bilind im. Di heman demê de xwînerê nû ya wêjeya kurdî me. Yanî di warê kurdî de xwînerê amator im.

- Ji "xwînerê amator" mebesta te çî ye?

-Yanî, bi awayekî bi rêkûpêk xwendina min a kurdî bi qasî du salan e dest pê kiriye û xwendinên min hêj baş nekemilîne, lewra ji xwe re dibêjim "xwînerê amator".

- Helbet di jiyana me hemûyan de ji bo destpêka her karekî demê amatoriye heye. Lê dîsa jî her pirtûkek, nivîskarek deriyek nû li ber mirovî vedike û ji bo kolanên me yên fikrî, hunerî dibe ronahiyek. Dixwazim vê bipirsim; pirtûka herî dawî ya ku te bi kurdî xwend kîjan e?

-Min herî dawî pirtûka Mehmet Dicle ya bi navê *Ta* ku ji 12 çîrokan pêk tê xwendibû.

- Baş e. Bi giştî te ev berhem çawa dît û nêrînen te yên derbarê berhemê û nivîskarê wê de çî ne?

- Ez tenê dikarim nirxandineke empresyonîst bikim, ji ber ku wek min got ez xwînerê amator im. Çi berhem ber destê min bikeve dixwînim. Ger berhem balkêş be, yan jî li xweşa min here ez xwe mecbûr dibînim ku nivîskarê wê berhemê nas bikim û bêtir bi cihana wî ya hunerî re eleqedar bibim. Ev berhema birêz Dicle jî berhemek wisa ye. Ku berhem, pirtûka çîrokan be wê demê jî çîroka yekem ji bo min pir girîng e. Ku çîroka yekem balkêş be yan jî bi aliyekî xwe ve bikaribe min bikişîne nava asoya metnê, xwendina çîrokên din jî ji bo min hêsantir dibe û bi kêfxweşî berhemê diqedînim. Lê ku çîroka yekem ne xweş be û meraqekê li mejiyê min peyda neke xwendina wê ji bo min dibe ezab û ez hêj ji serî de daxwaza xelasbûna ji vê ezabê dikim.

- Di nav vê çarçoveyê de ev berhem çawa bû, xwendina wê bû ezab an kêfxweşî û çima?

- Xwendina wê bû kêfxweşî. Ji ber ku hêj di çîroka yekem de ez dikarim bêjim ku ez ji cihana derve qut bûm û bûm hevala lehenga çîroka "Sala Kulê". Di vê çîrokê de zêdetir psîkolojiya lehengê derdikeve pêş. Wek ku nivîskar xwestibe hevokên xwe li psîkolojiya lehengê bîne, hevokên qelibandî bi kar anîne û carinan jî hin hevok dubare kirine. Aliyekî din yê vê çîrokê yê xurt ew e ku teswîr pir zindî ne. Lewra mirov di nava metnê de wînda dibe. Mînak dema ku lehenga çîrokê di nav mirî û nîvmiryan de li qîzika biçûk digeriya ez jî li kêleka wê bûm. Yan jî dema li qev-

da pirça qîzîkê ya di nav lepê xwe de nêrî û dest bi girî kir, ez jî kelogirî bûm û qurt di qirika min de ma. Tenê ne di vê çîrokê de hema bêje di hemû çîrokan de teswîr pir xurt in. Mînak di çîroka "Seyd" de dema Hesen lingê xwe yê di nav du zinaran de asê mayî û şikestî dilepitand wê demê lingê min diêşiya. Ez jî bi wî re di bin berfê de dicemidîm. Bi rastî jî gelek çîrokên din yên di vê berhemê de bi teybetmendiyên bi vî şiklî derdikevin pêşiya mirov.

- Ji xeynî vê, di vê berhemê de tiştên ku bala te kişandin çî bûn?

- Helbet mirov dikare qala gelek tiştan bike. Çîrok jî aliyê hûnandin û vebêjeran ve piralî ne. Mesela ez dikarim bibêjim ku nivîskar bi çavên lehengên xwe li bûyeran nihêriye. Yanî dema ku mijar hatine vegotin teybetmendiyên lehengan nehatine jîbîrkirin. Ku leheng jin be bi çavên jinê, zarok be bi çavên zarokan mesele hatiye vegotin. Wek minak di çîroka "Hêlîna Qijikê" de lehengê zarok wiha dibêje: "Min çend caran pirsî jî, kesekî baş qal nekir, loma min fêmanekir boykot çî ye. Lê tiştêk xweş bû, ji ber ku dibistan girtî bûn." Ji vê hevokê jî diyar e ku nivîskar jî aliyê zarokê ve li bûyerê nihêriye.

- Ku yek bi yek qala çîrokan bê kirin helbet gelek tişt dikare bê gotin û wê pir dirêj bibe. Tu dikarî ji bo berhemê bi giştî çend tiştan bibêji?

- Bi giştî ez dikarim bêjim ku zimanê berhemê zimanekî herikbar e, zimanê rojane ye û çîrokên wî bi rehetî tîn xwendin. Carinan hin gotinên gelêrî jî derdikevin pêşiya mirov. Wekî din bi giştî mijar takekesî



ne, çîrok bi bûyerek civakî dest pê bike jî, tê li ser psîkolojiya lehengî/ê disekine. Teswîr pir xurt in. Her wiha di çîroka "Zîv û Zêr" de jî şibandînen xurt balê dikişînin.

- Eger em berê xwe bidinê te bi giştî aliyên erênî vegotin. Gelo tu aliyên vê berhemê yên neyînî hebûn li gor te?

- Hebûn helbet lê zêdetir min bi çavek erênî lê nerî bawer dikim. Wek neyînî ez dikarim bibêjim ku di çîroka "Marê Birîndar" de min zehmetî kişand. Min di wê çîrokê de îdraq nekîr ka vebêjer kî ye.

- Wek gotina dawî tu dixwazî çi bibêjî?

- Di demek kin de miheqqek ez ê berhemên din jî yên mamoste "Dicle" bixwînim.

- Belê, gelek spas dikim ji bo vê sohbeta te ya xweş û bikêf.

- Spasxweş. Ez jî ji te û kovara we re serkeftinê dixwazim. Bi hêviyê xebatên têr û tijî...



Martîne Bextewer

Jan Dost

avesta

- Ali Bayram kî ye?

Ali Bayram, mirovekî Şirnexî ye û jî Gundikê Melî ye, 35 salî ye û ev 12 sal in parêzeriyê dike, helbestên kurdî dinivîse, xwendevan û şopînerêkî wêjeya kurdî ye.

- Pirtûka dawî ya ku we bi kurdî xwendiyê?

- Martîne Bextewer

- Sedema ku we ev pirtûk xwend?

- Jan Dost çi binivîse bala min dikişîne, piştî *Mijabad* û *Mîrnameyê* ez li benda pirtûka Jan Dost a nû ma-bûm. Çawa ku romana wî ya nû çap bû min xwend.

-Dikarî li ser vê pirtûke çi bibêjî?

Bextewarî û kurd ji hev gelek dûr in lê belê lêgerîn û meşa li dû bextewariyê xebateke hêja ye. Tiştê ku Martîn li pey ketî, bê encam mabe jî, Martîn li pey çîroka qedera xwe ketiye û hêja ye mirov şansekê bide poşmaniyên xwe jî.

- Hûn dixwazin tiştêkî ji nivîskarê pirtûkê re bibêjin?

Motîvasyona Jan Dost ya li ser romanê, nemaze hakimiyeta wî ya li ser zimanê kurdî bêhempa ye. Hêvî dikim mamoste zû neweste û romana kurdî bi hêviya Xwedê ve nehêle.

amadekar: Cumhur Ölmez

## KINBEŞ 3 Musîk

### Guhdarê vê Hejmarê

1. Tu kî yî, dikarî ji me re bi kurtî qala xwe bikî?

2. Albûmeke kurdî ya dawî (ne hewce ye ku dawî be jî) we guhdar kiriye kîjan e?

3. We ev albûm çawa dît?

4. Tu dixwazî ji xwediye albûmê re (muzîsyen re) çi bibêjî?

5. Ji bilî vê albûmê ji bo xwendevanên me tu dikarî du albûman jî pêşniyaz bikî, dixwazî bi hevokekê sedema vê pêşniyazê jî binivîsî?

1. Ez Emer Farûq. Cizîrî me. 24 salî me. Kar û pişeya min a eslî endezyariya mekanîkê ye, lê carûbaran dema pêdivî pê çêdibe bi wergêrî û karûbarên din ên têkilî edebiyatê ve jî radibim.

2. Hema bêje her albûmeka kurdî ya nû derdikeve legal an îllegal bi awayekî ez bidest dixim û guhdarî dikim. Vê paşiyê bi pêşketina dem û derfetan di warê muzîka kurdî de gelek xebatên hêja tên kirin û gelek berhemên xweş û serkeftî jî pê ve tên. Gelek kom û stranbêj hene ku hêjayî behskirinê ne lê ji bo ku zêde dirêj nebe dixwazim bes behsa Sakîna Teyna û herdu albûmên wê yên ku vê talîyê derketine bikim. Albûma wê ya pêşîn ya solo ya bi navê *Royê* ye û albûma duyem ya li gel koma *trio mara* ya bi navê *Derî*, ku Sakîna di komê de ji nalînen gelêrî yên kurdî re vokalistiyê dike.

3. Herdu albûm jî têra xwe xweş û serkeftî ne, lê ji nav herdu albûman

bêtir kêfa min ji *Derî* re hat, albûm bi nav û etîketa *trio mara* derketiye di albûmê de xwuşka Leyla Îşxanê, Nazê Îşxan tiliyên xwe li nav noteyên piyanoyê re dibe û tîne û keça hunermendê kurd Dilovan, Nûrê Dilovanî jî destê xwe li tîlên kemanê digêrîne. û dîsa rûmeta muzîka kurd Huseyn Zahawy jî li paş her stranek ku dengê defê lê diçe li erbaneyê dixê, anku bi erbaneyê re dikeve cizbê û Sakîna jî vokalistiya 'xebat û keyf û şer'ên gelêrî dike, distirê û hey distirê bêyî ku canê stranan biêşîne, dilê wan jî xwe bihêle. Albûm jî 11 stranan pêk tê, ji nav van stranan 6 jê kurmançî, 3 jê dimilkî û stranek jî bi soranî ye. Stranên di albûmê de bi piranî stranên gelêrî yên ku bi ser bêjînga serpehatiyên bi salan ketine û gihîştine heta roja îro, gelek ferq û cudahiyan vê albûmê ji albûmên din ên kurdî hene. Bêguman lê ez dikarim bêjim ku ferqa herî mezin a vê albûmê, ahenga newa û notayên piyanoyê ya ligel ruh û rîtma rewan ya stranên folklorîk ên kurdî ye, wekî din çend xalên din ên hêjayî gotinê hene ji bo vê albûmê ku di albûmên din ên kurdî de zû bi zû nayên dîtin, ya yekê vokalista komê Sakîna, haj rastgotin û rastbilêvkirina gotinên stranê maye, ya didoyê di nav enstrûmanên ku hogiriya stranan kirine de senkronîzasyonêke bêqisur heye, yanî mirov dibêje qey Sakîna dibêje û vîrtûozên enstrûmanan bi enstrûmanên xwe li Sakînayê vedigerînin eyn weke harmoniya dawetên berê yên devkî yên li botanê, ya sisêyê berfirehî û zengîniya dever û zaravayên stranên ku di albûmê de cih girtine.




4. Berî her tiştî dest û dilê wê sax be, wek pêşniyaz dikarim bêjim ku bila di albûmên xwe yê pêş de, piçekî berê xwe bide muzîka rojhilatê kurdistanê, ji bo nimûne bila here hawara xwe bigihîne Ardavan Kamkar û santûra wî, ez bawer im ku wê deh qetî encamên xweştir û serkftî-tir ji senteza stranên gelêrî yê kurdî ya ligel piyanoyê derkevin, bila albûmên stranbêjên weke Hesên Zîrek û *mamlê û tenya* Areb Osman û Mazhar xaleqî bidest bixwe wekî din ji xwe deriyên nû wê ji ber xwe de li ber vebin.

5. Piçekî têkilî bersiva pirsê çarê dixwazim bêjim ku bila herin çî kevn û gelêrî û çî nû û nûjen albûmên stranbêjên kurd ên ji başûr û rojhilatê Kurdistanê bidest bixin û guhdarî bikin, bila xwe bi xem û hêviya şahiya stranên a çarê ve nehêlin, bi serê çavê xwe bibînin bê serdestan muzîk û kelepura kurdî çawa diziye û çawa kirine mal û milkê bavê xwe. Û wek pêşniyaza albûman jî dikarim bêjim ku bila albûma Mîkaîl Aslan ya vê taliyê derketî ya bi navê *Xoza* û albûma Sîmir Rûdan ya bi navê *Bi Çîrokî* bi awayekî bidest bixin û guhdarî bikin, yek temsîla çawaniya parastina nêw û meqamên kevn û klasîkên kurdî ye û ya dî jî temsîla bi awayeke serkeftî vekirina derî û dergehên nû ya li pêşiya muzîka kurdî ye.

## KINBEŞ 4

Nûçeyên kurdî  
ferhanga kurdi ya înteraktîv  
tirsik.net li benda we ye



Kurdan zû bi teknolojiyê re têkilî danîn û li ser medyaya sosyal rojeveke taybet ji xwe re çêkirin. Helbet amûr û rêgezên dinya teknolojiyê çî dixwaze ew bi awayekî dikeve rojeva kurdan. Gelek caran li ser twitterê dibin toping li ser faceê koman vedikin fenomenên wan jî hene. Lê ev geşandin bi awayekî baş be jî parvekirinên kurdan bi piranî tirkîne mixabin. Helbet sedemê vê yeke ne tenê bi qedexebûna zimên ve girêdayî ye, hinkî jî ji kêmbûna ferasata zimên, nezaniya girîngiya meselê tê ev yek. Ya rûreş ew e hin kes li ser kurdî tofanan bi tirkî radikin. Bi beynokê erzan, bi klîşeyên hilweşiyayî, bi gotinên wek "zimanê me dewlemend e, zimanê me pîroze" hwd, barê vî tiralî, gunehbariya xwe herhal dixwazin sivik bikin. Helbet dewlemendî jî hebûna ziman bêtir ji perfomansa ziman tê. Zimanek çiqas xwedî rêk û rêbazekê be jî ku perfomansa wî kêmbê, meriv nikare bibêje ew ziman dewlemende. Îcar baş e çend xortên kurd ên zîrek ku li ber bayê gotinên erzan neketine rabûne ferhengeke înteraktîv bi navê tir-

şikê ava kirine. Ev ferheng rasterast asta perfomansa ziman zêde dikin, ziman dikin amûrekî rojane ji bar û problemên bikarneanînê ji kelepura kevneşopiyê xilas dikin. Bi ya min ev ferheng ku têra xwe eleqe bidîta an bibîne ji gelek saziyên kurdan hêjati- e. Lewre ji sînemayê bigire heya muzîk, edebiyat, kevneşop, adet, beynok hwd. Kurdî ji niha de arşiveke hêja çêkirine. Di berde zimanê wan ro bi ro ber bi teşeyekî ve diçe ku ev jî xuyaye dê jargoneke modern ava bike. Gelek xebatkaran tirsikê xemxurê kurdî ne, her çiqas nîqaşên tund ên siyasî tê de çêbibin jî-ku ev jî lazim e- herkes di warekî de valahiya paşxana ziman tijî dike. Îcar me bi çend pirsan xwest em vê ferhengê bi we bidin naskirin, da ku hûn jî herin seriyekî lêxin qe nebe kevrekî bidin ser kevrekî. Em bi nivîskar û moderatorê tirsikê Endezar re axivîn.

- **Tirsik çî wextî ji teref kê hat damezrandin?**

- Malpera tirsik.net di meha hezîrana sala 2013an de, weke malpereke girêdayî wergerine.com û turkcekurtcesozluk.comê hat vekirin.

- **Herkes dikare di tirsikê de binivîse?**

- Herkesê ku bixwaze û dikare bi kurdî binivîse, dikare bibe endamê tirsikê. Piştî endambûna tirsikê pêwîst e nivîskariya we ji aliyê moderasyona tirsikê were aktîfkirin, piştî hingî endamê nû-nivîskar bi ya dilê xwe dikare mijarên nû veke an di bin mijarên heyî de di nav peyamekê de fikra xwe bêje.

- **Îstatîstîkên tirsikê di çî halî de ne?**

- Îstatîstîkên heta dawîya meha sibata 2014an wisa ye: hejmara peyaman: 25.720, hejmara mijaran 7.127, hejmara nivîskarên qeydbûyî: 954 e.

- **Nivîskarê herî zêde peyaman ni- vîsiye?**

- Ya rast li ber destê min listeyeke birêkûpêk nîne ku ez yeko yeko bijmêrim lê dikarim çend nivîskarên ku bi zêdebûna peyamên xwe yê di tirsikê de balê dikişînin bêjim; @endazer 3800 peyaman, @simurg56 3300 peyaman, @brusk56 1500 peyaman, @ceso 1000 peyaman, @elegez 700 peyaman, @cinorek 600 peyaman, @nan û av 600 peyaman, @mamoste 400 peyaman, @mazlumdogan 400 peyaman, @nazim tolhildan 400 peyaman filan...

- **Eleqeya nivîskar û rewşenbîrên kurdan bi tirsikê re heye, çawa ye?**

- Erê di tirsikê de çend nivîskar û rewşenbîrên kurd ên berniyas hene û bi navên cuda dinivîsin lê ji ber ku di tirsikê de zemîn û atmosferereke bêserûber a serbestiya derbirîna fikrî û rexneyan heye, û ji ber ku civaka kurd -xwende û nivîsendeyên kurd jî tê de- civakeke girtî ye û her rexneyekê weke reşkirin an rabezînekî li hemberî heyîna xwe dibîne, di nav nivîskar û rewşenbîrên kurd de biheqî hêj belav nebûye, yanî erê xebera pîrraniya wan jê heye lê ji ber ûşt û egerên muxtelîf xwe jê dîr vedidin. An jî bi navên ku em nizanin, tê de dinivîsin û em nizanin.



**- Hûn ji tirşikê çi hêvi dikin?**

- Berî her tiştî em dixwazin ji rojeva serdestan û ji ajandaya mêtingeran wêdetir rojev û ajandayeke bi kurdî û kurdistanî çêkin, û herwiha em dixwazin databankeke bi kurdî ya berfireh ku tê de ji şîrê şêr bigire heta formûla çêkirina kurdistanêke serbixwe, ji bêje û biwêj û zargotin û metnên kurdî yên li ber metirsiya nemanê bigire heta rê û rêbaza perçekirina dendika atomê, ji pozîsyonên seksê yên di nav civaka kurdî de bigire heta klîşeyên helbest û stranên kurdî, behsa her tiştêkî li ser rûyê erdê bike, û herwiha em dixwazin bi pişdariya kurdên ji her beşeke kurdistanê û ji her zarava û devokeke kurdî, devok û zaravayên kurdî piçekî din nêzî hev bibin, zimanê kurdî piçekî dî ber bi standardbûnê ve biçê, neteweya kurdî piçekî din qalib bigire û hişmendiya kurdistanê piçekî dî li nav reh û damarên kurdan bigere. Bi kurt û Kurmancî em dikarin bibêjin ku armanca tirşikê ew e ku li ser înternetê derbarê her tiştî de agahî û şîroveyan kurdî werin berhevkirin û arşîvkirin û bi vî awayî dema kurdek bikeve înternetê bikare her tiştî bi kurdî peyda bike.

**- Problemê we hene? Hebin çi ne?**

- Erê çawa?! Mezintirîn pirsgirêka me, em dikin nakin nikarin xwe bigihînin kitleya xwe ya potansiyel, tevî hemû hewldanên me, heta niha teqrîben 1000 (bi nivîsê, hezar) nivîskarên tirşikê çêbûne û ji nivî zêdetirê van nivîskaran hêj destê xwe qene li peyvekê jî negerandine, yanî bi jargona tirşikê qet netir-

şikandine, ez naxwazim tu kesî deşîfre bikim û bidim şermê lê em dibînin heta êvarî li ser mecrayên din ên sosyal medyayê kêf û seyraneke dikin, lê dema tu ji wan dipirsî tu çima di tirşikê de nanivîsî, xwe didin paş perdeya hêncet û mahneyên wek, wextê min nîne, ez bi xwe re nabînim, ez ji sîstema tirşikê fêhm nakim, ez bi kurdiya xwe ne bawer im, ez vêga diçim kursa zimanê kurdî hema çawa ez serwextê zimên bûm ez ê binivîsim, kuliya zimanêminxwariye, "oqiyamamaya-zamiyem" mozqirtikê bi zimanê min vedaye, tirşik bûye cihê reşkirin û rexnelêgirtina destkeftinên kurdan, destê min lê nagire ku ez di tirşikê de binivîsim, ji ber ku ne min tirşik vekirîye û ji ber ku di tirşikê de tu payeyek neketiye ser milê min ez xwe lê nakim xweyî û tê de nanivîsim, filan.. hêj berdestnebûna versiyona mobîl a malpera tirşikê jî yek ji pirsgirêkên me yên mezin e ku dilê gelek bikarhênerên me yên xwedî smartfon ji tirşikê dihêle.

**-Tirşik di medyaya kurdî de cih girtiye?**

- Li ser înternetê di gelek malperan de nûçeya tirşikê derket, lê di malper û rojnameyan ku me hêvî ji wan dikir û piraniya kitleya potansiyel a tirşikê jî xwendevanên xwezayî yê wan in, nûçeya tirşikê di ser guhê xwe re avêtin, herwiha li ser sosyal medyayê jî çend kes û komên kurd ên popûler ku bi hêviyên mezin me ji bo tirşikê hawara xwe gihande wan, qene berê xwe jî bi me ve nekirin.

## Helbestên Evdirehîm Rehmî Hekarî Yên Wenda Hatî Dîtin

Wan rojên han di çapemeniya kurdan de nûçeyek xweş derket: Dihate gotin ku nivîskar, lêkolîner Sedat Ulugana hin helbestên E. R. Hekarî bi dest xistiye û li ser wan dişixule. Xwendevanên kurd navê Evdirehîm Rehmî Hekarî bi şanoya wî ya epîk Memê Alan dizanin. Ev şano gorî agahiyên di destê me de yekem şanoya kurdîye. Lê helbet ne agahdariyeke teqez e, lewre di nav kurdên "Sovyetê" de gelek xebat û akademiyên şanoyê yên kevin hatine damezrandin, ku belkî li ser van lêkolîn çêbibe yekemîniya vê şanoyê jî bi dawî bibe. Helbet ev tişt hewqas ne girînge.

Sedat Ulugana beriya vê, berhemê Ehmedê Xanî jî di mizgeftê de dîtibû. Piştî van nûçeyan helbet meriv çiqas şabibe hewqas jî xemgîn dibe. Careke din em dibînin ku kelepura kurdan çiqas bêxwedî çiqas belavala ye. Dîsa bi saya serê xemxur û dilsozê kurdî ev yek dertên holê. Em jî bo kovara Zaremayê gihîştin Sedat. Sedat ji me re du helbestên pirtûkê latînîze kir çend agahî jî li ser berhemana navborî da.

Cara yekem ev helbest dê di vir de werin weşandin. Li gorî gotinên Ulugana navê dîwanê *Gazîya Welat* e bi temamî çar cîlde, cîlda wînda cîlda duyem e va ye ew jî hat bidestxistin. Cîldên din jî bi ihtîmaleke mezin li pirtûkxaneyê Başûr de bîter dibin.

Tê de 10 helbest hene,

- 1) Dibaceya helbestî
- 2) Gaziya welat
- 3) Loriya welat
- 4) Hewar
- 5) Zozan
- 6) Kew
- 7) Bihuşt
- 8) Yekbûn
- 9) Wuslat
- 10) Firqat 23 Rûpel e.

Di sala 1921an de çap bûye. Ev hejmar 21 rûpel e


Nuha Ulugana ji bo vê cîldê wek pirtûk amede bike, li ser dixebite. Ji ber vê yekê emê şîroveyekê li ser helbestan nekin, tenê em ê hem latînzekîriya çend helbestan hem jî orjînalê wan di vê hejmara xwe de biweşînin. Li ser navê kovara *Zaremayê* em spasî dikin ji bo lêkolîn û parvekirinên Sedat Ulugana. Ez dixwazim di vir de tiştêkî din jî bibêjim Ulugana di heman demê de gelek wêneyên kurdan yên girîng ku di dîroka kurdan de cihekî hêja digirin bi dest xistiye. Dê çend wêneyên hêja di hejmarên pêş de ji bo kovare ji me re bişîne.



## Gaziya Welat

Du teyrokan dikir gazî  
 Nizam kund e ya ne bazî  
 Dibê welat rût e, tazî  
 De megrî welato megrî  
 De megrî welato megrî  
 Yekî digo nav nifîn e  
 Yekî digo pir birîn e  
 Lewra: dile min bixûn e  
 De megrî welato megrî  
 De megrî Xuda li me kerîm e  
 Welatê min wê dinale  
 Nav nifînan bi berpâl e  
 Zaroyê (zarê wî yê) xayîn naçine bal e  
 De megrî welato megrî  
 De megrî Xuda li me kerîm e  
 Welatê min hêja şifa ye  
 Zarê welatî bi xew e Halê welat lewra ew e  
 De megrî welato megrî  
 De megrî Xuda li me kerîm e

(Ve helbestê navê xwe daye berhemê)



## Hewar

Gelo! rabe ey şêrê Kurd ê biêş  
 Bilez rabe şîrê ji kalan bikêş  
 Here serhedan zû tuxûban bigir  
 Serê dijminan tu bikî ber bibir

Tu hilbigrîne wê gurza giran  
 Metalê bilindke li ber 'asîman  
 bigre hem bi destê xwe sura eniyê  
 li dijmin bide guh bide naliyê


Ji ber nara ya te bilerizêt cîhan  
 Ku herkes bizane xençera cindiyar  
 ji bo dîn, miletê neyne der  
 Ji bo Heq nebê Kurd nakit sefer

Li hesbê suwar be bihetkine  
 rîmê tu rêmbaz îro bihêle memê  
 Tu tîra xwe dayne li mala  
 kewan bikêşe û berde li cergê (...)

Li derdê misilman bibe çaresaz  
 heqê tîr û rîman ji (...)  
 bixwaz Çendan li me ew bikerb ketînin  
 Ji hêlên ,cîhan neşîn derînin

Şerm bikin hûn ji bab û pîran  
 dijmin bû li wan cîhan (...)  
 Wan terk nekirin welatê navdar  
 westane li ber bi şûr û xençer  
 Mirîni ji bo me ma weraset  
 Lewra ku em in xwedan kiyaset

Çend rûpel ji orjînala dîwanê





## Fotografa Dawîn\*

*Bîr; bîra qederê, bîra mirinê...  
heş û bîr...bîrbirina qederê...  
bîr, kaniya umir û jînê,  
warê pêşîn û dawîn...*

Belê, rûpelên romana *Bîra Qederê*, hêdî hêdî, digihên dawiyê. Her destpêkekê dawiyek heye; *Bîra Qederê* jî fotografek dawîn heye. Fotografa dawîn a çûyînê ye; çûyîna dawîn a bêveger...

Fotograf a mirinê ye. Ev fotografa dawîn a romanê ku gelekî ronî ye, tarîtiya çûyin û mirinê nîşan dide.

Sal 1951 e, ji rojan 15'ê Tîrmehê ye.

Germ e, tevî ku danê êvarê ye, dinya dikele. Bajarê Şamê û taxa kurdan a bajêr, bi xebera reş, dikele; mirina ku ji lehengê vê romanê pê ve kesî nedipa, hatiye û ber bi axa reş û warê vegera dawîn, bi rê ketiye.

Çare nîn e, li hember mirinê tu çare tune.

Di fotografê de, li pêş cenaze dixuye. Li ser milên çar kesan, cenaze bi rê ketiye û dere. Li pey cenazê jî xelkekî pir, bi gavên giran, di kolaneke fireh de, dimeşe. Seriyê dawîn ê xelkê naxuye. Kevirên kolanê, bi şewqa tîrêjên tavê, dibiriqin. Esmen vekirî û zelal e, ne ewrek, ne jî tarîtiyek dixuye. Dinya ecêb ronî ye.

Şênî, hêdî hêdî, serê wan li ber wan, dimeşe. Ew kî ne? Kesên ku nasên xwendevanên *Bîra Qederê* ne, tê de kêmin. Di navenda rêza pêşîn de, Cemşîd duxiye. Li herdu kêlekên wî hî Husnî Begê Berazî û Yusif Melik dixuyin. Herdu ketine milên Cemşîd û dimeşin. Bi qasî kuji fotografê dixuye, kes napeyive.

Koça dawîn bêdeng tê pê. Bajarê rengîn ê îslamê, bêdeng, li vê çûyîna dawîn a mîrekî kurdan şahîdî dike. Û fotografa dawîn a *Bîra Qederê*, bêdeng, şahîdî li roja dawîn a umrê Celadet Alî Bedirxan dike.

Celadet Beg dere

Cemşîd ku hê nû ketiye donzdehan, li pey bavê xwe dimeşe. Serê wî li ber wî, di navbera mamên xwe de, li pey bavê xwe, cara dawîn, dere. Piştî vê roja germ a havînê, ew ê hew li pey bavê xwe here. Ew e hew pê re be, hew pê re bipeyive, jê re bibêje, "Bavo, bavo binere, ez mezin bûme, ez bûme Mîr Cemo..."

Cemşîd çi difikire, çi hîs dike? Ma meriv li pey mirinê çi hîs dike?

Keser, bi tenê keser.

Mîna şitilekê, dirêj û zirav, Cemşîd dimeşe û bavê xwe bi rê dibe. Kî çi dibêje, bila bibêje; mirin ecêb e, çûyin û koça dawîn kambax e. Mirin keser e. Ew nayê qebûl kirin. cemşîd li pey bavê xwe dere û wî bi rê dike, lê ew ê



Ji merasîma cenazayê Mîr Celadet Bedirxan 1951.



çawan qebûl bike ku bavê wî dê hew jê re bibêje, "Cemo, kurê min, ez ketime bextê te, tu min, bavê xwe yê kal, şermezar dernexînî?.."

Fotografa dawîn a romanê, bergeha dilsoj a veqetîne ye; Celadet Beg ji jiyana rengîn, lê pirî caran kambax, vediqete, ji Cemşîd vediqete, jiheval û dostên ku di wênê de dixuyin, vediqete, ji Rûşen Xanim, Huseyma, Sînem û Ehmedê Ferman vediqete, ji zimanê xwe yê birîndar û rûpelên kovarên xwe vediqete. Ew ji dinê vediqete.

Celadet Beg, li ser milên çar kesan, di xewa ebedî de razayî, ji dinê xatir dixwaze û dere. Piştî vê fotografê êdî tu kes ê nikaribe fotografên wî bikişîne. Tu kes ê nikaribe wî li ser kitab, kovar û kaxizan bibîne. Tu kes ê nikaribe wî di kêf û henekan de, şîr û taziyan de, seyd û nêçîran de bibîne. Îro, yanî roja 15'ê Tîrmeha 1951-an ku ev fotografa dawîn hatiye kişandin, roja dawîn e. Îro roja veqetîne ye. Piştî îro êdî bi tenê valahî, xewn û xeyal hene. Ji îro pê ve êdî rastî dê biqulipin ser xewn û xeyalan...

Di fotografa yekemîn a *Bîra Qederê* de merivek hebû. Di bihara 1893-an de ku dinya û jiyana, ji nû ve, dest bi geşbûnê dikir, merivekî, li ser giravekê biçûk li kamerayê dinihêrt. Meriv navenda wê fotografê bû. Di fotografa dawîn de jî, dîsan, meriv navend e. Fotografên *Bîra Qederê* bi merivekî û hebûna wî dest pê dikir û bi merivekî û çûyina wî xelas dibe.

Hatî û çûyîn; du haletên herî însanî yên cîhanê. Fotografa dawîn a *Bîra Qederê* strana veqetîna û çûyîna, bêdeng, bêzar, dinehwirîne.

\**Bîra Qederê*, Mehmed Uzun, weşanên ithaki, Stenbol, 2013, r. 364-366

## ZILAMEK Û ZIMANEK<sup>1\*</sup>

Herkol Azîzan

Belê heke ew zilamê xurt û bi vên peyda bû zilamek dikare zimanekî mirî vejîne. Herwekî emê niho bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanê zindî, nav wan zimanên ko mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê re eşkere dikin.

Me got zimanên mirî û zimanên zindî. Bêdiro, ji awirê jiyînbariyê ve ziman jî wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanên mirî hin hene warkor û kordûnde diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêlin; ne kêl ne kitêb. Hinên din di pey xwe re eserine mezin, kitêbine hêja dihêlin û ew kitêb hetanî îro jî têne xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ku êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan napeyive.

Li Ewropayê latînî, li rohelatê nîzing ibranî zimanine mirî bûn. Latînî îro jî zimanekî mirî ye. Lê herçî ibranî êdî ne zimanekî mirî, lêbelê zimanekî zindî ye.

Belê ew mirovê bivên di nav cihyan de derket û zimanê ibranî vejand. Ibranî zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê erebî ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û nivîsandin. Bi tenê zanayan pê dizanin û di kiniştan tewrat bi vî zimanê dihate xwendin.

Herçî cihî bi zimanê din, bi zimanên welatên ko tê de rûdiniştin xeber didan. Yanê cihyan zimanekî milî, zimanekî xweser nîn bû û ji lewre wan bi zimanên xelkê xeber didan.

Di sala 1877an di şerê ûris û tirkî de zora tirkan çû bû û herçî miletên Belqanê hene ji bindestiya tirkan xelas bû bûn. Xelaskirina dewletên Belqanê nemaze bi destê çarê ûris çû bû serî û miletê ûris bi xwe bi vî îşî bendewar dibû û rojnameyên rûsî gelek qala dewletên Belqanê ên nû dikir.

Di welatê ûris de xortekî cihî bi navê Elyêzer bin Yehuda hebû. Kûrê Yehûda wek herkesî bi vî şerî bendewar dibû û didît ko miletên bindest wek Sirbistan û Bîrxaristanê û ên mayîn ji nîrê zorkerên xwe xelas dibûn û digihaştin istîqlalên xwe. Yehûda bi van bûyeran li miliyeta xwe hişyar dibû û li ber halê miletê xwe diket. Yehûda didît ko halê miletê wî ji halê her miletê

<sup>1\*</sup> Herkol Azîzan, "Zilamek û Zimanek", *Hawar* 40, (1942) r. 4-5. Amad. Firat Cewerî, weş. Nûdem, 1998, Stockholm. r.944-945.



din xirabtir e. Cihî ne tenê bê welat û bê hîkûmet in; lê zimanê wan nîne û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê cihî qerara xwe da û dilê xwe de got: divêt cihî vegerin welatê pêşiyên xwe; welatê kurên Israîl, û dîsan divêt ko cihyan ji weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin. Ew ziman jî zimanê pêşiyên, zimanê ibranî ye.

Yehûda hînî zimanê xwe bû û di sala 1878an de qesta Parisê, qesta wî bajarê mêvanhewîn kir.

Li Parisê, Elyêzer bin Yehûda têkilî cihiyên Parisê bû. Elyêzer jî alikî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fikrên xwe ên milî belav dikirin. Lê welatîyên wî bi xwe lê radibûn û heye ko digotin ev mirov dîn e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera xwe a mezin re bi vênêke xurt û mezin û bi serê xwe dixebitî. Yehûda kiri bû serê xwe jî miletê xwe ê bêziman miletekî biziman bîne pê.

Yehûda bi xwe hînî zimanê xwe, hînî ibranîyê bûbû. Niho diviya bû ibranîyê di nav civata miletê xwe de belav bike. Ji bo çandina tovê xwe jê re zeviyek diviya bû. Di sala 1881ê de Elyêzer keça mamosteyê xwe ji xwe re anî û berê xwe da Felestinê. Bi vî awayî jinikek, hîmê xanimanekê, ketî bû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rê ve, di vaporê de dersa jina xwe got û hetanî gihîştine erdê Felestinê jina wî hînî çend pirsên ibranî bû bû.

Gava pê li erdê pêşiyên kirin Yehûda gote jina xwe, ji niho û pê de emê bi tenê bi ibranî xeber bidin. Ibraniya jinikê gelek hindik bû. Jinikê kir ne kir lê mêrê wê ji qerara xwe ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye zaroyên Yehûda hetanî ko bûne xort ji ibranîyê pê ve bi tu zimanî ne dizanîn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesêb. Lê bi vî laliyê miletê cihî wek miletine din bû xwediyê zimanekî, xwediyê zimanekî xweser.

Yehûda û xelkê mala wî di zivariyê de dijîn. Lê çî xem. Ji fikirine mezin re fedakarine mezin divêtin. Ji ber ko xelk bi derbekê bira fikira mezin nabe. Yehûda nanê tisî dixwar lê gava didît ko xelkê mala wî bi ibranî xeber dida, bawer bikin, xwe bextiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Dawiyê Yehûda rojnameke bi ibranî belav kir û ji xwe re xwendevan jî peyda kirin. Bi rê va û di hin dibstanên cihî de dest bi xwendina ibranîyê jî kirin.

Ji milê din Yehûda ferhenga miletê xwe cêdikir û bêjeyên ko di zimanekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanîn. Zimanê ibranî jî di nav cihyan de belav dibû. Di sala 1922an de gava Elyêzer bin Yehûda mir zimanê ibranî yê ko beri 30-40 salî zimanekî mirî bû, bû zimanê miletekî. Ev ziman îro li Felestinê û di rex erebî û ingilizyê de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikûmetê ye jî.

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ko bi vîna zilamekî tete pê. Di kar û biserhatiya vî zilanî de pend û derseke mezin heye. Herçî miletên bindest û bêziman an bê zimanê nivîskî divêt jê ibretê bigirin. Herçî em kurd, me ziman, me zimanekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimanî pê

ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader jî bo her miletî êdî ne bi tenê wezifeke şexsî lê wezifeke xwe a milî ye jî. Heçî bi vî wezîfê ranebûna wezîfê xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kêrî miletê xwe ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe jî miletekî bihesibîne divêt bi kêrî wî bêt.

Piştî ko em kurd jî wek miletên din bûne xwediyê elfabeke xweser, xwendin û nivîsandina zimanê me gelek hêsanî bûye. Tecrîbê şanîdaye ko li gora jiriya mirov kurd jî heftêkê heta çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Belê piraniya kurdan bi tenê bi zimanê awe ê mader dizanin û ji lewre li mal be ji derve be di tenê bi kurdî dipeyivin. Lê di nav kurdan de hindikahi-ke kiçik heye û xelkê vî hindikahiyê an di welatê xerîbiyê de bûne an îro tê de dijîn. Tiştê ko ji vî hindikahiyê re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin berî ewilî hînî wî bibin û piştê di nav mala xwe de bi zar û zêçê xwe re herwekî Elyêzer fikir bi tene bi kurdî xeber bidin.

Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derve tenê mal, herwekî cilên xwe ji xwe kin û wan bi cilên malê diguhêrînin, zimanê xwe jî welê biguherînin û bi zimanê kûçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştêkî miqades hilînin.



## VEJANDINA ZIMANÊ IBRANÎ

Jeff Kaufman

### 1. Destpêk

Li Îsrailê dema mirov îro li rewşa ibranî dinêre, pir zehmet e bawer bike ku ibranî di nav sedsalekê de ji zimanekî mirî û ji axiverên xwecih bêpar, tevî zêdeyî 5 milyon axiveran derketiye asta zimanekî çalak û zindî. Ev pêşketina wî ya bêemsal ku mirov ecêbmayî dihêle, bala min kişand ser ibranî û vejîna wî. Ez dixwazim li vê serkeftinê binêrim û bibînim ku kîjan aliyên vê vejandinê dikare li zimanên din bê tetbîqkirin.

Wek hemû kesên ku derheqê vejandina zimanê ibranî de dinivîsin, ez ê jî bi zelalkirina bikaranîna xwe ya têgeha mirî, dest pê bikim. Li jêr ez ê li ser rewşa zimanê ibranî ya beriya vejandinê bisekinim, lê ya girîng ev e ku ibranî ji aliyê bi deh hezaran kesî ve dihate axaftin û bikaranîn. Gelek zimanên li ber mirinê jî ewqas axiverên wan nînin. Hin kes peyva mirî di wateya ku di hemû awayên ragihandinê de nayê bikaranîn de, diemilînin, "[1, p11] qenatetek hevpar heye ku zimanekî mirî ji aliyê tu kesan ve nayê axaftin. Dema ez li vir têgeha mirî bikar tînim, dizwazim ev zelal be ku qesta min di wateyeke qelstir de zimanekî bê axiverên xwemal e".

Ev girîng e ku di vejandinê de divê em bal bikşînin ser rola Ben Yehuda. Gelek caran ew wek bavê "ibraniya modern" tê binavkirin, lê ev ne tiştek e ku temamî wî organîze kiriye. Wî hêza destpêkirina tevgerê daye kirin û ew di gelek projeyên navendî û girîng de çalak bûye, lê hewldana vejandinê bixwe pir bênavendî bû. Dema em bikaribin rûyekî li ser tevgerê dînin û mirovekî wek serkêşê wê diyar bikin, fikirîna li ser wê hêsantir dibe lê li vir ne bi temamî be jî rewş ne wisa ye. Ji bo ziman-vejînerên mustaqbel ev girîng e, ji ber ku gelek kes navê Ben Yehuda dibihîzin û difikirin ku "ger wî karibû, ez jî dikarim." Ez ê nîqaş bikim ku di kîjan rewşan de hewldana vejandina zimanekî gengaz e û ev ne karekî şexsekî tenê ye. Ew katalîzora tevgerê bû lê talî ên ku ziman vejandin axiverên ferdî bûn û wan ev piranî bê kontrol an bê rêbertiya serkêşekî kirin.

Tiştêkî din î dixwazim di destpêkê de zelal bikim ew e ku tiştê vêga li Îsrailê tê axaftin ibraniya modern e, zimanekî nû ye, ji zimanê Torahê û ji hemû varyasyonên ibranî yên derbasbûyî cuda ye. Ev tiştêkî din e ku ew

kesên dixwazin zimanekî vejînin lazim e hay jê hebin; zimanekî ku mirovan dev ji axaftina wî berdane pir zehmet e ku heman zimanê ku wê bê vejandin be. Ger armanc dabînkirina axaftina zimanekî cuda ji aliyê gelekî be, bi ihtimal ev qebûlbar e. Lê ger ji dêvla vê niyeta parastin an berfirehkirina zimanekî pîroz ên bav û kalan be, mûhtemel e di encama vejandineke serkeftî de zimanekî ku axiverên wê ji encamê ne razî bin, derkeve holê.

### 2. Rewşa ibranî ya beriya vejandinê

Di xebateke li ser vejandina ibranî de, divê em binêrin bê ka rewşa berê ya ibranî çawa bû. Hokereke pir girîng ku kir zimanê ibranî bikaribe bê vejandin, ev bû ku dema zimanekî mirî jî bû, bi temamî winda nebûbû. Piranî zimanekî olî bû, lê qadên din ên bikaranînê jî hebûn. Bi awayê nivîskî gelek cure hebûn, her yek xwedî lîteraturek û peyvên cuda bûn. Di ibranî de ji aliyê gelek warên jiyana modern de kêmasiya peyvên hebû, lê wek ku li jêr tê ravekirin ev hate çareserkirin.

#### 2.1. Cureyên ibranî

Gelek cure û bincureyên ibranî hene, lê dema Ben Yehuda û yên din ji bo vejandinê li peyvên berendam digeriyan, bala xwe dan sê koman. A yekem û herî naskirî ibraniya Kitêba Miqades, ibraniya Torahê bû. Ji ber ku ev nivîsên ji belgeyek olî ne, pir şiklî û piranî ji jiyana rojane dûr in. [1, 124]. Lewma, ji bikaranîna rojane re nedibû. Digel ku cihûyan her roj li kenîştayê lê guhdarî dikirin û pir rêz lê digirtin jî. Ibraniya Kitêba Miqades her tim bi hemû dengên dihate nivîsandin,<sup>1</sup> û bi vî awayî baş hatibû parastin. Ji ber ku di Torahê [1, r15] de hew li dor heşt hezar peyv hebûn, ji bo ibranîyek bikaribe bê axaftin hin çavkaniyên din pêwîst bûn.

Zimanê derengtir ên Mişna<sup>2</sup>, Talmud<sup>3</sup> û Midraşê<sup>4</sup> ibraniya Talmudî di xwe de dihewandin.<sup>5</sup> Şiklê wan bêtir li zimanekî rojane dihat, ji ber ku ew bi xwe bêtir bi jiyana rojane re elaqeder bûn. Ev jî ji aliyê hin kesan ve wek awayê jirêderketî an xirabûyî yê ibraniya Kitêba Miqades dihatin qebûlkirin û li dij emilandina wan bûn.

Li Ewrûpaya serdema navîn û piştî wê di serdema ronîbûnê de, ibranî wek latînî tenê zimanê zanist û wêjeyê bû. Nivîskaran dixwestin tenê ibraniya Kitêba Miqades biemilînin, lê peyvên bi sînor gelek caran cih li wan teng dikir. Nivîskaran divê peyv ji ibraniya Telmudîk bigirtina, hin peyv ji

1 Di ibranî de awayê asayî yê nivîskî tenê dengên dengdar nîşan dide. Bêyî dengdêran dikare bê famkirin, lê gelek tevîhevî çêdibin. Awayekî dengnîşandanê ku li dor dengdaran nîşanên dengdêran tê danîn da ku kîjan dengdêr divê bê emilandin. Ev sistemê giran e û tenê li cihê ku wergerek rast pir girîng be, tê bikaranîn, mînak di Torahê de. Mişna û Telmud, ligel ku bêtir nivîsên jirêzê tê de hene rojname jî bi giştî dengnîşandanê bikarînin.

2 Mişna: Hiqûqa cezayî ya cihûyan. (wer.)

3 Talmud: Pirtûka cihûyan a qanûnan. (wer.)

4 Midraş: Pirtûka tefsîrî ya cihûyan. (wer.)

5 Hin nivîskaran wek ku ev formên cihê bin miamele dikirin, lê dema gel ji bo peyvên ibranî bi kar bînin û adapte bikin çav li van deqan digelandin pîvana senifandina wan a girîng beriya-serdema navîn û piştî-Pirtûka Miqades bû.



zimanê herêma xwe deyn bikirina û li ser kokên kevn peyvên nû çêbikirana.<sup>6</sup> Ev firehkirin ji aliyê hin kesan ve wek kufir dihate dîtin û heta hin kes ji bo rewşek sekuler li dij bikaranîna ibranî jî derdiketin lê paşre ev hemû ji bo vejîneran bûn mînak. Peyvên li vir dihatin pêşkêşkirin bi giştî dikaribû bîn bikaranîn, lê di nav nivîskaran de gelek awayên wan hebûn, lewma gelek têgehên bikêr nekete nav ibraniya modern.

Ibraniya cihûyên Yemenê jî bi awayekî din e, wek ku tê texmînkirin ev ibraniya Yemenê ye. Tê qebûlkirin ku ji aliyê fonolojîk ve di nav cureyan de a herî baş hatiye parastin ew e, ji ber ku ji bo her tîpên dengdar dengêkî tek heye. Dîsa jî ji bo ibraniya modern ev wek çavkanî nehatiye bikaranîn. Ihtimal e ev ji ber ku Ben Yehuda û yên din haya wan jê tunebûn an belkî jî bi awayekî rêk û pêk li ser nesekinbûn, lê her çî be, ew nehate bikaranîn.

## 2.2. Di axaftinê de bikaranîna ibranî

Ibrani helbet hê jî bi awayekî olî tê emilandin. Hemû kur divê xwendina ibraniya Kitêba Miqades bielimin ku dema bûn Bar Mitzvah bikaribin Torahê bixwînin. Fêrbûna Mişna, Talmûd û Midraş jî pir berbelav e. Giranî li ser xwendina deqan e, lê ji bo gelek ravekirinan ibranî bi awayekî devkî tê bikaranîn. Ibraniya Kitêba Miqades di gelek ayînen standard de û ji bo duayan tê bikaranîn, lewma ew tê naskirin û berbelav e.

Li Filistîn û cihên din ên ku cihû bêyî zimanekî din ên hevpar dihatin ba hevdu, ibranî bi halê xwe yê teng wek zimanê ragihandinê dihate emilandin. Hin analîzên vê bikaranîna li Filistînê wê di beşa pêşî de bê pêşkêşkirin.

## 3. Ben Yehuda û fikra vejandinê

Ben Yehuda cihûyekî litwanyayî bû, di sala 1857an de hatiye dinyê. Wek ku ji bo kurên ciwan adet bû, wî di sê saliya xwe de dest bi fêrbûna Torahê kiribû. Di donzdeh saliya xwe de bûbû neh sal ku ibranî fêr dibû û piraniya Torah, Mişna û Talmudê dixwend û vê ew bi ibraniya Kitêba Miqades û Talmûdîk aşîna kiribû. Dê û bavê wî dixwestin ew bibe haham û ew şandin dibistaneke olî. Li vê derê xwendina ibranî domand û tevî nivîsên sekuler marûzî ibraniya serdema ronakbûnê hat. Piştî frensî, almanî û rûsî fêr bû û ji bo bêtir perwerdehiyê ew şandin Dunabergê. Li wir Ha-Shahar ku netewperweriya ibranî jê fêr bû xwend, û fikirî ku li Filistînê vejandina zimanê ibranî dikare cihûyên diasporayê li hemberî bişaftina derveyî biparêze.

Piştî mezuniyeta xwe çû Parîsê ku li Sorbonê bixwîne. Li wir dîrok û siyaseta Rojhilata Navîn tê de, gelek tişt xwend, lê ya ku herî zêdeli ser bandor kir zimanê ibranî bû. Taybetî, dersên ibraniya pêşxistî yên nîqaşê. Ew bikaranîna ibranî ya bi awayekî peyvî ew îqna kir ku wek zimanê neteweyekê

<sup>6</sup> Ibrani, wek zimanekî samiyî, zimanekî kokî ye. Yanê, komên dengdaran wateyek wan a giştî ku bi wan re elaqeder e, heye. Bi ser van kokan ve bi lêzêdekirina dengên cuda yên dengdêr, gelek peyvên cuda tên çêkirin. Ji bo çêkirina peyveke nû, mirov dikare rahêje kokek pêwendîdar û komek nû ya dengdêran lê zêde bike. Wek alternatif, her çiqas qet nayê kirin jî, wê gengaz be ku kokên nû bîn ba hevdu. [3, r4]

vejandina zimanê ibranîpêkan e. Ji Parîsê çû Cezayirê, li wê derê di nav cihûyan de zimanê hevpar tenê ibranî bû. Li Cezayirê di nav peywendekê sekuler de di ragihandinê asayî de derfeta bikaranîna ibranî zêde çêbû.

Ben Yehuda, dema li Parîs û Cezayirê bû, di çapemeniya ibranî de gelek gotar weşand. Hewl dida mirovan îqna bike ku wek zimanekî ji nû de bê dinyê ji bo pratîkbûna ibranî çawa pêkan e û li Filistînê vejandina vî zimanî wê xortên cihû çawa ji terikandina cihûtiyê dûr bixe û nêzî çanda netewî bike. Digel ku bersivêk tîkel wergirt, biryara xwe da ku biçe Filistînê û hewl bide alikariya vê vejandinê bike.

## 4. Filistîn û koçberî

Filistîna ku Ben Yehuda di sala 1881ê de çûyê ji %54ê wê cihû bû. Ji aliyê etnîk û çandî ve cihû di nav xwe de wek aşkenaz û sefarad bûbûn du kom. Cihûyên aşkenazî ji Ewrûpaya rojhilat, sefarad jî giştî ji derdora Derya Spî hatibûn. Zimanê du koman ji hev cuda bûn, ibranî bi awayekî cuda telafuz dikirin, çanda wan û statuya wan jî cuda bûn.

Aşkenaz hemû koçberên zarokên koçberan bûn û beriya 1820î qet tunebûn. Piraniya wan ji bo xwendinê li wê derê bûn û ji (û lewma girêdayî) derve dihatin fînansekirin. Bi giştî bi zimanê yîdîşî dipeyvîn û zimanê wan di bin bandora telafuza ibranî de bû. Ne civatek yekgirtî bû, lê li gor herêmên Ewrûpaya Rojhilat ku jê hatibûn, di nav de parçeyî bûn. Berovajiya wan, ên sefarad bi giştî ji bav û kalan li wê derê bûn. Bi zimanê ladînî û erebî dipeyvîn û di nav civakê de piranî di rewşek baştir de bûn. [1, r29] Telafuza sefaradî wek devokek xwedî prestîj dihate qebûlkirin.

Erebî zimanê bajarî bû û her kom li gor herêmên xwe bi zimanê xwe dipeyvîn. Dema cihûyên herêmên cuda pêwîst bû bi hev re bipeyivin, bi ibraniya sefaradî dipeyvîn. [1, r28] Wek encam, dema Ben Yehuda hate Filistînê dikaribû bi piraniya cihûyan re bi ibranî bipeyive. Cihûyên sefaradî bi yên ne sefaradî re bi ibranî dipeyvîn û Ben Yehuda dikaribû bi yîdîşî bipeyive lê wî nedixwest ev bê zanîn lewma aşkenazan jî dixwestin bi wî re bi ibranî bipeyivin. [1, r31]

Gencîneya peyvên ibraniya sade a bazarê pir sînorkirî bû û di nav hewleke ku wê tatbîkî pêdiviyên modern bikin bi awayekî neyekser dihate bikaranîn û rêzimana wê tîkela Kitêba Miqades û ibraniya Talmudî bû. Gelek wechên zimên, bi taybetî dengdêr û hevoksazî, li gor zimanê xwemal ê axiveran diguherî. [1, r31] Ev ibranî tam zimanekî tîkel bû, ne tam zimanek bû lê bi awayekî bisînor ji aliyê komên curbicur ku zimanekî wan ê hevpar tunebû, dihate axaftin.

Di dema vejandinê de, ji Ewrûpayê herika koçberên cihû hebû. Piranî wek du koman tên qalkirin, aliyaha<sup>7</sup> yekem û duyem. Aliyaha yekem di navbera salên 1882 û 1903yan de ji 35,000 cihûyên koçber pêk dihat. A duyem, di deh salên piştî vê ji sala 1904an heta 1914an dom kir, ji 40,000 kesan pêk dihat.

<sup>7</sup> Koçberiya piştî serdema vejandinê jî wek aliyot tê dabêşkirin, lê li vir mijar ne ev e.



Her du aliyah ji piraniya wan aşkenazên bajarî yên îdealîst û ciwan bûn ku berê qet cotkarî nekiribûn. Dema hatin Filistinê gelek ji wan ketin nav civatên cotkar û aliyaha yekem ji ber bêtecrubetiye gelek zehmet kişandin. Di aliyaha duyem de êdî gelek pirsgerêk hatibûn çareserkirin û koçberên berê xwedî tecrube bûn. Hate famkirin ku civatên cotkaran ên nîv-îzolekirî bûn ji bo pêşketina zimanê ibranî bikêr e, ji ber ku van civatan dikir ku komek mirov bi hev re derbasî zimanekî din bibe bêyî ku pêdiviya wan bi alemek firehtir hebe.

### 5. Pêvajoya vejandinê

Çendîn hemanên girîng yên pêvajoya vejandinê hebûn. Ben Yehuda heft heman tespît kiribûn, lê yên sereke ev bûn:

1. Axaftina ibranî li malê.
2. Axaftina ibranî di nav civakê de, di nav xort û zarokan de.
3. Çavdêriya Komîteya Zimên û paşre ya Akademiya Zimên.

#### 5.1. Axaftina ibranî li malê

Hin kesan divê dest bi axaftina ibranî bikin ku ev ziman di jiyana rojane de bê axaftin. Ben Yehuda û jina wî mala xwe kirin mînak û cihê ceribandîna ku tenê ibranî bê axaftin. [1, p37] Di hewldana wan a bikaranîna ibranî bo kar û barên rojane de, her tim pirsgerêka binavkirina tiştên ku di serdema Torahê de tunebûn û lewma di ibranî de peyv bo wan tunebûn, derdiket pêşiya wan. Her ku pêdivî çêbû wan ji kokên kevn peyvên nû çêkirin û hêdî hêdî ji bo jiyana rojane komek peyv çêbûn.

Tevî vî karê peyvçêkirinê, gelek karê wan hebû. Ben Yehuda di piraniya temenê xwe de li ser ibranî xebitîbû lê hê jî bi awayekî herikbar nikarîbû bi ibranî bipeyive. Jina wî diviyabû hê bêtir bixebite, ji ber ku di rêwitiya xwe ya bo Filistinê de di keşiyê de dest bi fêrbûna ibranîkiribû. [1, p38]

Bi rastî jî bo vejîna ibranî axiverên xwecih pêwîst bû û Ben Yehuda hay ji vê hebû. Jina xwe îqna kir ku kurê xwe divê bi yek zimanî mezin bikin. Kurê wan Ben Avş, heta heft saliya xwe tenê dengê ibranî bihîst. Hema bêje hemû ibraniya wî a ku ji aliyê dê û bavê wî û hin mêvanên carna dihatin mala wan. Dibe ku ji ber vê sînorkirinê be, Ben Avi heta çar saliya xwe nepeyivî. [1, p39] Ji ber vê rewşê dê û bavê wî, bi taybetî diya wî ketibû tatêla wî; miroven ku mala wan wek mînak didîtin jî di tatêla wî de bûn. Heta Ben Avi dest bi axaftinê kir, malbatên din dil nedikirin ku rîska zarokê wan bê ziman rabe, bidin ser xwe.

Heta Ben Yehuda û jina wî nîşan dan ku malek ibranîaxêv pêkan e, kêma malbatan hewl dan vê biceribînin. Axaftina bi ibranî gelek kar jê re dixwest û kêma kes bi awayekî xurt di xema vejandinê de bûn ku têkevin nav xebateke dijwar. A din, hê jî zêde kesên bi ibranî baş bizanibin tunebûn ku bi taybetî wî bikaribînin û lewma zêde berendam tunebûn. Heta ku hin parçeyên pêvajoyê kir ku mirov têra xwe bi ibranî bipeyivin, ev qismê pêvajoya vejandinê bi kêr nehat.

### 5.5. Ibraniya civakî

#### 5.2.1. Ibranî di dibistanan de

Du sal piştî hatina Ben Yehuda ya Filistinê, Nissim Bechar, midurê dibistanê seretayî ku berê tenê xwendekarên sefaradî digirt, xwe nêzî wî kir. Bechar dixwest destûr bide aşkenazan jî lê di tatêla pirsgerêka zimên de bû. Wek rêbazek çareserkirina vê pirsgerêkê, ji Ben Yehuda xwest ku di dibistana wî de bi zimanê ibranî mamostetiye bike. Ben Yehuda bi bikaranîna rêbaza Berlitzê<sup>8</sup> tenê bi zimanê ibranî dest bi mamostetiye kir. Lê piştî demeke kurt nexweş ket û mecbûr ma dev ji vê berde. [1, p48]

Di nav çend mehên mamostetiya xwe de wî zêde kes yekser fêrî ibranî nekir, lê bi rêya fêrkirina temamî bi zimanê ibranî ew dîsa bû mînak. Mamostetiye ew kir pozisyonekê ku bikaribe bandorê li ser mamosteyên din bike û wan bi bikêrbûna rêbaza Berlitzê û pêkanbûna vejandinê serwest bike. Gelek mirovên hêja bi vê serwest bûn û di polên xwe de bi bikaranîna zimanê ibranî dikaribûn di rewşa vî zimanî de guhertinekê çêbikin.

Di dibistanan de perwerdehiya bi zimanê ibranî pir zû hat ecibandin û statuya ibranî hate wê astê ku pirsgerêk êdî ne ku zimanê dibistanan divê bi ibranî be an na lê kîjan ders divê bi ibranî bin? Netewperweran dixwestin hemû ders bi ibranî bin, ên mihafezekar dixwestin tenê dersên olî û çandî bi ibranî bin. [1, 55] Bi demê re bêtir cihû ketin nav zimanê ibranî û li cihê ku taybetî ibranî dihat bikaranîn, zimanê xort û zarokan bêtir herikbar bû. Her ku ibranî dikaribû wek zimanekî mahrem kar bike, van xort û zarokan bêtir jê hez dikirin. [1, r54]

Dibe ku ji bo demekê zarokan ibranî wek zimanekî mahrem qebûl dikirin ku bi taybetî di nav wan de ewqas populer bû. Qabiliyeta axaftina bi zimanekî ku mezinên wan fam nakin, pir bi kêrî wan dihat û xweş bû, di tiştê de baş bûn û dê û bavê wan ketibûn nav hewldana fêrbûna wî. Ev dihat vê wateyê ku nîşekî din bi temamî derbasî ibranî bûbû, ev hokerek pir girîng bû. Ev bêhevsengiya dê û bav-zarokan bi du aliyên kar dikir. Ji aliyekî ve dê û bavên didîtin ku zarokên wan çawa fêr dibin, wan jî dixwestin fêr bibin û zarokan jî, wek axiverên herikbar bi alîkariya bo dê û bavên xwe pratîk dikirin.

#### 5.2.2. Ibranî di rojnameyan de

Dema Ben Yahuda hate Filistinê, rojnameyên bi zimanê ibranî tunebûn. Li Ewropayê rojnameyên zimanê ibranî hebûn, lê ev ne rojnameyên gelemperî bûn, ew bêtir li ser mijarên cihûtiyê bûn, mirovên cihû nûçeyên giştî ji rojnameyên bi zimanê lokal dixwendin. Li Filistinê jî xeynî rojnameyên ji Tirkiye, Ewropa an welatên din dihatin, ne bi erebî, ne bi ladînî ne bi yîdîşî ne bi zimanên din tu rojname dernediket. [1, p56] Ben Yehuda ferq kir ku li Filistinê

<sup>8</sup> Rêbazeke nû ya fêrkirina zimên ku xwendekar bêyî rêziman an jiberkirinê bi riya noqîkirinê fêrî zimanê nû dibin. Ev tetbîqkirina rêbaza Berlitzê ne rêbazeke safî bû, ji ber ku xwendekar ji xwe tecrübeyên wan ên rêzimana ibranî hebû, lê aliyê wê ye beşdarîbûnê pir karîgerdar bû.



ji bo nûçeyên gelemperî bazarek bo rojnameyek bi ibrani heye û sê salan piştî hatina wî ya Filistinê di sala 1884an de **Ha-Zevi** derxist. Ben Yehuda ji bo **Ha-Zevi**, biryar dasîstemeke bi navê Hemû Ibrani, bikar bîne. Rojnameyên din ên bi ibrani tenê ibraniya Kitêba Miqades bi kar dianîn, dema ew têr nedikir ji zimanê lokal peyv deyn dikirin. Ben Yehuda valahiya di navbera ibraniya Talmudî û Serdema Navîn tijî kir. Ji çavkaniyan peyvên wisa digirtin ku ji bo mirovên Kitêba Miqades baş nas dikirin, aşîna bin. Dema çavkaniyên ibrani têr nedikirin wî peyvên nû çêdikirin, çî li malê çî li kar be. Ji bo Hemû Ibraniya (Total Hebrew) wî çavkaniya dawî Markêta Ibrani ya têkel bû. Li vir peyvên rojane ên wek "ji kerema xwe" û "spas" hebûn ku bi awayekî kurt û bikêr di çavkaniyên kevn de peyda nedibûn. [1, r60] Bi vî awayî rêjeya peyvên deyn daxist heta %2yan, ji bo rojnameyên ewrûpî ev %14 bû. Ev her sê çavkaniyên derveyî Kitêba Miqades hin kes aciz dikirin, lê wek çavkaniyekê hîlbijartina Markêta Ibrani, bi sedema ku ev çavkanî xirabûyî û nermijoqî ye, herî zêde ew rastî bertekan hat. Lê edîtor ew bû û serkêşên olî yên ku îtiraz dikirin ji vê zêdetir tiştek ji destê wan nedihat.

Ben Yehuda **Ha-Zevi**, taybetî ji bo berbelavbûna ibraniya axaftinê wek alaveke sereke didît. Ew difikirî ku pêdiviya xelkê bêtir bi peyvên berdest heye, lê wî dizanibû ku xelk bi giştî li dijî qebûlkirina peyvên nû ne. Ji ber vê, peyvên nûçekirî êdî bê jêrenot, bê werger heta bêyî dengên dengdar nivîsand da ku xelk wan ji peywendê fam bikin. [1, r65] Ev rêbaz ne ewqas bikêr bû, ji ber ku xelkê bê dengdar nikaribûn peyvê telifûz bikin. Li aliyê din, ku bikaribûna telifûz bikin jî îcar ji ber ku nû xuya dikir, qebûl nedikirin.

### 5.3.3. Saziyên çavdêriya zimên

Di sala 1890î de Ben Yehuda Komîteya Zimên ava kir. Lê di demeke kurt de ji hev belav bû û sala 1903yan de wek Konseya Zimên ji nû de dest pê kir. Armanca wê ev bû: Berhevkirina peyvan ji Kitêba Miqades, Talmud, Serdema Navîn û Markêta Ibrani û çêkirina ferhengê, cihên pêwîst bû çêkirina peyvên nû û standartkirina telifûzê.

Ben Yehuda beriya avakirina komîteyê dest bi amadekariya ferhengê kiribû. A rast, çawa ku Ben Yehuda hat Filistinê yek ji karên wî yên ewil amadekirina pirtûkeke biçûk bû da ku xebata bi ibrani hêsantir bike. Her ku çû peyvên nû lê zêde kir, heta ku têra xwe mezin bû. Ferheng sînorê vê xebatê derbas kir û bi gelek awayî wê ev destpêk nîşan dida. Di çêkirina vê ferhengê de tiştekî herî xerîb ew bû ku li gor mijaran hatibû rêzkirin û bi ser de jî bi rêza alfabetîk. Fikirîbû ku ji bo kesekî ku ibrani kêmbûn ev ê bêtir pratîk be. Di derxistina rojnameyê de Ben Yehuda ji vê ferhengê gelekî îstifade kir, lê ji ber ku heta nêzî dawiya pêvajoya vejandinê jî hê xelas nebûbû, di salên herî girîng ên vê pêvajoyê de gelek kesan zêde jê îstifade nekirin. Her çiqas piştî vejandinê wek hêzeke bo standardîzasyonê hate xelaskirin jî, ew dîsa jî bi kêr bû.

Yek ji armancên sereke yên konseyê, di nav kesên nû fêrî ibrani dibûn de kêmkirina şaşbikaranîna zimên bû. Di sala 1911an de broşurek bi navê "Nebêje..., bêje ...." derxistin. Nod û heyşt şaşiyên herî zêde berbelav tespît kiribûn û rastiya wê li hember nivîsandibûn. Wek gelek belgeyên qedexekirinê yên akademyên zimên, xuya ye ev jî hatiye ihmalkirin. Lê ev broşur têra xwe hate belavkirin û ji nû de hate çapkirin, heta salên 1970yî jî hê li ber dest bû. [1, p88]

Konsejê ji mirovên ku di hin mijaran de ji wan re peyv lazim bû, wek mamosteyên ku dixwestin di polên xwe de mijarekê vebêjê ku jê re komek peyvên hê tunene lazim e, daxwaz werdigirtin. Pirsgirêk ev bû ku ew komîteyek bûn û ewqas hêdî bûn. Deh sal çêbû di navbera ku wan di 1903yan de ji nû de dest pê kirin û heta sala 1913an de yekem listeya xwe ya peyvên ji bo cil û berg, nebat, mala zarokan û dirûtinê, weşandin. [1, r93] Heta ku wan xebatên xwe xelas dikirin û li ser peyvan biryar didan û ew diweşandin, dibû ku xelkê bi xwe ji zû de peyv çêkirine û bi salan e bikartînin.

Ji nişka ve êdî konseyê karê hakemiyê da ser xwe. Mirovên ku ziman ji bo karê rojane bi kar dianîn li gor pêdiviya xwe peyv çêdikirin. Ji bo peyvan bi awayekî pêşbaziyek û standardîzasyonê xwezayî çêbûbû, lê gelek varyasyonên peyvan jî çêbûbû. Konseyê li peyvên ku xelkê bi kar dianî dinêrî û li gor pîvana çavkaniya peyvê, berbelavbûna peyvê, hêsaniya bikaranîna wê û di nav ibraniya modern de çiqas cihê xwe digre, "a herî baş" hildibijart. [3, r3] Piştî wan peyvên hatine hîlbijartin dikirin wek broşurekê û ew li mamosteyan belav dikirin û di rojnameya Ben Yehuda **Ha-Zevi** de diweşandin.

Ev modela çavdêriya zimên ji bo standardîzekirina zimên pir fonksiyonel bû, lê ji bo parastina peyvên kevn ewqas baş kar nekir. Hin kesan digotin ku rola konseya zimên divê safikirin û zelalkirina zimên be. Ev kes difikirin ku wek fermî an standard qebûlkirina peyvên ji çavkaniyên din wê xeter be, dibe ku xelkê bi şaş-şîrovekirina Torahê peyv çêkiribin. [3, r3] Wexta konseya zimên ev rêbaz dişopandin xelkê zêde guh nedida wan. Ger ku dixwazin gel guh bidin wan, rêbaza çavdêriyê ku karê komîteyê yê sereke wê standardîzasyona peyvên di bikaranîna de be, xuya ye karê ku divê bikin ev bû.

Konsej li ser standardîzasyona telifûzê jî xebitî. Gelek nîqaşên dîrûdirêj kirin ku di encama wan de ji bo ibraniya modern li ser telifûza sefaradî biryar dan. Ji ber ku ev telifûza Ibraniya Markêta bû jî ku ibraniya modern jê diza, xelkê jixwe li vî awayê telifûzê biryar dabû. Xuya bû ger konseyê ibraniya modern hîlbijarta, ew ê hatibûna paşguhkirin. Ji ber vê, biryara ku konseyê dabû, bersiva pirsê ku çima ne ya aşkenazî dida.

<sup>9</sup> Ji ibraniya Kitêba Miqades û ibraniya Talmudî, terciha ji aliyê Kitêba Miqades kirin, ji erebî û ibraniya Talmudî a Talmudî, ji erebî û zimanên biyanî jî erebî tercih kirin.



## 6. Beramberkirinên bi vejandinê yên din û destpêkên wan re

Hin kes dikarin bibêjin vejandina ibranî çawa pêkan bû, lewma vejandina zimanên din jî wê pêkan be. Hewldanên din di serkeftinê de nêzî ya ibranî nebûbe jî. Taybetiyek heye gelek kes bala xwe nadinê ku ibranî di qada ku ew hate vejandin êdî qet nedihate bikaranîn. Di zimanên din de rewş ne wisa ye, ew ne mirî ne li ber mirinê ne. Û ew dimirin jî ber ku axiverên wan berê xwe jî wan diguherin ber bi zimanê medya û çand û civaka serdest ve. Hêzên ku xortan jî zimên dûr dixîne xurt in û pirsgirêka wan ne ya ibranî ye.

Ecêb e ku, rewşa ibranî ku ne zimanê axaftinê bû bi rastî bi kêrî ibranî hat. Zimanê ku gel hewl dida fêr bibe û bipeyive, jî aliyê zimanekî serdest prestîja wî neketibû bin lingan, lê di axaftinê de qet statuya wî tunebû. Li Filistînê medya an civakeke firehtir ku pê re têkeve reqabetê tunebû, taybetî jî bo xortên di kibbutzan de ku jî koçberên bi aliyaha duyem jî Rûsyaya sosyalîst hatibûn, pêk dihatin. Li wir, pêkan bû ku civatek bi temamî bêyî mudaxleyên derve dest bi axaftina ibranî bike. Di zimanên modern de qet tunebe jî pir kêr ziman di vê rewşê de ne.

Girseya koçberên xort ku bi aliyota yekem û duyem hatibûn jî alikariya vejîna ibranî kirin. Dan pey vejandinê û pir bi hewes bûn ku tevî serxwebûn û nasnameya xwe ya netewî zimanê ibranî ava bikin. Di rewşa vejandina zimanên netewî de ev motivasyon ne her tim ewqas xurt û berbelav e. Ev koçber hatibûn cihekî nû da ku awayê jiyana xwe jî kokê ve biguherînin, guherînek jî bajarîbûnê ber bi cotkariyê. Li ber hemû guherandinên din guherandina zimên ne tiştekî zêde bû. Di rewşa civakeke ku tenê dixwaze zimanê xwe jî nû de bi ser piyan bixe de, koçberiyek sembolîk û jêneveger ku bi rastî jî xwe terxan bike û wan bi hevdu re bi cih bike, nîne. Ji dêvla vê, hin mirovên dilsoz ku dixwazin rewşa zimanê xwe biguherînin di nav gelek kesên ku jî fikrên derve re vekirîne re ne lê girêdayî wê dozê ne û hin jî wan rijd in jî, dijîn; bi kurtî jî şertên îdeal gelekî kêr in. Ewçax em vedigerin ser pirsê ku li cihekî diyar vejandina zimanekî kengî pêkan e. Li gor tecrubeya vejînerên zimanê ibranî xuyaye çendîn hoker pêwîst in:

- Hin sazmandar an rêvebirên dilsoz: Ben Yehuda, gelek kesên din
- Civakek îdealîst û dilsoz: Aliyot (koçber)
- Rewşeke ku bikaranîna wî zimanî jî yên din bikêrtir be û ligel vê tunebûna zimanekî berfirehtir ku bikaribe vê pêdiviyê bîne cih: Cihûyên Filistînê jî zimanekî hevpar bêpar bûn û di nav zimanên ku ew dipeyivîn, yek jî wan ne guncan bû ku bibe zimanê hevpar.

Di gelek hewldanên vejandinê de jî van yek an bêtir hoker kêr in. A din, li vir mekanek heye ku ziman wê bê vejandin dikare bibe zimanekî mahrem. Li cihên din, ew niyeta ku ziman têkeve dewsa zimanê zal nîne, tenê lêzêdekirina zimên e jî aliyê çandî ve wek zimanekî duyem ê alîkar.

## Çavkanî

- [1] Jack Fellman. *The revival of a classical tongue: Eliezer Ben Yehuda and the modern Hebrew language*. Mouton, The Hague, Netherlands, 1973.
- [2] Leanne Hinton and Ken Hale, editors. *The green book of language revitalization in practice*. San Diego, 2001.
- [3] Moshe Nahir. Micro-corpus codification in the Hebrew Revival. 2003. <http://www.uoc.edu/hum/l/articles/eng/nahir0303/nahir0303.html>.
- [4] Chaim Rabin. The national idea and the revival of Hebrew. In Jehuda Reinharz and Anita Shapira, editors, *Essential papers on Zionism*. New York University Press, New York, NY, 1996.
- [5] Shalom Spiegel. *Hebrew reborn*. The Jewish Publication Society of America, Philadelphia, PA, 1962.

ji îngilîzî: Fexriya Adsay



## EMÊ! TU DIKARÎ DI TARIYÊ DE JÎ BI TIRKÎ BIAXIVÎ

Mihemed Şarman

### Destpêk

Van salên dawî gelek rewşenbîr, nivîskar komele û tevgerên kurdan li ser mafê perwerdehiya bi zimanê kurdî disekin, roj nîne ku nivîsek an daxuyanîyek li ser vê meseleyê dernekeve. Bi min jî ev mesele têra xwe girîng e û divê meriv gelek caran bi doralî li ser bisekine. Lê di van nivîs û hewldanan de du kêmasiyên mezin dertên peşiya me:

1. Axaftin, gengeşî, daxwaz gelek caran hev dubare dikin, mesele tenê di çarçoveya siyasî de tê nirxandin û mixabin gelek tiştên girîng li ber çavan nayên girtin.
2. Li ser bîreweriya kesan an civakê nayê rawestin, da gelo qedexebûna zimên çî qirêjî li ser bîrewerî, hiş an derhişê muxatabê meseleyê hiştine. Çiqas jî hundir deng bidin jî bi çavekî dûr û derveyî meseleyê, ev guftûgo tên kirin.

Helbet kelepor an sergoyê zimên jî wek kelepor an sergoyê kurdî arşîveke mezin li pey xwe hişt. Êdî "kurdûn" an "kurdî" bûn li ber mudaxaleyên desthilatdariyê ne wek rewşa xwe ya ewilîn zelal û yekrengîn e. Teşe û navrokên wan hatiye guhertin. Divê meriv hin pirsên heyatî li van meseleyan zêde bike. Gelo "kurd" bûn an "tirk" bûn di raya giştî û zêhna wan de jî bilî nav û neteweyekê an navê zimanekî tê çî wateyan? Bi çavekî postkolonyal meriv dikare van yekan jî nû ve çawa biaxive? Di nivîsa jêrîn de her çiqas ev meseleyên girîng bi hûrgilî nehatibin nivîsîn jî hêvî dikim ku xizmeteke biçûk be jî li van gengeşiyên zêde bike. Belkî bibe sedema nêrînek cuda qet nebe em hinekî jî nava dilê xwe, bêkompleks bikarin meseleyê ji bo xwe zelal bikin<sup>1</sup>.

1 Min nexwest ez di nava vê nivîsê de agahdariya teoriyên wek postkolonyal (xebatê madûnan) an "xebatên reşikan" bidim, ev çarçove dikare di nava jî ji paşxaneya van herdu teoriyan sîd bigre. Lewre wek xwendevan jî dê bibîne teşeya nivîsê ji sarbûna gotaran bêtir li germahiya ceribandinan tê. Ev nivîs pariyek ji dosyayek min e (Li Ber Deriyê Hişê Gelekî) neweşandî ye. Jixwe me dil heye ku em dosyeye taybet di hejmara duyemîn de li ser van teoriyan amede bikin, dûr û dirêj li ser rawestin.

### Tariya kurdiyê

Li gundê me merivekî bi navê Emer hebû, bi henek û pîrbêjiya xwe dihat nasîn. Carinan jî di ber henekan re derewên xweş dikirin, ku tehma edebiyat û hunerê jê dihat.

Wextê Emer ji leşkeriyê tê, -ku leşkerî merheleyeke girîng e di ferhenga mêranîyê de lewre navê leşkeriyê di bin peyva kamilbûnê de tê nivîsîn û têra xwe jî tirtire ye<sup>2</sup>- jî kamilbûnê wêdetir hinek xûy û xisletên elewatî lê zêde bûne. Di nav xeberdanên xwe de peyvên tirkî derbas dike, di kirasê pozbi-lindiyekê de bi hevokên tirkî diajo ser jina xwe ya nexwendî û tirkînezan. Şevêkê dîsa Emer bir tirkî-mirkî xeber dide, bê şansî ceryan diçe, di cî de dengê wî qut dibe. Di tariyê de dimînin. Jina reben bê hemdî, li bêdengiya Emer vedigere û dibêje: "Emê Emê<sup>3</sup> Xwedê kî tu dikarî di tariyê de jî bi tirkî xeber bidî!?"<sup>4</sup>

Wextê ez bi vê meseleyê hesiyam hê xort bûm. Min ev yek wek henekekê an pêkenokê pejirand, di sohbeta hevalan de, gelek caran jî xwe re kire qewde tovîk, heya dema xwe pê borand, bêyî ku li ser bifikirim, tê de nimûneyeke sosyolojîk, rengê modernîzmeke derengmayî bibînim. Kengê modernîzm, -taybetî modernîzma kurdan- helwest û nêrîna kurdan a li hem-ber tirkî, jî min re bûn derd, piştî qelibîn li ser têgihîştîneke sosyolojîk, vê "pêkenokê" boxçika xwe ya hêja li ber min vekir.

Heya ku em vegerin ser êşa vê pîrsê dixwazim çend sehneyan ji bîranînên xwe parve bikim û li şopên sedema pîrseke bi vî şewazî di nava kelepura modernîzma derengmayî de bigirim. Her çiqas ev mijar gelek berfireh be jî, em ê li ser nimûneyên li ser ziman bisekinin, ew tiştên din dîsa di nava vê pirtûka behskirî de bi sernavê xwe cî digirin.

Ez bawer im ev serpêhatî bi serê xwe, jî şexsîbûnê wêdetir, pareke çîrokeke kolektîf di nava xwe de di hewînîna ku kirde jî kurdbûn bi xwe ye.

### Kê tirkî kişand gundê me?

Kîjan kurd di zaroktiya xwe, di salên dibistana seretayî vegere dê teqez pêrgî çîrokeke qedexebûna zimanê xwe, pêrgî êşeke dijwar were ku wextekê bi derba dar û cetwelan pêşî li canê wî pişt re li ruhê wî deq bûye. Meriv dikare bibêje neviyê cetwela mezin a ku sînorê mîsak-î millî pê hatiye xêzkirin,

2 Meriv dikare di vir de bîne bîra xwe ku fotoxrafên ku leşkeriyê hatine girtin, her tim bi payebilindî bi qiblegehên menzelê ve tî hîlawestî.

3 Emê awayê kurt ê navê 'Emer' e.

4 Li gorî salixan zimanzan û xemxurê kurdî FHuseyin Sağniç jî bi meseleyeke wiha re rû bi rû maye. Henekê FH. Sağniç ku li jêr hatiye nivîsandin, her çiqas dîrî ruhê vê pîrsa jinê be jî dîsa jî, diyardeyê bi vî rengî balkêş di xwe de di hewînê, hewceyê dabaşkirinê ye. Gava jî ber vê nivîsê min hinek pîrs ji hevalên xwe re rêkir yekî ji wan (Elhekîmê Tetwanî) ev nîşe li bersiva xwe zêde kir jî min re şand: "Ez ê li vir behsa Mamê Feqî Huseyin Sağniç bikim Mamê Feqî gelek girîngî dida axaftina bi zimanê kurdî rojekê nasekî Mamê Feqî diçe dikana wî û di wê demê de êvar e û ceryan jî tune. Ew mirov dibêje "Feqî Amca nasilsin?" Feqî; "Ez baş im biraziyê min." Mirov; "Feqî Amca sana bîr konuda danişacagim" Feqî nahêle axaftina xwe bidomîne û jê re dibêje: "Mala te xerab nebe ez di rohnîya rojê de nikarim bi tirkî biaxivim ez ê niha çawan di vê tariyê de bi tirkî bersiva te bidim, ka bi kurdî bipirse ku ez bizanim."



ev cetwel e. Ne wisa bûya dê tenê bi çûyina êşa serê tiliyan re bifûriya, dê belaya wê qirêjî û êşa xwe bernedaya ser ruhê me. Ji ber vê yekê rasthatina li zimanê tirkî tu carî di rewşeke asayî, di rojeke geş, di kirasekî şaristaniyê de nebûye, û nehatiye. – a tirkan jî heman tişt e. Bîranîna bi vî rengî gelek caran di civatan de, şevbihurkên ku kurd û tirk li cem hev bin, an di hevpeyvîna rewşenbîr an jî siyasetmedarên kurdan de kêmbi hêrs, geh bi henek, lê bi piranî di kirasê mexdûriyetekê de tèn dabaşkirin.

Ew rojên ku tirkî zimanê efendî-mamosteyan, kurdî tifa devê gundî û nezanan bû karê me tevan hînbûna tirkîyeke tekûz bû mixabin. Ders tev bi vî zimanê dojhî bûn ku tenê di betlaneyê de, ji bo sixêf an çêrekê, an bi saya nav û nûçik lêkirinekê kurdî ji dilê me diteyisî, ji zimanê me dipekiya ku dibû sedema tinaz, gilî, gazinan û bi piranî jî li hember hevalên me yên qîz.

Keçikan ne bi tenê di nava xwe de, li malê di navbera hev de jî bi tirkî-axaftina xwe bi kêf didomandin. Piştî çend salan ez gelek caran fikirîm çima piranî mela keçan li ser axaftina bi tirkî bû? Aya bo çî ji serkeftina bikaranîna tirkî re quretiyek li dev û rûyê wan belav dibû? Heya ku niha jî di jiyana kurdan a rojane û duzimanî de kurdîaxivîna keçan ji ya mêran kêmtir e. Ma gelo hewce ye ku em bibêjin ku meriv di vê pirs û bersivê de ji lêgerîneke niyeteke pederşahî zêdetir, bala xwe bide rehekî kolonyalîst dê çêtir be.

### Tirkiya modern bajarî û kurdiya gundî

Carinan ji gund em diçûn navçeyê bal malbatên pismamên xwe, ku ji zû de li navçeyê (bajar) bi cî bûbûn, em dibûn mêvan. Gava dê û bavê me li raxistina malê, navmalê û paqijîya dîwêr, mehfûrên bajarî dimeyzandin gotîneke qerase li ser niyeta ecibandî, pesindayîne ji devê wan derdiket: “Meriv dibêje qey mala we wekî ya tirkan e.” Carinan ev hevok bi wan re li pîqabên dîzel ên kevin siwar dibû, di rengê salixdayîne de, di tevna pesindariyekê de digihîşt gundiyan û bi vî awayî wan jî para xwe ji vegotina kolonyalîst digirt. Heman tişt derengrabûna ji xewê ya xwediyê malê re, li ser navê tirkîtiyê bi şibandina memûrtiyê der dibû.<sup>5</sup>

Min bi salan li gelek deverên kurdistanê li dibistanên tirkan mamostefî kir. Çi gavê derfet biketa destê min, zimanê min diguherî ser kurdiyê. Lê çî hikmet e, piştî her axaftina min a bi kurdî hinek xwendekaran bi israr ji min dipirsîn: Mamoste tu bi kurdî dizanî?

Tiştêkî din, ku hatiye serê me gelesan; kengê ku kurdek bi tirkîyeke bêşîwe biaxive, ser û cilên wî paqij, rûyê wî ji qemberbûnê şuştî, dest û pê nazik û spî be, an pirça wî zerik be, ji aliyê tirkan ve wek pesindariyekê tê “sûcdarkirin”: “tu qet naşibî kurdan”. Ev gotin çî tesîrê li ser muxatabê xwe dike hewceyê lekolîneke berfireh e. Lê ez di vê baweriyê de me ku gelek kes dilê xwe bi vê gotinê germ, devê xwe jê re beş dikin. Hinek bi dev îtirazê bikin jî dîsa bi dil vê gotinê wek pesnekê û ciyawaziyekê dipejirînin. Lê yên ku him bi dev;

<sup>5</sup> Min pirsî têkiliya malên paqij û tirkîtiyê ji gelek hevalên xwe kir, heya gelesan ji min re got, heman tişt li ba me jî hebû.

him bi dil vê gotinê biqewirînin kêmbi in. Ev jî di nav çerçoveya dîroka me ya talanbûyî de tiştêkî însanî, xwezayî ye; lê heya derekê. Di vir de divê meriv gotina F. Fanon ku bi dilêşî li ser reşikan der kiribû bîne bîra xwe: “Em reşik tev li ser xeyalekê dimeşin, ew jî spîbûna laşê me ye.”

Ez bawer im, wek ku hûn jî ji van minakên watedar gihîştine kula vê pirsê.

### Modernîzma derengmayî û pozîtîvist

A.Valî di hevpeyvîneke xwe de dibêje kurd modernîzmê di kirasêkî pozîtîvist de dixwînin, fam dikin<sup>6</sup>. Bi me tesbîteke di cî de ye û rast e. Meriv pirseke din bi dilê vê pirsê ve bike û bibêje: Gelo kurdên bakur li ser destê kê, bi çî awayî, çawa bi modernîzmê re rû bi rû mane?

Ji ber derfet, niyet û şeweya vê nivîsê em ê nekevin pey dîroka modernîzmê û geşedana wê. Lê bi kurtasî em dikarin bibêjin ku kurdên bakur li ser destê dewleta tirkan, bi riya dibistan û perwerdehiya bi tirkî di şexsê mamoste, karmend û alavên ragihandinê de modernîzm nas kir. Pejirandina wan jî her tim pozîtîvist û şênberî bûye. Lewre modernîzma tirkan jî wek modernîzmeke derengmayî bû. Ji halekî xwezayî bêtir bi darê zorê, bi derbên jakoben, bê malhazirayî û teqlîdî bû. Model, mînak dewletên rojava bûn; heya ku li ser piştî teknolojiyeke xurt, jiyanêke sekuler, di nav serxweşiyeke jixwerazî de modela xwe li bazarên difirotin. Dewletên ku di vê pêşbirkê de li paş mabûn, di dil de êşa derengmayî, di çavan de hêrsa pêşveçûnê, di zik de dexesî û zikreşiyeke tund, bi lingên kulek nav di hewldaneke bêhampa de xwe li pey modela xwe dixişişandin. Ji destpêka komara tirkîyê heya 1960î jî tirk jî di qonaxên zordariyê re, di pêvajoyên xetere re, bi darê zorê dihatin “ajotin” ber bi derê milkê modernîzmê ve. Lê belê wekî her tiştê ne di wextê xwe de, ne li ser xîmê xwe, ev meşa nexweşokî û kêmbi ma, heya niha jî ev pirsgirêk bi awayekî berdewam e.

Belê ew dewletên ku modernîzm ji milkê bavê wan, ji zeviyê wan ê bi adan biter bû, piştî hin dewletên din bi teqlîdî bi saya dezgeh, rewşenbîr û siyasetmedarên xwe dan pey wan heta qadekê jî hatin, ku îro baş xirab tiştêkî danîne ser tiştêkî. De baş e, gelê kurd ê ne ewrûpayî û bi ser de jî bêdewlet çî kir?<sup>7</sup> Wan jî digel van barên giran bi barê bêdewletbûnê jî, dan ser riya çend rewşenbîrên welatperwer, dilsoj wek Celadet û Kamiran Bedirxan, Law Reşîd, Kemal Fewzî, Cegerxwîn, H. Qadirê Koyî, Abdullah Cewdet, Hemzeyê Miksî hwd. ketin nav hewldana rewşeniya gel. Ji ber van kêmasiyên navborî bi ser neketin. Îcar kurdan ji wir heya vir di nav lepên dewleta tirkan de, bi riya tirkî, bi alavên ragihandinê modernîzm nas kir. Pirtûk bi tirkî xwendin, televizyon bi tirkî seyr kirin, bir tirkî lêdan xwarin, heya “alo” ya telefonê digel nav û nîşanên hemû amûran jî bo wan bi tirkî bûn û heya niha jî wisa ye.

<sup>6</sup> Kürtler Modernizmi Pozitivist Algılıyorlar, *Dipnot*, 2012, hj. 2, hevpeyvîn r.25

<sup>7</sup> Ev pirsî heyatî û panoramaya modernîzma derengmayî îlhama xwe ji ders û nivîsên romanûs û rex-negirê hêja Remezan Alan digire.



Vê yekê di nêrîn û derhişiya kurdan de konê xwe yê reş û dagirker vegirtiye, ku heya derekê dîsa tiştêkî xwezayî ye. Îcar ji bilî tiştên ku rasterast bi tirkî ne hin tiştên din jî bi xwe li vê nêrînê zêde bûne. Tirk û tirkî digel neyartî û hovîtiya xwe di hişmendîya hin kurdan de wek modern, dewlemend, şareza û paqij hatiye qodkirin<sup>8</sup>. Zimanê tirkî wek sembol û nîşana van tiştên erênî, delal tê qebûlkirin ku gelek bajariyên kurdan heya demekê ji bo ku pêşveçûn, şaristaniya xwe bide haydarkirin mela xwe her tim didan ser zimanê tirkî.<sup>9</sup>

Ku em vejerin ser destnîşankirina xwendina modernîzma pozîtîvîst meriv dikare bibêje ev yek taybetmendiyê modernîzma derengmayî ye<sup>10</sup>. Lewre ji hizir, raman zêdetir modernîzmê pêşî bi şêwe teqlîd dike. Teqlîda bi vî awayî hem hêsan hem jî eşkere û pratîk e. Guhertina fikir û ramanan jî ya cil û libasan diwartir e. Kes û civak li modela xwe dinêre bi wehekî madî wê dişopîne. Îro çawa li Tirkiyeyê hin dinyanedîtî bi erebîyên xwe yên giranbiha, telefonên modelên dawî, avahiyên dûrî estetîkê û mezin xwe modern dihesibînin<sup>11</sup>. Kurd jî modernîzmê bi heman tiştan fam dikin. Lewre di navbera estetîka gundîti û modernîzma derengmayî de pismamiyê xurt heye. Di herdu têgehên de jî hejmar û mezinayî pîvana estetîkê, merhaleya pêşveçûnê ye<sup>12</sup>. Ji ber vê yekê çiqas xwediyê malê dinyê be, ev tişt çiqas berbiçav bin, xwe ew qas modern û nêzî şaristaniyê dibîne. Modernîzm bi çî nas kiribe dê ji modernîzmê jî heman tiştî fam bike. Ev yek di hiş û helwesta merivan de her tim heye ku rastiyeke sosyolojîk û psîkolojîk e. Î. Beşikçi û

8 Di demeke nêzîk de mebûsekî tirk, Bülent Arınç li ser zimanê kurdî hê bi vî qewlî dipeyivî, zimanê kurdî bi dîrbûna jî şaristaniyê tawanbar dikir.

9 Li hember tirk û tirkî axaftinê gelek helwest, nêrînên cur bi cur hene ku dem deman hatine guhertin. Piştî şerê PKKê dest pê kir ev helwest di serî de nehat guhertin, heya demeke dirêj PKKê her tim perwerdehî û jiyana xwe bi tirkî domand. Di nava kurdan de demek pir dirêj pêkenokên kesên nizanin bi tirkî bi axifin hatine gotin. Piştî salên 2000î ev yek hêdî hêdî hate guherîn. Niha jî henek, pêkenok li ser wan kesên ku bi kurdî nizanin bi axivin tên kirin. Hê gelek mebûsên tevgerên kurd sedem ku bi kurdî naaxivin tên şermezarkirin. Her çiqas şikandina vî mejiyî bi awayekî vekirî ber bi çav be jî. Qirêja van travmayên psîkolojîk û sosyolojîk zû bi zû ji ruh û hiş dernayê mixabin. Gelek caran bi şêweyekî din xwe dide der.

10 Mirov dikare tiştêkî din jî li vê tesbîte zêde bike. Civakên ku dereng derbasî nivîsariyê bûne, her li ser qewlekî şênber difikirin. Yanî hiş û mejî, ji metafor û têgehên razber zêdetir şênber in. Psîkologê Sovyetê Alexander Luria di 1930î de li ser vê mijarê li gundê Ozbekistan û Kirgizistanê gelek lêkolînên balkêş kirine. Dîsa li ser heman mijarê filozofê Fransîz R. Barthes wiha dibêje. "Di şûna zimanê ku li ser tiştan bi axive (Zimanê Sîwan, üst dil-) xwediyê zimanekî ku bi bûyeran tiştê bûyî di axife, wek zimanê alavî-nesne dil- heye. Mînak mirovekî darvan tu carî li ser darê naaxive, lê yekser bi darê re di axive. An li ser baranê naaxive li ser tesîra baranê li ser karê wî di axive, heya ku baran encax wek alavek ji alavên karê hesibandin, ku bi serê xwe tu tişt nîne. Ji ber vê yekê civakên ku hê di asta ramana şênber de mane metafor û têgeh ji wan re luks in û mirov dikare hizra modernîzma pozîtîvîst hinekî li ser vê epîstemolojiyê jî binirxîne. Gurdal Aksoy, "Bir Lider 'Yaratmak' ya da Kürtlerin Düşünsel Süreçlerini Kavramak Üzerine" di nav *Nostradamus'un Kurdistan Kehaneti* de, 2008, Stenbol: Komal. rr.54-152.

11 Li ewropayê yekî tirk bi milyon dolaran erebeyek Ferrari dikire, ji bo zêde mesref nebe tup lê girêdide. Ez bawer im yekî ku modernîzm û dewlemendî li ser xîmê wê naskiribûya tenezulî tiştêkî wiha sosret nedikir.

12 Ev deh sal e R.Tayyip Erdoğan li ser desthilatdariyê îslamî dibe yekem partiya Tirkiyeyê. Geh dibêje ez ji we me, ji nav gel hatime geh pesinê xwe bi mezinahiya bînanan, bi hejmara mizgeft, rê û asfaltê dide ku ev teyamûl jî vê yekê tê.

çend hevalên xwe di salên 1960î de li Ruhayê li hinek gundên kurdan lêkolînekê dikin. Fotoxfafê avahiyeke mezin rêyî zarokên 10-12 salî didin dibêjin 'ev çi ye?', zarok dibêjin "qereqol" piştî fotoxfafê xaniyekî sê qat rayê wan didin dîsa dibêjin ev jî qereqol e, di dawiyê de yê dibistanekê nîşan didin zarok dîsa dibêjin ev jî qereqol e. Piştî Beşikçi van bersivan wiha şîrove dike: Zarokan kîjan bîna ser sackirî bidîta jê re digot qereqol, lewre li gundê wan qereqol hebû, di nava xaniyê gund de ew tenê sackirî bû. Ev tişt hinek jî vê yekê tê, meriv bi çî nas bike, wî wisa di hewîne di mejiyê xwe de.<sup>13</sup>

### Tirkiya bi ceryan, kurdiya bi êzing

Her çiqas me hatin û geşedana modernîzma kurdan wek modelgirtina jî tirkan di pêvajoyê awarte de nîşan da, ya rast divê meriv tiştêkî din teqez bîne bîra xwe. Dewleta tirk digel vê modernîzma xwe ya kulek û kêmbêr bi salan bi zordarî, hovîti bi rêya alavên ragihandinê, pirtûkên perwerdehiyê sînemaya xwe ya Yeşilçamê kurd wekî dij şaristanî û paşverû nîşan da. Bi rêzefilmên erjeng keleş, urf û edetên kurdan jî binyada wê dîr, di kirasê hovîtiyê de li ser navê torevaniyê (torecilik) şîrove kir. Ma derfet hebû kurd xwe jî vê talana mejî bi silameti xilas bikin? Ev mijareke hewceyê lêkolînê ye û derê vê nivîsê ye.<sup>14</sup>

Îcar hemin tirk modern, delal, bajarî û paqij in, tirkî jî heman tişt e û be-rovajî vê yekê hemin kurd kevn, gundî, qirêj û nepaqij in, kurdî jî heman tişt e. Em dikarin vê zincîrê dirêj bikin. Nexwe axaftina bi kurdî jî rêzê, di ser de jî tiştêkî nexweş û belaya serê meriv e. Axaftina bi tirkî derbasbûna merheleyê bilind, terfikirina milkê şaristanî û bajarvaniyê ye. Çiqas tirkî ew qas modernîzm, çiqas tirkî ew qas pêşketin. Ji ber vê yekê kurd ku bi tirkî bi axive, çawa bûye mamoste? Mamoste be, divê tirk be; ne wisa? Memûrtî her tim karê tirkan e, li tirkan tê.

Ez bawer im meriv dikare êdî pirsê jina Emer şîrove bike. Vê pirsê jî îroniyê bêmempa an tinazekê zêdetir li ser van yekan şîrove bike. Di hişê jinê de tirkî tiştêkî modern e<sup>15</sup>, modernîzm jî di qalibê pozîtîvîzmê de tê naskirin. Ceryan jî tiştêkî bajarî û nûjen e; jî xwe yên ku tînan ceryanê çêdikin, seatan kontrol dikin jî tirk in. Makîneyên teknolojiyê tev tirkî ne. Nexwe tîkiliya axaftina bi tirkî bi ceryanê re heye, belkî axaftin bi ceryanê be. Wek -henekî-

13 Gurdal Aksoy, "Bir Lider 'Yaratmak' ya da Kürtlerin Düşünsel Süreçlerini Kavramak Üzerine" di nav *Nostradamus'un Kurdistan Kehaneti* de, 2008, Stenbol: Komal. rr.54-152.

14 Berhemên Müslüm Yücel ên Wek "Türk Sinemasında Kürtler", "Osmanlıdan Günümüze Türk Edebiyatında Kürtler" li ser van mijaranan in. Lê ev meseleyek gelek girîng e ku divê wek xebateke mîna "Madun Çalışmaları" a hîndûyan, an xebateke ku rewşenbîrên reşikan ku li ser spiyan li ser navê "Beyazlık Çalışmaları" kirin, bîn kirin.

15 Tiştêkî balkêş heye ku ez bawer im ew yek, bi awayekî bi vê meselê ve girêdayî ye: Xortên kurd her tim bi destgirtî, an hezkiriyê xwe re bi tirkî di axivin, tirkî dinivîsin. Yanî zimanê flortê di nava piraniya kurdan de tirkî ye. Gelo çima? Flort bi têgeh û repertûwara xwe rewşeke modern û nû ye. Ji ber vê yekê jî kurdî zêdetir li tirkî tê? An performansa kurdiyê tîra dabaşkirin, parvekirina evîna flortê nake(!). Gelo soran an kurmancê kurdistana başûr bi erebî di axivin, li gel hezkirî û hevalên xwe yên qîz? Bersiva vê pirsê çî dibe bila be, yan bi sedem yan jî ber encama xwe bi helwest, bi wê fikra ku modernîzm û tirkî di heman qalibî de tînan qebûlkirin ve girêdayî ye.



axaftina kurdî bi mazotê belkî bi êzingan be, a tirkî bi ceryanê. Televîzyon her tim tirkî diaxive, ku kurdî bi axiviya jinê belkî ev pirs bi vî rengî nepirsiya. Lewra gava ceryan here telewîzyon jî diçe, tirkî jî diçe ew çax axaftina bi tirkî jî divê here.<sup>16</sup>

Her çiqas şert û mercên kurdan û kurdî guherîbe jî meriv nikare îddia bike ku ji qirêjiya pişaftine bi temamî hatiye şuştin. Ev tişt, tişteki hêsan nîne; wek avakirina wê ji xerakirina pişaftin û talanê re jî dem û ferasateke kûr divê. Di nivîsê li ser ziman an li ser rewşa kurdan de meriv para van yekan jî bîr bike meriv ê negihêje mejiyekî zelal, heta wê seqetiyên vê yekê zirareke mezin bide rewşenbîrî û têkoşîna neteweyî. Jixwe ji bo avakirina rewşenbîriya neteweyekî jî ev tişt elzem û şertê herî mezin e.

16 Beriya ku vê nivîsê binivîsim min ev mesele ji nêzî 15 hevalên xwe re rêkir, heman pirs ji wan pirsî. Ji wan bersivan yekî got kurdî tarî ye, tirkî spî ye. Kurdî bela tarîbûnê, tirkî ji rohiya rojê ye. Lê ez dikarim bi naskirina Emer û jina wî vê bersiva balkêş wek şiroveya derhedî bibînim. Dîsa hevaleke bîrkan peyda kiribû, heval hogirê wê tev kurd bûn lê gava ku telefonê lêdida bixwe jî baş tirkî nealavên teknolojîk û tirkîtiya wan di vê meselokê de jî bibîne.

## HESTIYÊ ZIMÊN TUNEYE LÊ DIKARE HESTIYAN BIŞKENÎNE

Amir Hassanpour

Amir Hassanpour bi xwendineke ji nêz ve, ya li ser biwêjên ji temamê dinyê, hêza axaftinê ya di afirandina yekdestiyên (monopoly) zanîn û desthilatdariyê dinirxîne.

Bi pêşketina nivîsê re û taybetî piştî belavbûna matbaayê, her ku çû axaftinê girîngiya xwe wînda kir û bi qewlê teorîsyenê siyaseta aborî û pisporê ragihandinê Harold Innis (1897-1952) ê ji Zanîngeha Torontoyê, girîngî kete ser "ragihandina mekanîze".

Pirsgirêka sereke ya di ragihandina mekanîze an hevbandoriya di ser medyaya girseyî re, meyla wê ya astengkirina diyalog û her wiha, bi gotina Innis, kedîkirina "yekdestiyên zanînê" û navendîkirina desthilatdariyê ye. Wek mînak; îstasyoneke radyoyê ku gelemperî ji aliyê çend kesan ve tê rêvebirin, xitabî girseyeke mezin a guhdaran ku endamên wê nikarin li wan vegehrîn, dikin; telefonên ku ji wan re tên kirin, di rojnamevanîyê de, nameyên ji edîtoran re tên şandin, digel her tiştî, diyalogê pêk nînin, ji ber ku ev tesadufî ne, qismî ne, tên neqandin, tên hîlbijartin û ji bo hewcedariyên mekanî û zemanî yên vê medyayê tên qutkirin. Berovajiyê vê, ragihandina rûbirû ya peyvkî, bi dîtina Innis, înteraktîf e, diyalojîk e û derfeta beşdarbûnê dide, ku ev hemû ji bo fikirîna rexneyî pir girîng in.

Lê kevneşopên devkî çîrokek din vedibêjin. Ger em ji nêz ve tenê li biwêjan binêrin, em ê lê hay bibin ku axaftin qasî ku xuya dike ne romantîk e. Axaftin di eslê xwe de hevbandorker be jî, ji beşdarkerî, wekhevîxwazî, diyalojîkbûn an demokratîkbûnê dûr e.

Zanebûna biwêjkî ya gelên li her çar aliyê dinyê wêneyekî ku di pêwendiyên peyvkî de yên di navbera dê û bav û zarok, xwedî-erd û cotkar, mamoste û xwendekar, mêr û jinan de parvekirina desthilatdariyê ya newekhev dest nîşan dike, diresmîne. Hemû hemfikir in ku axaftin -û bi taybetî jî rast-gotinî- wê teşebuseke xeternak be.

Di biwêjan de hesasbûna axivêr bi awayekî pir eşkere tê teswîrkirin. "Zimanê sor seriyê şîn diruxîne" (farisî). "Pilingê di devê wî de ew wêran kir" (japonî). "Ger dîk beriya wextê xwe bang bide, tê serjêkirin" (ermenî, fa-



risî). "Zimanê dirêj jiyânê kurt dîke" (ermenkî). "Kî rastiye bêje ji neh gundî tê qewirandin" (tirkî). "Şûr yekî, ziman artêşekê dikuje" (ermenkî). "Birîna şûr rihet dibe, lê birîna zimên rihet nabe" (ermenkî, tirkî).

Xetereyên axaftinê, bi qismî, di tebîeta ragihandina devkî ya herikbar an bêtaet de ye. Axivêr li ser gotina xwe ne xwedî kontrol e: "Dema peyv di bêtaet de ye. Axivêr li ser gotina xwe ne xwedî kontrol e: "Dema peyv di devê te de bin, ên te ne, ku ji devê te derketin, êdî ne yên te ne" (ermenkî); "Devê mirovan de derî tune." (japonî); "Dema peyv ji dev derket, nabe bê daqurtandin" (kurdî); "Dema peyv ji dev derdikeve, li nav bajêr digere" (kurdî, japonî).

Hevbandoriya axaftinê îmkanê dide şefafiyê, lê biwêj di navbera peyv û kirinan de, gotin û guhdarkirinê de, şandin û wergirtinê de hevnegiriyandestnîşan dîke: "Zimanê min dibêje lê dilê min nabêje" (ermenkî); "Ma dema tu bêjî 'şekir', xwarina te şêrîn dibe?" (tamilkî); "Dema mirovek derewekê dîke, kesên din wê wek rastî dibêjin" (japonî).

Axivêr di nav hesasiyeta xwe de, ne azad in ku samimî an rastgo bin: "Ê li hundir, ez ji te re dibêjim, ê derve, tu fam bikî" (ermenkî) an varyasyoneke din "Bûkê ji te re dibêjim ku xwesû guhdarî bike" (kurdî); "Di dilê wî de tiştêk e, devê wî tiştêkî din e," an varyasyoneke din, "Li rûyê te tiştêkî dibêje, li paş te tiştêkî din dibêje" (tamilkî).

Dema axaftin xeternak be û axivêr li ser encamên wê ne xwedî kontrol be, alternatîf bisînorkirina wê ye. Xwediyê biwêjan pêşniyaza xwe-girtinê dîke: "Aqil çiqas kamil be, ewqas kêmtir peyv ji dev derdikeve" (erebî); "Yek ji devê yekî din re muameleya cêrê parastî dîke" (japonî); "Her peyvê neke, guhên erdê hene" (tirkî); "Zimanê di devê mirov de mihafizê serî ye" (farisî).

Awayekî hişk ê xwe-sansurkirinê bédengbûn e. "Bédengî zêr e" Li gor biwêjeke ermenkî (û tirkî, wer.), "Axaftin zîv e, bédengî zêr e," biwêjeke japonî jî bi awayekî din dibêje, "Neaxaftin kulîlk e," "Dev ji bo xwarinê ye, ne ji bo axaftinê ye" û "Ên dizanin napeyivin, ên dipeyivin nizanin." Li gor farisan "Heta ji te nehate pirsîn, nepeyive" û tirkî şîret dîkin, "Dema du mirov diaxive, tu nebe yê sêyem."

Herçiqas mirov dikare biwêjên ku derheqê axaftina serbest de kêmtir hişyarker bin jî, peyda bike, kevneşopên devkî yên gelên cur bi cur, axaftinê wek pêvajoyeke ku tê de dabeşa newekhev a desthilatdariyê rê li ber îmkana diyalogê digire, problematîze dîkin.

Dîsa, ne hêsan e ku mirov Innis neheq derxîne.

Axaftin, digel ku ji aliyê pêwendiyên desthilatdariyê tê sînorkirin jî, ji bo diyalogê, ku jê re hevbandoriyeke du-alî lazim e ku ji bo li hevdu vegeftinê û tevkariya encameke ne-tayînkirî bikin, derfet bide herdu aliyan jî, şêwaza herî dînamîk dabîn dîke. Mînak, diyaloga Sokratesî, diçe Yewnanistana antîk, rêbazeke diyalogîk e ku ji bo bigihêje "heqîqet"ê bi riya bi dorê jêpirsîna reqîbekî û jêhatinpirsînê, eşkerekirina nakokiyan e.

Diyalog gelek caran, wek awayekî fikirînê û rêbazeke têgihîştina di-yayê bi diyalogîkê re tê yekkirin. Diyalogîk, ji sabîtbûnê bêtir, wek gewherê

hemû fenomenan (li gor yewnanên serdema antîk, mirov du caran nakeve avekê) şahidê guherînê ye û guhertin di nakokiyên ku jiyana takekesan, civakê û xwezayê dişewîne de xwe bera erdê dide. Ev awayê fikirînê ne girêdayî şêwaza ragihandinê ye: mirov dikare di hevbandoriyên him devkî û him mekanîze de bi awayekî diyalogîk bifikire. Ger ku her du alî jî bikaribin ne-linear<sup>1</sup>, ne-binary<sup>2</sup> bifikirin, diyalogek dikare diyalogîk be.

Diyalog ji hevbandoriyê (înteraktîvîte) cuda ye. Divê neyê jîbîrkirin, bêyî ku têkevin nav diyalogekê jî mirov dikare bi hev re bipeyivin; a rast, medyaya girseyî hewl dide bêtir înteraktîf be, taybetî jî televizyon. Innis nikaribû "televizyona înteraktîf" texeyul bike, herçiqas wê bigota ev jî awayekî din ê "ragihandina mekanîze" ye ji ber ku bîner dikare naverokê biguhere, lê nîkare şandêr (mînak, saziya medyayê) û çarçoweya wê veguherîne.

Ger ku hevbandoriya di nav ragihandina mekanîze de bi awayê ne-diyalogîk û bi pêvajoyeke yek-alî bidome, tam ew xetereya ku ragihandina devkî ya rûbirû (di biwêjan de binê vê hat xêzkirin) ketiye nav, li pêş wê ye jî. Xwendevanê pirtûkekê bêyî ku encamekê bistîne dikare bertek bide: dikare wê bipesinîne an berovajîya vê dikare wê bihetikîne, naletê li weşangerê wê, nivîskarê wê, firoşkerê wê bîne an pirtûkê perçe perçe bike. Bi îhtimaleke mezin Innis wê înternet jî têxista eynî ezmûnê: Ew tevkariya diyalog, fikirîna rexneyî û jiyana demokratîk dîke an jî bo yekdestiyên nû yên zanîn û desthilatdariyê bîn afirandin, amûreke din lê bêtir kompleks e?

**Spasî:** Biwêj ji çavkaniyên cuda hatine wergirtin, wek Rev Herman Jensen, *A Dictionary of Tamil Proverbs* (1988), Dora Sakayan, *Armenian Proverbs* (1994) û Metin Yurtbaşı, *A Dictionary of Turkish Proverbs* (1993). Ji bo bêtir agahî li ser fikrên Innis, bnr. *Empire and Communication* (1950) û *Bias of Communication* (1951).

**ji îngilîzî:** Fexriya Adsay

1 Non-linear: Kesê ku bi awayekî duz nafikire (wer.).

2 Non-binarist: Mirovê bi awayekî tûj û tenê du-alî difikire, wek erê an na, reş an spî (wer.)



## REXNE ÇI YE?

Roland Barthes

Weşandina hin prensîbên mezin ên rexneyê di nav kargîna îdeolojîka bûyerên rojane de her tim mimkun e, bi taybetî li Fransayê ku modelên teoriyê li wir xwedî prestîjeke mezin in, lewre bê guman ew model wê ewlehiyê bide wî sepînerî ku di heman demê de tevî şerekî, dîrokekê û tevahiyeke dibe; bi vî awayî di van panzdeh salên dawî de rexneya frensî bi dewlemendiyên cihê, di nav çar "feylesofên" mezin de pêş ve çûye. Beriya her tiştî têgeha egzîstansiyalîzmê ya pir binîqaş bi gelemperî çawa tê binavkirin, ya ku berhemên rexneyî yên Sartre dane; *Baudelaire*, *Flaubert*, çend gotarên pir kurt ên li ser Proust, Mauriac, Giraudoux û Ponge, û bi taybetî berhema wî ya serasa *Genêt*. Piştî marksîzm: em dizanin (lewre nîqaş a niha kevn bûye) bê ka marksîzma ortodoks di rexneyê de çiqas kember bû, bi pêşniyazkirina ravekirineke sirf mekanîk a berhemên an jî bi awayekî fermî weşandina sloganên bêtir ji nîrxên wan ên pîver; ji ber vê, ku em dikarin bêjin rexneya herî berdar di nav "sînorên" marksîzmê de (lê ne li navenda wê ya aşkere) tê dîtin: Xebata L. Goldmann (li ser Racine, Pascal, li ser romana nû, li ser şanoya avangard, li ser Malraux) bi awayekî aşkere bi yên Lukacs re di nav têkiliyekê de ye; ev di navbera rexneya herî vezgir û a herî dahêner e ku destpêka xwe ji dîroka civakî û siyasî digire. Piştî psîkanalîz; li Fransayê îro nûnerê herî baş ê rexneya Freudiyen Charles Mauron e (li ser Racine û Mallarmé); lê li vir ew psîkanalîza "marjînal" a herî berdar e ku destpêka xwe ji analîzeke saxlem (û ne ya berhemên) girtiye, û di nav helbestvanên bêhejmar de dînamîkên bêteşe yên hêmayan şopandiyê, G. Bachelard dibistaneke rexneyê ya rastîn ava kir, ewqas dewlemend e ku mirov dikare bêje rexneya frensî niha di bin forma xwe ya herî ronak de ye, rexneyeke ku îlhama xwe ji Bachelardiyanî girtiye (G. Poulet, J. Starobinski, J. -P. Richard). Li dawiyê jî binyadgerî (an jî ji bo ku em sade bikin heta mirov dikare bêje lê bêguman bi awayekî xirab: şeweparêzî (formalism): em girîngiya -em dikarin bibêjin şewaz- vê tevgerê ji C. Lévi-Strauss û vir de dizanin ku li Fransayê berê xwe daye metodên zanistên civakî û ramanên filozofîk jî; heta niha hin berhemên rexneyî jê derketine; lê niha li ber amadekirinê ne, û em ê bêguman di nav wan de bi taybetî tesîra modela lînguîstîkê jî bibînin ku ew ji Saussure derketiye û ji hêla R. Jakobson hatiye berfirehkirin (di destpêka kariyera xwe de tevî tevgereke rexneya edebî bûye, dibistana formalîst a rûsî): wisa xuya dike ku ji du kategoriyên

retorîk ên ku ji hêla Jakobson hatiye berfirehkirin, pêşvebirina rexneya edebî mimkun e: metafor û metonîmî (kinaye û nixmane).

Em dibînin ku vê rexneya frensî di heman demê de "netewî" (têkiliya wê bi rexneya anglo-sakson, Spitzer û şopînerên wî, yên Crocean re pir kême heye an jî qet tune) û nûjen e, an jî mirov dikare bibêje "nedilsoz": hemû bala xwe daye îroya îdeolojîk a eyan, ji bo beşdarbûna rexneyeke kevneşopî ya Sainte-Beuve, ya Taine û ya Lanson jî ne jidil e. Vê modela dawî dîsa jî ji rexneya me ya nûjen re pirsgerêkeke taybet derdixe. Berhem, metod û jîrîtiya Lanson, ew bixwe mînakeke sereke ya profesoren frensî ye, ev pêncî sal e, hemû rexneya akademîk ji nav epîgonên<sup>1</sup> bêhejmar venihart. Ji ber ku prensîbên vê rexneyê di çarçoveya avahiya tiştan de misogerî û objektîvîti ne, mirov dikare jê bawer bike ku di navbera Lansonîzm û rexneya îdeolojîk de tu nakokî tune ye, ku hemû jî rexneya şîrovekê ne. Digel vê yekê, tevî ku piraniya rexneya frensî îro (em li vir tenê behsa rexneya binyadê dikin, ne ya rexneya navdar) a profesoran e, di navbera rexneya şîrovekê û rexneya pozîtîvîst (akademîk) de vekêşaneke diyar heye. Ji ber vê ye ku Lansonîzm bixwe îdeolojîyê e; ew daxwaza sepandina qaydeyên objektîv ên hemû lêkolînan zanistî qebûl nake, ew bi nêrînan gelemperî yên li ser mirov, dîrok, edebiyat, ahenga navbera nivîskar û berhemê re têkildar e; mînak, psîkolojiya Lansonîzmê bi temamî kevn bûye, esas ji cureyêke determînîzma analojîk pêk tê ku li gorî wê kitekitên berhemekê divê *bişibin* kitekitên jîyanekê, ruhê karakterekî divê *bişibe* yê nivîskar, hwd., îdeolojîyêke pir taybet, -ji ber ku bi salan e di şopa formulekirina wê de ye- ku psîkanalîz, wekî mînak, têkiliyên hemberî hev ên înkare yên navbera berhem û nivîskarê/a wê fikirî. Esas, bêşik postulatên<sup>2</sup> filozofîk misoger in; Lansonîzm divê ji pêşdarziyên xwe neyê berpirsiyarkirin lê ji bo bûyerên ku wan vedişêre bê berpirsiyarkirin: îdeolojî xefexef ket nav çenteyên zanistê, wekî tişteke qaçax a bazirganiyê.

Ger ev prensîbên îdeolojîk ên cihê *dihemandemêde* mimkun bin (û ji hêla min, bi şewazeke diyar, ez di heman demê de her yekê wan pesend dikim), ji ber vê ye ku bêguman bijareya îdeolojîk Bûyîna rexneyê pêk nayîne û ji ber ku "rastî" ne pesenda xwe ye. Rexne, ji axaftina tenê a li ser navê prensîbên "rastîyan" jî wêdetir e. Berdewam dike ku guneha mezin a nav rexneyê ne îdeolojî ye, lê bêdengî wê vedişêre: ev bêdengiya tawanbar xwedî navekî ye: *baweriya baş*, an jî îmana xirab. Mirov çawa dikare bawer bike ku berhem objeyeke derveyî giyan û dîroka mirov e ku wê dide ber pirsan, objeyeke ku rexne dê li ser wekî cureyêke mafê tiştêkî destnedayî bixebite? Bi kîjan muzeyê ragihandina kûr a ku piraniya rexneyan şert datînin navbera berhem û nivîskarî/ê, dê têkiliya berhemên wan û serdema wan bibiriya? Qanûnên afirandina legal ên ji bo nivîskar hene, lê ji bo rexneyê tune ne? Divê hemû rexne di nav rabêja xwe de (tevî ku ew di şewaza herî neyekser û mutewazî de be jî) ramaneke neyekser li ser xwe bihewîne; her rexne rexneya berhemê û ya xwe ye; ku em lîstika peyvan a Claudel bigrin dest, ew li cîhanê danasî-

<sup>1</sup> Epîgon: Şopîner an jî teqlîtkarê kesekî/ê, dozekê

<sup>2</sup> Ew rastîya ku nikare bê îspatkirin



na a din û ya xwe bixwe ye. Bi awayekî din, rexne tu car ne maseya encaman e an jî ne bedena darazê ye, a rast rexne aktîvîte ye, ango rêzeke çalakiyên entelektuel e ku ji hundir girêdayî heyîna dîrokî û subjektîv (ev heman tişt in) a wî mirovî ye ku wan pêk tîne, ango dide kirin. Aktîvîteyek dikare bibe "rast"? Serê xwe li ber hemû pêwistiyên din xwar dike.

Her romannûs, her helbestvan, her çî qas ji rêya teoriya edebî dikare derkeve jî, tê texmînkirin ku derbarê obje û fenomenan de dipeyivin, tevî ku ji zimên re xeyalî, derveyî û a berê bibe jî: ev ne "dinya" ye, ev rabêj e, rabêja yekî din: rexne rabêja ser rabêjêke din e; ev zimanekî *duyemîn* e, an jî zimanê raser (wekî gotina mantiqnasan) a ku li ser zimanekî yekemîn (an jî *zimanê alavî*) xwe fêr dike. Piştî wisa berdewam dike ku divê aktîvîteya rexneyê bi du cureyên tîkiliyê bê hesibandin: tîkiliya zimanê rexneyê bi zimanê nivîskarê/nivîskêr re ê ku li ser hatiye xebitîn û tîkiliya vî zimanê alavî yê bi cihanê re. Ev "gelemşe" ya van du zimanan e ku rexneyê terîf dike û belkî dirûveke mezin didê bi aktîvîteyêke din a zîhnî û bi mantiq a ku bi temamî li ser cihêbûna zimanê alavî û zimanê raser (meta-language) ava bûye.

Ger ku rexne ji zimanê raser ne tiştêkî din be, ev tê wê wateyê ku peywira wê ne tenê dîtina "rastiyên" e, di heman demê de "mûteberî" ye jî. Di nav xwe de zimanekî ne rast an jî xelet e, mûteber e an na: mûteber, ango pêkanîna sistemeke hevgerî ya nîşaneyan. Qaîdeyên ku serê xwe li ber zimanê edebî xwar dikin bi guncanîya vî zimanî ya di rastiyê de eleqeder nabe (her çî daxwazên dibistanên rastîhez), lê tenê girêdana wê ya sistema nîşaneyan a bi destê nivîskar hatin damezirandin (û divê, helbet em li vir wateyêke xurt a peyva *sîstemê* bidin). Rexne ne xwediyê wê tiştê ye ku bêje ger Proust got "rast", ger Baron de Charlus esas Count de Montesquiou bû, ger Françoise Céleste bû, û bi gelemperî ger civak a ku Proust pênase kiriye rasterast şertên dîrokî yên bêjandin ên kesên esîl ên dawîya sed sala nozdemîn vehildiberînin an na; rola wî tenê amadekirina zimanekî ye ku aheng, mantiq, û wekî kurtasî sistematîk a wî zimanî dikare (wateya matematîkî ya peyvê) mêjera herî mezin a mimkun a zimanê Proustiyên berhev bike an jî "entegre" bike, bi temamî wekî tekstên hevkeşe yên mantiqî ya sedeman ku bêteref wekî "rastî" ya nûqaşan mobilîze dike. Mirov dikare bêje ku peywira rexneyê (ev ewlehiya wê ya tenê ye di gerdûnîtiya wê de) tenê teşeyî ye: ev ne "keşfîkirin" a nav berhemê an nivîskara/ê wê ye ku tiştên "veşartî", "kûr", "nepên" ên heya îro bêyî lê werqilîn derbas bûne (bi kîjan mucîzeyê? Em ji kalikên xwe jîrtir in?) lê tenê lihevkerin, wekî necarekî baş e ku bi destên xwe "bi jîrane" du perçeyên mobîlyayê yên tevlihev digihîjin hev, zimanê ku serdema xwe (egzîstansiyalizm, marksîzm, psîkanalîz) bi zimên re li hev tîne, ango bi sistema fermî ya zehmetiyên mantiqî ya ku ji hêla nivîskar li gorî serdema wî ya bixwe tê amadekirin. "Delîl" a rexneyekê ne ya pergaleke "aletîk" e (ji rastiyê dernakeve), ji bo rabêja rexneyê -herwiha, wekî rabêjên mantiqî- tu car ne totolojîk e: di dawiyê de bi gotina derengmayî pêk tê, lê bicihkirina vê tevahiyê nav derengmayîne ji ber vê ye ku ne bêwate ye: Racine Racin e, Proust jî Proust e; "delîl" a rexneyê, ku hebe, girêdayî qebîliyetekê ye, ne girê-

dayî *keşfîkirina* berhemê ye a ku qala wê tê kirin, lê dijî vê girêdayî bi temamî *pêçandina* wê ya bi zimanê wê bixwe ye.

Bi vî awayî, em careke din bi aktîvîteyêke ku wekî esas fermî ye eleqedar in, ne di estetîkê de lê belê di wateya têgehê ya mantiqî de. Em dikarin bibêjin ku ji bo rexneyê, rêya tekane ya ji bo revîna ji "baweriya baş" an jî "îmanê xirab" ê ku me di serî de behs kir ew e ku girtina armanceke exlaqî ye, ne deşîfrekirina wateya berhemê ye ya ku li ser hatiye xebitîn, lê ji nû ve avakirina distûr û zehmetiyên amadekirina vê wateyê ye; bi şertê ku mirov di cî de qebûl bike ku berhema edebî sistemeke semantîk a pir taybet e ku armanca wê xistina "wateyê" nav cihanê ye, lê ne "wateyekê"; berhem a ku qet nebe bi gelemperî dikeve nêrîna rexneyê -û belkî ev terîfîkirina edebiyata "baş" e-berhem tu car bi temamî ne bêwate ye (nepênî an jî "sirûştî") ne jî bi temamî eşkere ye; ew, yek dikare bibêje ku di wateya *daleqandî* de ye: esas xwe ji xwendevên re wekî sistemeke diyar a eşkere pêşkêş dike lê xwe wekî objeyêke diyarkirî jê vedîşere. Ev cureya hêvîsikestinê ya wateyê ji aliyekî ve eşkere dike ku berhema edebî xwedî hêzeke pir xurt e ku ji dinyayê pirsan bipirse (hejandina wateyên jixwebawer ên ku îdeolojî, bawerî û wateyên gelemper xuya dike ku xwediyê wan e), bêyî bersivdana wan (berhemeke mezin a ku "dogmatîk" e tune), û ji aliyê din berhem xwe pêşkêşî deşîfrekirineke bêdawî dike, lewre tu sedem tune ye ku em rojekê dev ji axaftina ji Racine û Shakespeare berdî (hekena bi cirnexweşî ew ê bixwe bibe zimanekî): di heman demê de pêşniyaza biisrar a wateyê û wateyêke serhişk a qaçax, edebiyat bi rastî *zimanek* e, ango sistemeke nîşanokan: hebûna wê ne di peyama wê de ye, lê di vê "sîstem"ê de ye. Û ji ber vê rexne peyama berhemê ji nû ve ava nake, lê tenê sistema wê ava dike, çawa ku zimannas wateya hevokekê deşîfre nake, lê binyada teşeyî ya ku dihêle ev wate belav bibe, ava dike.

Ew bi nasîna xwe bixwe ne ji zimanekî wêdetir e (an jî bêtir zimanê raser) ku rexne bikaribe -bi paradoksî lê bi rastî- di heman demê de bibe objektîf û subjektîf, dîrokî û bûnwerî, totalîter û lîberal. Lewre ji aliyekî ve zimanê ku rexneyê ji bokuli ser bipeyive hîlbijartiyê, ji esmên danakeve, ew yek ji zimanên curbecur e ku serdema wî pêşkêş dike, ew wekî objektîf têgeha gîhaştineke dîrokî ya zanîne, fikran, azweriyên rewşenbîrî ye, ew *pêwistiyek* e; û ji aliyê din, ev zimanê pêwîst ji her rexneyekê ku di tevgereke egzîstansiyel de kar dike hatiye hîlbijartin, wekî *hîndariya* erkeke rewşenbîrî ku wekî malê xwe lê xwedî derdikeve, hîndariyêke ku hemû "kûrahiya" xwe didê, ango hîlbijartin, daxwaz, berxwedan, azwerî. Bi vî awayî diyaloga du dîrok û du subjektîfîyên nivîskar û yên rexneyê, di dilê berhema rexneyê de dest pê dike. Lê ev diyalog bi awayekî egoîstî bi temamî ber bi îro ve hat hilgirtin: rexne di rastiya berê de, an jî di rastiya "a din" de ne "rêz"ek e, ew avahiya watebar a serdema me ye.

\*mafê telîfa vê nivîsê ji weşanxaneya Seuilê hatiye stendin, © Editions du Seuil, 1964.

ji frensî: Sevdâ Orak Reşitoğlu



## FETISÎNA DI NAV PIRTÛKAN DE

Fexriya Adsay

Nivîskarek dema hê nivîsa xwe di serê xwe de disêwirîne, di serê wê/wî de pirsên çî, çawa, çima û ji bo kê dinivîsîne diçin û tîn. Bersiva van pirsan li gorî dem, civak an kesan her daîm di nav veguherînekê de ye ku ewqas awayên vegotinê û cureyên nivîsê hene û wê hebin. Bersiv gelek caran bi giştî bi epîstemolojî û paradîgmaya serdema nivîskar re girêdayî ne. Piştî van diyarkerên bingehîn peywenda siyasî, aborî, çînî, civakî û çandî ya nivîskar di şêwe û naveroka nivîsê de xwedî bandor in. Lewma asayî ye ku peywendiyek di navbera berhemên wêjeyî, siyaset û civakê de hebe an em gelek caran wan wek rengvedanek civakî bibînin. Lê ev rengvedana civakî ya di wêjeyê de ne hêmanek neguher e û li gor serdeman an civakan qels an xurt dibe.

Ger em ji bo wêjeya kurdî bipeyivin, di wêjeya kurdî de dengê xurt ê civakî heye. Wêje bi dengê civakî, wek yek ji awayên îfadekirin û hilberandina rabêjekê, ji bo îddiyên siyasî an civakî dibe amrazek. Gelek caran, her çiqas berovajîya wê jî rast be, "piştgirîya lêpîrsîna desthilatdariyê û pergala civakî" dike û dibe amraza "xwestina tiştên nû"<sup>1</sup>. Fredric Jameson<sup>2</sup> ev rewş wek alegoriya netewî bi nav kiribû. Heta vir tu pîrsgirêk nîne, belê ji ber peywenda taybet a ku kurd tê de ne wêjeya kurdî jî taybetiyek wê ya bi vî rengî heye. Ku wêje yek ji awayên rengvedana civakî be, ev ne kêmasiyek e, encax dikare wek tespîtekê bê qebûlîkirin. Dibe ku ev ji bo nivîskarên kurd avantajek be jî. Wêjeya kurdî bi taybetî jî roman û çîrok ku li gor roman û çîroka cihanê û li gor ên cîranê xwe jî nû ye, lê hemû mîrata cihanê li ber e û dikare ji ezmûnên curbicir îstifade bike û derengmayîna xwe bi awayekî telafî jî bike, ta' mên nû yên wêjeyî biafirîne. A din, ev ji bo nivîskarên kurd tê wateya bakîrbûna qada wêjeyê û derfeta çeşitdariya naverokê jî. Lê mesele çî ye? Mesele ew e ku nivîskar di berhemên xwe de dema hewl didin ku bibin dengê civakê li gor huner û estetîka wêjeyî çiqas serkeftî ne. Dikarin çiqasî di çarçoveya qaideyên wêjeyî de bimînin û bi awayekî didaktîk tevnegerin?

<sup>1</sup> Jonathan Culler, *Yazın Kuramı*, wer. Hakan Gür, 2007, Enqere:Dost

<sup>2</sup> Fredric Jameson, *Modernizmin İdeolojisi*, wer. Kemal Atakay, Tuncay Birkan, 2008, Stenbol:Metis, r.365-396

Ev pîrsek her daîm aktuel e. Pîrsek din jî heye ku dema nivîskar bi îddiya ku bibe dengê civakê tevdi gere, gelo civakê çiqas nas dike? Gelo hêza xwe çiqas ji civakê digre an wê ji xwe re dike paşxane? Di civakê mêtîngeh de nivîskar jî wek pîraniya civaka xwe di bin bandora hişmendîya mêtinkariyê de dimînin. Gelek caran bi çavên mêtinkaran li xwe jî û li dora xwe jî dinêrin an nikarin xwe ji qirêjîya mêtinkariyê rizgar bikin, ku bi salan li ser hişmendîya wan kom bûye. Ji bo vê, haydarbûn û hewlek taybet lazim e. Lewma zanebûna nivîskar a li ser sosyolojiya civakê, xwe-naskirina wê/wî bi qasî aliyên hunerî û estetîkî dikare çawaniya berhemê tayin bikin.

Ez ê di vê gotarê de li çîrôka Mehmet Şarman a bi navê "Çiçino"<sup>3</sup> ku li ser pêwendîya civak û wêjeyê mînakek serkeftî ye, ji nêz ve binêrim û analîzeke naverokî bikim. Di vê çîroka alegorîk de nivîskar çî, çawa nivîsiye û di nav çarçoveya çîrokeke alegorîk de awayê fikirîna şênber û eklektîk a di nav civakê kurdan de û rûdana wê ya li ser siyasetê çawa vegotiye, rê li ber çî nîqaşan vekirîye, li ser van bisekinim.

Serlehengê çîrokê Çiçino serokê êla mişkan e ku debara xwe bi dizîya malan dîkin. Rojekê ji rojan Çiçino dikeve hundirê malek mezin û dike nake nikare tiştêkî xwarinê peyda bike. Ji neçarî xwe diavêje pişt pirtûkxaneyê malê. Dest pê dike pirtûkek bergreş û stûr dikeritîne, zikê xwe têr dike. Bi vê xwarinê re tenê zikê wî têr nabe lê di mejîyê wî de veguherîneke ecêb pêk tê. Ji pirtûkê têgehên helal û heram fêr bûye, ferman dide êla xwe ku dîsa dizîya malan nekin. Bi xwarinên helal zikê xwe têr bikin ya na du piyên pêşî wê bîn jêkirin. Tenê vebêjer û çend kesên din jî li gotina Çiçino guhdarî nakin û dizîya xwe didomînin. Gelek ji wan ên li wî guhdarî dîkin ji birçîna hişk dibin. Çendîn roj derbas dibin Çiçino vê carê tê ji wan re qala biratiya mişk û pisikan dike; wek neyar jî mirovên serdest hedef nîşan dide. Behsa navên wek Marx, Engels, serdest, bindest û biratiya gelan dike. Her çawa be civata Çiçino her ku diçe mezintir dibe, Tiralê mixalîf bi tenê dimîne û rastî êrişan tê. Di vê navê de di pirtûkxaneyê malê de jî guhertinên mezin çêdibin. Piştî demeke dirêj Çiçino careke din diçe pirtûkxaneyê, lê pirtûka ku her tim dixwar xuya nedikir. Hemû pirtûkxane tenê bi pirtûkeke du-cild û naylonkirî hatiye tijîkirin. Pirtûkekê tenê dewsa hemû pirtûkên din dagirtiye. Ji neçarî hewl dide wê bixwe, lê pirtûk bi ser de diqelibe û bêhn lê diçike. (r.37-44)

Mebesta Şarman a bi vê çîrokê eşkere ye. Di ser êla mişkan re sosyolojiya siyaseta kurdan dibe mewzûbahîs. Di analîza naverokî ya vê çîrokê de wek çarçoveya teorîk ez ê ji nivîsa Gürdal Aksoy a bi navê "Bir Lider 'Yaratmak' ya da Kürtlerin Düşünsel Süreçlerini Kavramak Üzerine"<sup>4</sup> ('Afirandina' Serokekê an Li ser Têgihîştina Pêvajoyên Fikrî yên Kurdan) îstifade bikim. Ev nivîsa Aksoy di sala 2004an de wek gotareke nêzî 20 rûpelî di malpera rizga-

<sup>3</sup> Mehmet Şarman, *Pirça Winda*, 2010, Stenbol:Avesta. r.37-44

<sup>4</sup> Gürdal Aksoy, "Bir Lider 'Yaratmak' ya da Kürtlerin Düşünsel Süreçlerini Kavramak Üzerine" di nav *Nostradamus'un Kürdistan Kehaneti* de, 2008, Stenbol:Komal.



ri.comê de hatiye weşandin. Di sala 2008an de halê wê yê lêzêdekirî jî di nav pirtûka *Nostradamus'un Kehanetleride* (Kehanetên Nostradamus) hatiye weşandin. Gotara nivîsa Aksoy bi tespît û analîzên xwe yên antropolojîk, siyasî, sosyolojîk, psîkolojîk û zayendî yên li ser zihna civaka kurdan û çîroka Şarman heman mesele, bi şêwazên cuda ji xwe re kirine mijar. Analîza wî ya li ser rola çanda devkî û awayê fikirîna şênber di çêbûna zihna kurdan de û bandora wê ya li ser siyaset û rêveberiya civakî de dibe bersiva gelek pirsan.

Di analîza "Çiçino" an famkirina sedema gengeşiya siyaseta "mişkan" de nivîsa Aksoy bi ravekirina xwe ya li ser çanda devkî û awayê şênber ê fikirîne dibe mifteya vê analîzê. Aksoy bi tespîteke gelemperî dest pê dike ku kurdan ji ber ku demeke dirêj bi zimanê xwe (zimanê din jî) kêr nivîsîne û xwendine xwedî çandek devkî ya dewlemend bûne. Em sedemên vê yê di serdema pre-modern de dînin aliyekî, di serdema modern de jî dewletên dagirker rê li ber nivîsandin û xwendina bi kurdî girtine û tenê hiştine ku wek zimanekî rojane li ser piyan bimîne. Ji bo bêqîmetkirina zimanê kurdî hemû alavên dewletbûnê bi kar anîne. Civakên xwedî çandek devkî her çiqas jî têgehên razber ne bêpar bin jî, bi giştî meyla wan li ser awayê fikirîneke şênber e. Heman meyl di nav kurdan de jî tê dîtin, ku hê di bin bandora vê çandê de ne. Li gor lêkolînên zanistî jî kesên xwende li gor ên nexwende meyla wan bêtir li ser têgehên razber in. Psîkologê rûs Alexander Luria di salên 1930î de li hin gundên Ozbekîstan û Kirgîzîstanê di nav nexwendeyan de li ser taybetiyên wan ên hişbînî (cognitive, bilişsel) lêkolînekê pêk tîne. Luria digihêje wê encamê ku alema wan a fikrî ji aliyê têgehên razber feqîr e, ji ber meyla wan a li ser fikirîna şênber di navlêkirina şênber de çeşitdariyek mezin heye. Ew li gor rewşê yanê bi awayekî erkî difikirin, razberkirin, liserfikirîna li derveyê rewşa heyî, terîfikirin û senifandina kategorîk a li gor fikirîna razber tune. Wek ku Roland Barthes dibêje ji dêvla "zimanekî raser yanê zimanê *li ser qewimandinan dipeyive*" xwedî 'zimanekî *alavî* ne ku encax qewimandinan vedibêje". Mînak, dema êzingvanek darekê jê bike û bixwaze wê tarîf bike wê qala darê bike lê *li ser* darê napeyive. Zimanê wî bi awayekî gerguhêz girêdayî darê ye, di navbera darê û wî de tenê keda wî an kiryara wî heye. Lê mirovekî ne êzingvan be qala darê nake, wê *li ser* darê dipeyive. Barthes vê jî dibêje, wek êzingvan, ên bindest jî tenê zimanekî wan heye, zimanê kiryanan e ew; zimanê raser jî bo wan luks e. Zimanê wan bêtir bi jiyana rojane re elaqedar e. Civakên ji aliyê razberkirinê ve feqîr bin, ji aliyê navlêkirina şênber ve jî dewlemend in. Pîleya vê dewlemendiyê bi şertên erdnigarî û avûhewayaya derdorê ve girêdayî ye. Her tişt bi hûrgilî tê daqurtîne, biafirîne.<sup>5</sup>

Fikirîna teqlîdî ku taybetmendiyek din a fikirîna şênber e, tenê hin qalibên tevgerên ku wê bîn dubarekirin, hin gotin û fikrên qalib jî diafirîne.

<sup>5</sup> Aksoy, b.n.b. r.57-59.

Kurd tevî ku xwedî çandek devkî ne, wek gelekî bindest jî meyla wan bêtir li ser dirûşm an gotinên qlîşe yên bibandor in. Dirûşm û gotinên qlîşe yên bibandor him azadiya fikrî dikuje him xwebûna kolektîf parçe dike, ji aliyekî ve jî qarîzmaya xwediyê wan diperçînin. Lewma mekanîzmaya rexnegirtinê pêş nakeve û tehemula fikrên cuda namîne. Kesên civakeke bi vî rengî nabînin beşdarên rêvebirina civata xwe, encax bibin parçeyek ji xeleta bicihanîna fermanan.<sup>6</sup>

Nivîsek din ku paralelî vê nivîsa Aksoy dikare bê xwendin û di analîza "Çiçino" de rê li ber me veke nivîsek Şarman bi xwe ya bi navê "Mitoromantik Söylem ve Kürt Siyaseti"<sup>7</sup> (Rabêja Mitoromantik û Siyaseta Kurdan) ye. Şarman di vê nivîsa xwe de ku çarçoveya nêrîna mirov firehtir dike, li bersiva van pirsan digere: Referansên rabêja siyasî ya kurdan çi ne? Rabêja polîtîk a kurdên bakur li ser kîjan paradîgmayan ava bûye? Aktorên siyasî yên kurd têkoşîn û siyaseta xwe bi çi awayî îfade dikin? Di navbera rabêja polîtîk a kurdan û zimanê "yên din"ên wan de çi manendî hene? Gelo kurd dikarin bi vê rabêjê têkoşîneke neteweyî û demokratîk bimeşînin? Aliyekî vê nivîsê ku dikeve çarçoveya vê gotarê ev e ku xwendinên di nav kelecaneke de, bê rêbaz, bi awayekî eklektîk, di ser re tînin kirin, xwendevanê xwe her dem wek zarok dihêle, nakemilîne. Gelek caran ji nav şertên taybet û pirsgerêka şênber derdixîne û di nav sembol, metafor û alegoriyên erzan de dihêlin an jî hedefê dîr dixînin. Meseleyan dadixîne asteke pir nizm û xwedî rabêjeke ku ji têgehên sosyolojîk, psîkolojîk û dîrokî ku bikare meseleyê analîz bike, bêpar e. Ji ber ku ew bi xwe ne xwedî rabêjeke xweser e, serî li tarîf an têgehên yên din dide.

Di gengeşiya di nav êlamişkan de şopên awayê fikirîna şênber herî zêde xwe di xwendina Çiçino de nîşan dide. Çiçino li nav pirtûkxaneyê xwe li pirtûka qalind radikşîne û wê dixwe. Di civakên ku di wan de şênberkirin serdest be, pêwendiyek xurt di navbera qîmet an nirx û mezinbûnê de heye. Civakên bi vî rengî bêtir bi xwezayê ve girêdayî ne; ji afirîneriya civakên modern û awayên hilberandinê jî dîr in. Lewma erd, keriyên pez, xanî an axur hwd. çiqas mezin bin, ewqas hêja ne û bikêr in. Di çîroka me de jî pirtûka Çiçino bi mezinbûn û stûrbûna xwe balê dikişîne. Pirtûkê giştî dixwe, "naxwîne". Mirovên bi awayekî şênber difikirin jî pirtûkan dixwin; wan naxwînin, *li ser* wan nafikirin, tehlîl nakin, şîrove nakin an adaptayî xwe an civaka xwe nakin, peywenda nivîsandina pirtûkan û peywenda xwendina xwe nadin ber hevdu. Pirtûkên ku xwendine di nav çî şert û mercan de hatine nivîsîn an ew fikrên nû ji ber kîjan hewcedariyan derketine, di nav çî peywendê de hatine hilberandin an dikare bîn pratîzekirin, di serê wan de nabe pirsgerêk. Ji ber meyla wan a xurt a teqlîdkirinê çî bixwînin bêyî ku wan bihundirînin an jî bêjîngêkê derbas bikin hewl didin wan derbasî pratîkê bikin. Çiçino jî

<sup>6</sup> B.n.b. r.103-104.

<sup>7</sup> Mehmet Şarman, "Mitoromantik Söylem ve Kürt Siyaseti". *Birikim*, hej. 264-265, sal. 2011. r.97-109.



pirtûka yekem a bergreş û stûr ku li gor naveroka wê tê famkirin ku Quran e ("helal û heramî" (r.39), "nivîsên ecêb weke zirzûleke maran lihevketî bû" (r.40) û ji bo mirovan hatiye nivîsîn û encax mirov dikare wê pratîze bike, ji mişkan re dike rêber. Divê dizîya malan nekin. Ger mişkek nekeve malan, wê çawa zîkê xwe têr bike? Ev ne diyar e. A girîng, heye tune pratîzekirina pirtûkê ye! Tenê mişkekî tiral heye ku bi eşkereyî li dij Çiçino radibe. Divê ew tiştê bike ku hevalên xwe ji birçîbûnê xilas bike lê ji ber tiraliya wî zanebûna wî bêkêr dimîne. Dizane li ser rewşê bi awayekî razber bifikire, şîrove bike û tehlîlan bike lê derbasî asta kiryareke şênber nabe. Lê em heqê wî nexwin, mişkê tiral ji bo îqnakirina hevalên xwe yên bi gotina Çiçino bawer kiribûn û ji birçîna li ber mirinê bûn, hewl dide; bê encam dimîne.

Piştî demekê Çiçino dest bi xwarina pirtûkên Marx û Engels dike. Îcar veguherandineke din di Çiçinode peyda dibe. Vê carê hedef û armanca êla mişkan ji binî de diguhere, dijminên xwe ji nû de tarîf dikin. Li gor zanebûnên wî yên nû êdî dijmin an serdestê mişkan ne pisîk, neyarê pisîkan jî ne kuçîk in; lê mirov dijminê wan ên hevpar in. Bêyî ku haya pisîkan jê hebe an digel ku pisîk wan li ku derê bibînin wan dikujin jî, li gor zanebûna Çiçino an li gor pirtûka ku wî "xwariye" ew birayên wan tîlankirin. Li hemberî mirovên serdest divê hemû heywan bibin yek, têkoşînê bidin. Pir kêma kes dipirse ka çima, çawa em û pisîk, pisîk û kûçîk dibin birayên hevdu an bi vî awayî wê bikarin ji êrişên wan xelas bibin an na. Gotinên Çiçino bê lêpîrsîn derbasî pratîkê dibin. Li gor wan her tişt hevpar e û heqê wan di her tiştî de heye. Kevneşop û qaîdeyan bi tiştê nahesibînin û qîmeta hurmet û hevaltiyê namîne. Çi derkeve pêşîya wan dixwin an talan dikin. Kevneşop û qaîdeyên civakê ji holê rabûye û rewşek kaotîk, bêbingeh serdest e.

Dîsa li gor Aksoy, bi ser de civakên bindest li gor civakên din ji aliyê hestiyariyê ve tengjî ne, li nav wan qehremantî wek diyariyek ilahî ye. Li nav civakên ku têkoşîna azadiyê didin hemû şertên afirandina qehremanan heye, lê di heman demê de şertên afirandina xayinan jî heye. Di paşxaneyê wan de, ger eşkereyî be ger binhişî be her tim li bendî "xelasker" êkî bûne û pêwistiya acîl a bo qehremanekî,<sup>8</sup> dike ku serok ji rexneyan azade bin û bi hin taybetiyên sersiruştî bîlê xemilandin. Muqabilî vî rewşê, kesên muxalîf an xwedî fikrên cuda pir zû tîlankirin an wek xayin tîlankirin. Ev rewşa Çiçino ya hegemonîk ku bi serê xwe şîkil dide êla xwe, bêyî ku bi kesî re têkeve diyalogê an fikrên kesekî guhdarî bike, rê li ber diyalogê an hevbandoriyê digre. Tiralê êla mişkan jî di nav rewşeke wisa de, ew tenê diwêre an dikare bifikire ku li hember Çiçino rabe û rexneyan li vî rewşa karesat û Çiçino bigre. Ewî jî aliyê guhdarên Çiçino ve tê vederkirin. Çiçino berteka yekem dema Tiral navê nivîskarê pirtûka ku wî xwendiyê dipirse û nav nayê bîra wî, nîşan dide. Hêrsa nezaniya xwe û hêrsa li hemberî dijderketina Tiral, dibe sedema xayinkirina Tiral. Paşre navê wî wek burjûwayê biçûk tê gu-

<sup>8</sup> B.n.b., r.84-85.

hertin; têr lêdanê dixwe; tê tawanbarkirin ku razên wan gihandiyê dijminên wan.

Veguherîneke ku Çiçino bi xwe re anibû, guherandina armancê bû. Hedefê dî ne ew pisîkên ku her roj dide ser piştê wan, lê mirov wek dijmin tîlankirin. Bi vî awayî bertekên mişkan ên li hemberî pisîkan tîlankirin. Bîndestî jî nav peywenda xwe tê derxistin û di nav peywendek din de tê tarîfkirin an wek ku Şarman di nivîsa xwe de gotibû bê sewiye dibe, ji analîzên ciddî bêpar dimîne. Pîrsgirêkên wan ên esasî bi pisîkan re tîlankirin an piştguhkirin. Ev jî aliyê Çiçino ve wisa tê ravekirin: "Em hemû ajal bindest in, ne pisîk neyarê me ne, ne jî kûçîk neyarê wan e. Esil neyarê me mirovên serdest in. Divê em bibin yek..." Wek ku ji kurdan re jî tê gotin ku neyarên me yên esasî ne dewletên li ser me serdest in, lê neyarê me yê esasî û kaniya hemû pîrsgirêkên mirovatiyê emperyalîzm û kapîtalîzm bi xwe ye. Sedema pîrsgirêkên tu gelî jî yê din ne cudatir in. Di vî rabêja ku bi têgehên gerdûnî an dinyayîbûnê jî tê xemilandin, armanc ew e ku pîrsgirêka neteweyî bê veşartin; ku barê wê giran e, pratîka wê zehmettir e, jê re xwebaweriyek, xwezanebûnek xurt, xebatek bîngêhî pêwîst e.

Bi nêrînek antropolojîk û sosyolojîk em li meseleyê binêrin, ji bo ku gelek neteweyîbûnê li pey xwe bihêle, lazim e di nav de bijî û di nav wê de biryara lipeyxwehiştinê bide. Terry Eagleton di pirtûka *Milliyetçilik, Sömürgecilik, Yazın* (Netewperwerî, Mêtinkarî, Wêje) de li ser vî mijarê jî romanek Raymond Williams jêgirtinekê dike. Karakterekî efrîkî yê romanê wiha dibêje: "Netewperwerî dişibe çînê. Riya dawîlêhatina wê tenê xwedîlêderketina wê û hîskirina wê ye. Ger hûn nikaribin îddia bikin an hûn zû dev jê berdin, ew encax tê wê wateyê ku hûn ji aliyê çîn an netewên din ve hatine xapandin."<sup>9</sup> Eagleton bi xwe jî di heman rûpelî de destnîşan dike ku "Bi daxwaza jîholêrabûna çîn an neteweyan, ew çîn an netewe dikeve nav lepên serdestê xwe." "Wek mêtinkariyê, çîna civakî jî awayekî pêwendiyê ye û dema ev pêwendiyên siyasî ji hev belav bibin, êdî nikarin bi heman nasnameyê bijîn. Têgeha 'Çanda Neteweyî' jî divê marûzî eyn daraza siyasî bibe."<sup>10</sup> Tarîfa Eagleton a netewperweriyê wisa ye, "Netewperwerî tam jî xwe-pêkanîna kirdeyekê yekbûyî ye ku wek gelekî tê naskirin."<sup>11</sup> Ji ber xwe-pêkanîna hêza gelekî yekbûyî ye ku dikare di nexşeya herêma xwe, hevsengiya hêza navneteweyî de guherandinên mezin bi xwe re bîne, ev jî manîpûlasyon an şîroveyên cûrbicûr ên dewletên mêtinkar an dewletên di nav sîstema heyî de cihê xwe girtine, vekiriyê.

Psîkiyatristê bi navûdeng Carl Gustav Jung jî di sala 1934an de di nameyê ke xwe ya ji James Kirsch re tespîteke manend ji bo cihûyan dike. Ji nameyê tê famkirin ku ji aliyê hin kesan ve wek dijminê cihûyan hatiye tawanbarkir-

<sup>9</sup> Eagleton, Terry, E. Said, F. Jameson, *Milliyetçilik, Sömürgecilik, Yazın*, wer. Ş. Kaya, weş. Kabalçı: Stenbol, 1996. r.25.

<sup>10</sup> B.n.b., r.29.

<sup>11</sup> B.n.b., r.30.



rin. Elbet bi tundî li dij vê tawanbarkirinê derdikeve lê xwe-parastina wî an ravekirina sedema ku ew çima nikare bibe dijminê cihûyan ji bo nîqaşên roja me jî bersivek pir zelal e:

Tu dizanî ez wek kesayetê li ser hebûna mirovan disekinim û ji bo ku ez wî/wê ji nav rewşa wî/wê ya kolektîf derxînim û bînim asta takekesiyê çî ji destê min tê dikim. Wek ku tu jî dizanî, encax ew şexs bikare taybetiya xwe ku qedera wî li ser wî ferz kiriye bipejirîne, pêk bîne. Mirovekî cihû, *bêyî ku bizane* ew cihû ye, ew nikare bibe insan. Divê beriya her tiştî ji vê bingehê derkeve ser rê da ku bikare ber bi têgehek berfirehtir a mirovatîyê ve bimeşe. Ev ji bo hemû netewe û nijadan wisa ye. Netewperwerî –her çiqas nexweş be jî- tiştêkî çarenîn e; divê tak di nav netewperweriya xwe de nefetise.<sup>12</sup>

Dema em bi vî awayî li netewperweriyê binerin sedema notralîzekirin, pasîfîzekirin an hedefguhertina bertekên li hemberî desthilatdariya mêtinkar nayê famkirin an ne tatmînkariyê in. Aksoy<sup>13</sup>, Frantz Fanon wek referans nîşan dide û destnîşan dide ku di têkoşîna hember mêtinkariyê de divê hêrs û bertekên gel têkevin nav çarçoveya bernameyekê da ku bîreweriya wî gelî ji têkoşînê dûr nekeve. Bi awayekî psîkolojîk ji bo bêbandorkirina bertekan wê her tim bernameyek mêtinkaran jî hebe da ku bîreweriya siyasî ya gel ber bi aliyê xwe ve bikşînin.

Ji aliyê şiklgiirtina fikr û ramanan de di xwendinên (xwarinên) Çiçino bi xwe de pirsgirêkên pir ciddî hene. Li jor di nav peywenda fikirîna şênber de ev jî aliyekî ve hatibû şîrovekirin. Lê ev jî heye ku di xwendinên wî de şopên xwendineke bînavend serdest in ku ji manipulasyonê re pir vekirî ne. Orhan Pamuk, bi taybetî di romanên de, navendê wek nêrînek kûr derheqê jiyanê de, cureyek ferasetê, rasteqîn an xeyalî, xaleke nepenî tarîf dike. Bi ya wî roman jî bo li vî cihî bikolin, wê bidin pêderxistin tîrî nivîsandin û nivîskar dizane ku xwendevan jî wê bi vî çavî bixwîne.<sup>14</sup> Ez dixwazim di vê tespîta Pamuk de balê bikşînim ser beşa xwendevan û hemû cure xwendinê tevî bikim. Xwendevan jî dema berhemekê dixwîne li gor zanebûn, paşxane, aso, netew, çîn û statuya xwe ya siyasî, çandî û hwd. dixwîne û li navenda nivîsê digere. Lewma navenda ku nivîskar di serê xwe de texeyyul kiribû û navenda ku xwendevan tespît kiriye, wê gelek caran ne wek hev bin. Her xwendevan wê li gor taybetiyên xwe wê şîrove bike û jê îstifade bike an neke. Jixwe hîlbijartina berhemên xwendinê jî gelek caran ne bi tesadufî ye. Mirov li gor lêgerînên xwe an pirs û daxwazên di serê xwe de xwendinên xwe didomîne. Bînavendîbûn berê xwendinên Çiçino tayîn dike, bi gotineke din, nizane li çî digere. Ev jî teqlîdek pir qebe bi xwe re tîne û dibe xwendineke bîkêr.

12 Carl Gustav Jung, *Analitik Psikoloji*. wer. Ender Gürol, weş. Payel, Stenbol:2006. r. 397.

13 Aksoy, b.n.b., r.97.

14 Orhan Pamuk, *Saf ve Düşünceli Romancı*, weş. İletişim, Stenbol:2011. r.115.

Rewşenbîrekî ku wek Çiçino pirtûkan dixwe û wan teqlîd dike bi xwe jî rewşenbîrekî bînavend e. Nikare berê xwe tayîn bike; di nav fikrên ji xwe dûr ku di nav civakên cuda de, di nav rewşên cuda de hatine afirandin, difetisin. Bi awayekî pasîf û bêrade ji ber bayekî ber bi bayekî din ve diçe. Gürbilek ji bo Selîmê ku lehengê romana Oğuz Atay *Tutunamayanlar* (Ên Têkçûyî) e wisa dibêje: "Ji ber ku bi Dostoyevskî re dibe Dostoyevskî, bi Gorkî re dibe Gorkî, bi Kafka re dibe Kafka, dike nake nabe 'xwe'. Wek ku hemû tişt di van pirtûkan de hatibe gotin, qediyabe, tiştêkî ku lê zêde bike tunebe li hemberî wan bîkêr dimîne Selîm."<sup>15</sup> Çiçino jî kîjan pirtûkê dixwîne an dixwe bi nivîskarê wê re dibe yek, lê nikare bibe "xwe" an peyveke aidî xwe bêje. Talî, di bin pirtûkek din a stûr de dimîne Çiçino, çavên wî tarî dibin, ew çavên ku di rastîyê de ne aidî wî bûn.

Zihna şênber û teqlîdî, yek ji tarîfên zarokatiyê ye jî. Wek Aksoy ji zarokatiya xwe mînak dide zarok ji 'di polê mayin'ê dikare fam bike ku wê temama havînê di poleke deriyê wê girtî de, derbas bike.<sup>16</sup> An zarokek bi gotina 'eydî hat' re wê li dora xwe binêre, bibêjî 'ka eydî li ku derê ye?' Zehmet e ku mirov zarokekî îqna bike ku kîloyek hesin û pembo wek hev giran in. Awayê fikirîna şênber bi xwe elbet bi temamî ne tiştêkî bîkêr e lê ew di cihê xwe de bîkêr e: di zarokatiyê de an di jiyaneke pre-modern de. Di nav siyaseta modern de ev dibe sedema karesatekê. Şarman di çîroka xwe de vê karesatê derdixe pêş û rexneyeke tûj li rêberê siyasatê û rewşenbîrên wê dike. Encameke din a zarokî û nekamilbûnê jî ev e ku ji ber ku zarok ne xwedî kesayet an nêrîneke aidî xwe ne, her daim qehremanên wan hene. Li cihêkî çiqas qehreman hebin qada jiyana tak jî ewqas teng dibe. Çareserîya hemû pirsgirêkan di destê qehremanekî de ye. Ên din nikarin bi serê xwe tevbigerin an xwedî însiyatîf bin. An kesên bi xwedî zêhnek zarokane kêfxweş in ku qehremanek li ser navê wan tevdigere. Ya na ji bo zarokekî azadî û berpirsiyara azadiyê, berpirsiyara xwe-îfadekirinê barekî giran e. Zihna zarokekî li ser zarokekî dibe ku pir şêrîn be û mirov bibişirîne lê ew li ser mirovên mezin an serokekî zêde beloq û nexweş disekine û tirsê dixwe dilê mirov.

Di encama xwendina "Çiçino" de perspektîfek dîrokî jî derdikeve pêş. Di çîrokê de pirtûka yekem (beriya wê jî gelek pirtûk xwendiyê Çiçino) ku Çiçino xwendibû Quran bû, a duyem Kapîtal û sêyem jî, em ji çîroka bi navê "Ezmûna Jiyanê" ku di nav heman pirtûka Şarman de cih digire, fêr dibin ku pirtûka Evdila Ocalan e. Yek lehengê vê çîrokê Rênas, xwendevanekî zanîngehê ye, wisa dibêje, "Ez ê îro pirtûkên malê derxim. Êdî ji me re wehiy hat, tenê du cilt pirtûk hene ew ê bibe dermanê derdê me tevayan." (r.64) Çeto, "... bi saya vê pirtûkê em ê ji serdema Oktobirê bifirin Marsê." (r.64) Ev ew pirtûk e ku Çiçino di binî de difetise. Bi xwendina her pirtûkekê, siyaseta

15 Gürbilek, b.n.b., r. 12.

16 Aksoy, b.n.b., r.60.



gelekî ku ne xwedî perspektîfek an armançeke ku li ser dînamîkên xwe yê civakî ava bibe, ji bin de diguhere. Dîrok bi şêwazeke cuda tekerrur dike.

Beriya ku em dest bi xwendina çîrokê bikin "Ji Fredric Jameson û xaltîka wî ya delal re" nivîsî ye. Nivîskar çîrok ithafî Fredric Jameson kiriye, ku cara yekem di gotara xwe ya bi navê "Di Serdema Kapîtalîzma Pirneteweyî de Wêjeya Dinyaya Sêyem"<sup>17</sup> de têgeha alegoriya netewî bi kar aniye. Xaltîka wî jî tevlê kiriye ku wek nîşaneyekê ku wî çiqas baş nas dike. Bi xwendevanê xwe dide zanîn ku bi teoriya wî jî, wî jî û heta xaltîka wî jî pir baş nas dike. Ji bo wî ne girîng e ku wê kî çi bibêje an berhema wî bike nav çî kategoriyê, ne xema wî ye. Ew rastiya xwe, belê tam jî çîroka neteweyî vedibêje, wek ku bipirse: Ev çîma nebe? Çîma ev wek kêmasiyekê tê dîtin? Nivîsandina meseleyên tenê şexsî çîma bi qîmet be û meseleyên siyasî çîma bê qîmet bin? Kê ev pîvan danîne?

Bi rastî dema Jameson gotibû ku hemû wêjeya cihana sêyem, her çî bi-nivîsînî nîkarin ji nav çarçoveya alegoriya neteweyî derkevin an jî çîroka neteweyî wêdetir naçin. Mijar çiqas şexsî be û bi dînamîkek libîdînal dorpeç-kirî be jî, her dem wê rehendekê wê ya siyasî hebe.<sup>18</sup> Her çiqas Jameson li hemberî biçûkdîtinên rojavayîyan, di nav hewleke parastina wêjeya cihana sêyem de ev tespît kiribe jî, bêtir têgeha bikaranîna wî tarîfa "cihana sêyem" û aliyê teoriya wî ya reduksiyonîst hate rexnekirin. Intibayek wisa çêbûye ku wek Jameson di wêjeyê de vegotina meseleyên siyasî bê qîmet kiribe. Halbûkî ew di nivîsa xwe de sedema rêjeya şexsî-siyasî pir baş rave dike û di wê fikrê de ye ku asayî ye ku li cihana sêyem giranî li ser meseleyên siyasî be û ev wê bêqîmet nake.

Di vê nivîsa ku gotarek û çîrokek bi hev re hatin xwendin de, me du awayên vegotinê dîtin. Yek di nav çarçoveya zanistên civakî de, yek di nav çarçoveya wêjeyê de. Ger ku her nivîs li hember pirsên jîyanê bersivek be, heman tişt bi awayên cuda dikare bê gotin. Lê her cure vegotin di nav xwe de xwedî xweseriyekê ye. Romanûs an çîroknûsên ku bala wan li ser xweseriyaya wêjeyî bin, li gor pîvanên estetîka wêjeyî deqa xwe dihûnin bi ser dikevin. Mehmet Şarman nivîskarek e ku heqê xweseriyaya deqa wêjeyî daye. Şarman jî bo mijara çîroka xwe heta bêje mijarek siyasî an civakî hilbijartîye lê bi saya zimanê wê yê mîzahî û alegoriya wê ya xurt ta'ma wê ya wêjeyî di bin barê vê mijara giran de nemaye. Bêyî ku bi edayek dîdaktîk vebêje, bêyî ku şîretan li xwendevanên xwe bike an wan ajîte bike, Şarman bi çîroka xwe ya alegorîk bersiva xwe dide. Çîroka wî jî bo nîqaşên li ser pêwendîya wêje û siyaseta an wêje û meseleyên civakî jî wek bersivekê dikare bê xwendin. A herî girîng, Şarman jî ber ku bi asoyeke fireh li civaka kurdan dinêre û wê baş nas dike, pirsgerêkê jî bêyî dîdaktîzm an ajîtasyonê derdixe pêş. Lewma tevî zimanê wî yê mîzahî û hûnandina wî, çîroka wî ewqas serkeftî ye.

17 Jameson, b.n.b., r.365-396.

18 B.n.b., r.373.

Nivîskar ji berpirsiyariya civakî ne azade ye. Bingehek siyasî an der-siyasî qedrê berhemê tayin nake. Awayê vegotinê ye ku qîmetê wê tayin dike. Şarman xwe spartîye pîvanên estetîk ên wêjeyî û di çîrokên xwe de daye pey çî çawa binivîsîne? Bersiva wî û Chinua Achebe, romanûs, helbestkar, profesor û rexnegirê Nijeryayî, jî pir dişibin hev. Achebe di gotareke xwe ya bi navûdeng "Novelist As a teacher"<sup>19</sup> de dibêje, divê nivîskar ne li bende be ku ji peywira jinûdeperwerdekirin an vejandina civakê muaf bê girtin û ji profesore felsefeyê yê Ganayî neqil dike: "Zanayên efrîkî çareserkirina pirsgerêkên zanistî didin ser xwe, dîrokzanên efrîkî dikevin nav dîroka efrîkayê, zanyarên siyaseta dikevin nav xemên siyaseta efrîkayê, çîma afirînerên wêjeyê yê efrîkî divê ji xizmetên xwe muaf bin?"

19 Chinua Achebe, "The Novelist As a Teacher". Di nav *Hopes and Impediments* de. E-book, r. 57-65. [http://books.google.com.tr/books/about/Hopes\\_and\\_impediments.html?id=46oOAQAAMAAJ&redir\\_esc=y](http://books.google.com.tr/books/about/Hopes_and_impediments.html?id=46oOAQAAMAAJ&redir_esc=y)







Girî, ên Mezopotamya, ên Ûrartû hwd.) dewreke dûdirêj temsîliyeta tiştan kirine. Lê bi vî hawî nêzîkbûna temsîliyete li dijî wê mantalîteya çanda nivîs-kî ye ku reflekseke wê ya girîng pratîkbûn e. Belkî ji vê anê de elîfbaya herî bi mubalexe a Çîniyan e; Ong dibêje: "Di ferhenga Çîni K'anghsi a ku ji P.Z. 1716 de maye tam 40545 tîp hene, û Çîni yan jî sînologekî ku bi van hemûyan zanibe derneketiye.[...] Ji ber ku fêrbûneke kamilbûyî ya nivîsa çîni herî kêr 20 sal jê re divê, tu bikî nekî xwendinû nivîsandin ji sinifeke bijarte wêdetir naçe" (107). Lê îro asta/çanda nivîsê gelek endîşeyên "çanda devkî" bertaraf kirine; gava ku em li ser kaxetekê bi tîpan peyva "beq"ê dibînin beriya her tiştî rismekî beqekê di serê me de serî radike, gava em peyva "masî" dibînin sûretê masiyekî tê pêşberî mirêka mejiyê me. Pirsgirêkên temsîliyeta tiştan ji dema însanên ewil heta niha jî însaniyet meşxul kiriye-dike; bihevgerêdana mekan-rism-deng-zeman xetereyên li ber her vegotinê ne.

Meseleya di navbera axaftin û nivîsê de ne hew mîna ku Ong îşaret dike hilqetandina deng a ji peyvê ye. A rastî "zimanê bi deng" jî li ber qewaman/tiştan kêr e; vegotîneke ku bixwaze bûyerek bûyî vebêje wê her di kêmasiyekê de bilikume. Ji vê anê de romana Ciwanmerd Kulek Zarokên Ber Çêm vê rastiyê xweş li ber me radixe. Kejoyê ku bi bîranînên Dêrsimê dilê wî dikizire û nema kare rê li ber sikra bîra xwe bigre, dixwaze ku (têkeve ser şopa diya xwe Koçerê û tiştê ku wê hertim digo û pêkneanîbû bike) bantekê dagire. "Tiliyên wî çûn ser herdu bişkokên teyîbê ên dawî. Xirexira gerîna bandê hat. Tiştê di qirika wî de ma. Zengelorka wî girrikî bû" (205). Hezar fikar di serê wî de derbasdibin, band vala digere lê peyv ji devê wî dernakeve. "Hingê xwest dengê mirîşkan, dengê bayê nav dehlê, çirkeçirka demjimêrê jî bikeve nava bandê. Heçku dixwest û guman dikir, ku dê deng here Koçer Kubara diya wî jî. Hehecîk çûbûn, hêlîna wan vala bû. Xwezil dengê şîrşîra wan jî bihata û biçûyayê. Wê hingê ji pêjna wan hez dikir" (205-206). Ku dengê mirîşkan, ê bayê nav dehlê, ê çirkeçirka saetê û şîrşîra hehecîkan têxe bandê jî wê nikaribe çûyîna hehecîkan û valabûna hêlîna wan têxe bandê. Belkî jî ji ber ku bi van kêmasiyan wê nikaribe atmosfera kêliyê bibêje Kejo nikare karê ku pir nêzîkayî li pêkanîna wê kiriye bibe serî. Kejo digel kêmasiya deng a wêneyî jî eşkere dike. Dibe ku hinek bibêjin meriv van kêmasiyan dikare bi rêya kamerayê/sînemayê çareser bike û vegotîneke qewî û bi heqîqetê ve girêdayî bîne meydana. Lê di wir de jî pirsgirêkên mîna zeman wê derkevin; tiştê ku di mehekê de an di çend salan de bûye wê di çend deqan an di çend saetan de bûye bîn nîşandan, an hew tiştên ku kamera berê me didiyê em ê bibînin. Kejo cixara xwe vêdixê; "Bêhna don a ji hesteyê wî hat jana dilê wî hîn bêtir azirand. Weke ku bêhna can û cesedên qemirî, bûbûn rijik û bêhnpeketî, bike, pozê xwe qermeçand. Dilê wî xewirî" (208). Kamera wê nikaribe bêhna dohn jî têxe bêvila me. Yanî meriv dikare zimanê ku Ong di navbera çav û guh de par dike<sup>2</sup> bi têxistina hin organên din ên ragihandinê ya nav meseleyê hebekî din jî parçe bike.

<sup>2</sup> Ong dibêje "deng" xîtabî guh û nivîs xîtabî çav dike.

Di axaftinê de çawa ku bo wate biçûrise ji hereketên dest û piyan, çav û seriyên, mîmîkan mirov alîkariyê digre wisa jî di nivîsê de bi verastkirinê/aranjeyê wate dikare bê dayîn. Hevokên kinî ku di jiyana rojane de ji ber derdora ziman a zindî ku bêgramer tên gotin, ji ber ku ew derdora zindî di nivîsê de tune hewceyiyê bi verastkirinekê dibînin. Bela ku berê li ser nehatiye xebitandin, neqla peyv û bûyeran nehatiye organîzekirin di axaftina rojane de hevokên kin, gelek caran bi dubarekirinan ta ku wateyekê biafirînin li pey hev tene rêzkirin. Hewceyîya axêver bo ku bîne bîra xwe bi çendek wext divê û wî wextî jî gelek caran bi dubarekirina peyv an bûyeran bi dest dixê, ji bo hevokên dirêj wextê mejî çênabe. Ji ber vê hewceyiyê mejî dilikume, di kêliyên kin de dikeve nava lêgerînan û çareseriyên peyda dike. Lê nivîs ji peyvên organîzekirî ên ku berî hesab û kîtabên wan hatine kirin, ji pevxistina bûyerên ku pîvanên wan hatine danîn, li ser manîpûleyên ku wê bîn kirin dîrûdirêj hatiye fikirîn pêk tê. Peyva ku ji dev derdikeve paş de nayê lê hevoka nivîskî ya ku nekeve serê me meriv dikare biguherîne.

Yek ji taybetiyên zimanê axaftinê kin-hevokî ye. Ji ber ku di dema axaftinê de pir wextê hiş çênabe ku hevokên dirêj organîze bike (wê sekn têkeve şitexilandinê û xwezaya xwe wenda bike) di cîyekî de mehkûmî vî tiştî ye. Mîrata hevokên kin herî zêde di romana Mahmut Baksî ya bi navê *Hêlîn* derdikevin hemberî me; "Navê birayê min danîn Azad. Navekî delal û mêrxas. Azad wek navê xwe, ew ê jiyana xwe bidomîne. Ew kur e. Jê re her tişt serbest e. Li gora dilê xwe, wê bikaribe hereket bike. Cihê kuran bilind e, girîng e li Kurdistanê. Diyên ku her kur tînin pir bi rûmet in, tînen hezkirin. Tu kes nikare têkilî wan bibe" (27). Ji hevokên romanê mîna din:

Bavo û mamostê Tirk nêzî serbaz sekinîbûn. Destên wan kelepçekirî bû. Her du jî tazî bûn. Dadê xwe dabû piştê bavo û destê xwe danîbû ber xwe. Serbaz xwe nêzî bavo kir. Çar leşker hatin ba serbaz û sekinîn. Serbaz bi wan re peyivî. Piştî peyva serbaz, leşkeran diya min ji erdê rakirin û ew danîn nav milên bavo. Qîrînî jî bavo çû. Bavo ji nedî ve serê xwe li nav rûyê serbaz da. Xwîn ji pozê serbaz herikî. (73)<sup>3</sup>

Roman ji destpêkê heta dawiyê bi hevokên mîna ên jor dimeşe û diqede. Helbet gerek em bi bîr bin ku ev roman di sala 1984an de hatiye çapkirin; yanî di dewreke ku hîn kurdî nû bi nû bi nivîsê re di warê wêjeyî diket têkiliyê de hatiye nivîsîn. Yanî manevraya ku zimanê kurdî yê nivîskî di 20-30 salên dawî de bi dest xistiye li holê nîne hîn. Romana bi navê *Dem û Dêmarî* ya Egîdê Xudo ku piştî ya Baksî bi du salan hatiye çapkirin, ku ne biqasîya Baksî be jî, di heman terhî de ye. Her çiqas Egîdê Xudo di şûna bikaranîna nuqteyê bi danîna bêhnokê hevokên xwe hebekî din dirêj kiribin jî, hevokên wî dîrî mantalîteya çanda nivîskî ne.

Asas nivîs ji tiştên zêde hez nake jî, lê bi qasî ku hevok kin dibin ger tiştan jî li xwe vehewînin û tîr dagirtî bin. Hevokên di çîrokên Mehmet Dicle ên di

<sup>3</sup> Jêgirtin mîna ku di romanê de hatiye nivîsîn hatiye kirin, tu serastkirin an midaxeleyên din nebûne.



pirtûka wî ya bi navê *Nara* ji bo vê qalê mînakên baş in. An jî yên Ciwanmerd Kulekî ku di romana wî *Zarokên Ber Çêr* de ne. Yanî nivîs hertim li hevokên mîna ên Şener Özmenî di *Kelehê* û ên Kulekî di *Otobêsê* de dirêj ku asta ziman bilind dikin û wî bi manevra dikin nagere. Lê ji yên Mahmut Baksî ya jor jî direve.

### Bi dubarekirinan bereketa ku dikeve nivîsê

Di asasê xwe de nivîs ji barê zêde aciz e; ji ragihandinên belaheq, ji tiştên ku ji çepera metin dîr dikevin ên ku bala xwendevan diteriqînîn û wextê wî (ê ku di serdema çanda nivîs û teknolojiyê de her dem hindike) belaheq xerc dike direve. Ji ber ku tekst li ber me ye û her gav em dikarin lê binêrin hewceyiya dibîrdeanîne (ku çanda devkî bi dubarekirinê ji xwe re pêlikan çêdike) difetiqe, dibe karekî bêfesa. Romana Bûbê Eser a bi navê *Jiyanek* di warê zêdeyî û dubarekirinan de emsalekî bê mînak e. Carinan tiştêkî ku di rêzekê de hatiye gotin li rêza dû wê, tiştêkî ku di rûpelekê de hatiye gotin di rûpela dû wê, qaleke ku di beşekê de hatiye kirin li çend beşên dû weke ku bi bîra xwendevên nebawer be an jî bi endîşeya jibîrkinê, belkî jî ji ber hewceyiya dibîrdeanîna xwe ya nivîskar tînan dubarekirin. Em çend mînanan ji dubarekirinên ku seran serê romanê dane ber xwe bidin: Di beşa nehan de lehengê romanê Mihemed diçe cem birê xwe Dawo da ku îznê ji bo çûna Diyarbekirê jê bixwaze; "Keko, bi Xwedê ev halê em tê de ne tu hal e. Eger tu îzna min bide, ez ê ji xwe re herim bajarê Diyarbekirê, belkî karekî bibînim. Li vir, em ê ji bêkariyê birizin. Em ê tim birçî bin" (65). Haziriya Mihemed, dûayên ku li dû tînan kirin, derketina ser "Îpekyolî", girîna li pey wî di vê beşa ku ji du rûpelan pêk tê bi bêhnfirehî tînan gotin. Beşa dehan (rûpela 67an) wiha dest pê dike: "Mihemedê birayê Dawo jî, nihêrî nabe, wî jî xwest jiyana xwe ew bi xwe berdest bike. Lewma wî îzna kekê xwe Dawo xwest, ji nava malbatê koçî bajarê Diyarbekirê kir" (67). Tiştê balkêş di nava du rûpelan de ji hewceyiya dibîrdeanîna çûna Diyarbekirê bi heman hevokan bêhtir dibîrdeanîna biratiya Mihemed û Dawo ya heta vê rûpelê ku hema hema di her beşê de çend derban qalbûye ye (digel ku tu Mihemedên din di romanê de tunene). Xwedê li rûyê Mihemed dikene: "Midûrê daîreya *Toprak Suyê* bi Mihemed re peyvî û ew ji bo bekçîtiya baxçeyê daîreyê girt" (68). Piştî çar rûpelan nivîskar vê rewşê bi vê hevokê tîne bîra xwe û xwendevanan: "Mihemed li Diyarbekirê, di daîreya *Toprak Suyê* de bûbû bekçiyê bexçê" (74). Dilê Serdarê serlehengê romanê di bin îşkenceyan de ji ber zêdeceryandayîne disekine, ev yek di rûpela 190î de xal bi xal tê gotin, di serê rûpela 191ê de îcar bi gotinên ku textorê ku anîne ser tê gotin (textor di vir de hew bûye amûrekî tesdîqkirinê). Polîs, ji bo ku kirasekî li mirina wî bifesilînin û nekevin ber cirmekê şewra xwe datînin û dixwazin rengê revê li qewamê bixin. Ber bi dawiya rûpela 191ê de îcar ev hevok derdikevin hemberî me:

Bi destmalekê canê Serdar ê şil zuha kirin, cilên wî lê kirin, porê wî şikinîn, ji ciyê şikence û lêdanê derxistin qatê çaran. Yekî bi destê wî, yekî

din jî bi lingên wî girt, kesekî jî pencere vekir. Serdarê mirî di nava xwe de hejandin û gotin:

- Yek, dudu, sisêêê...

Serdar di pencereyê re avêtin derve. (191)

Di rûpela 198an de îcar ji devê xelkê (qalkirina bajariyan) ev bûyer dîsa tê neqilkin. Xwedêgiravî di nava hin bajariyan de ev diyalog derbas bûne:

- Polês gelekî ji wî qeherîne, lewma bê hemdî zêde ceyran danê, dilê wî sekiniye.

- Paşê...

- Piştî ku doxtir tînin ser, doxtir dibêje, ev miriye. Wî ji qatê çaran de davêjin jêrê da ku bibêjin, wî xwest bireve, xwe avêt (198).

Beşa 44an wisa dest pê dike:

Dema şikenceyên li Serdêr dihatin kirin, polêsan fêr kir ku Serdar di şikenceyê de kuştine. Ji bo ku ew di stûyên wan de nemîne, xwestin rewşekê bidin vê sedemê ku wekî Serdêr xwestibe bireve û xwe avêtibe. Ji ber vê fikrîne bû ku wan ew ji qatê çaran de avêtibû, lê dema ku Serdar hişk li ser erebaya wan dikeve, dilê wî dîsa dest pê dike dikute û bi vî awayî ew ji mirinê rizgar dibe. (226)

Ku em vegerin ser lêkolîna Ong; raman domdariyekê dixwaze, mejî qet vala nasekine. Ji ber wê çendê di axaftinan de gelek çaran kes ji ser rê ber bi qiraxan de tewş dibin lê nivîs, di nav metin de li derveyî mejî xetek domdar bi dest dixê. Di xwendina metnekî de gava bala meriv ji ser here û meriv ji peywendê biqete, mirov dikare vegere çend rêz an çend paragraf berê û dîsa têkeve nava peywendê; tiştê ku ger di bîra me de be li derî bîrê, li ser kaxetê ye jixwe. Ji ber vê yekê mejî hemû hêza xwe ji bo pêşdeçûnê xerc dike; zûtir dixebite. Lê ji ber ku peyv çawa ji dev derdikeve di nava valahiyekê de wenda dibe, ji xeynî bîrê ciyekî ku em karibin lê vegerin û binêrin nîne. Ong dibêje: "Ji ber vê hiş, bi nêzîgirtina nûqtêya nîskokê [focus] a qismekî pir ê mijara ku hatiye axaftin ve mecbûr e ku bêhtir bibêje û hêdî bi pêş de biçê. Axaftina bi xemlûxêlî<sup>4</sup> û bi mubalexe, hemen tekrarkirina tiştê ku berî bi kêliyêkê gotiye, nêhle ku bala axêver û guhdêr bi derekê de biteriqe" (56). Taybetiyek sereke ya ramana devkî di şûna ku peyvan bê tibarek li pey hev rêz bike, bi zêde gotinan vegotinê xenê dike, ev yek bêhtir li xwezaya çanda devkî tê. Ramana veçirîner a ku xwe dispêre bi hindik peyvan li ser xetekê

<sup>4</sup> Hin xalên têgehên mîna "Romantik Ergen Dil" (Zimanê Nûkamîlbûyîyan ê Romantîk), "mîtoromantîk" ên ku Mehmet Şarman di gotara xwe ya bi navê "Mîtoromantîk Söylem ve Kürt Siyaseti" (Vebêjeya Mîtoromantîk û Siyaseta Kurd) de li ser hûr dibe û xalên ku di beşa vê gotarê yên ku di bin navê "Mîtoromantîk Söylem Neden Sorunu Çözemez?" (Vebêjeya Mîtoromantîk Çima Nikare Meselê Safî Bike) de kombûne jî bi meseleya çanda devkî ve girêdayîne. Hêja ye ku meriv Pirtûka Ong û gotara Şarman li tenîştê hev bixwîne; wê nêrînek xweş li ser siyaseta kurdan û wêjeya wan derkeve holê.



meşandinê teknîkeke nû ye. Bi deh hezar salan însaniyetê bi awayê devkî kulên xwe derbirine.

### Rêbertiya wêjeya devkî ya ji bo nivîsa kurmancî

Hebekî jî ji ber wî zimanê Mehmed Uzunî mexduriyetê ku di hevpeyvîn, daxuyanî û nivîsên xwe yên nesrî (mîna *Ruhun Gökkuşağı*) de bi kar dianî, weke refleksekê gava behsa wêjeyê dibe xwe diavêjin bextê dengbêjan. Ev refleks bêyî ku dengbêjiyê ji hev veçirîne, mîna ku hew ên wan hebin û gotin beramberî nivîsêye (mealên) dibêje: "ku nivîskarên we hene yên me jî dengbêjen me hene". Beriya ku Mehmed Uzun li cem tirkan dengbêjiyê têxe rojevê û hin kurd jî bêhtir bi vê pêhesandinê û balkêşdîtina tirkan bi taybetiyek çanda xwe bihesin bi du hezar salan yûnaniyan li ser dengbêjan nîqaş dikir.

Gelek lêkolîn li ser dibîrdeanîna hozanan, awayê gotin û zimanê epîkên ku hozan dibêjin hatiye kirin. Însan şaş diman bê hozan çawa bi hezaran bend diafirînin û wan di hişê xwe de dihêlin. Piştî ku Milman Parry gelek hêlên epîkên Homeros eşkere kirin ew perdeya tarî a şaşmayîne ji mejîyan vekîşîya û cîyê xwe da fêmkirina "qalibên peyvan", bûyeran, sifetan û rêyên dibîrdeanîne. Xebatên bi vî rengî li ser çîrokên sêlekan jî hatine kirin.

Hin peyvên ku di gelek kilaman de pir tînan bikaranîn û alîkariya bîra dengbêjan dikin evin; dewran e, dêran, weylo/lê, rebenê/o lêê/loo, felekê, haymî (hawê keyandinê) hwd. ev peyvên keyandinê ku bi dirêjkirinekê tînan gotin wî wextê ku hiş pêdiviyê pê divîne dide hozan. Di bîra hozanan de gelek rengdêrên dibîrdeanîne jî hene. Çend mînakên mirov dikare wiha rêz bike: Felek her dem xayîn e, kezêb peritiye, derd/birîn bêderman e, şev tarî ye, dijmin an xayîn e an xwînxwar e, baran a biharî ye, xew şêrîn e a şevê ye diherime, dil reben e, hêstir mîna baranê dibarin hwd. meriv dikare gelek rengdêrên peyvan ku bûne klîşe bêyî ku zêde bîra xwe bibetilîne ji dev derxe. Hozan bi îmkana van rengdêran destanên/klamên xwe dixemilînin û xîtabî bîra civakî jî dikin ku ev yek girîng e. Her wiha tiştêkî din î ku xemla epîkan geş dîke dubarekirina peyvan e. Çend qalibên ku dikarin zûtirîn bîra me ev in: derd û kul, xem û kul, kul û birîn, vir û derew, heyran û qurban, feqîr û fuqera, alim û zana, şêx û meşayîx, kafir û gawir, dijmin û xayîn, diz û keleş hwd. Ev cotên peyvan ku gelek caran di heman wateyê de ne, epîkan û vegotinên devkî zexim dikin. Her wiha di pevxistinên devkî de jî gelek tişt-kes-mekanên hevpar hene. Ji ber ku peyv di van vegotinên de ne li ber çavanin, di guh de ne, tiştêkî ku çavê me lê bialiqe û bi xweşîya me neçe li meydana nîne. Lê bîra ku wê di nivîsê de bixwaze ku di zûtirîn demê de bi pêş de bimeşe wê di van peyvên de bilikume. Bela ku her tişt li ber çav raxistiye wê kes, ji kêfa ku guh dikir bêpar bimîne.

Lehengên Yaqob Tilermenî di romana wî *Kitimê* de (ku ji Sêbareya Mêrdîne pirtûka yekem e) li ser awa û rêyên avakirina romana kurdî nîqaşinan dikin. Di navbera Fendoyê ku di bin darê zorê de bi nivîsandina romanekê

ve rabûye û Hêjayê ku li ser reng û çavkaniya ku romana kurdî jê avê vedixwe, pê re serî diêşîne ev diyalog derbas dibin:

"Destûra te hebe û ku xewa te nayê, ez ê ji te re behsa Destana Fatima Salih Axa bikim. Rêbazêd tê de hatine bikaranîn; Vegotina ji devên kesên cihê; Newaya muzîkê; Epîkbûn û lîrîkbûn û dîdaktîkbûna wê, tu yê gişî bibînî; Û ku tu ji wan fêdeyê bistîni wê romana te li ser çanda kurdî, li ser koka xwe rabe."

"Belê kerem bike, lê gelo bikaranîna edebiyata devkî di romana modern de wê nebe weke lingekî kût!" her çiqas ez ne weke van gotinên xwe difikirim jî, min dixwest hebekî feraseta wî bipîvim. Jixwe kêmasiya pênûsgiran ev bû ku ji hêlekê ve xwe bi zargotina kurdî dibuxudandin, ji hêlekê ve jî nizanîbûn ev gencîneya bikirana bingeha nivîsa xwe. Bi tenê xwepeşandin hebû.

"Rast e birawo. Çawa ku Celadet Bedirxan bi xebara xwe yî *Hawarê* pîrek di navbera edebiyatanuhjen û zargotina kurdî de ava kir, divênivşêd îro jî vêya di ser guhêd xwe re navêjin û edebiyata me yî klasîk ji xwe re bikin esas." (123-24)

Fendo û Hêja li ser vî mijarê li hev dikin (a rastî hevokên wan hevdu temam dikin; bela ku herdu ne bi hev re, lê bi yek devî bi cîhana derîromanê di nîqaşê de ne). Hêja, kilama Fatma Salih Axa bêetlahî qedere çar rûpela ji Fendo re dibêje (di eslê xwe de Tilermenî ji xwendevanên xwe re dinivîse):

[...]

Berê xwe da oxirê û piştî xwe da felekê.

Got ya Allah û ya Xwedê û meşîya.

Dibên sê roj û sê şevên wî çêbû meşîya.

Cilên wî bi dar û devîyan mane.

Zeraqa tavê derket gihîşt şivanîna.

Got lawo hûn şivanên kê ne.

Wan got em şivanên Salih Axa ne.

Nebêj.

Got welle.

Got hûn şivanan nagrin.

Gotin wellehî em şivanên xerîb nagirin.

Got çima.

Gotin pezên me wenda dikin.

[...] (124).

Kilam tesîreke mezin li *guhder* Fendo dike. Lê ez bawerim nivîsandina bi vî hawî ya bê aranjmanî kilamê (ku em pesnên di diyalogan de û weke rêya felatê nîşandana kilamê li ber çavan bigirin) wê ji bo *xwîner* hew komîk bisekine. A dîtir tevna vî kilamê, teknîka vebêjeya wê, rêyên çareserkirina probkine. A dîtir tevna vî kilamê, teknîka vebêjeya wê û xweşgotinên wê di roja îro de û lematîka kilamê, awayê meraq çêkirina wê û xweşgotinên wê di roja îro de û



di dema ku ev roman hatiye nivîsîn de êdî pir klîşe ne. Belkî tiştê ku (ger) em guh bidinê hew dengên kurdîne. Ku derd epîkbûn û lîrîkbûn be mirov dikare ji bo pêdiviyên wê û awayê wê yê gelekî bi serketî li çîroka Mehmet Dicle "Nara" a ku di berhema wî ya bi heman navî de ye binêre. Digel pêdiviyên zimanê nivîsê hemû xalên ku Fendo û Hêja dil dibijîne tê de hene.

Rewşa ku Tilermenî di vir de ketiyê ew rewşa ku Ong wiha tîne zimên e: "Çawa ku xwende-nivîsendeyan serfiraziyên xwemalî yên nivîsê li hozanan anîbin, wisa ji hozanan ên xwemaliya devkiyê li xwende-nivîsendeyan anîne" (79).

Helbet ku em bixwazin ji em ê nikaribin ji sûdwegirtina çanda devkî rû babidin. Ev xwespartin di hemû zimanan de heye. Bes ku em karibin wê bi nivîsê ve bijênin ne ku wê monteyî metin bikin. Di romana Fawaz Husên a bi navê *Barê Şevêde* çîrokek gelêrî (Çîroka Mîrza Mihemed) digel ku di nav peywenda ku tê qalkirin û çîrokê de tu têkilî tune ye ji di nav metin de hatiye bicîkirin. Digel ku pir eşkere ye ku ew çîrok vegotinê qut dike û nîskoka wê bela dike ji, herhal wê ji ber daxwaza nivîskar a xelaskirina çîrokê yî jîbîrbûnê be, ev yek dîsa tê kirin. Heman mesele di romana Jan Dost *Mîrnameyê* de ji derdikeve hemberî me; Selîmê Nalbend ku yek ji vebêjerê romanê ye hin meselokên gelêrî yên bi vegotinê re ne têkildar weke hîmekî ku meriv dayîne nav avê datîne nava metin. Av nikare wî bi xwe re biherikîne, mecbûr dimîne ku di derdora wî re biherike. Li hember van metnan Ciwanmerd Kulek di romana xwe ya *Zarokên Ber Çêm* de gelek mesel, kilam, mamik, tiştonek û mîratên çanda devkî di nav metin de dihelîne. *Dengên* peyvvan diguhê mirov de olan didin, çavê mirov bê rawestan li nav rêzikan digere û mejiyê mirov bi beza ku di nivîsê de jê hez dike bazdide. Kî dikare ji xwespartinek bi vî hawî ya çanda devkî re bibêje na?

### Dawî

Digel gelek şibandinên çanda neteweyan pirê caran ji devê penaberan gazinên ji neelimandina wan welatên cihê (ku lê dijîn) derdikevin. Kesê ku nêviyê jiyana xwe di nav adetekê de bihirandibe nikare bi derbekê re fêrî toreyeke din bibe, wê bike bawerî û sedemên tevgerê xwe, belkî heya dawiya emrê xwe adapte nebe û her li ser rabûn û rûniştina xwe ya berê bimîne. Her wiha kesên ku bi deh salan û gelên ku bi hezar salan di nav çanda devkî de jiyane wê nikaribin bi carekê de adapteyî çanda nivîskî bibin. Weke ku di hin hevokên vî nivîsê de ji tîne dîtin "gotinên" axaftinî ku beramberiyekê di nivîsê de nebînin wê her ji çanda devkî serî hildin û kes bidin dest. Ong dibêje: "Ji ber ku awayê vebêjê û ramandina bi qalibên gotinî di hiş û derhişê me de di kûr de nexş bûye, ku meriv çawa dest biavêje qelem tune nabe" (40). Û behsa çandên mîna ereb, yûnan û yên kêleka Behra Spî ya modern digel ku bi sedsalane zanin binivîsin ji lê wê nehundurandine û hîn bi şiklekî hişk bi awayê vebêjê û ramandina bi qalibên gotinî ve girêdayî ne dike.

Kurmanciya me û civaka me ya ku xweşikî ev bîst-sî sale bi nivîsê re di nava danûstendinekê de ye wê hîn gelekî li ber xwe bide. Lê her ku danûstendin bi nivîsê re zêde bibin wê xwe û civaka xwe biguherîne, ji fikirandina devkî wê ber bi ya nivîskî de bimeşe.

### Çavkanî:

Baksî, Mahmut. *Hêlîn*. Stenbol: Weşanên Lîs, 2007.

Eagleton, Terry. *Kültür Yorumları*, wer. Özge Çelik. Stenbol: Weşanên Ayrıntı, 2005.

Eser, Bûbê. *Jiyanek*, Stenbol: Weşanên Bajar, 2004.

Kulek, Ciwanmerd. *Zarokên Ber Çêm*. Enqere: Weşanên Lîs, 2012.

Ong, Walter J. *Sözlü ve Yazılı Kültür: Sözüün Teknolojileşmesi*, wer. Sema Bostancıoğlu Banon.

Stenbol: Weşanên Metis, 2010.

Tilermenî, Yaqob. *Kitim*. Stenbol: Weşanên Lîs, 2005.







egoya xwe. Di paşerojê de tiştê hatiye hilibijartin û libîdoyê ew bi insanekî taybet ve girêdaye. Piştî vê çendê yan ji aliye wî tiştê/kesê jê hatiye hezkirin ve tê astengkirin (inhibition) yan jî bi sebeba dilşikestina li hember tiştê ve têtikiliya kesî û tiştî hildiweşe. Dema ew kes di derheqê xwe de diaxivin û xwe dieyibînin -ji ber ku di eslê xwe de di derheqê yekî din de diaxivin- şerm nakin û hewcedariyê bi veşartina van tiştan jî nakin. Ji hêlekê ve ger li hember tiştê ku jê hatiye hezkirin pêgirêdaneke xurt tunebe û ji hêla din jî veberhênana objeyê ger ne saxlem be, ev nakokî nîşan dide ku binyadeke narsîstîk di nav vê têtikiliyê de heye. Di şûna hezkirina objeyê, sazkirina wekhevîbûnê (identification) di hezkirinê narsîstîk de mekanîzmeyeke sereke ye.

Bi van agahiyên di derbarê melankoliyê ve kesayetiya Salar Xan û bingeha têtikiliya wî ya ligel Cemşîd ronîtir dibe. Benên Salar Xanî ji bo li ber bêneçe bi xwe û Cemşîd ve girêdide her çend bi şênberiyê rastî jî be, wî bi bingehê narsîstîk bi Cemşîd ve girêdide. Ji ber vê çendê heta windabûna Cemşîd a dawiyê bi dilsoziyek eşkere û bi nefreteke veşartî tekiliya xwe bi rê ve dibe. Hin caran fikirîna xwe ya ku benên Cemşîd ji destê xwe berde û xwe ji wî xilas bike venaşêre. Lê ew heta dawiyê jî vê fikra xwe pêk nîne. Heta ku Cemşîd daxilî jiyana wî nebûye ew mirovekî ji rêzê bû, piştî Cemşîd bû hevparê jiyana wî, ew êdî bû xwedî rolekê û mebestên xwe bi wî ve girêdan. Berî hevkarîya Cemşîd jî, Salar derheqê xwe û pismamê xwe Smayîl xwediyê fikirîneke menfî ye: "Ez û Smayîl di nav êla xwe de du ciwanên herî bêkêr bûn... kesî bendewariya tiştê baş û siberojê ronak ji me nedikir" (13). Piştî Cemşîd têtikilî jiyana wî bû ew êdî veberhênana xwe a objeyî li Cemşîd dike. Ji ber ku Cemşîd berî girtin û îşkenceyê jî bi fikr û ramanên xwe merivekî berçav bû, piştî îşkenceyê jî bi lawazbûna xwe a nesirûştî ve merivekî bêhempa ye. Di derhişê xwe de ji aliyekî hez dike bibe ew (Cemşîd) ji aliyekî jî ji ber ku Cemşîd ji bo vê fira xwe a nesirûştî dikeve rewşên xirab û bi çavê xwarê li wî dinêre û tu qîmetê nade wî jê direve: "Divê bêjim min berê ji apo Cemşîd hez nekiribû, ne ku ji ber kêman caran bi me re dipeyivî, lê ji ber ku nerîneke wî ya pir req, tûj û cidî hebû; herdem bahaneyê wî hebû ku bi pozbilindî û nefret li me binêre" (14). Bi vî awayî veberhênana wî a bi hezkirinê astengkirin û di libatên wî de duserîtiyek (ambivalence) derdikeve holê. Wekî me li jor jî qal kiribû hezkirin û nefret li gel hev xwe nîşan didin û êdî ne tenê ew demên Cemşîd winda dibe, ew demên bi wî re jî ew di xemekî kûr û ximam de ye: "Min di wan çend salan de tiştê nekir, her û her min li ezmanan dinêrî û di ronahî û tarîtiyê de li dû Cemşîd Xan digeriyam, heta demekê ku ew li erdê û li teniştê min disekinî, min bê hemd serê xwe bilindî jor dikir û li dû tiştê nediyar ku min nedizanî çî ye, serwinda dibûm" (34). Di pismamê Salar Smayîl de, ku heman wezîfe (miqatebûn a Cemşîd) lê hatiye ferzkirin, ev rewşên melankolîk dernakevin holê. Ji ber ku ew, hevkarîya Cemşîd ji bo ku li ser xwendin û ronakbûna xwe mijûl bibe wekî baha-

neyekê dibîne. Jixwe Smayîl jî vê hevkarîyê zûka vediqete û li ser karê xwe ê rojnamevanîyê dixebite û ev çend ji bo nêzbûna Cemşîd û Salar dibe fersend. Lê cihê Smayîl li ba Cemşîd herdem cuda ye. Di demên borî de gava berê riya Cemşîd û Smayîl careke din bi hev bikeve, ew ê Salar vederbikin. Lê Salar li hemberî vê vederkirinê jî dest ji wan nahêle û hema bêje bi heqaret û qewirînên wan jî qayîl e: "Smayîl tu dizanî ez û te bira û hevrê bûn, vêga tu bûyî rojnamevanekî naskirî û ez hîç im... qet jî ez nabim tiştê. Hemû nola berber û xizmetkar li min dinêrin, rast e ev pir nexweş e, lê min qebûl kiriye û zêde ji min re ne girîng e" (108). Li vê xakê jî ber tiştê ku bi dilrihetî û eşkere di derheqê xwe de îtiraf dike şerm nake, ji ber ku di asasê xwe de di derheqê wî kesê ku bi hezkirineke îdeal xwe pê ve girêdaye û bi dilşikestin jî wî vegeriyaye dipeyive. Ango gazinên wî sûcdarkirin in. Ew tiştên ku Salar derheqê xwe de dibêje bi heqîqet jî rast in ango mekanîzmeyek xwe-parastinê nînin. Freud, di gotara ku me li jor qala wê kiribû de heman çavdêriyê derdixê holê. Di wan analîzên ku li ser gelek nexweşên xwe ên melankolîk kiriye de vê rastiyê tîne zimên. Lê ew sebebên rewşên melankolîk ji ber ku li derhişê pêk tînin bi çarçoveyê esehî tu car xwe eşkere nakin. Ji ber vê çendê wexta Cemşîd Xan deh salan winda dibe Salar xan dê êşa xwe ya belasebeb bi vî awayî bîne zimên:

Bi giştî rewşê min hebû li ba hemûyan cihê gunepêhatinê bû. Her roj du saetan diçûm derve, li çayxaneyekê min çayek vedixwar û vedigeriyam malê, bi gelemperî tenê min li ezman dinêrî û hew... Min li ser balkonê kursiyek didanî û li ewr û stêrkan dinêrî û li benda wê yekê bûm rojekê Cemşîd li jor bibînim, ji xeynî çay û cixareyên li ser hev, tiştê min ê din nebû. Çend caran min dest bi nivîsîna kitabekê li ser jiyana wî kir, lê li hesabê min nedîçû. Gelek caran ji bo meş û guherandina hewayê diçûme bilindahiyên Baranok, li wir bi heftiyên di nav sirûştê de dimam, çend caran di nav daran de û li nav çiyayan digeriyam, van gerên şevê alîkarîya min kirin gelek xeyalên reş ji serê xwe derxim. Gelek şevan diçûme cihên herî bilind ên Baranok û min dixwest bifirim, min dixwest hema carek be jî wê jiyane bijîm ku Cemşîd xan tê de dijîya, hemû tiştî ji jor bibînim, jorhiyê ku rengê quretî û bêminetiyê dabû wî ku li ba min nebû. Li wan ben û şirîtan difikirîm ku min apê xwe bi wan bilind dikir, min hest dikir bi windabûna xan re, ez jî winda bûm, bi xeniqîna wî di deryayê de ez jî di nav pûçiya jiyane û sarîtiya tiştên sade û rojane de xeniqî me. Ew ben tena faktorên min bûn ji bo xwe girêdana bi ezman û gerdûn û tiştên dûr ve. Di wan deh salan de çend caran li jinanîne fikirîm û poşman bûm, çend caran li karkirinê fikirîm û poşman bûm, tenê bi wan pereyan dijîyam ku min ji Tirkiyê bi xwe re anîbûn, lê jiyana min weke jiyana rebenekî bû, min pir kêman dixwar, min pir kêman cilên nû dikirîm, ji bilî çay û cixareyan tiştê din di jiyana min de nebû. (100)



Di van gotinan de em dibînin ku nebûna Cemşîd, Salar bêbizav xistiye. Ji çavkaniya îtirafên derbarê xwebûna wî xuya ye ku pêgirêdayiyekî narsîstîk e. Hema bibêje tiştê ku li bin fikirîn, xeyal, xwestek û bêbizaviya wî de ve-şartîbûyîneke Cemşîd e ku ew quretî li jor gerdûnê temaşe dike. Bi rasterast jî ewên melankolîk ji bo ku xwe ji wê rewşê derbixin minêkar nînin. Ji ber vê çendê nayê zanîn ku ewên ji vê rewşê derdikevin kengî û çawa derketine. Da ku bê zanîn viya tiştê xwe li derhiş pê girêdayî bibe zanîn. Jixwe dawîya romanê ji ber ku Salar hevbûyînekî esehî li gel Cemşîd dike êdî ew jî xwe li ber bê nagire û yekem car di jiyana xwe de tiştê berkeftî dike û vê romanê dinivîse. Tê zanîn ku ev tiştê berkeftî jî xwesteka Cemşîd a herî mezin bû.

### Cemşîd: Di dualiya leheng de şîn û bîr

Bi hevgeradayina melankolî û şînê de têkiliyeke weke tirs û endîşeyê heye. Elisabeth Roudinesco di berhema xwe a bi navê *Her Şeye ve Herkese Karşı Lacan* (Li Hember Her Kesî û Her Tiştî Lacan) de tekiliya tirs û endîşeyê bi vî awayî tarîf dike: "Li dijî endîşeyê, hemû caran tiştê tirsê ku bi dest bê girtin heye. Mirov mûtleg jî tiştê ku dê bê serê xwe ditirse: mirin, veqetîn, îşkence, nexweşî, êşkêşan, seqetmayîn hwd. Ketina nav travmayê bi tiştê ku nayê tarîfkirin pêk tê. Ew ne tirs e ne jî endîşe ye. Ji ber ku zayîna wê bi talûkeyek bê tişt e, hewcedarî bi tu bendawariyê nîne. Ji ber vê çendê dibe ku bibe sebaba nevrozeke travmatîk" (64). Heman têkilî di navbeyna melankolî û şînê de jî heye û wexta Freud di gotara xwe a ku me li jor qal kiribû de behsa cudahiyên wan dike hema bibêje heman argumanê bi kar tîne. Şîn, li hember berzebûna kesên hezkirî, welat, azadî û wek tiştên îdeal reaksiyonek e. Di şînê de tiştê ku pêk tên li derhiş nînin rasterast li ser zemîna hiş pêk tên. Ji ber ku tiştê berzebûyî tê zanîn; ji bo ewê xemgîn nexwebûn, dinya pûç e. Bi vê agahî û çavkaniyê ve gava em li Cemşîd dinêrin em ê bibînin ku îşkenceya li ser laşê wî hatiye kirin wê bibe sedema firîna wî. Sedema windabûna hêvî, azadî, welatekî serbixwe û hemû tiştên ku bi bawerî xwe pê girêdaye jî keftinên wî ne. Ew, di bin îşkenceyê de bi tirseke giran hemû tiştên ku lê dibe giranî (yên şênber) diavêje. Lê tiştên bi serê wî tên li gor dîtina wî herdem jî sebêbên derî wî ne. Di xwebûna wî de guherîneke mezin pêk nayê. Ew heta dawiyê qure û serhişk e. Têgeha wî ya xwebûnê jî her dem baş e, sebêbên tiştên ku bi serê wî tên an Xweda an jî qedera xedar e. Yanî bi rasterast em dizanin çima Cemşîd di nav rewşeke weha çepûrast de ye. Li vê xakê pirsra girîng kevin holê? An jî şîna Cemşîd û bîra wî ya birîndar dema me temsîliyetên wî anîn li pêş çav bi çî awayî xwe nîşan didin? Gava me çeperên şînê fireh kirin û têkildarî û gihastinên wê di nav bîra civakî de vekolan wê heqîqeta bêhiş û bîra Cemşîd bêtir derkeve holê.

Paul Ricoeur di berhema xwe ya bi navê *Hafıza, Tarih, Unutuşe* (Bîr, Dîrok, Jibîrkirin) de, di beşa "Hafıza ve Anımsayış Üzerine" (Li Ser Bîr û Bîranîne)

de li ser şîn û melankoliyê û tekildariyên wan ên bi bîrhatî û bîra civakî de wiha dibêje:

Bi rastî jî ev meşaqeta bi tirsder re çî bibe bila ew be, ji bo mijara me girîngtir e ku em veşerî li hêla bîrê da ku hevtayîtiya (*equivalence*) wan rewşên patolojîk ku psîkanalîz pê mijûl dibe em di asta bîrê de bibînin. Duqutbiya ku bi nasnameya kesane û nasnameya ayîdê civatê pêk tê; heq dide me ku em analîzên Freud ên derbarê şînê di nav travmaya nasnameya kolektîf de berfireh bikin. Em dikarin him rasterast bi têgehên analîzê ve him jî bi têgehên dirûvandî ve behsa travmayên kolektîf û birîndariya bîrên kolektîf bikin. Ciyê ku objeya hatiye wendakirin rasterast firseta tetbîqê dibîne, jidestçûnên desthilatan, axan û xelkan e ku ev tişt gewdeyê dewletê ava dîkin. Bi îfadeyên keserê heta lihevhatinên tam ên li gel tiştê berzebûyî gelek cureyên libatên şînê, wê di kelijîna gelekî ku ji bo merasîmên cenazeyê kombûyî de bê dîtin. Bi vî awayî libatên şînê di navbeyna îfadeyên taybet û îfadeyên gelemperî de mînakeke girîng pêk tîne. (98)

Çî kolektîf be çî kesayetî be ji bo ku ji bin tesîra şînê bê derketin divê salwextek derbas bibe. Da ku kes an jî gel tiştê bi hezkirin xwe pê girêdaye bike bîrhatî. Lê astenga li pêşiya Cemşîd berzebûyîna bîrê ye. Tiştên berzebûyî kifş in: welat, azadî, ax, dewlet hwd. Lê weka Ricoeur di heman berheme de tîne zimên: "Bîra birîndar hemû caran ji ber tiştên berzekirî mecbûr e ku bi xwebûnê re rûbirû bimîne; heta ku berzebûn tam navxweyî nebe veberhênanên (investment) libîdo ku xwe bi tiştên windabûyî ve girêdaye nayê terikandin" (99). Cemşîd jî herdem bi xwebûna xwe re rûbirû dimîne. Lê ketinên wî yên car li dû carê nahêle şînê ji ser xwe biavêje û bike bîrhatî. Heger em temsîliyeta Cemşîd a kurdayetî li pêş çav bigirin û çavdêriyekê li ser dîroka kurdan bikin, em ê bibînin tu sal nînin ku bê şer û qetlîamek giran borîbe. Ji ber vê çendê xwesteka şînê ya wext derbasbûyîne bi tu qaîdeyan pêk nayê û şîn dide dû şînê. Jixwe em li vê xakê travmaya Cemşîd bi îşkenceya ku tê serê wî girênadin. Îşkence dibe sedemê firîna wî ya nesirûştî. Di sazûyîna bîra wî de şopên sehma civakî beriya girtina wî cih girtine. Ji ber vê çendê di her ketina wî ya li ser rûyê erdê de xeyalekî din derdikeve holê: "gelek carên din jî gava ba Cemşîd dibe, hema ku digihê ser erdê tiştê wî ye girîng diguhere û xeyaleke wî ya kûr û dûr şîn dibe, car li dû carê jî û bi her ketineke wî re beşekî bîranînen wî winda dibin û hinekî din kaltir û kaltir dibin." (12). Ango şînen di nav nasnameya kolektîf de cih girtine dê her carekê wî ber bi macerayêke din ve lêdin. Ew travmaya di kûrahiyên bîrê de veşartî li benda felatê ne lê di her ketinê de pêşberî windabûneke din tên û fersendê nade ku libîdo tişte ku bi hezkirin xwe pê girêdaye terk bike û xwe bi tiştê din ve girêbide. Ji ber vê ew axa ku Cemşîd tê de bîrên xwe sazkerîye tu awayî destûr nadê ku şînê ji ser xwe biavêje û dawiyê çareya saxbûna wî dê bibe welatekî ji hemû awayan li dûrî "jidestçûnên" wî; ciyekî weke bihuştê.



## Encam

Tê dîtin ku nasnameya kesayetî bi rewşên melankolîk, bi aliyê Salar ve, nasnameya ayidî civatê jî bi rewşên şînê bi aliyê Cemşîd ve xwe nîşanî me dide. Jixwe vê dualiyê di nav rastiya roman û temsîliyetên wan de jî hev-girtiye. Tiştê ku Salar wê ji bo xwe bike nasnameyek berçav û bi hezkirin pêgirêdayiyê Cemşîd e, lê Cemşîd tu car rû nade wî û hebûna wî ya nesirûştî wê bibe astenga herî mezin. Gava Cemşîd bi temamî jê dûr bikeve-ango astengkirin (inhibition) ji navbeynê derkeve- ew edî dê bikaribe hevbûyînekê pêk bîne. Dawiya romanê dê bo wî jî bibe talûkeya herî mezin. Ji ber ku ew edî Cemşîd e. Li aliyê din Cemşîd bi nasnameya ayidî civatê ve libatên şînê berpêşî me dike. Sehma "berzebûnên" civakî dibe sedema bîreke birîndar û hewldanên wî yên felatê bê bersiv dimînin. Heger bikarîbûya şûna wan berzebûnan bi dewlet, azadî û bi merasîmên qutsî dagirta, dê ji bin tesîra şîna xwe ya çepûrast xelasbûbûya. Lê di her ketina li dû fira xwe de dê pêşbazî travmayeke ku li ser bîra wî bûye giranî bê. Ji ber vê çendê jî xilasbûna wî dê bibe cihekî ku ji hemû aliyên ve ji civak û bîrhatiyên wê dûr e. Weke zayîne-ke nû li ser axeke îdeal.

## Çavkanî

Elî, Bextiyar. *Apê Min Cemşîd Xan Ku Hertim Bê Ew Li Ber Xwe Dibir*, ji soranî.

Besam

Mistefa, Stenbol: *Weşanên Avesta*, 2012.

Freud, Sigmund. *Metapsikoloji*, wer. Dr. Emre Kapkın, Ayşen Tekşen Kapkın. Stenbol:

*Weşanên Payel*, 2002.

Horkheimer, Max. *Akil Tutulması*, wer. bo tirkî. Orhan Koçak, Stenbol: *Weşanên Metis*: 2002.

Ricoeur, Paul. *Hafiza, Tarih, Unutuş*, wer. bo tirkî. M.Emin Ozcan, Stenbol: *Weşanên Metis*, 2012.

Roudinesco, Elisabeth. *Her Şeye ve Herkese Karşı Lacan*, wer. bo tirkî: Nemi Başer. Stenbol:

*Weşanên Metis*, 2012.

Todorov, Tzvetan. *Fantastik*, wer. bo tirkî. Nedret Öztokat, Stenbol: *Weşanên Metis*, 2012.

RASTIYA VEŞARTÎ YA XWEDAYEKÎ KOLONİYAL  
LI SER ORYANTALÎZMA EDWARD SAID Û  
GOTINÊN GUNEHKARA  
HESENÊ METÊ HIN RAMAN

Joanna Bocheńska

Dema ku meriv bi riwangeya postkolonyal li tîkiliyên nav Rojhilat û Rojava (an jî bi gotineke çêtir kirde û biresera siyaseta kolonîkirinê) bifikire, meriv dikare têbigihê ku bêbaweriya navbera nûnerên her du aliyên bi piranî jî qinyateke kûr diqewime; li gor wê qinyatê, ku ji her du aliyên yek li dijî yê din tevgerê çewt bike, ew wê tevgerê mexsûs dike da ku zirarê bide aliyê din. Ew gelek caran wek "kuştina pîlankirî" tê dîtin ku mexsedên wê bi tenê bidestxistin, hukimkirin û bikaranîn bû. Piştî ewqas salên ku bi tîkiliyên curbicur yên ku li ser îstismar, serhildan û gelek awayên hevkarîyê yên xumamî ava bûbûn, bi rastî jî zor e ku meriv ji bo tîgihîştina hevpar zemîneke nêtar (neutral) peyde bike. Û gelo bi rastî bêjeya "nêtar" bi tîra xwe guncan e ji bo zemîneke bawerbar ku bo siberojê tîkiliyên baştir biafirîne? Ez dixwazim di gotara xwe de li ser du pirtûkan bisekinim. Yek jê *Oryantalîzma* (1978) Edward Said e ku pir navdar e, a din jî *Gotinên Gunehkara Hesenê Metê* ye ku li Rojava pir hindik tê naskirin (lê di heman demê de li nav nivîskar û rewşenbîrên kurd tê ecibandin). Ev berawirdkirin, tevî ku ewilî seyr xuya bibe jî, dikare ji bo xerabiya kolonyal a aloz tîgihîştineke kûrtir bide me ku em wê di peywendêke firehtir a felsefî, metafîzîk û etîkê de bibînin.

*Oryantalîzma* Edward Said piştî ku di 1978an de çap bû, bi dehsalan hat xwendin û hîn jî tê xwendin bi wê azweriya xwe ya xurt ku dil dike ku paşxaneyê neyînî ya helwesta Rojava ya li hember Rojhilat derxe holê. Xuya ye Said li her derê bi pey şopa vê yekê ketiye, heta bi serdema antîk. Ligel vê yekê ew, projeya bilindkirina mantiq û zanîne, ya Ronakbûnê ye ku bala wî lê asê bûbû û tîra xwe ji tîgehên Michael Foucault sîd werdigirt. Ez ramanên Said ên li ser berpêbûyînen (approach) kaşifên Rojavayî bînim bîra we. Em dipirsin bê paşxaneyê me ya modern bi rastî çî bû û divê çî be derbarê elaqeya me ya li aliyekî li hember Rojhilat, li aliyê din jî li hember Rojava? Gelo divê bi tenê xwe bispêre zanîna "nêtar", an jî zanîna qaşo



"bêali"? An gelo divê jêwêdetir here, çi bi maneya erênî çi bi ya neyînî bêyî ku ji bandora tiştinan bitirse?

Li gor Said hewce ye ku Oryantalîzm wek rabêjekêbê vekolan, ku wê kiriye ku zanisteke xweser derkeve holê. Armanca wê birêvebirin û heta bipêşxistina Şerqê bû da ku li ser wê hukim bike, wê ji nû ve saz bike û bibe desthilatdarê wê<sup>1</sup>. Saidê ku "peywirên veşartî" yên zenkirî (supposed) yên oryantalistên bijarte keşif kir, diyar dikir ku binecihên Rojhilat wek aferîdeyên reben tên dîtin, ên ku nikarin bi hiş û mantiq bifikirin. Lewma pirsra ku derdiket holê bi tenê ev bû, tevî têngihîştina hemû sînorên wê "dê nîjada kirde çawa bê memnûnkirin" (Cromer)<sup>2</sup>. Balkêş e li gor Balfourê ku Said ji wî girtiye, maneya yêndinbûnê ev e: cudabûn an dûrbûna ji objeya vekolandinê, nemayîna di bin bandora objeyê de. Ji xeynî vê yekê keşifkirina şaristanîya din, bi wê qinyata xurt ku zanyarekî Rojavayî dikare wisa bike, ji hêla daxwaza bidestxistina kokên wê dihat birêvebirin. Analîzkirina Şerqê xwe dispart baweriya ku ew xwedîya xwezayêke neguherbar e; ku li gorî fikirîna analîtîk a rojavayî, ev yek rastiyeke hêsan bû ku divê bê qebûl kirin.<sup>3</sup>

Hemû ramanên behskirî bingeha projeya zanîna modern pir baş nîşan didin. Ji bo zanîyê, yekane pîvana rewşa fikirîna mirov û ew behremendiya wî ye ku bi riya mantiqê tiştan bi dest dixê. Dûrbûna ji hestan, hestyariyê û sêbjektîviyê ji bo avakirina zemîneke pêbawer ya zanîna mirovan wek şensa tekane xuya bû. Ji ber vê yekê nemayîna li bin bandora objeyê, ji bo her cure analîzên guncan ewqas girîng bû û pêdiviya bi objektîviyê hema bêje kakila hemû projeyên perwerdehiyê pêk aniye. Di projeyêke wisa de tiştta ku bû armanca sereke ya lêkolînê zanîn bû (helbet ku em aliyê berjewendperest û rastiya ku zanîneke wisa di demeke kin de bû xizmetkarekî pir hêsan ê hêzê li ber çavan negirin). Ew bi gelek dîtinên din ên zanîne re jîdikeve nav nakokiyê; yên wek Yewnana klasîk, kevneşopiya xirîstiyaniyê û îslamê; ku li gorî wan zanîn mijara bastûreke (structure) bêtir komplîke bû ku bi felsefe, teolojî û etîkê re girêdayî bû. Di peywendêke wisa de hînbûna tiştinan ji mexsedinan ne azade bû, tiştta ku di lêkolînê de jî rol digirt etîk bû. Helbet etîk jî tu carî ne xwedîya damezrankeke (construction) neguherbar, yekcure û bêşaşî ye. Dema ku etîk, bû hêmana zanîna modern an jî bi tenê bû qada analîz û senifandinê, wê maneya xwe ya sereke wenda kir, ku ev manenîşandana riyên "ji hêla exlaqî wêrebûn"ê<sup>4</sup> bû.

Bêyî ku zêde têkevim nav nîqaşên berfireh û cihêreng yên derbarê hişbînî (cognition), zanîn û etîkê, ez dixwazim dîsa bipirsim bê meriv dikare projeya Oryantalîzmê wek "kuştina pîlankirî" a ku bivênevê tenê bi hêzê re têkildar bibîne an na? Û ji bo zanîne pîvana objektîviyê bi rastî jî tekane

1 Edward Said, *Orientalism*, Penguin Books, London 2003, rp. 3

2 Ibidem, rp. 32

3 Ibidem, rp. 32

4 Jacek Filek, *Filozofia jako etyka*, Znak, Krakow 2001, rp. 15

bingeha pêkan e gelo? Ew dihêle ku meriv ji "armancên veşartî" yên lêkolîne vekêşe an jî esas wan veşêre?

Wisa xuya ye tevî daxwaza xwe ya azwer a bo eşkerekirina "rastiyên veşartî" ku sebeba sîc bû ne ya xelasiyê, Said bi temamî qanîh nebûye ku oryantâlîzm "kuştina pîlankirî" bû. Ne wisa bûya, wî yê dilsoziya xwe ya seraqet dubare nekira, dilsoziya ji bo hêvî û qinyata kûr ku ew ne vekolana (scrutiny) "nêtar" ameseleyê ye ku divê lêkolînê û pêvajoya keşifkirina Yêndin (Others) bi rê ve bibe.

Wê balkêş be ku meriv li hin xalên axaftina Balfour binêre, ya ku Said jê girtibû. Ger em li ser niyeta ku axaftina wî bi rê ve dibe bifikirin, esas em ê wê wek tiştêkî "baş" bibînin. Ew birina ronakbûnê, xwe-rêvebirinê û jiyanêke çêtir e heta "bêyî ku tu minêkariyê" ji Şerqê bipêş. Yanî li vir tiştta ku feraseta kolonyal bi rê ve dibe, ne tenê niyeta xerab e. Tiştta ku Said di projeya xwe de destnîşan dike, ji tunebûna riwangeya Şerqî û ji tunebûna Şerqê bi xwe wêdetir e. Zanîna ku feraseta Balfour bi rê ve dibe heta tu bibêjî bes ji xwe-bawer e û bi tu muxataban re eleqedar nabe, wan nabihîze, an jî qet nebe destûra axaftinê jî nade wan. Lê belê tiştta ku rê li ber serencameke bi vî awayî vedike, ne tunebûna zanîne ye. Axaftina wî maqûl e, mantiqî ye, xwe dispêre hin qinyatan ku di dema wî de berdestû berbelav bûn. Said dikare wî rexne bike, lê belê *Oryantalîzma* wî bi xwe jî ne tiştêkî jê zêdetir e; bi tenê danheviyeke (compilation) din a sofistîketir a raman û teoriyan e ku ji ber kok û xebatên wî, ji bo bîrmendekî amerîkî-filîstînî yê nivê sedsala 20. berdest bûn. Heger wî berpêbûyînen hin kaşifên polonî yên li hember Yêndin li ber çavan girtibûya wê çi qewimîbûya, berpêbûyînen ku ne tenê li ser esasê zanîna şerqî ya berdest lê herwiha li ser esasê tecrûbeyê wan a dagirbûnê û bi salan di hêsîriyê de biçûkkinê. Em dikarin lêkolînên August Zaba (Jaba) û Aleksander Chodzko yên li ser kurdan mînak bidin, lê herwiha em dikarin mînaka bibandor a bisîkletgerê yekem ê polonî Kazimierz Nowak jî bidin; ku li temamê Efrîkayê geriya, di 1930an de rapor girtin û ew rapor di 2008an de wek pirtûk hatin çapkirin<sup>5</sup>. Ew mînakên baş, nîşan didin ku di rastiye de îd-raqa navdar a rojavayî ya li hember Rojhilat û Yêndin pir curbicur bû. Helbet bidestxistina van agahiyan ji bo Said ne pir hêsan bû, lê dîsa jî ew hinek maf dide min ku ji wî re bibêjim "nezanekî qestî". Ev ne razek e ku daxwaza wî ya eşkerekirina "rastiyên veşartî" yên li paş oryantâlîzmê û "hêzên kolonyal", eşkerekirina "rastiyên veşartî" re li ser heman bingehî ye. Ew bijarker (selective) e, hewl dide ku medê têxe navbera kirdeya ku tê analîzkirin û bêyî ku Rojhilat li bin roniyeke guncan bibîne hewl dide ku hemû sînorên "Rojavayiyên reben" fam bike. Bi ser de jî bi baweriya ku ew dikare vê yekê bike, bi pey koka têkiliyên Rojhilat-Rojava dikeve. Heçî kaşifên bi baweriyeke wisa xwedî paşxaneyêke derûnî ya tendurist e gelo? Bi rastî dê lêkolînên me hemûyan her tim bijarker

5 Said, rp. 32-33

6 Kazimierz Nowak, *Rowerem i pieszo przez czarny ląd. Listy z podróży afrykańskiej z lat 1931-1936*, Sorus, Poznań 2008



bin û wê têkevin xefka tecrûbeyên me bi xwe, ku em bikarin wan rexne bikin jî. Tiştê ku divê bê guhertin ne zanîn e; bingeha wê ye, armanca elaqeya li mirovan e ku her tim efekta dawîn dide lêkolînê, wê ber bi pirsînê nû an jî beyanînê klîşe dibe. Esas 'bêparbûna ji "bijarkerbûn"ê ya bivênevê' garantiya herî baş e ji bo kaşifên siberojê ku dikarin cih û qadên paşguhkirî keşif bikin. Lê belê ku em *Oryantalîzmê* bi baldarî bixwînin, em dikarin fam bikin ku tevî beyankirina Said, tiştê ku divê bê guhertin ne zanîn e; lê helwesta etik a li ber mijara lêkolînê ye. Û ev yek, ramana pir girîng e ku rasterast nayê beyankirin lê ji nav pirtûkê der dibe. Ew ne vekolana bêalî û sar e lê jê zêdetir nêrîneke hestdar a hewce ye. Wek encamekê, pirsê girîng ku hiltê ev e: divê berpêbûyîna li Yêndin çi be yê ku "nizanin bi wan hemû tiştên pir girîng ên ku em bi wan dizanin", lê herwiha, çi Yêndinbûna Oryantal çi jî ya Oksîdental? Helbûkî berovajî tiştê ku her tim tê gotin, li vir tiştê herî balkêş ne "xweşbînî", lê helwesta me bi xwe ya li hember zanînê ye.

Di demên modern de, piştî ku mirina Xwedê ji hêla Friedrich Nietzsche hat îlankirin, zanîn û xuyana wê ya çewt lê cazîb (ku ancaq bi zorê em dikarin wan ji hev veqetînin), bû pîroziya nû ku pê bê perestî. Her tişt jî hêla "zanîna guncan" ve tê ravekirin û rewakirin. Mirov dê wê bi mirina bi gotîneke çêtir bi kuştina Xwedê<sup>7</sup> ve girê bidin, lê ez dixwazim wê adeta mirovan a nemir destnîşan bikim; ev adet'car bi car da ku bi wan bê perestî bi nav û sernavên cuda "hilberandina Xwedayên nû" ye. Ev yek wek sedema sereke xuya dibe, ya li paş sêdarkirina "kuştina pîlankirî" ya oryantal-kolonyal û wekî ku ji hêla filozofê Polonî Jacek Filek ve tê dupatkirin, meriv dikare wê li bin ronahiya xuyana çewt a qencyê fam bike. Herwiha di peywenda xebatên kurdî de, bi prîzma pirtûka Hesênê Metê û bi raman û çîroka wê ya piçekî berovajî jî bê pêşkêşkirin, wê pir kêrhatî be. Bi sêdwergirtina ji wêjeya kurdî (Ehmedê Xanî) û kevneşopiyên dînî (êzdayetî), Metê hewl dide ku sedema herî ewil a xerabiyê û bedbextiya mirovan fam bike. Ramana wî ji bo *Gotinên Gunehkar* dikare ji bo pirsên Said bibe mînakeke baş a wêjeyî, ku ewil di 2007an de ji hêla weşanxaneyê Avestayê li Stenbolê, paşê jî di 2008an de ji hêla Apecê li Stokholmê hat çapkirin. Li destpêka pirtûkê wecîzeyê manedar a Muhiyeddin îbn Arabî heye: "Li gel ku ez Wî înkâr dikim, ew bi min dizane û ez bi Wî dizanim"<sup>8</sup>.

Çîrok, çîrokeke ber bi rabirdûyê ve ye. Behram, figurê sereke û vebêjer, li bajarokê "E"yê dijî, tevî ku ne zelal e jî em dikarin texmîn bikin ku li Kurdistanê ye. Em vê yekê texmîn dikin ji zimanê ku tê axaftin û hin bûyerên dîrokî yê di çîrokê de qalkirî yê têkildarî dîroka Kurdistanê. Du gundên din jî hene ku qala wan dibe. Ê ewil gundê Kawaşê yê Wanê ye ku Behram jê hatiye û yê din jî gundê Argon e ku bûyerên pirtûkê lê diqewimin. Herwiha Behram ta li destpêkê beyan dika ku ji bo wî dana agahiyên bikitekit ên derbarê koka wî ne girîng e, ji ber ku ev yek ji bo "hebûna rast" bêkêr e.

<sup>7</sup> J. Filek, rp.293

<sup>8</sup> Hesênê Metê, *Gotinên gunehkar*, Apec Förlag, Stokholm 2008, rp. 6

Ew xwendekarê dibistaneke îlahiyatê ye û misilmanekî dilsoz e. Ew dibêje hîs dika ku "Xwedê ji bo Xwe mirov afirandiye" da ku ji "Xwedê hez bikin". Herwiha Xwedê wek "zarokekî ku mimkun e ku bi hêsaniyê dilê wî bimîne" dibîne. Wexta ku wî,ew zilamê nenas li mizgeftê dît, jiyana wî guherî. Behram wî wek zilamekî baş îdraq dika ku tenê bi xêra vîna Xwedê ew nas kiriye. Lûlû, navê kesê biyanî ev e, ji bo ku bi kirê bidê daîreyekê pêşniyazî wî dika û wî vedixwîne gundê xwe (Argon) cihê ku ew bi jina xwe û du zarokên xwe lê dijî. Behram rojê payizê biryar dide ku biçê wir. Ew bi xweşikiya Argonê û bi henûniya Lûlû û jina wî Geştînayêkêfxweş dibe. Gava ku çav li marê li malê razayî dikeve bi awayekî nepayî pir zêde dibehite. Gava ku hewl dide ku wî bikuje, him Lûlû him jî Geştîna nahêlin û jê re dibêjin ku mar, "marê mal" a wan e. Li gorî îslamê mar sembola xerabiyê ne. Lê wisa xuya dika ku gotinên Behram ne xema Geştîna û mêrê wê ne. Li wir cara ewil Metê dilsoziya wan a xurt a bi kevneşopîya êzdayetiyê re berpêş dika, ku tede mar xwedîqedr e û bi wî tê perestî. Geştîna, ji Behram re çîroka bavê xwe Mokrûs vedibêje, yê ku dema vedana bîrekê kûzekî tije zêr dîtibû û dûre mar parastibû û xwarin dabûyê. Li gor gotinên bavê Geştînayê ev yek bi xêra awira nas a mar pêk hatibû ku "hîsa ku ew, mar ji derekê nas dika" pêre çêkiribû.

Behram bi Lûlû û Geştînayê re diçe nav rezên wan ên li çiyayê bilind. Ew li ser rê hin peykerên awarte dibîne ku atmosfera nepen a çîrokê kûrtir dikin. Paşê Lûlû û Geştîna goleke tehtan nîşanî wî didin, yeka ku bi awayê amfi-teatrekê bi kevîrên qorqor pêçayî ye. Li gorî efsaneyekê berê perî dihatin li vê golê serê xwe dişuştin û carinan jî soberî dikirin û mêran ji dereke veşartî bi dizî li wan dinêrin. Behram hîn dibe ku du zarokên Geştîna û Lûlû hene. Navên wan Nagîna û Aryan in. Her ku diçe Behram dil dikeve Nagînayê lê wek misilmanekî xwendekarê *medreseyê* ji ber van hîsên xwe fedî dika û hewl dide ku xwe ji wan xelas bike. Behram, hevalên xwe yê nû dihêle û dimeşe. Li gola tehtan vedigere, xwe li cihê vedîşêre û di nav mitaleyan de wenda dibe. Ji nişkê ve, bi hebûna Nagînayê dihise. Nagîna di golê de serê xwe dişo. Bi dizî dest bi raçavkirina wê dika. Ne zelal e bê ew xewn e ya rastî ye. Nagîna wî nas dika û hemû xweşikiya bedena xwe ya tazî nîşanî wî dide. Behram dide dû wê ber bi çiyana ve, cihê ku evîna wan lê pêk tê. Dûre bi hev re diçin bin dara mezin û Nagîna li wir ji nişkê ve ji ber çavan wenda dibe. Behram pêrgî Mokrûs tê û jêre dibêje ku ew "ji Xwedê bêtir ji Nagînayê hez dika". Mokrûs jêre dibêje ku navê wê yê rast Demora ye û ji bo ku wê bibîne divê bide dû wî ber bi *ehl-i malê* ve. Li wir ew, Nagîna-Demorayê razayî (an jî divê bide dû wî ber bi *ehl-i malê* ve. Li wir ew, Nagîna-Demorayê razayî (an jî mirî) dibîne û ji bo rêwîtiya xwe bidomîne divê ku li piştê hespekî reş siwar bibe. Mokrûs jêre dibêje ku ew hespê Mîrê Mezin e ku di xirîstiyaniyê û îslamê de jêre Şeytan tê gotin. Lê belê, di êzdiyatîyê de ew figurê sereke ye û navê wî Melekê Tawis e. Behram ber bi Mîrê Mezin dihere da ku "temamê ras-tiyê" hîn bibe. Rêwîtiya wî manedar e û bi awayekî berovajî paralelî Mîracatîyê" hîn bibe. Rêwîtiya wî manedar e û bi awayekî berovajî paralelî Mîracatîyê Mûhemed e, ya ji bo dîtina Xwedê li bihuştê. Lê di çîroka Metê de rêwîti jî



bo Melekê Ketî ye, ne ji bo Xwedayê ku pê tê perestin û wek kana zanîn û rastiye tê dîtin. Ew dikare wek niyeta nivîskêr ya bo eşkerekirina aliyên tarî yên ruhê mirov jî bê xwendin, ku ev yek di gelek roman û kurteçîrokên wî de xuya dibe.

Mîrê Mezin (ligel vî navî wek Ahrîman jî tê binavkirin di çîrokê de, ku bibîrxistineke eşkere ya kevneşopiya Zerdeştîyê ye jî) ji wî re wersiyona xwe dibêje, ya bûyerên ku rê li ber pevçûna wî û Xwedê vekir. Ew, derbareyê afirandina mirovan li ber Xwedê rabûbû; ji ber ku li gor wî fikra Xwedê ya 'çêkirina mirovan ji axê' ne fikreke rast û baş bû. Sebeba sereke ew niyeta Xwedê bû ku li gorî Ahrîman bi tenê hewesek bû. Xweda xwestibû ku aferîdeyekî pir qelstir çêke da ku bikare raserî wî be. Wê mirov karîbûya hemû navên Xwedê hîn bibûya ji xeynî yekî, ku ew Rastî bû û di heman demê de raza herî mezin bû. Li gorî Ahrîman afirandina 'mîrovên ku wê nizanîbûna bê çima hatine afirandin' pir xetere û neheqî bû. Herwiha wê bikira ku mirov jî hev îstismar bikin. Lewma Mîrê Mezin xwestibû ku vê sebebê ji mirovan re eşkere bike. Ahrîman xwestibû ku mirov ji dara zanîne hînî maneya Rastiye bibin. Wek encamekê dema ku ew bi tazîtiya hev û cudahiya hev a zayendî hisiyabûn, wan fedî kiribû. Xweda têgîhabû ku Ahrîman mafdar bû, lewma biryar dabû ku wî bi her tiştî tawanbar bike. Herwiha, Xweda jî ji afirandina mirovan poşman bûbû û erd terikand û ew di halê wan de hişt. Tekane şahidê Ahrîman Bayê Kur bû, wî biryar dabû ku bê pirtûk û pêxember be. Wî rojekê ji Xwedê xwestibû ku dakeve erdê û hemû êşa mirovan hîs bike û bijî. Xwedê qebûl kiribû û wek Îsa lawê Meryem çêbûbû. Lê ji ber ku ew li çarmîxê ketibû wî Ahrîman bi xapandinê tawanbar kiribû. Fikra wêjeyî ya nivîskarê kurd, ew e ku gotinên Îsa "lema sabachtani" (te çima ez terikandim?) ne ji Xwedê re bûn (ji ber ku ew Xwedê bi xwe bû) lê ji Ahrîman re bûn.

Di dawîya çîrokê de Behram li rastiye vedigere. Dibe ku serpehatiyên wî wek xewnekê bîn dîtin; ji ber ku jê re tê gotin heta ku her tiştî dest bi guherînê kir ew bi derba kevîrekî li erdê dirêj kirî bû. Marek, bi keça Lûlû û Geştînayê vedide û keçik dimire. Birayê wê Aryan, agir bi xwe dixê û xwe dikuje. Berî wê, dibêje 'min tu carî tercîh nekiribû ku ji dayik bibim û tekane rêya derketina li dijî vê yekê xweşewitandin e da ku dîsa "meriv neyê dinyayê". Behram dibe "mêrekî bêdîn", an jî bi gotineke din yekî ku "bi qasî hev ji Xwedê û Şeytên hez û nefret dike". Lê belê, tişta ku maneyê tîne jiyana wî ya biêş, evîna wî ya Nagîna- Demorayê ye, ku ew wê ji evîna xwe ya Xwedê mezintir dibîne.

Çîroka Hesênê Metê ji ber gelek sebebên girîng e. Motîfên dînî, kokên wan û awayê bikaranîna wan a di pirtûkê de helbet dikarin bîn nîqaşkirin. Lê belê wexta ku em li wêjeyê bifikirin ku her tim mijara xeyalkirinê ye, ev jî bo wê ne pirsgirêka sereke ye ku li ser bê axaftin. Di çîrokê de gelek motîfên cuda hene ku dikarin ji hêla xwîneran bîn eşkerekirin, rexnekirin an jî ji nû

<sup>9</sup> Di Încîlê de du versiyonên van gotinên Îsa hene bi zimanê Aramî: *Eli, Eli, lema sabachthani* (Mt 27,46) û *Eloi eloi lema sabachthani* (Mk 15,34)

ve bîn vekolîn. Xala bîngêhîn ku ez dixwazim dupat bikim figûra Xwedê û fikra wî ya 'bi tenê ji bo xwe afirandina mirovan' e. Ev hewesa xwedbîn tê girêdan bi hîsa serdestiya li ser mirovan û bi xeyala ku hinek bibin heyranên wî û bi wî biperesin. Ev yek di fikrên Behram ên li ser çîroka Ahrîman pir baş xuya dibe:

Cenabê Ahrîman serpehatiya xwe û Xwedê welê ji min re vedibêje û di-sekine. Serwext dibim ku di destpêkê de çewtiyek çêbûye. Ew çewtî bûye nakokî û heta îro jî di nava wan de bûye qayîşeke şer. Lê ne bi çêyî, ne jî bi xirabî li ser vê yekê ez gotinekê jî nabêjim. Ez xwe wek hêz û hêjayî alîgiriya yekî ji wan nabînim. Loma tiştêkî nabêjim. Lê ez baştir têdigêhîjim ku nefsa meziniyê nexweşiyêke jî demên pêşîn e.<sup>10</sup>

Li gorî fikra Metê *nefsa meziniyê* ya Xwedê sebeb û jêderka xerabiyê ye. Ew heta wek sebeba afirandina mirov jî xuya dibe, bi tenê da ku yekî li gor wî qelstir hebe. Xwedayê ku ji hêla Metê tê pêşkêşkirin, baweriyê nade mirovan lê wan ditirsîne. Ew, dinyayê diterikîne û guh nade êş û azara mirovan. Balkêş e, ev fikra wêjeyî dibe ya herî hevgir bo têgîhîştina "xwedayê kolonyal" yê ji hêla fatîhên Rojavayîpesinandî, her wekî ku Said jî wisa fam kiribû. Em dikarin dîsa bipirsîn bê ji bo tawanbarkirina "kuştina pîlankirî", pesinandina Xwedayekî wisa dikare bibe ravekirineke baş ya na? Rastiya wê ya veşartî, şehweta wê ye ku dixwaze bête hezkirin û heyranman. Zanîn, teknoloji û behremendiyên wî, ne tiştêkî zêdetir in; lê afrodizyakeke sofistîke ya bo mirovan e ku ew him muhtacî wan e û him jî dixwaze wan biçûk bixe da ku serdestiya xwe pesend bike. Xuya dike ku Xwedayekî wisa zêde "zana" ye ku dîr û laqayt dimîne. Tiştên ku herî pir tîne înkarkirin û ji bînahiya hişmendiyê tîne veşartin, hîs û pêdiviya kûr a bi Yêndin e. Dema ku Behram evîna xwe ya bo Nagînayê wek tekane sebeba rasta hebûnê beyan dike, ev fikir bi awayekî xurt tê dupatkirin. Hezkirin, ji bo hesreta hezkirinêdibe çareya yekane. Serdestiya Xwedê bi fikra evîna Xwedê re cih diguhere, ev yek ji kûraniya çanda kurdî tê ku di bîngêhê wê de deqên pîroz ên êzdiyan û mesnewiya Ehmedê Xanî *Mem û Zîn* heye. Ji ber ku wecîzeyî ku Xwedê red dikir di serî de bîyî tu lêpirsînê hatiye pejrandin, dikare wek 'hilatina gumanan a ji nav rasteqîniya li ser norm û baweriyên bînîqaş' bê famkirin. Li gor Metê, ev bi awayekî paradoksîk rêya ji bo dîtina "Xwedayê guncan" an bi gotineke çêtir "nirxê guncan" ku pê bê perestin, vedike ne ku digire. Ez qewî bawer dikim ku ev yek di *Oryantalîzmê* de fikra veşartî ya Said jî bû, bi kederê û hêrsê tije lê ji hêvî û îmanê ne bêpar.

Bi xwendina her du pirtûkan bi çarçoveya realîteya me ya postkolonyal a pirrehend a gelek welatên cuda û dîroka wan a cuda, me divê ku ne li avakirina zanîneke nû; lê ji bo zanîne li avakirina bîngêhên guncantir û zexmtir bifikirin, ku tede hezkirina bo Yêndin wek hîsinî kawik û súbjektîf ên bi tenê li gor aferîdeyên qels neyê dîtin; lê belê wek nirxa sereke ya maneyêke kûr,

<sup>10</sup> H. Metê, rp. 147



berfireh û cihêreng bê dîtin. Xuya ye, kevneşopiya wêjeya Kurdî ya biçûk lê dewlemend, ji bo têgihîştina herî kûr a derbareyê ramanên Xweda-Hez-kirinê, dibe yek ji jêderkên herî mezin. Wekî ku Metê nîşan kiriye sînorên piştguhkirin û vekolana dûr û nêtar derbas dike, lê ev yek ebeden nayê wê maneyê ku şopînerê kor û hestiyar ê ramanekê an teoriyekê ye. Ji vekolaneke sar bêtir, bi rêbazên vekirî yên dînamîk, guherbar ên nêrîneke hestdar, li ser mirovên ku wê dişopînin hûr dibe.

Ev nivîsa Joanna Bocheńskayê di çarçoveya projeya lêkolînî ya bi navê „Deng çawa tê bihîstin. Berdewamî û guherîna çand û realîteya civakî ya kurd di perspektîfên postkolonyal de” (www.kurdishstudies.pl) hat nivîsandin ya ku Navenda Zanistî ya Dewleta Polonyayê bi biryara DEC-2012/05/E/HS2/03779 ew ji bo finanskirinê qebûl kiriye.

ji îngilîzî: Umran Aran

## SERBORIYA KÊMNIVÎSKARIYA LEHENGEKÎ: ÊŞ Û AZARA (NE)NIVÎSANDINÊ

Mîrza Baran

### Destpêk

Wêje çavkaniya xwe ne tenê ji jiyana û tecrûbeyên takekesî û civakî, belam di heman katê de ji kûrahiya giyanî jî digire û bi şêwaz û formeke estetîk xwe digihîne ber xwînerên xwe yên ku bi saya pirtûkan cîhana xwe dixemilînin û dewlemendtir dikin. Ji ber hindê ye, her berhemeke wêjeyî, çi çê çi neçê, kêm zêde rastiyên jiyana cûrbicûr radixîne ber çavên me xwîneran. Hingê jî şîrovekirina van berhemana bo me wek pêdiviyekê dixuye da ku em bikarin rastiyê peyda bikin ku em tim li pey van berhemana li wê digerin. Di nav wan tecrûbe û azmûnên mirovan de ne tenê bi şahî, kêfxweşî û şadî heye, lê pê re jî jan, keser, êş û kêmasiyên kûr jî xwe didin ber ku ew jî car caran dibin çavkaniya êşên dijwar ku bêhna mirovan diçikînin. Di vê nivîsa xwe de ez ê li ser kêmasiyekê bisekinim ku ew ji bo gelek nivîskaran bûye û hêj jî dibe kaniya êş û azarê: (ne)nivîsandin.

Berhemên wêjeyî dikarin bibin objeyên gelek xwendinên cihê û ji her xwendinekê ve wateyê cuda derdikeve, lewma tiştên ku em ê li vir qalê bikin nayên wateya ku ew hemû jî ji sedî sed rast in, yanê wekî her şîroveyekê ev jî di nav xwe de şîroveya rexnegirî dihewîne, lê dîsa jî tevî vê yekê, bando-ra bûyer û kirinên lehengan û paşxaneyên civatê jî li van şîroveyan dibin ku civat ew civat e ku leheng jî, rexnegir jî tê de dijîn. Duyemîn romana Şener Özmen a bi navê *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* (2010) bi vegotin û lehengên xwe, xesma ya sereklehengê xwe hê di destpêkê de bûye yek ji romanên ku herî zêde hatiye nîqaşkirin, çiku tê de tenê em rastî lehengekî kurd nayên lê jê wêdetir em rastî newxeyên derûnî, dînî, xwewindakirin û kaniya hev-par a êşên mirovahiyê dibin.

Serlehengê romana me Sertac bi rola xwe ya di romanê de tê nîşandayîn ku ew namzetê nivîskariyê ye û bi çîroka xwe ya her dem li ber qedandinê lê qet naqede, ew jî wekî *kêmnivîskar* (*manque author*) xwe dide der. Li aliyekî din jî ew neyê jîbîrkirin ku PÇN (*Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*) berhemeke postmodernîst e û ji ber vê ye em dikarin çend taybetmendiyên wê jî wekî







û bêxwedan e, eynî wek bavê xwe, bêziman, naçar û tirsonek e (178). Ku wî berê ji nenivîsandina eleyhî sellema li ber navê Adem pêxember nerazîbûna xwe ya ji Sertac mamoste anîbû zimên. Sedema vê kuşînê jî wekî nebaweriya wî tê nîşandan.

### Kêmasî û kêmnivîskarî

Piştî vê kurteya romanê beriya ku ez li ser analîza xwe hûr bibim dixwazim li ser rêbaza kêmnivîskariyê qala çend tiştan bikim. Di wêjeya cihanê de cûreyekî romanê yê bi navê *bildungsromanê* heye; bi rêyeke kronolojîk qala bûyerên jiyana leheng dike. Ji gelek aliyan ve dişibin berhemên biyografiyê, lê ew ne biyografiya kesên nas an jî berhemên belgeyî ne lê ji serî heya dawî fiksiyon in. Di bin vê katogeriya *bildungsromanê* de jî cûreyekî din heye ku navê wî *künstlerroman* e û ew jî behsa jiyana hunermend û nivîskaran dike ku ew bi xwe jî fiktîv in. Di nav van nivîskaran de du kom hene, yek ên ku di karê xwe de bi ser dikevin, yê din jî ew in ku dikin nakin tu carî nikarin xebatên xwe bi dawî binin. Her gav astengiyek derdikeve pêş wan, lê ew astengî her çiqas derveyî bixuyin jî bêtir ên derûnî ne, ji kurahiya nava wan nivîskaran tîn û qet nahêlin ew bibin xweyî berhemeke li gorî dilê xwe. Di wêjeya ewropî de *Wilhelm Meistera Goethe, Illusions perdues, Louis Lambert, Le Peau de chagrin, Le Chef d'oeuvre inconnu* ya Balzac, *Tonio Kröger* û *Mirina Li Venedîkê* û *Dr. Faustusa Thomas Mann* û berhemên Samuel Buttler, James Joyce û yên D.H. Lawrence mînakên wan nivîskaran in (Parla, 42). Di wêjeya kurdî de jî çiroka Mihemed Şarman a *Axaftina Nobelê* û ya Hesenê Metê Êş dikarin bibin mînakên kêmnivîskariyê.<sup>1</sup>

Mijarên berhemên *Künstlerromanê* rêwîtî, lêgerina takekesî, hest û romanên derûnî yên nivîskaran in, lewma ew cûre bi nivîskarên tîkçûyî ve tije ne. Jixwe ya rastî ew nivîskar jî bi vê xusletê xwe manque (kêm) dibin. Jale Parla di pirtûka xwe ya bi navê *Türk Romanında Yazar ve Başkalaşım* (Di Romana Tirkî de Nivîskar û Veguherîn) de li ser cureyên nivîskarên manque disekine û bo sedemên tîkçûna wan nivîskaran jî van rewşan rêz dike: hêviya wan a bo berhemeke tekûz, cîrnexweşî û nehêminiya wan dema ku bi armanca xwe bi ser nekevin, tahdeyên civakî û polîtîk, sansur û astengî, kêmasiya rewşa aborî, hesta derengmayînê, hesta bêkokbûyînê, bêcihûwarbûnê, lihevxiştina takekes û bavî, lihevxiştina nasnameyê, obsesyona xwebûnê, şayîşa bandorê, dîrokeke wenda û bîra çewisandî, zimanekî birîndar û takekesiyê birîndar (11).

Ew nivîskar xweyî bêdesthilatdariyê takekesî, lawazî, xeydoktî, qirofektî, bêxiretiyê ne. Ew hemû jî ji bo xêra hunerê ye da ku bila bikeve pêşiya nivîskar, pêşiya her tiştî. Em dikarin bi hêsanî bibêjin ku leheng-nivîskar xwe qurbanî berhema xwe dikin. Her gav xwe wisa didin bawerkirin ku dema ew

<sup>1</sup> Bo xwendineke hûrgulî ya li ser kêmnivîskarekî kurd bnr nivîsa Şêr, Ferzan; "Axaftina Nobelê û Kêmnivîskarî", *Tarafkitap* 16 (Gulan 2008) û ya Şarman, Mihemed; "Di Çiroka Kurdî de Nivîskarî", *Wêje û Rexne: Di Wêjeyê de (Bê)Cihûwarî*. Hejmar:1 (2014) r.38-50.

kêmasî jî holê rabe dê hingê bikaribin binivîsin. Lê rastî wisa nîne, li vir nakokiyek çêdibe. Lê belê mirov dikare li vir bipirse gelo heke ew leheng-nivîskar xwe ne kê mî tam hest bikirana, wê li pey çî biçûna û çî binivîsandina? Berhemên werê jî bi vê nakokiyê re tîkildar in û jixwe xwe li ser vê nakokiyê ava dikin. Belam axirê jî ber ku nikarin xwe tekûz bikin û nexweşiyên xwe çareser bikin yan xwe dikujin yan jî hişê xwe winda dikin û dîn dibin.

Gelo cudahiya van tekstan jî yên roman û çîrokên din çî ne? Em dikarin bibêjin ku ew berhem bi giştî metafiction in, ezmûna wan a bi zimên re li gorî yên din zêdetir in, ew ne berhemên xweyî plot in, lê berovajiyê vê komplîke û tevîhev in. Qasî ku nivîskar bêdesthilat dibe, berhema wî jî ewqasî zêdetir xweyî desthilat dibe. Li hemberî romanên din ên ku lehengên wan jî nivîskar in lê tekûz û serketî ne, ew berhem jî ber destnîşankirina nakokiya van lehengan û sekna nivîskaran a li nav civatê û ya derveyî civatê serketî ne (Parla, 42).

Ne tenê bo sedemên kêmasiya van nivîskaran lê jî bo famkirina derûniya wan jî li pêşiya me sê babet an jî sê xwendinên alîkar hene:

- **Nehêminiyeke Faustwarî:** Ê dixwaze her ji yê ber destê xwe baştir binivîse. Tim û daîm nehêmin e, ew jî taybetiya nivîskarên serdema romantîzmê ye.
- **Rewşeke Freudwarî:** Bo famkirina vê taybetiyê li pêşiya me sê gotarên Freud hene: *The Poets and Daydreaming* (Helbestvan û Xewnerojk), *Dostoyevsky and Patricide* (Dostoyevskî û Bavkuji) û *The Uncanny*. Ew her sê nivîsar bo famkirina van cureyên nivîskaran gelek alîkar in, çiku ew kes jî ber êşên kûr ên takekesî yên di giyanê wan de bûne çavkaniya êş û kulên bêdawî; bi azar û derd in, lewma ew êşa wan jî bandorê li nivîskariya wan dike.
- **Rewşeke Lacanwarî:** Li vir jî li hemberî me têgeha Lacan a manque heye ya ku navê xwe daye vê cureya nivîskaran, bi kurdî wateya vê peyvê kê m, kêmasî ye. Ev kêmasî kêmasiyê wisa ye ku mirov çî bike jî tu carî nikare wê tamam bike, dagire, lewma tim û daîm vala dimîne. Poetic desire (arezûya helbestkî) jî li gel vê kêmasiyê xwe nîşan dide. (Jale Parla, ji semînara *Conventions in Literature II*)

Belam heke ez werim ser babeta ku ez ê şîroveya xwe li ser vê yekê bilind bikim, ew jî rewşeke Lacanwarî ye. Kêmasî û kêmbûn. Valahiya ku qet nayê dagirtin. Hesteke bêtixûb û dagirker. Lêgerîneke domdar... Lacan psîkanalîstekî post-Freudî ye û bala xwe zêdetir daye ser tîkiliyên derhiş û zimên... Têgeha kêmasiyê ku Lacan qalê dike zêdetir bi wî awayî hatiye bikaranîn, ango *manque-a-etre* ku wateya wê jî *kêmasiya li ba adinê* ye.<sup>2</sup> Li gorî *Ecrits* ên (Semîner) Lacanî, bo avakirina takekesiyê divê her tim adinek hebe da ku mirov bikare bi saya hebûna wê adinê xwe nas bike û li ser hebûn an

<sup>2</sup> Lacan bo îngilîziya vê tegehê "want-to-be" pêşniyar kiriye. (Alan Sheridan, ji pêşgotina *Ecrits* a Lacan)



jî tunebûna wê xwe ava bike. Lê hêjayî kirpandinê ye ku adina adinê tune-ye, jî ber vê jî hingê pirsar *Adin çi ji min dixwaze* derdikeve holê (Lacan, 242). Bersiva wê jî fallîk îmaj e ku dikare vê valahiya kêmasiyê dagire (245). Ji ber vê, kesê nevroîk xeyal dike ku adin her tim dixwaze wî bixesîne, lewma ev kêmasiya ku di giyanê wî de şîn bûye rê nade ku bi yê di dest xwe de re şa û bextewer be, lê berovajiyê wê tim û daîm bikeve dû vê kêmasiyê û vê xeyala adinê bajo (247). Bi gotineke din, ji bo ku bibe xwe, bi xwe kêmasiya xwe derdixe pêş û tim û daîm li pey vê kêmasiyê digere da xwe bi tamam hest bike, lê weku diyar e ew kêmasî jî bi tenê bi adin re têkildar e.

Serlehengê romana me Sertac jî ligel xisletê xwe yê nivîskariyê dikeve nav vê komê, jê wêdetir wê êşa wî qasî ku mezin û kûr e dibe navê berhema Şener Özmen jî; *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*. Hesta kêmasiyê ku lehengê me Sertac her tim tê de dijî, jiyana wî ya takekesî belawela dike û ew bi xwe biçê ku derê jî nikare dilê xwe sayî bike, ango nikare vî tiştî peyda bike ku pê re vê valahiyê tije bike ku bi rastî jî ew qul û valahî hemû giyanê wî serdanpê dagir kiriye û bûye çavkaniya êş û azarên bêdawî. Lê ew êş û keserên wî bi dîmeneke şênber a pirtûkê li ber çavê xwîneran bi goşt û hestî dibin, ewqas e ku tu yê bibêjî qey hemû êşên wî dê bi saya vê pirtûkê xilas bibin, lê mixabin jinên li derdora wî ketine pey nivîsandina wî, pênûs û hilberandina wî ya wêjeyî an jî ya libidînal a li vir ne dola mêraniyê ye; lê tîpên reşik ên ku li ser kaxizê dirijin û dibin xweyî hêzeke wisa ku jin jî dixwazin bibin xweyiyên vî tiştî.

### Serlehengê ku bi jana nivîsandinê ketiye

Leheng-nivîskarê romanê Sertac bi êşên malbatî û zaroktiya xwe a *qorim* re giraniya nasnameya xwe ya netewî û bindestiya gelê xwe yê kurd jî ji xwe re dike derd. Ji xeynî wan, tiştên herî zêde dilê wî aciz dike neheqî ne, ku tim li kurdan tîn kirin. Bi kurt û kurmançî berê xwe bide kîjan aliyê êşên dijwar dibe para wî. Hewce ye ku ji xwe re rêyekê peyda bike ku qet nebe bikare barê xwe pê sivik bike. Ji ber vê ye belkî xwendin û berhevkirina pirtûkên bi kurdî û nivîsandina çîrokekê ku qet naqede vê peywira dermankirinê girtiye ser milên xwe. Lê mixabin Sertac dike nake ew çîrok xelas nabe, dawî lê nayê, bi (ne)nivîsandina xwe dilê kesî rehet nake, lê berovajî wê neqedandina wê nefreta lehengî ya ji xwe dike zêdetir jî dike:

[...] ew li çîroka xwe ya nivcomayî dakeve û tiştin lê zêde bike yan jê derî-ne, niha xwe ji duh û pêr bêgavtir, tengavtir û tengezartir didît, ew çend ku ji xwe û ji rewşa xwe nefret kiribû. (79)

Xelîl Semed di nivîsa xwe ya li ser pirtûkê de diyar dike ku mirov baş tînegihêje ka ew bûyer, monolog û diyalogên Sertacî xewn an jî bûyerên travmatîk destnîşan dike. Di dema xwendina vê berhemê de wî tiştî bala min jî kişandibû, çiku ne tenê çîroka Sertacî navê xwe dide romana Şener Özmen,

di heman demê de carina çîroka Şener û ya Sertacî tevîhev jî dibin. Sermeselê ev hevok ji nav romana Şener Özmenî ye "Ewê ku berî bi panzdeh salan di rojê havîna germ a kelekel de hatibû vî bajarê berevajîbûyî û linavhevketi [...] " Lê piştî çend hevokên din, li pey xewnerêşka bi Merasîm, em aniha jî wê hevokê wekî hevokeke ji çîroka Sertacî dixwînin:

Ew bi hêviya şeveke bêdeng û bêxirecir hîn ji êvar de derbasî odeya xwe ya xebatê bûbû û xwestibû ku çîrokê bidomîne, bes çîrokê! Çîrok, çîroka wî bû û bi vê hevokê dest pê dikir: "Berî bi pazdeh salan di rojê havîna germ a kelek de..." (79)

Li gel vê jî bi bûyer û monologên romanê re em dibînin ku *jiyana wî, jiyana wî ya bêwate, ji gelek çîrokên neqediyayî ên ku ew qet nejiyabûn hatibû pê û ew bi xwe jî yek ji wan çîrokên neqediyayî ye* (92-3). Bi vê nîşeyê re em yeqîn dibin ku ya rastî tiştê nivcomayî û neqediyayî ne tenê çîroka li ber destê wî ye, lê di heman demê de jiyana wî jî ye ku negihîştîye asta takekesiyê û nebûye xweyî wateyekê û civata wî jî ye ku di bin barê bindestî û neheqiyê de tim dinale.

Dibe ku kêmmayîna Sertacî zêdetir bi sedemên civakî ve girêdayî be, ku xwendinên sosyo-polîtîk bi hêsanî dikare wisa bibêje, lê gava em bi hûrgulî li serencama jiyana wî dinêrin bandora neyînî ya mêtîngiriyê bi heman awayî xwe di nav jiyana wî ya malbatî de jî dide der. Ku ew tîrsa bavê wî ku hemû jiyana Sertacî ya malbatî û ya giyanî belawela dike çavkaniya xwe nemaze jî bûyerên salên nodî digire ku hingê ew xwedayên tîrsê di her qada jiyana civatê de tînen hemberî hemû niştecihan. Li vir em dikarin bibêjin ku jiyana wî ya takekesî li gel jiyana civakî dimeşe û encamên xwe yê xerab jî bi xwe re dide hestkirin. Ji ber travmayên dualî, takakesî û civakî, Sertac dûçarî kul û derdan dibe û dûre nivîsandina berhemeke wêjeyî wekî dermanekî dibîne ku ew dikare hemû nesaxiyên wî yê hundirîn rihet bike. Lê mixabin heyfa lehengê me, dema biçê li ber masê rûnê da çend tiştan xêz bike, mixabin kaxiz wekî berê spî û vala li ber wî dimîne (103).

[...] Çîrok, çîroka wî bû û bi Kurdî bû.

Çîrok, çîroka wî bû û diwelidî. (155)

Tiştêkî din jî ew e ku taybetiya çîroka Sertacî wek vîrusekê derbasî her kesî dibe û nivcomayîna xwe wekî encameke jirêzê nîşê dide. Sermeselê, Dr. Sarîn Zavaryan, psîkologa wî jî rapora xwe ya venihêrînê "hema bêje li ber qedandinê" dihêle (127) û nikare xelas bike. Kî çi dibêje bila bibêje, Sertac Karan bi rastî jî *çîroknûsekî afirîner* e, çiku her tişt di serê xwe de diafirîne û bi nexweşiyên derûnî ve tîk diçe (169).

[...] Çîrok, çîroka wî bû û wî dil tunebû biqedîne. Çîrok, çîroka wî bû û dibû serbarê ser xewn û xeyalên wî. Çîrok, çîroka wî bû û giyyayê hewşê tehl bû. (164)



Piştî tîkçûyina şoreşê diçe Ewropayê, li bajarê Munsterê, di mêvanxaneya Diakonisenmutterhousê de sî û sê rojan dimîne. Navê vî ciyî jî balkêş e, Mutter house, yanê mala dayê. Malzaroka dayê, dûrî civatê, cihê ku hê bi tîgeha Lacanî, hê ziman û zagonên BAVÎ ne desthilatdar e, cihê ku zarok rû bi rû bi xwe re ye. Lê li wê derê, dûrî civata xwe lehengê me ditengije, bêhna wî diçike, tu yê bibêjî qey guleyek bera mejiyê xwe dabû:

Mîna ku ew avêtibin binê zîdaneke tarî û zilûmat û ew li wir ji bîra kiribin, mîna ku dest û piyên wî bi qeyd û zincîran girê dabîn û ew ji hemû mafên wî yên mirovane bêpar hiştibin, mîna ku hatina wî ya Munsterê û mana wî ya li mêvanxaneyê ne bi dil û daxwaza wî be, ew bi hikmê zorê li wir dabîn sekinandin. Û daxwaza çîrokek negengaz jê kiribin, welê tengizar bûbû ji bêgaviyê, ji bêjiniyê, ji bêtesqeletiyê, ji bêdengiya şevan, ji tenêtiyê [...] (166)

Li wê derê rastî çend nivîskarên ji deverên din jî tî. Weku me li jor jî qal kiriye, nivîskarekî Iraqî ji hatîna Sertacî, a kurdekî feodal ne razî ye. Sertacê dilşikestî jî radibe û tenê ji Sadiq El Behrî, yê Iraqî re nameyekê dinivîse, bi me xerîb e çiku tiştê ku Sertacî destê xwe dabûyê û qedandî tenê ew e (153-5). Ji xincî vê, ne li gorî dilê wî be jî, li mêvanxaneyê jî ji *Sertacê Çîrokbêj* (153) û *Sertacê Çîroknûs* (157) dixwazin ku axaftinekê binivîse. Frau Muller, berpirsiyara malê jî li benda nivîsa wî ye. Gava Ozlema wergêr tî cem wî û xwesteka Frau Muller jê re bi lêv dike ku pê re jî dixwazin ku bi wî re hevpeyvînekê çêkin, Sertac ew pîrziya li ser rûye xwe wekî hincet nîşê dide ku niha nikare lê di ber re jî ya rastî wî bixwe *nivîsa xwe jî hîn neqedandiyê*. Di ser vê yekê re Ozlem jî qala fotosopê dike ku bi saya vê dikarin vê pîrziya jê bibin. Bersiva Sertacê jinenivîsandînetengizar jî ev e:

Û bêhtengî? Dê çî bi bêhtengiyê bikin? Ma *photoshop* dikare vê bêhtengiya kujende ya ku rê nade ez bi dilê xwe binivîsinim, ji dil û mejiyê min bibe Ozlem!?" (163)

### Pirsgirêka bavî û tîrsa xesandinê

Di analîza vê romanê de şîroveya herî girîng sekna bavî ye. Wateya wî û tîkiliya wî ya bi çîrokê re û di ser de jî Merasîm û tîrsa xesandinê ye ku bi xwe re tîne. Belam gava em diçin zaroktiya wî ya birîndar, diya Sertacî, li hemberî bavê wî, bi kesayetiyê xwe zêde ne xuya ye lê bavê wî bi her awayî tîrsonek, newêrek e. Her çiqas di tevahiya romanê de girêka Odîpûs bi awayekî eşkere hatibe destnîşankirin jî, em zêde tiştan li ser tîkiliya wî ya bi diya wî re nizanin da bibêjin dayik di pêşzaroktiya wî de û bi pey re lê desthilat-reke mezin li ser wî hiştiye. Lê çima û çawa? Ji bo bersiva vî tiştî ka em hinek di nav jîyan û xeyalên *Sertacê Çîroknûs* de bigerin. Gava ew bi êşeke giran a derûnî dikeve, ji xwe re rastiyê nû ava dike ku tê de her tişt li gorî dilê wî ye, xweyî malbeteke kurdewar, bavekî ku piştî wî digre û jê re dibe alîkar. Di

vê jîyana nû ya rastî çîrokek ji çîrokên *Sertacê afirîner* de ew xwe wek kurdekî bêtîrs dibîne ku navê wî Ferheng e û li serbajarê Kurdistanê hatiye dinyayê. Tevî wê, tiştêkî balkêş jî ew e em hîn dibin ku ew di bîst û çar saliya xwe de *bi teşwîqa bavê xwe* dest bi nivîsandina kurteçîrokan dike (112). Di vê jîyana nû ya li hemberî jîyana wî ya rasteqîn a bi êş de bikaranîna navê çîrokan tevî bavê wî bi min pir watedar e. Bav ligel ziman û zagona civatê di nav xwe de hêzekê dihundirine ku kurê wî dikare pê ji xwe re jîyaneke qewîn ava bike û li ser piyên xwe bisekine. Lê belê weku di destpêkê de min diyar kiribû ku bavê wî her tim bi tîrs û newêrekiya xwe dihat bîra Sertacî lê xalê wî di dewsa bavê wî de dikarî jîyana Sertacî rengîntir bikira lê mixabin ew jî ji aliyê wan kesan tî kuştin ku yên ku di dilê bavê wî û civata wî de tîrseke bêsînor belav kiriye jî ew heman kes in.

Kêmasiya ku bavekî tîrsonek li pey xwe hiştiye dûre ji ber tunebûna *xalekî ku xwarziyê wî jê hez bike* û civatake ku zarok xwe tî de ewle hest bike mixabin nayê dagirtin. Loma tîkiliya lehengê me ya bi jîna wî re di siya vê tîkiliya hanê de dimîne ku Merasîm jî dibe çavkaniya tîrs û xewnereskên wî. Ji ber van tiştan, bi min pêwendiyê xurt di navbera kêmasiya bavî û zexmiya jîna wî Merasîm de heye. Weku were bîra me hemûyan, Merasîm ewilê hê beriya ku bizewice dikeve pey dengê mîrane yê Sertacî (9), lê xerîb e ku piştî zewaca wan êdî ew deng nayê ber guhê xwîneran. Ma çî bi vî dengî hatiye? An jî di rastiyê de dengêkî wisa hebû? Belkî tunebû ku ew jî fanteziya Merasîm bi xwe bû. Ew deng rastî bû ne rastî bû ne xem e, çiku psîkanalîzê şanî me daye ku tiştê ku mirov bi hêsanî jê re bibêje rastî tune ye, bilêvkirina tiştan jî bo nîşana hebûna wan bes e. Lewma ez dikarim bibêjim, wexta ew dengê ku Merasîm li pey wî bû qut dibe, êdî li hemberî wê û me xwîneran ne dengê wî, lê tiştêkî din heye: çîrokek, pêşbazîya çîrokên neqediyayî. Ku xewn û xeyalên Merasîmê dixemilîne. Di derbarê vê yekê de Merasîm wiha dibêje "heke min xelata yekemîn wergirt, bifikire Sertaco, bîne pêş çavên xwe, heke ku xelata yekemîn dane min û ez bi serfirazî vegeyriyam mal" (199). Lê ne tenê ew, ji çîrokê jî wêdetir, ez naxwazim sînora xwe û ya rexneyê ji bîr bikim, ya rastî tiştê jî gelek jinên din re dibe objeya arezûyê pênûsa (we got penîs?) Sertacî bixwe ye.

Ew gelek caran li wir, li ser qaryoleyê di xew re diçû û bi kabûsekê re -he-man kabûs bû yê ku didît; Merasîmê bi saya çîrokên wî dibû çîroknûseke bi nav û deng, piştî xelatgirtinekê bi Sergîno re dihat malê û şûşeyekî votka bi maseyê de dikir û agir berdidayê" (79)

"Vê carê pir, pir bi dûr ketibû ji odeyê, çûbû û hey çûbû. Di xewna xwe de dîtibû ku ew û Merasîm li odeyekê ne, dosyeya wî ya çîrokan jî -çîrokên neqediyayî- li ber destê wê ye û Merasîm, mîna ku di konferanseke navnetewî de be, mîna ku ligel çend şîroveger û rexnegirên giregir ên navdar derketibe pêş guhdarên xoşewîst, welê ji xwe û ji nirxandin û şîroveyên xwe bawer, lib û lib xeber dida û digel ku car caran, jîyana xwe ya kesane û pîrs-



girêkên xwe yên zewacê û rewşa Sertacî jî tev li gotara xwe dikir û dida navê, dîsan jî Sertac Karan û Sertacê *Çîrokawîneqediya* jî şîrovevên Merasîma xwe ya di xewnê de heyirî mabû." (90)

[...] ew çend ku ji pêşniyazên xwe û xasma ji "pênûsa" mêrê xwe bi bawer bû, bi tevî ku Sertacê mêrê wê ne wêjevenakî ji wan wêjevanên xwedî pirtûk bû jî, dîsan jî hêvî jê dikir lê bi qerf digotê; "Ma te ew qas pirtûk û kovar ji çî re kirîne mêro? Nivê zewaca me bi dû vê hewesa te ya pûç û betal de çû, bi ser de jî te ew qas pere dan van pirtûkên Kurdî, êêêê, bû çî? Çi bi destê te ket?" (194)

Dema ku hindik mabû serlêdana Pêşbazîya Çîrokên Neqediya biqediya Merasîm bi kelecaneke ku bêhna Sertacî teng bike, zextê lê dike ku bilezîne. Dilê Merasîm bi ser 30 milyarên gilover de ye ku bi pêşbazîyê bikeve destê wê. Serê *Sertacê Çîrokger* bi çîrokê û jina wî dikeve belayê û nizane ka çawa dilê jina xwe rehet bike (197). Li gorî xebardana wî, tim hindik dimîne ku çîroka xwe biqedîne lê xuya ye çîrok çîroka wî ye lewma naqede. Carekê jî di dema nivîsandina çîrokê de Merasîm midaxaleyî berhemê dike û jê dixwaze çend ciyan wekî beşa masturbasyonê jê derxe çiku ew beş ne li gorî dilê wê ne. Ma Merasîm tenê Merasîm e an jî di hişê Sertacî de sembola têgeha jinê ye? Bo bersiva vê yekê jî em dikarin dêhna xwe bidin rojên wî yên li Elman-yayê. Li wir nivîskareke Erebi, ku navê wê Sabîne ye, nas dike û ew xanima hanê Sertacî vedixwîne mala xwe, lê ew jî ji ber şerma nikare here, lê dîsa jî qet nebe fanteziyên xwe yên hevşabûnê pê re çêdike, vê kêliyê, di dema hevşabûnê de rûyê Sabîneyê diguhere û dibe yê Dr. Sarîn, dibe Merasîm, dibe May, nivîskareke Denmarkî, dibe evîna wî ya lîseyê û dîsa yê Merasîm. Ew jin bi her awayî di dirûv û şiklê Merasîmê de xwe nîşan didin.

Merasîm, jina Sertacî, jineke ewqas çavsor e ku dikare ji bo gurzek giha lodekê bişewitîne (73). Ji ber vê yekê jiyana Sertacî ya bi Merasîmê re ne tiştêkî hêsan û cihê şadî û bextewariyê ye. Tirs û xofa ketina ji mêranîyê û daqurtandinê li ba Sertacî wisa zêde dibe ku dema ew ji jina xwe lêdanê dixwe hevalên wî yên mêr tinazên xwe pê dikin û dikevin nav galegalan ka jina wî bi çî tiştan lê xistiye û navên "xwelîdank, sirehî, guldank, çarçove û neynîk" dihejmêrin. Dibe ku di destpêkê de ew nav bi hev re wateyeke baş nadin xuyanê lê gava mirov li ser wan bi hûrgilî disekine dibîne ku ew hemû alav bi kûrahiya xwe û bi hêza xwe ya daqurtandinê belasebeb nayên gotin, ji ber ku ew giş tirsê wî ya *xesandinê* û *daqurtandina* ji aliyê jinekê ve nîşan didin. Jixwe li piştî wê, hevalên Sertacî dibêjin, "welleh bavo me mêr di ser Merasîmê re nedîtine" (77). Di jiyana xwe de ji bavê xwe tiştêkî hîn nebûye ku xwe ji hêzên derveyî biparêze û bibe xweyî hêz û qawet. Dibe ku kêmasiya rola bavîtiyê bi xêra xalê lehengê me ji holê rabûya. Lê ew jî nayê cih. Di civatê de jî tiştêkî tuneye ku xwe pê bihêz hest bike, civateke bindest û zêrandî. Tirseke bêdawî li der û dora wî ye. Lewma bi min, em pirsgirêkên

civakî nikarin tenê wek meseleya civata wê demê binirxînin, ji ber ku ew tişt di jiyana gelek kur û keçên kurd de ji aliyê kemilandina takakesitiya wan de kêmasiyeke mezin çêkiriye ku hê jî şifaya wê nayê dîtin û ew birînen kûr hê jî nayên kewandin.

*Tirsa Xesandinê* di terminolojiya psîkanalîzê de xweyî cihekî taybet e. Dûre teorîsyenên post-Freud jî li ser vê tegehê bi hûrgulî sekinîne, yek ji wan jî Andre Green e, di geşedana zayendî ya zarokî de qonaxake giyanî û hêmayî ye ku zarok dûre takekesiya xwe li ser wê ava dike. Her çiqas ev talûke ji destê jinan were jî, bi piranî kirdeyê vê xebatê mêr in (Green, 14). Li aliyekî din jî xesandin perçeyekî girêka Odîpûsî ye. Ji bo ku zarok girêka xesandinê derbas bike, divê dev ji arezûya ensest û kuştina bavî berde. Yanê bi gotineke din ancex piştî vê zarok dikare bi reqîbê (bav) xwe re bibe yek û wî wek modelekî bibîne (32). Pirsgirêkên li gel bavî encax tenê di nav sî-norên îdentîfikasyonê de dikarin bînen çareserkin. Lê lehengê me hê jî serî de pirsgirêkên îdentîfikasyonê tecrûbe dike û nikare jê derbasî balixiyê bibe, ji ber vê yekê ye ku tevî pirsgirêkên xesandin û çênebûnê hê di qonaxa girêka odîpûsî de dimîne.

Li gorî Green, zayenda zarok çî be, çî jin çî mêr, zarok sembola penîsê dayikê ye (104). Piştî geşedana xwe zarok êdî ji wê peywira penîsbûna dayê dûr dikeve û dibe takekes. Lê dema ew pirsgirêk neyê çareserkin, jinên xesankar û yên fallîk li hemberî mirov peyda dibin û Green dibêje ku ne pêwîst e ew rast bin lê ew bixwe jî ji texeyûla mêran derdikevin (106-7). Taybetiya girêka xesandinê ew e ku him nahêle ensest pêk bê û him jî rê dide ku bav sax bimîne; ku ev jî tiştêkî erênî ye, sedema wê jî ew e: ji bo ku zarok xwe biparêze divê bav zindî be (116-7). Bi kurt û kurmancî dibe ku Merasîm jineke xesanker nebe jî, ku ya rastî em çîroka Sertacî bi çavekî Sertacî dixwînin û dengê Merasîm jî ji xeynê çend nîşeyên di jêrenotên neqediya de nabihîzin-ew jina/ên xesanker ji xeyal û fanteziyên wî yên birîndar ve dertên. Yanê di jiyana Sertacî de ew jin hene, çî xeyalî çî rastî.

Dinya, dinyaya jinan bû, mixabin wilo lê hatibû, li her derê bûn, pir bûn û her ku diçû hejmara wan pirtir dibû, di mînbûs û otobêsan de ew hebûn, li sûk û mixaze û kolan û meydanan ew, li ber deriyê nexweşxaneyan ew, li nexweş bûn? Ma bi rastî nexweş bûn? Sertac bawer nedikir, bawer nedikir bê nexweş in. Heke bi rastî jî nexweş bûna, ma wê çima di xwepêşan-dan û serhildanên vî bajarî de li pêş bûna? Heke bi rastî jî nexweş bûna, ma wê ji ber çî laşên xwe bidana ber jopên bênsaf? [...] (196)

Di jêrenota duyem de Merasîm li şîrovevên muxtemel ên li dijî wê wisa diaxive: "[...] li gor wê sedema bingeîn ez im ne welê? Jixwe sedem tim û dayîm jin e, jinek e, yan çend jin in dema rê û dirb li ber mêrekî wînda dibe di civakek serobinobûyî de" (188). Belam weku li jor jî xuya ye, şîroveyek şaş dikare ji xwendina vê romanê derkeve li hemberî jinan, ku Sertac jî ji ber vê



yekê bala me dikişîne ser vê nakokiyê. Bi min jî mesele her çiqas bi hikmê jinan wekî Merasîm xuya bike jî, hê bi gelekî beriya wê dest pê kiriye û jê wêdetir bi kêmasiya bav, wêrekiya wî, sistbûna wî ve derfet dîtiye ku jiyana Sertacî serobino bike. Ma ew sûcê bavê wî ye? Jixwe eşkere ye ku ew tirs û xof jî ji destê serdestan ketiye nav malbat û welatê Sertacî.

Ber bi dawiya romanê ve em rastî diyalogeke balkêş tên ku tê de Sertac bi xortekî kurd re galegalan dike. Beriya wê, jineke elmanî dema mêrê wê diçe karê xwe û beriya ku xortekî rojhilatî bîne mala xwe diçe şaneşînê û kulîlkên xwe av dide, hingê jî *Sertacê Sistemêr* (167) dipirse kar û barên nivîsandinê çawa diçe, we dît jineke din jî kar û barê (nivîsandinê) jê dipirse. Merasîm jî Frau Muller jî jê dipirsîn. Sertac hevşabûna wê ya bi xortê rojhilatî (kurd) re bi temamî nikare bibîne lewma yên mayîn jî di *hişê xwe yî şilbûyî* de temam dike. Paşê êvarekê ew jinik tevî merê xwe gazî vî xortî dike û li ser şaneşîna xwe *grillê* çêdikin. Bi vê dîmena sêkesî re Sertac pir diqehere. Xwe tazî dike diçe ber neynîka odeya xwe û "ji wê jinê re çêr û sixêfên nebihîstî dike di lûtkeya xweşiyê de û yek caran berê xwe bi neynîkê de dike da şebikînên reşgunika bibîne". Roja dinê dixwaze pêşî porê xwe paşê jî riha xwe ya mîranî kur bike (170).

Ev xortê kurd karê nêrevaniyê dike, lê nêrevaniya kê, ne diyar e, tenê di nav diyalogê de derbas dibe ku em dibên zarokê qorim heye, lê beriya wê haya me qet jê çênabe. Ew meseleya nêrevaniyê dibe ku fanteziya Sertacî be, ew zarok ne ew zarok, ew jin ne ew jin û ew mêr ne ew mêr be. Dê û bavê Sertacî û zarokê qorim; yanê Sertac. Ew hevok fanteziya Sertacî şirove dike ku hem bo xwe û hem jî bo diya xwe *gayînê* dixwaze, bi gotineke din dixwaze ew kurikî têxe dewsa bavê xwe û ew jî bibe kurikekî *qorim*, çênebûyî, yê di landikê de mayî, di ser de li pêşberî *dika ewilîn* de wekî Freud qala wê di çîroka *Guremêr* (Wolfman) de kiriye, dixwaze bavê wî, wî bixwe jî bikute. Ew kêmaniya bavî û pê re jî encamên bi êş û jî mêraniyê ketîn ne tenê di romana Özmen de tê hemberî me, tişteki seyr e ku di çendin nivîskarên din ên kurd de jî em rastî vê yekê dibin ku têkiliyên dê û bav, di bandora têkiliyên her du civatan ên kurd û tirkan de dimîne û rola wan du civatan jî şikla xwe diguhezîne têkiliyeke mêr û jin an jî aktif û pasîfê.<sup>3</sup> Bi min heta ku kurd ji bindestiyê gelên din dernekeve rola bavîti dê tim û dayim kê m be, çiku dema zimanê BAVÎ (yê civatê) û bav xuya nebe, kesayetiya zarok nikare tenê li ser milên dayikê bilind bibe.<sup>4</sup>

<sup>3</sup> Mînak romanên Yunus Eroğlu, *Nameyek Ji Xwedê Re*, *Otobês û Sergotina Calvinoya Yaqob Tilermenî*, *Di Tuwaletê deya Rênas Jiyan*, çîrokên Mihemed Şarman û hwd. An jî di romana nivîskareke kurd lê tirkînûs a *Korkunun Irmağında* (Di Çemê Tirsê De) ya Suzan Samancı de jî em pêrgî vê rastiyê tên. Lê hûrgilî û analîzeke kûr divê. Min ew şirove jî xwendinên xwe yên van roman û berheman derxistiyê.

<sup>4</sup> Heman rewş li hemberî Ewropa bo wêjeya tirkî jî hatiye gotin. Bnr *Babalar ve Oğullar* (Bav û Kur) a Jale Parla, *Kör Ayna, Kayıp Şark* (Neynika Kor, ŞarqaWinda) a Nurdan Gürbilek.

Di vê peywendê de ew meseleya NA û EVETê jî watedartir dibin. Bi min wisa tê, ew her du peyv jî tam pirsgirêka Sertacî û ya civata Kurdan a sero-bînobûyî rave dike. Em dikarin bipirsîn, ka çima peyveke neyînî bi kurdî lê erênî bi tirkî ye. Ez ê bersiva wê li jêr bidim. Xelîl Semed jî, di nivîsa xwe ya bi navê "Peşbaziya Çîrokên Neqediyayî" de qal dike ku Pîra Na wek tirs an binhişê Sertac Karanî derdikeve pêş. *Tiqetîq û hîrehîrên Pîra NA'yê di mejiyê Sertacî de her tim olan didin*. Pîra Na cara ewil di beşa destpêkê ya Merasîmê de derdikeve holê:

"Pîra NA nizamim bê wê êvarê ji ku derketibû, hatibû li ser milê min ê çepê veniştibû, min du-sê caran tepa xwe jî lê xistibû ji bo ku bişeqite here ji ser milê min, lê wê pûte bi min û halê min nekiribû, "Tu bi kêfa xwe yî... tu bi kêfa xwe yî, tu bi kêfa xwe yî..." (16)

Dûre çend carên din jî bi bêhna xwe ya genî tê cem lehengên me û wan aciz dike, lê ji Merasîmê bêhtir Sertacî (16, 18, 32, 53, 65, 80, 83, 88, 138-9, 203, 205). Di heman demê de Pîra NA sembola xesandinê jî di nav xwe de dihewîne; yanê xweyî "quzekî bidev û diran bû" (138). Di rûpela 139an de bi saya diyaloga navbeyna Sertacî û Pîra NA em hîn dibin ku ew kî ye:

[...] Ez dapîra te me...

De here ji wir!

Ez diya te me...

Here ji wê pîsa heram!

Ez meta te me...

Ez ê di devê... tobe estaxfurullah!

Ez welatê te yê kavilbûyî me...

[...]

Xwedê te çi bela anî serê min! Me got em ji polîsan xelas bûn û îcar...

Îcar û çi! Tu ji jinan zehf ditirsî..."

Biçirîn!

Tu ji quzê wan zehf ditirsî...

[...]

Ez şoreşa we ya têkçûyî me...

Şoreşa me têk neçû, tenê me hinekî bi paş xist...

Paşxistin, têkçûyî e...

Pîra feylesof!? Pek û sed carî pek!

Tu ji jinan zehf ditirsî

Ez ji jinên mîna te ditirsim...

Ez wêjeya we ya xwedbîn im

Xweş keee!

Ez qeder im, qedera te me... (139-140).



Xerîb e em baş dibînin ku ew Pîra NAya ku bûye sembola xesandinê, paşê dibe welatê wî jî, hingê em seh dikin ku Kurdistan jî wî dixesîne. Tevî wê, formuleke wiha li ber me peyda dibe: tirs=jin=xesandin. Dagirker bi tirsaxwe, welat jî bi dagirbûyîna xwe dixesîne. Ya herî pir bala min dikşîne jî ew e ku wêje jî dixesîne, belkî sedem ew e ku çîrok naqede, heke biqede ew e Sertacî bixesîne.

[...] xwedêkirî Pîra NA yeka nediyar e, jixwe ev nediyariya wê ye ya ku kawdanê vedizelîne. Dikarin bêjim ku Pîra NA, pêwendiyek e, pêwendiyaya Sertacê çîrokê ye ya bi qedere re, ya bi qedera xwe re [...] (203)

Li hemberî Pîra NA, Rûnê EVET heye (38, 49, 200, 201, 203). Ew her du peyv jî bi tîpên girdek hatine nivîsîn. Li vir ez pêwendiyeyeke din jî dibînim ku rûnê EVETê û Pîra NAYê, ev her du nav, dema ku tên nik hev, xwendikek xweser ji wan derdikeve. Jixwe di jêrenota sêzdehan de em dibînin ku ew erêkirina zordestiyê, xizaniyê, belengaziyê, erêkirina rejîma faşîst, stûxwariyê ye. Dibe ku sedema erêya tirkî ew be jî, ku tê de wateyeye neyînî heye û salên çewisandinê tîne bîra mirov. Lê ez ê jê wêdetir şîroveyeyeke din lê bar bikim. Bi min, pirseke din a sereke serê xwîneran mijûl dike û wê bikare wê meseleyê ronîtir bike jî ku me li vir ew rave kiriye, ka çima peyva erênî bi tirkî, bi tîpên mezin (EVET) lê ya neyînî bi kurdî, dîsa bi tîpên mezin (NA) dan nîşankirin? Ez wisa yeqîn dikim ji ber vê yekê ye ku bav jî weke gelê Sertacî yê kurd tîk çûye, tirk jî li dewsa kêmbavê cî girtiye. Lewma ew hemû xwestek û arezûyên ku bo geşedana wî ya giyanî hewce ne, tenê di derhişê wî de mane. Li gorî tîkiliya civakî ya kurd û tirkan, kurd dibin jin, tirk jî mîr, ango bav in, weke Lacanî jî gotiye zarok li hêviya erêkirina *Bavê mezin* dimîne ku *xwe* ava bike. Lê bîyî hebûna tirkan, di nav çarçoveyeyeke teng de kurd jî ango civat jî bav e, lê mixabin ji ber sedemên polîtîk û civakî yên sed-salan, nemaze piştî damezrandina komara tirkan ev bav bi hebûna tirkan tîk çûye û desthilatdariya xwe li ser kurî wî wînda kiriye, lewma ji erênîyê zêdetir, civata kurdan wekî *Pîra NA* ya bi vajînaya dentat derdikeve ser dikê, ew jî weku me gotî metafora xesandinê ye, rastî xesandinê dibe, diguheze dibe jin, dixwaze bê gayîn, qet nayê qebûlkin. Di diyaloga Sertacî de weke wî bixwe jî gotiye, ew êşa Sertacî ne tenê ji ber kêmasiyên wî yên malbatî û veguherîna takekesiyê ye, lê *Kurd ji vê saetê bi şûn de dikarin her tiştî bikin* (173), bibin her tişt. Ev mayîna leheng a di nav bera Erê û Nayê de, serdest û bindestan, mîr û jinan de ye, em dikarin şopa vê yekê li ser şerê wî yê bo navê wî jî bibînin, ku naxwaze navê wî wek navekî tirk Sertacî bê gotin, lê Sertacî wekî ku ew lê kirine, wekî reseniya xwe. Yanê ew hatin û çûyina navbera her du qutbên dijber de lehengê me li xwe digere, bo nasname û navê xwe şerê xwe tim û dayîm didomîne.

## Encam

Weku min di destpêka nivîsa xwe de jî diyar kiriye ew berhem bi taybetiyên xwe yên vegotinê berhemeke postmodernîst e. Tê de mirov tûşî babetên cihê tê û ew jî bi hev re dikarin bibin xwendinên gelek cuda. Xwendineke femînîst, kolonyalîst an jî post-kolonyalîst, ya marksîst hwd. Lê min bala xwe zêdetir daye jiyana Sertacî ya hundirîn û xwest ku fam bikim ka ewqas êş û keseran çima nehişt *Sertacê Çîroknûs* çîroka xwe bi dawî bîne. Ji bo ronîkirina vî tiştî jî min rêbaza psîkanalîzê bi kar anî. Lê pê re jî di teoriya wêjeyî de min berê xwe da tîgeha *kêmnivîskariyê* jî ku em dikarin vî tiştî di hemû wêjeyên cihanê de bibînin. Di vî cureyî de lehengên nivîskar ku ji ber gelek sedeman nikarin berhemên xwe biqedînin û di dawiyê de yan hişê xwe wînda dikin an jî xwekuştinê wek riya xelasiyê dibînin. Her çiqas di nav van sedemên Sertacî de bûyerên civakî gelekî girîng xuya bikin jî, birînen wî yên ji salên zaroktiya wî mane û tîkiliyeye nexweş a di navbera wî û dê û bavê wî de jî bandoreke pir neyînî li ser kesayetî û takekesbûna wî dihêlin. Di nav van hestên sereke de tirsaxwe herî berbiçav e, ku serdanpê tu laş û giyanên Kurdistanê jê bêpar nemane; wêje, şoreş, welat jî bi vê tirsaxwe hanê re dibin Pîra NA û wek kabûsekê li Sertacî jiyane diherimînin. Bi wan hest û ramanan re bawitî, wek bidawînehatina prosesa girêka odîpûs tirsaxwe xesandinê, desthilatiya jinan tevî xwe rewşa kurdan a civakî û polîtîk jî ji me re ronîtir dikin. Sekna nivîskarê pirtûkê Şener Özmen bi xwe li hemberî bav û kurî û bicihkirina xwe ya li navbera wan jî bala me dikişîne ku ew romana xwe diyariyî bav (bavê romana kurdî) û kurekî (kure xwe bixwe) dike. Gava em nenivîsandinê leheng bi kêmasiya mîranî yan jî desthilatdariya civakê dinirxînin, xwe bicihkirina di navbeyna bavê romana kurdî û kure xwe de jî tîra xwe hêjayî gotinê ye.

## Çavkanî

- Green, Adré (2004). *Hadım Edilme Kompleksi*, wer. Levent Kayaalp, Stenbol: Metis
- Lacan, Jacques (2005). *Écrits: A Selection*, wer. Alan Sheridan. London û New York: Routledge Classics.
- Özmen, Şener (2010). *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Parla, Jale (2011). *Türk Romanında Yazar ve Başkalaşım*. Stenbol: Weş. İletişimê.
- Semedî, Xelîl (2013). <http://www.komaxwendineaqosere.blogspot.com.tr/2013/08/xelil-semed.html>



## DI NAVBERA MÎNORÎ Û MAJORIYÊ DE Û JÊ WÊDETIR

Ferzan Şêr

Di teoriya wêjeyê de Major û Mînorî ji wateya peyvên xwe yên mîna mezinbûn û biçûkbûnê dertên, lê wateya serdestî û bindestiyê jî li xwe dikin. Helbet hiyerarşiyêke bi vî rengî di nav zimanan de nîne, qet nebe di zimanasiyê de haya min ji tiştêkî wiha nîne. Lê di bikaranîna zimên de hinek ziman ji yên din berfirehtir in. Di encama kolonyalîzmê de gelek zimanên dewletên cîhana yekemîn (îngilîzî, îspanyolî, portekîzî, hwd.) di gelek waran de cihê zimanên niştecihan girtine û bûne majorên wan. Mesele ne tenê kesên ku bi wî zimanî dipeyivin e jî. Di gelek qadan de serdestiya îngilîzî heye, di nav dîrokê de demeke dirêj Fransî wiha bû. Îcar meseleya majorî û mînorîyê bêtir di nav çandên hevbeş, ango di erdnîgariyên hevbeş ên zimanan de dest pê dike. Ji bo ku mirov behsa majorî û mînorîyê bike divê rasterast zimanên major û mînor li ber kesan alternatîfê hev bin. Li gor vê tespîtê îngilîzî û tirkî ji bo tirkên li Tirkiyê ne di vê tîkiliyê de ne. Belkî ji bo tirkên li Elmanyayê em dikarin vê bibêjin. Li Tirkiyeyê tirkî û zimanên din di nav vê tîkiliyê de ne; tirkî û kurdî, tirkî û ermenkî, tirkî û erebî major û mînorên hev in. Û ji vê jêderkê mirov fahm dike ku tîkiliya majorî û mînorî ji wan kesên bi du zimanî, ango ji bo wan kesên zimanên wan di nav qada dewletekê de "hindik" e an jî tune, tê sazîkirin. Ji bo tirkekî li Almanyayê tirkî zimanekî mînor e, lê tirkî li Tirkiyeyê ji bo kurdekî zimanekî major e.<sup>1</sup>

Dîroka majorî û mînorî bi ya min bi netew-dewletan destpêdike. Lewra majorî û mînorî piranî li ser qedexebûna zimanê mînor ava dibe. Wateya vê qedexebûnê rasterast wekî qedexebûna kurdî ye, carina ji tîkiliyên civakî jî kêmbikaranîna zimanan bi xwe re tînin, carina jî bi awakî neyekser sansurê, kêmdîtinê jî li ser hin zimanan çêdibe. Mînak em nikarin serdestiya zimanê farisî ya di serdema osmaniyan de (berî netew-dewletan) di vê kon-

1 Bi piranî wêjeya mînor wêjeya kêmarên ku bi zimanê serdestan dinivîsin e; di vî warî de îstîsna hene, hinek kes ji ber sirgûnî hinek jî ji ber derfet û sedemên dîtir bi zimanê biyanî dinivîsin. Ev kes jî daxilî wêjeya mînor dibin.

teksê de binirxînin. Lê piştî avabûna netew-dewletan gelek ziman bûn mînor û majorên hev. Wekî din yek ji taybetmendiya van her du tîgehên jî tercîh/mecbûrmana nivîskarên mezin bi xwe ye. Kafka, Beckett, Joyce yên ji nişka ve tîn bîra me ne. Kafka bi xwe serek amûr e di afirandina vê tîgehê de. Lê esil ev tîgîn bi riya xebatên Deleuze û Guattari tevî ramyariyê bûne. Di kitêba bi navê *Kafka: Minor Bir Edebiyat İçin* [Kafka: Ji Bo Edebiyateke Mînor] de vê tîgehê di bin sîwana sê rêgezan de diyar dikin; di mînorîyê de zimanekî bêcihûwar heye, her tişt polîtîk e, her tişt nirxeke kolektîv digire. Di nav taybetmendiyan de hevnişkarên vê deqê dema zimanên ku Kafka bi wan re tîkildar e (almanî, almaniya Pragê, çekî û yîdîşî) didin ber hev pêşniyarekêdikin: "ji bo her yek ji van zimanan, divê radejimarên bicihwarbûnê, ên bêcihwarbûnê û ên ji nû ve bicihwarbûnê bînin diyarkirin" (37).<sup>2</sup> Ya herî girîng mijara bêcihwarî û bicihwariyê ye. Lewma di heman nivîsê de tê gotin ku "Kafka, bi riya çekî berê xwe nade ji nû ve bicihûwarbûnê" (38). Gelo ku Kafka berê xwe bidaya "ji nû ve bicihûwarbûnê" dê çî biqewimiya? Em vê yekê nizanin û tu carî em ê bersivê ji vê yekê re peyda nekin. Lê kesên ku dev ji hunera xwe ya mînor (bikaranîna zimanê major) berdidin û dîsa li zimanê xwe yê dayikê vedigerin hene. Kurd ji ber ku di rêveberiya hemû dewletên dagirker de bi zorê zimanê serdestan fêr bûne; bi awakî (ne)siruştî her kurd kêr zêde bi du zimanî ye. Lewra kurdên ku bi erebî, bi tirkî û bi farisî dest bi nivîsandinê kirine û di pey re jî vegeyirane kurdî hene; her wekî din kesên ku rasterast bi her du zimanan jî dinivîsin hene; her wekî din li pey sirgûnbûnê rewşenbîran ên ku zimanên Ewropî jî li van zîde kirine peyda bûne. Nexwe di van zimanan de, di van çûn û hatinan de (ji nû ve bicihûwarbûn) hin taybetmendî jî dertên holê. Di vê nivîsê de em ê vê vegeyirînê veçirînin û pê ve em ê bibînin ne bi tenê nivîskarên mînor, kêmar gişt bi awakî di bin tîsîra vê bicihûwarbûnê de ne. Dema ev kesên ji mînorê vedigerin zimanê dayikê çalakiyên xwe yên hunerî û ramyarî didin zimanê dayikê; ger hay ji vê yekê (radejimara majorî) hebin ev vegeyirîn dibe çalakiyê avakar, lê na ger hêmayên majorî li gor formên zimanê majorî di zimanê nû de serdest bin hingê dibe çalakiyê rûxîner.

### Vegera li zimanê dayikê

Li jorê me behsa zimanê mînorî kir, îcar serdemek tê ku zimanê "kêm-ketî" ji xwe re qadeke tîkoşînê diafirîne û di encama wê tîkoşînê de ji xwe re bazarekê diafirîne. Ev yek di wateya xwe ya modernîteyî de bazar e. Nivîskarên "şoreşger" bi mebesteke, bi zanîneke xurt û bi eksekî nedîtî zimanê xwe bikartînin. Lê yên ku ji ber derfetên xwe yên polîtîk û civakî rê nedîtine ango ji ber sedemekê xwe di zimanê serdest de vegotine, derfetên zimanê dayikî xurt bibe vedigerin zimanê dayika xwe. Dema nivîskarên ku ji wêjeya

2 Radejimar di şûna "katsayı" ya tirkî hatiye bikaranîn.



mînor vedigerin ser zimanê dayika xwe îcar ji zimanê resen ê dayikê dûtir dikevin û zimanekî dîtir ji wê tevliheviyê dertê.<sup>3</sup> Ev ziman zimanekî taybet e, taybetmendiya wê jî bi radejimara zimanê majoriyê dertê holê. Mirov kare taybetmendiyên vê radejimarê jî di nav sê xalên sereke de kom bike; tehma wergerê, nebûna biwêj û qalibên resen, veguherandina dengsaziyê.

### 1- Tehma wergerê

Metnên di vê vegerê de dertên holê, ger radejimara wan zêde be tim bi awakî ji hevoksaziya resen bêtir wekî zimanekî çêkirî, tehma wergerê didin. Xwendevan ger nivîskarê metnê nas neke ango em nivîskar jê veşêrin dê bi dibêtiyeke girîng bibêje "ev berhem hatiye wergerandin". Ev yek jî li gor hostetiya nivîskar û zanîna wî/ê ya li ser peywendiyên di navbera zimanan de diguhere. Lê bivê nevē her û her mirov dikare şopên zimanê major tê de peyda bike. Em vê yekê jî bi çend tiştên şênber karin xuyangtir bikin. Yek jê ev e: dema mirov wê hevokê an bi giştî hevokên dîtir wergerîne zimanê major dê bibîne ku bêyî alîkariyên hunera wergerê dê bi rehetî bê wergerandin. Di metnê de radejimara majorî kêmbê belkî hinek zehmettir bibe lê di yê qels de ev yek gelek eşkere xuya dibe. A din jî wergêrên kurdî baş dizanin ku dema ji tirkî wergerê dikin peyva herî kêrhatî "ku" ye<sup>4</sup>. Ji bo hin ravekirin û temamkirina hevokên dirêj û kompleks pir bikêr tê. Helbet ne pêkan e em hemû "ku" yê di hevokan de bixin vî kîsî, ez vê yekê jî wekî nîşaneyê zêdebûna radejimarê dibînim. Ger em li vê hevokê binêrin wê mijar zelaltir bibe; "Li hundirên kompartmana pêşî du mirovên navsere, di dawiyên sohbetê ku xuyabû acizî dabû mirovê xerîb de bûn".<sup>5</sup>

3 Di destpêkê de bo vê vegerê û ji zimanê pêkhatî re min xwest bibêjim mîmajor. Mîmajor wekî têgeh ji mînor û majorê pêk tê, majorbûna zimanê mînor dinimîne. Mînor major cihê xwe diguherînin û carê major û hêmayên majorî di zimanê mînor de xwe diyar dikin û zimanê resenê ve carê dibe zimanekî taybet. Lê hinek xetereyên vê têgehê derketin. Ewîlîn wekî kategoriyeke di navbera mînori û majorî de bi cih dibû, lê angaştê wê ew bû zimanekî nû diafirîne. Wekî din ji ber ku ev veger ji aliyê Deleuze û Guattari ve hatiye îmakirin jî bi awakî xurt xwe bi têgîna mînoriyê ve girêdida, yanê pîrsa ku "têgîneke nû hewce dike an na?" derdixê holê. Lowma ez vê yekê jî bo ku navenda deqê bi xûmamekê re neyê pêçan bikarînim û bawerim bi nîqaşên berfirehtir û bi kamîlbûnê re ev têgeh wê li beşê edebiyata mînor û li zimanê mînor rûne.

4 Gihaneke "ku" formên wê yê dîtir "digel ku, ji bo ku, da ku, berî ku, heta ku" ji aliyê Îbrahîm Seydo Aydogan ve di sazkirina hevokên kompleks de wekî alavên zimên ên avakar hatine pêşkêşkirin. Ji bo werger û mijara "ku" yê, nemaze di warê pratîk de berhema bi navê *Guman-1* a Aydogan mînakên balkêş pêşkêşî me dîke. Di bikaranîna "ku" yê de ya girîng ew e ku divê mirov li gor dengnasî û zimannasiya zimên bi kar bîne. Ger li gor wê bi kar bîne wekî ku Aydogan jî balê dikşîne ser dê hevokên kompleks bikaribin di kurdî de saz bibin, lê ger ne li gor dengnasî û zimannasiya zimên bin hingê jî roleke hilweşîner digirin. Ji bo agahiyên dîtir li beşên "Hevokên Kompleks" û "Hin Pîrgirêkên Wergerê di Kurmancî de" a *Guman-1*'ê binêrin.

5 Ev jêgirtin û jêgirtinên bêyî jimara rupelê hatine dayîn, giş ji romaneke neçapkirî ya bi navê *Bêdengî* ye. Romana *Bêdengî* ji aliyê weşanxaneyê Aramê bo xwendina min hatibû şandin. Lewma li gor wê bidin. Taybetmendiyê wê berhemê, mînakdayînê jê bi min balkêş û kêrhatî ye. Ji ber ku bêyî karê sererastkirinê em rasterast nivîsa nivîskar a xav dibînin, û xavbûn jî ji ber ku bi têsîreke derveyî ne-majoriyê tê de kêmbûya, ji ber ku edîtor û redaktor hemû kêmasiyên ziman li gor zimanê resen sererast dikin. Di vir de metneke şifitazî heye.

Em dizanin ku sêha "tehm" jî bi xwe hatibû guberbar û subjektîf e, lê dema em dibejin tehma wergerê em nikarin behsa heman subjektîfîna bikin. Em mecbûr in xwe bişopînin li serî berbiçav û şênber. Lewra bi hebûna hemanên şênber re, wê kûrbûna tehma ber bi pîvaneka zanistî û rûniştî ve bimeşe. "Ku" wekî gihaneke yek ji wan tiştên şênber bû, lê divê em ji bo danîna avayî-yeke bîrêkîpêk çend tiştên din jî diyar bikin. Hevoksazî di vê mijara "tehma wergerê" de xalêke din a şênber pêşkêşî me dîke. Mînak di çirokbêjiya tirkî de, ango neqilîkirina hin vegotinên de lokera "dodî" li pey hevokê tê bikaranîn: "Ahmet ewe girdolim, dodî". Ev çirokbêjî di kurdî de bi lokera "gotî"ê pêk tê û di destpêkê de tê gotin. Mînak di *Martîna Baxtoara Jan Dost* de wiha tê neqilîkirin: "Paul konte, a got: Merise hevalo!" (69). Lê dema em "got"ê bavêjin dawîya hevokê "Merise hevalo, got Paul" em ê formê bişabîmîna forma zimanê major, jî wê formê bêtir wê jî herikbariya çirokkirina resen dîr bikeve. Mînak di romana "Sêlengî" yê de axaftineke wiha pêk tê:

"Gavê me çawa ye..." pîrsî bi heycan Behram. Nasor, bi rengêkî bêhêvî li rîyê wî nihêrî. Li şîma ku bersivêkê bide wê pîrsa wî, destê xwe avête mîlê wî: "Dewana tu hînesê bêhna xwe bide niha... Ji dûtir hatiyî tu!" got. "Rewşa wî pîr çawa ye?" got Behram bi dengêkî tengzar.

Dema mirov wê deqê dixwîne zimanekî biyani dixwîne, kurdî li kurdî hatibû biyanîkirin, wek ku mirov deqê jî zimanekî biyani dixwîne û bi zorê li kurdî hatibe wergerandin. Di vir de radejimara majorî gelek bilind e em dikarin bibêjin rasterast (bişî-derbişî) jî zimanê major hatiye girtin. Lê hin radejimarên jê jêrîr û serketîr jî hene. Mînak; di çiroka bi navê "Kaleh"ê de Şener Özmen wekî vebêjer "Go" bi kar aniye. Bi bikaranîna "Go" yê re bi awakî formel şewaza çirokbêjiyê li gor zimanê dayikê li vegotinê rûdine. Bi "Go" yê re radejimar dadîkeve jêr, ew jî tê wê mahneya ku nêzî zimanê resen dibe. Mijara radejimarê girîng e. Lewra di nivîsa navborî ya Deleuze û Guattari de behsa wê yekê dihat kirin. Di vir de radejimar dipejeyekê pêktîne; radejimara major çiqas zêde be ewqas jî zimanê resen dûtir dibe û wî zimanî lawaz dike, radejimar çiqas kêmbê bibe ewqas nêzî zimanê resen dibe û wî zimanî dewlemendtir dike.

Ne tenê bi tevahî hevoksazî, carinan jî veqetandek û hêmanên din ên hevokê jî li gor sazûmana zimanê major pêk tînin. Mînak em li vê hevokê binêrin "her du ber bi dereke dî ya germ ku ê şeva xwe lê derbas bikirana ve çûn." Dema mirov wê hevokê dixwîne ji sazûmana veqetandekê têdigihê ku bi awakî zordayîne hatiye sazkirin. Dikare bibêje "her du ji bo ku şeva xwe derbas bikin ber bi dereke germtir ve çûn" (herwekî din bi çend şeweyên dîtir jî ev hevok dikare bê sazkirin) lê nivîskar ne bi kurdî nûsîne bi avakirina wê veqetandeka nekurdî û çêkirî ve mijûl e.

Carinan jî radejimar hewqas bilind dibe ku edî rasterast peyvên herî hêsan ên kurdî jî tînin jibîrkirin, yekser zimanê serdest (di vê mînakê de tirkî) dike nav zimanê nivîskar. "Di kîjan cehenemê de ne ev!" hem hevoksazî tirkî ye hem jî peyva "cehennem" bi kêmkirina "n" yekê re hatiye pêşkêşkirin.



Em dizanın "cahnim" wek di mînaka "cahnima te kim" di kurdî de peyveke hêsan û çalak e, têr jî tê bikaranîn. Ne ku ev nivîskar vê peyvê nizane, radejimar hewqas bilind bûye ku êdî ji bilî fikra bicihûwarkirina zimanê serdest derfeta fikrê nemaye. Samuel Beckett yek ji wan kesan e ku li pey çalakîyên dirêj ên di zimanê fransî de, vedigere zimanê dayika xwe. Di nivîsa xwe ya bi navê "Samuel Beckett'in Ana-diliyle İlişkisi [Têkiliya Samuel Beckett Bi Zimanê Dayikê Re]" de Patrick J. Casement diyar dike Beckett dema vedigere zimanê dayika xwe di destpêkê de wergêrek alîkar digre ji xwe re (224). Li gor vegûhestina Casement, Beckett ji wergerê xwe re ji bo wergera *Molloy*'ê wiha gotiye "divê ne bi tenê wergerandî be, [divê] em di zimanê nû de pirtûkek nû binivîsin" (224). Belê bi rastî jî hêzeke veşartî ya vê vegerê jî nûkirin û pêşvebirina zimên e. Ev yek jî bi daxistina radejimarê pêkan e û di warê wergerê de encax bi lihevanîna kodên zimanê resen û hêmayên derveyî wê gengaz dibe.

Tehma wergerê di taybetmendîya Beckett de bi şenberî li ber me ye, lê ez dibêjim ger nivîskar qet wergêr bikarnîne jî ji ber duzimanî û bikaranîna wî ya zimanê serdest û her wekî din ji ber ku di nav sazûmana nîşanderên serdest de dijî bivênevê tehma wergerê dadiwerive nav zimanê wî/ê yê resen.

## 2- Nebûna biwêj û qalibên resen

Di zimanan de, biwêj û hinek qalibên resen ên wekî biwêjan tên bikaranîn nîşaneyên pêşketin û dewlemendiyê ne. Ev nîşane ji bo kesan jî nîşaneyên asta zanîna wî zimanî ye. Dema yek hay ji biwêj û qalibên resen ên zimanekî hebe dikare bibêje ku "ez bivî zimanî dizanim". Mînak em di ser tirkî re biçin û hevokeke ku tê de biwêjek heye hîlbijêrin, em bibêjin: "Siyabend yoluma taş koydu". Kesekî kêm tirkî zane ango hay ji biwêja "yoluna taş koymak" nîn be dê vê hevokê wiha wergerîne: "Siyabend kevir danî riya min." Lê ger hay ji biwêjê hebe dê rasttir wergerîne û wiha bibêje "Siyabend rê li ber min girt", ango "Siyabend ji min re astengî derxist". Wateya ewil û ya rast gelek ji hev dûr in. Îcar hin biwêj hene ku wateya wan rasterast dij û berovajîya hev in. Dema nivîskar li gor hişmendîya zimanê major bifikire û wergerîne zimanê dayika xwe ji wê biwêjê bêtir metaforên ecêb dertên. Di tirkî de dema dibêjin "edebiyat yapmak" tê wê mahneyê ku ew kes mijarê bi peyvên wêjeyî û xemilandî ji rastiya wê bi peyvê berovajî dike. Lê hûn rabin ji dêvla wê bibêjin "wêje dike" ev rasterast dawerivandîna hişmendîya zimanê serdest e. Lewra nebûn û kêmbûna van qaliban yekser ne nîşaneyên zêdebûna radejimara majorî ne, lê ez dibêjim encameke wê ne û ji bo me jî pîvaneke zêdekirina radejimara majoriyê ne.

Di vê mijarê de dîsa bi serpêhatîya Beckett û bi şîroveyên Casement ên li ser wî, tiştên balkêş û rêveker dertên pêşberî me. Li gor Casement "bi giştî, di wergerên îngilîzî de, em dibînin ku Beckett bi ziman û peyvên dilîze, bi peyvên nas pêkhatiyên nû çêdike, metafor, klîşe û biwêjên mirî lê hêj nete-

martî, bi jîndariyeke teze lê dike" (227). Bi vê jêgirtênê em him hêza nûkirin û pêşvebirina zimanê nû dibînin, him jî têsîra biwêj û qalibên resen a angaştî me eşkeretir dibe.

## 3- Veguherandina dengsaziyê

Hêmanek din a vê radejimarê di veguherandina dengsaziyê de pêk tê. Dema li hemberî peyvên zimanê major di zimanê nivîskar de peyvek nîn be bêçare serî li zimanên din dide. Ji ber ku her ziman ji bo hemû nîşanderan re tiştêkî resen neafirandiye (ango neafiriye) di nav zimanan de danûstandinên peyvên çêbûne. Lê her ziman li gor bilêvkirina xwe, peyvên li gor dengsazîya zimanê xwe veguherandine. Îcar radejimar di vê pêvajoya veguherînê de dixitîme (bilind dibe), frekansên dengsazîya zimanê major cihê zimanê mînor digire, tevlihevîyek çêdibe. Hem dengsazîya zimanê major dadiwerive zimanê mînor hem jî bi wê yekê re "bêhemdî" lînerîna serdastan jî pê re diyar dibe. Mînak piraniya dengên ku veguherîn li ser wan çêdibe ev in: "h" dibe "x", "u,ü" dibin "û", "k" dibe "q" (sadiq dibe sadîq) carinan jî "v" dibe "w" (heval dibe hewal), "d" dibe "t" hwd. Mirov dikare kêm zêde çend mînanan lê zêde bike, her wekî din helbet berovajîya van jî pêk tê, lê bi giştî bi vî rengî deng-veguherîn pêktên. Her zimanê serdest li ser biçûkkirina zimanê bindest rûdinê lowma em dibînin ku di vê deng-veguherînê de ziman ber bi bilêvkirineke "hişk, tund û qebe" ve diçe. Sedema vê "qebebûnê" di derhişî kolektîv a zimanê major de veşartî ye. Zimanê serdest tim û daîm zimanê bindestan wekî zimanekî qebe, hişk û neşareza didin nîşandan. Her çiqas nivîskar şareza, rewşenbîr be û bi hewleke şoreşgerî vegere zimanê dayika xwe jî bivênevê ev hêmaya derhişîn têsîrek lê dike, bi vê têsîrê re bandorê li zimanê wî/wê jî dike.

Beckett ji bo ku navê diya xwe veşêre ango jê bireve, wê pûç bike bi tîpa dawî a navê wê dilîze. Navê diya wî May e, di berhema *Molloy*'ê de May dibe Mag. Di heman berhemê de diyar dike ku kiteya yekemîn a May'ê Ma (dayik) bi tîpa "g"ê tê kuştin (veguhêst Casement, 217). Her ku em di vir de girêka odîpûs û metafora kuştina dayikê bixwînin jî, ji bo kirina vî tiştî bîkaranîna veguherandina dengsaziyê girîng û balkêş e. Tîpa "y"yê ber bi tîpeke "hişkîr" ve diçe serkiteya dayikê (Ma) dikuje. Ev yek di zimanê serdest de pêk tê yanê Beckett di zimanê serdest de vê dengguherînê pêktîne. Berovajîya pratîka radejimarê di angaştî me de di zimanê dayikê de dengveguherînê pêktîne, Beckett wek ku diyar jî dike vê yekê bi zanîn (hişî) dike lê ev yek di zimanê vegerê de bêzanîn/bêhemdî (derhişî) pêk tê.

## 4- Çavkaniyên derhişî û derhişî kolektîv

Têkiliya herî qewî ya di navbera ziman û derûniya kesan de bi riya psîkalanîzê hatiye sazîkirin. Sigmund Freud piraniya semptomên xwe di likmînin zimên de digere. Jacques Lacan ji ber ku mîratgirê binyatgerî (*yapısalcılık*) û yek ji pêşengên pişt-binyatgeriyê (*post-yapısalcılık*) ye, bivênevê tîkiliya wî



û zimên; ji psîkanalîstên din cudatir û xurttir e, lewma jî bi angaştî xwe ya rûniştî di pirtûka xwe ya *Psikanalîzin Dört Temel Kavramı*de (*Çar Têgehên Bîngelîn ên Psîkanalîzê*), dibêje "ziman wekî derhişê saz bûye" (26). Dîsa di pirtûka xwe ya bi navê *Guman-1* de Îbrahîm Seydo Aydoğan dema têsîra xwendîna wergeran li ser zimanê mirov dinirxîne wiha dibêje "şopa xwendinan di berhemên mirov de nikare were veşartin" (275) û bi vê hevokê re Aydoğan jî berê me dide wê çola derhişê. Ziman jî derhiş jî bi riya nîşaneyan xwe der didin, xwe bi rê ve dibin. Zimannasî ji Ferdinand de Saussure û vir de wekî qadeke xweser e; di hûrgûliyan de li ser gelek tiştan nîqaş bike jî "pergala nîşanderan" bi giştî ji aliyê gelek bizavan ve tê qebûl kirin.

Pergala nîşanderan ne tenê di zimannasîyê de ango di sazûmana zimên de heye, li her derê nîşan û nîşander hene. Nîşanderên trafikê hene, ên kompîtûrê hene hwd. Ev nîşander giştî dîsa bi zimên û bi alavên zimên re girêdayî ne, ji aliyê zimên ve tîr guhertin û bi awakî diakronîk di zimanan de guherînan çêdikin. Ji bo fahmkirina têsîra pergala nîşanderan divê em berê xwe bidin derketina rêbaza zêhişiyê (*stream of consciousness*), bê çawa derketiyê holê. Di pirtûka xwe ya bi navê *Epik Modern: Goethe'den Marquez'e Dünya Sistemi* (*Epîka Modern: Ji Goethe Heya Marquez Pergala Cîhanê*) de Franco Moretti wiha dibêje "di xala çerçerxa sedsalê de [sedsala 19.mîn] takekesên Rojavayî tekaneyiya xwe wenda kirin û ji bo Ezbûna parvebûyî jî pêdivî bi dîtina zimanekî hebû" (204). Bêguman ev ziman jî zimanê modernîzmê bû. Gelo ev zêhişî çawa dertê holê em hinekî lê jî binêrin. Bi pêşveçûna şoreşa pişesaziyê re jiyanên gundan ber bi metropolan ve çûn. Febrîke wargeha çîniya karker bû, karkerên girseyî, tevî sermiyan û çîniya navî ve tevde firehbûnek li wargeha xwe kirin. Ji van danûstandinên civakî gund ber bi bajarên ve veguherî, ew jî ber bi metropolê ve ajot. Metropol û dabeşkirina kar û şuxlan çîni û bineçîniyan li tevahiya civakê zêde kir. Guherîn bêrawest dimeşiya. Bonmarşe avabûn, xerîdar zêdebûn. Pêdivî bi reklamê çêbû. Reklam jî li ser peyvan e, ne hewceyî bi hevokên dirêj e û ne jî li gor qaîdeyên rêzimanê tevdi gere; li gor armanca firotinê bi xemilandinê re mijûl dibe, daxwazkariya tiştan, şehweta wan pêşkêş dike. Lewma ji wan peyvan, ji wan kurtebiwêjan, dirûşmên reklamên jî û helbet li gor aura'ya metropolê rêbazeke mîna zêhişî derket holê. Bo vê yekê jî wiha dibêje Moretti "[I]i bajarê peyvan, ji bo ku hin kes riya xwe peyda bikin pêdivî bi şêwazeke cuda heye; rêzimanekê jî bajarê hişmendiyê lawaztir; hevoksaziyê nedomdar û rakêşandî; qaşo kubîzma zimên. Û zêhişî jî tam vê yekê pêşkêş dike" (155). Di encama pêvajoyê wiha de modernîstên mîna James Joyce derketin, têsîrek mezin li wêje û zimên kirin. Bi vê mînakê re em dibînin ku pergala nîşanderan di bikaranîna zimên de xwedîhêzeke (ve)guherkar e.

Ger em têsîra nîşanderan di navbera zimanan de bidin ber bêjînga nirxandinê em ê bibînin ku zimanê serdest di kîjan waran de zext û tahdeyê li zimanê bindestan bike, ne bi tenê travmayên zimanî pêktîne di heman demê

de di derhişî wî zimanî de ji xwe re cih çêdike, nîşanderên xwe dişîne wir. Ji ber ku em li ser mînakên şênber ên mîna tirkî û kurdî diçin, em dikarin mînakên din jî ji ser vê tîkiliyê bidin. Kurd û kurdî ji bilî axaftina di nav civateke biçûk pê ve di tu qadên dewletê de, di tu qadên zimanî de nîne. Hemû qadên jiyanê ji aliyê zimanê serdest ve tê birêvebirin, hemû kodên zimanî, hemû pergalên nîşanderan bi zimanê serdest hatiye çewsandin; ji filmên karton heya markayên biskewîtan, ji axaftina bijîşkan heya navê amûra dirankiran giştî bi zimanê serdestan e. Zarok dema li cihekî dinêre raste-rast nîşandereke zimanê serdest û desthilatîyê dibîne. Di bin vê desthilatî û komêrîşên nîşanderên zimanê serdest de li deşta derhişê konên bêxêr û nekêrhatî vedidin. Lewma bixwaze jî nexwaze jî bi qasî radeyekê têsîra van hêmanên derhişî li zimanê kesan rûdine. Her kesê ku zimanê serdestê xwe zane -ev nivîs jî tê de- ji nîşanderên zimanê serdest û ji têsîra zimanê serdest ne bêpar e. Radeya têsîrê jî li gor radejimara zimanê major diyar dibe. Mînak di xwediyê romana *Bêdengî* yê de ev radejimar pirr mezin e, lê di vegotina Şener Özmen de jî kêmtir dibe.

Deleuze û Guattari vegera li zimanê dayikê wekî hewleke bicihûwabûnê û Odîpûsî, nîşaneyê girêka Odîpûsî dibînin (31). Dema em vegera Beckett a li zimanê dayikê bifikirin (Beckett li pey mirina diya xwe vedigere zimanê dayika xwe), ev nîşaneyê odîpûsî bi awakî paradoksî eşkere dibe. Ev paradoks bi vegera Beckett re metefora mirina (zimanê) dayikê jî bi xwe re tîne. Mirina dayikê bi şûndiyariya zimanê dayikê re tê bicihkirin ango ji bo ku di zimên de şoreşekê pêkbîne û nivîskar vegere zimanê dayika xwe lazim e dayik bimire. Nivîskarê vegerxwaz bi her du awayan jî zimanê dayikê dikuje; dema radejimar bilind be bi awakî neyînî ziman tê kuştin, ger radejimar kêmtir e bi awakî erênî jî bo dewlemendkirin û tezekirina zimên zimanê dayikê tê kuştin. Li gel wê hewla odîpâlî û şerê li hemberî wê (paradoks); divê bi awakî çalak çawa zimanê serdest konên hêmayên xwe di derhişî mirovan de vedabin, divê nivîskarê vegerxwaz jî (da ku radejimara xwe kêmtir bike) zimanê (zir)bavê xwe bi nîşanderên nû re bidewisîne. Bi awakî metaforîk belkî dayik jî tê de, lê divê mirina (zir)bavê xwe pêkbîne.

Wekî encam, ev veger û taybetmendiyê vegerê, pê re jî angaştî radejimarê jî tûnebûnê neafiriye. Belê tiştêkî nû ye, lê bi gelek tiştên heyî re jî girêdayî ye. Mînak bi benên qewî û xurt bi wêjeya mînor ve girêdayî ye, wekî din xemxurên kurdî dema bi awakî qerfî dibêjin "tirkmancî" behsa heman tiştan dikin û gelek nivîskarên kurdî di rexnekirina kurdî de vê yekê wekî pîvaneke zanîne digirin. Dîsa dema Deleuze û Guattari behsa "ji nû ve bicihûwarke bûnê" kirin rê li ber vê xebatê vekirin. Hewla vegera li zimanê dayikê ku xwe kêmdîtina mînorîyê destpê dike, ew jî wek em dizanin ji bêcîhûwariya zimên pêkdihat, ev hewla vegerê û pratîka wê dike ku wî zimanê xwe yê bêcîhûwar bicîhûwar bike. Di pêvajoya vegerê de du encamên bi hev re girêdayî û nakokiya hev dertên holê. Nivîskarên vegerxwaz dikarin zimanê xwe



dewlemendtir jî bikin, dikarin qels û lawaztir jî bikin. Ev yek jî girêdayiyê bicihkirina nîşanderên resen ên di derhişa mirov de û pê ve di dewisandina nîşanderên zimanê major de veşartî ye.

### Çavkanî

Aydogan, Îbrahîm Seydo. *Guman 1: Zimanê Kurdî*. Diyarbekir: Weşanên Lîs, 2013.

Casement, Patrick J. "Samuel Beckett'in Ana-diliyle İlişkisi". wer. Harika Yücel. Pasaj 4-5 (Tebax 2006-Çiriya Paşîn 2007): 212-229.

Deleuze, Gilles û Félix Guattari. *Kafka: Minor Bir Edebiyat İçin*. wer. Özgür Uçkan û Işık Ergüden. 2. Çap. Stenbol: Weşanên Yapıkredi, 2001.

Dost, Jan. *Martîne Bextewar*. Stenbol: Weşanên Avesta, 2012.

Lacan, Jacques. *Psikanalizin Dört Temel Kavramı*. wer. Nilufer Erdem. Stenbol: Weşanên Metis, 2013.

Moretti, Franco. *Epik Modern: Goethe'den Marquez'e Dünya Sistemi*. wer. Nurçin İleri û Mehmet Murat Şahin. Stenbol: Weşanên Agora Kitaplığı, 2005.

## HEVPEYVÎN BI MEHMET DÎCLE RE

### "Jibîrkin Mirin Bi Xwe Ye"

Di çîroka kurdî de yek ji navê hêja û serkeftî Mehmet Dicle ye. Bi pirtûka *Tayêre*, sê berhemên Dicle çêbûn. Dicle di çîrokên xwe de bajarekî bi navê *Asûsê* avakirî ye û gelek çîrokên wî li vî mekanê xeyalî(?) derbas dibin. Ev mekan çiqas bi navê xwe xeyalî be jî bi naverokaxwe jîewqasî bi awayekî xurt bi jiyana kurdan ve girêdayî ye û ji mirov tê li nexşeyê li cihê wê bigere. Asûs (wek mekan) mîna derekî ku êdî em niştecihên wan nas dikin, dawîya jiyana wan meraq dikin bi rih û can bûne ciranên me. Helbet zindîbûna Asûsê bi zî-rekbûna nivîskarê wê ve gîredayî ye, da ku êdî li ber xwendevan bûye cihekî bi nav û deng. Serkeftineke van çîrokan jî ev e ku tîkiliya form û naveroka çîrokan bi awayekî estetîk bi hev girêdayî ne. Hevokên kurt û xurt, biwêj, hal û tevgerên kevnare, tarîf û şayesandinên li gor dewra xwe, çend nimuneyên vê xalê ne. Me xwest ji bo vê hejmarê em bi Dicle re hevpeyvînekê bikin. Digel berhemên wî yên hêja, Dicle bi xwe zêde ne li berçave û liser berhemên wî kêmtîşt hatine nivîsîn. Lewrebi rêya vê hevpeyvîne, me xwest ku em Mehmet Dicle ji nêz ve nas bikin û bi xwendevanên xwe re bidin naskirin.

- Mekanê piraniya çîrokên te navçeyek biçûk a bi navê Asûsê ye. Çîrok bi me didin zanîn ku piraniya lehengan li vî bajarê xeyalî hev du nas dikin an haya wan ji hevdu hene. A din, di çîrokan de mirov ewqas xwe (wek civak) dibîne û dikeve nav çîrokan ku dadikeve kolanên wê jî. Lewma navçeya Asûsê di hişê min de, belkî ji yên rasteqîn bêtir şênber bû û min ew aîdî xwe dît. Ji bo çî navçeyeke xeyalî?

- Ev tişt ji bo min tercîhek bû, belkî jî ji ber ku Asûs navçeyeke xeyalî ye loma hûn wê aîdî xwe dibînin, an jî xwe aîdî wê derê dibînin. Her wekî dema ku ez kitêbên G. G. Marquez dixwînim Macondoya wî ya xeyalî ji min re pir nas tê, an jî Jefersona Fualkner. Yanî di vir de tiştêkî berevajî diqewime, xeyal me ber bi rastiyê ve dibe. Jixwe ev jî hêza wêjeyê bi xwe ye.

- Asûs wek bajar an mekanek çêkirî xurt dertê pêşberî meriv. Carinan di atmosfera jiyana kevneşop a kurdan carinan, taşrayek bitenê, tengezar, di monoton... Gelo meriv taybetmendiyê Asûsê bide berçav, meriv dikare vî mekanî di heman demê de wekî demekê an serdeman bixwîne?



- Belê Asûs ne tenê jiyana ku ez bûme şahidê wê ye, her weha paşeroj e jî. Binhişekî civakî ye. Jibîrbuyîne, an jî ku mirov bi hawayek din bibêje jibîrnekirine. Dema ku mirov guh bidê, di bédengiya şevên hemû navçeyên Kurdîstanê de çîrokên ku li Asûsê diqewimin wê werin bihîstin.

- Demên Asûsê meriv dikare bixe sê beşan. 1. ProAsûs an Beriya Asûsê, ku çîrokên vê demê an mekanê di atmosfereke kevneşopa kurdayetî de hatiye pêçandin, hê nixên feodalî an eşîrvaniyê serdest in. Jixwe bi vebêjîyeke rivayetsaziyê hatine nivîsîn. Mînak: Çîroka "Heyfa Mêran", "Axa Pîroz", "Sala Kulê" 2. Asûsa navîn, an TaşraAsûs: "Meqesê Zêrîn", "Gulê Salan", "Taveheyv" 3. Piştî Asûsê an Asûsa hemdem: "Taveheyv, Kampûs". Gelo tu li ser van û li ser Asûsê dikarî çi bibêjî?

- Wekî ku min got, ez nebûme şahidê hemû serdemên Asûsê, û dema ku ez nebûme şahidê wê bi piranî miriye, dibe ku ez gihîştibim çend şahidên dawîya wan deman û belkî jî yek caran rîwayeta rîwayetê hatibe ber guhê min. Ev jî bi rastî jî bo min kulek e. Ji ber ku wek xisletê nivîskariyê, jibîrkin mirin bi xwe ye jî bo min. Û mixabin gotin bi xwediyên xwe re dimire û li dû wan tu nivîs nemaye. Loma jî serdema Asûsê ya ku ez nebûme şahid bêtir bala min dikêşe. Dibê lingek zûtir ew çîrok jî mirinê bîn xelaskirin. Serdema ku ez şahid im jixwe wê çawa be jî bê nivîsîn.

- Di pirtûka te ya yekem, "Asûs"ê de ji deh çîrokan sê heb li Stenbolê an li derveyî Kurdistanê derbas dibin ku serpêhatiyên ew kesên ji Kurdistanê çûne Stenbolê vedibêjin: "Hêvî", "Simîtfiroş" û "Kampûs". Di ya duyem "Nara"yê de mekanê çîrokekê, "Şekirê Eydê" dîsa Stenbol e. Lê di ya sêyem "Ta"yê de hemû çîrok li Kurdistanê derbas dibin. Gelo ev tê wê wateyê ku te berê xwebêtir daye aliyê welêt û an tu vedigerî?

- Bi rastî ez di ferqa vê yekê de me. Serpêhatiya min jî mixabin serpêhatiya gelek kurdên sedsala dawî ye. Yanî her tişt bi veqetîne dest pê dike. Li dûrî welêt ez kûr dibim. Welêt di hundirê xwe de mezin dikim. Her çiqas dûr bim jî jî ber ku rehên min li wê ne ez jî wê xwedî dibim. Raste yek caran jiyana kurdên li derveyî welêt jî bala min dikêşe lê her tim berê min bi Kurdistanê ve ye. Min piştî sê kitêban vêya fam kir, ku ez bixwazim jî nuha nikarin çîrokên li derveyî welêt derbas dibin bibêjim. Ji ber çîrokên di derbarê axa ku ez lê mezin bûme hîn neqediyanê û hîn jî xewa min diherimînin.

- Gotin û teswîrên ku ji ruhê kevneşopiya kurdan, ji kurdiyêke orjînal tî gelek in wekmarekî piştîşkestî, bi guran re dizûrin, te çawa wêribû pez bidizî ber pozê me, pêsîrtengî, em ber bayê reş ketin, navçe wek sîtila danûyan ku dest bi kelandinê dikir, xewa qulqiliye wek seradê, hwd. Gelo têkiliya M.Dicle bi zimanê kurdî re di atmosfer an malbateke çawa de destpêkir ew jî bi çîrok û çîrvanokan mezin bû?

- Di malbata ku ez tê de mezin bûm de ji xwe ji bilî kurdî tu ziman nedihat axaftin. Tenê ne malbat jî li Hezroyê bi xwe tenê kurdî hebû û heye. Her weha mezinbûna li Hezroyê jî ji bo min awantajek pir mezin e. Hezro ciyekî biçûk e lê heta tu bêjî kevn e. Çawa ku Hîndû dibêjin, "Hîndistan ji dunyayê mezintir e", Hezro jî ji dunyayê kevintir e. Şikeftên ku mirovên serdemên serate tê de jiyane hene, hîn jî çîrokên dema Deqnenos tî qalkirin, ku navê wî yê orjînal Daqyanûs e û serokekî romayî ye. Çîrokên dema Asûriyan, yê dema şahê ecem, mîrekî li Hezroyê ava bûne, serhildan, tîkçûn, sirgûn, şerê eşîran, yê zirkî û silîviyan. Tiştên ku ji hafiza civakî wenda bûne û di tu nivîsan de derbas nabin hîn jî li Hezroyê tî qalkirin. Li gel van, ji ber ku bavê min seyda ye min li medreseyê xwend bi salan, ez bawerim ku wî jî zimanê min, dunyaya min a xeyalî û edebî xurt kir. Tevî van pîreke min a ku ji qalkirina çîrokan pir hez dike heye, ez jî ji wê pir hez dikim û ji çîrokên wê. Ez bawerim ku ew di şertên din jiyabûya ez ê nuha neviyê nivîskareke pir mezin bûma.

- Têkiliya folklor û edebiyatê gelek hatiye nîqaşkirin û nivîsandin. Folklor gelek caran çiqas avantaj be, ji bo edebiyatê hin caranewqas jî astengî ye. Hele di edebiyata kurdî de hin caran rasterast nivîsîna bûyerên folklorik wek cureyên modern tî qebûl kirin û gelek probleman di nav xwe de dihevine. Lê çîroka we ya "Nara" -ku çîrokeke bêhempa û gelek xweş e- û ya te feyza xwe ji folklorê kurdî jî girtiye bi awayekî gelek serkeftî jî hatiye hûnandin tu dixwazî derheqê vê danûstendinê de çi bibêjî?

- Min çîroka "Nara"yê di şûna deynê xwe de nivîsand. Ji ber ku min xwe deyndar didît ji dengbêjan re, wek diyariyek, wek silavek e li Şakiro û li hemû dengbêjên welatê min. Ger em werin ser têkiliya wêjeya modern û folklorê, rast e sîwdwergirtin divê, lê ji ber ku folklor wek behreke pir kûr e dema ku tu bibêjî ez xwar bibim tiştê jê bigirim dibe ku tu bişewşibî û tê de xerq jî bibî. Wê demê êdî tiştê ku tu yê bikî dê ne wêjeyeke modern û orjînal be. Lê bê wê jî nabe. Em nikarin bi giştî piştî xwe bidin folklorê jî. Tiştê ku emê bikin divê em zanibin ku em çi dikin. Yanî bi qasî folklorê divê em modernê jî nas bikin.

- Vêga çîrokên bi navê "Beysûs" û "Leylan"ê tê bîra min ku derûniya du extiyarên tenê teswîr dikin. Em dikarin vê derûniya wan wek encama di destpêka guherandinên civakek ku êdî têra xwe nake û ji qalikê xwe derdikeve bixwînin.

- Ev tespît li gorî min jî di cih de ye. Di çîroka "Beysûs"ê de, mîrekî ku êdî dema wî li paş maye û ew jî di ferqa vêya de ye heye. Dizane ew çi jî bike dem û dewran bi paş ve venagerin. Lê di ya "Leylan"ê de trajediyek din heye ku di roja me de jî tê jiyîn. Li hemû navçe û gundên Kurdistanê kal û pîrên ku zarokên wan ew tenê hiştine, tenê pîr dibin û heta ku dimirin jî çavên wan li rêya zarokên wan ên ku êdî hew dikarin vegehin hene.



- Meseleya jinên biyanî ku tê Asûsê çîrokeke trajîk li pey xwe dihêle. Sala û Hesên aqlê wan ji serê wan diçin, jiyana wan diherime diçe. Lê Behram Beg, Mîrê Asûsê yê dawî, bi jinek biyanî re, Mehbûbe Xanimê re zewiciye. Dema min xwend ev hate bîra min: **Ku Behram Beg nikaribûya bi Mehbûbe Xanimê re bizewice, îhtimal e wê aqlê wî jî ji serê wî biçûya.** Zarokên wan çênabin û xuyaye mîr ewqas jê hezkiriye ku qet nefikiriye careke din bizewice. Ev jî hat bîra min, gelo Mehbûbe ne biyanî bûya, jinek wî kurd hebûya, wek Mîrê dawî, wê dîsa nezewiciya?

- Di jîyanê de îhtîmal gelek in û yê min jî wekî nivîskarê van çîrokan îhtîmalên ku ez fikirîme û nefikirîme hene. Lê ez dikarim vêya bibêjim ferqa Behram Beg, Sala û Hesên heye hem jî ferqên pir mezin in. Sala û Hesên mirovên jî rêzê ne loma jî ew jinên biyanî neketine ferqa hebûna wan, evîn û herweha dînbûna wan jî, lê Behram Beg xwediyê statuyekêye ku gelek di ser Mehbûbe Xanima jina xwe re ye jî. Yanî zewaca wî ya bi Mehbûbeyê re ji bo wî ne tiştê mezîn e. Û tevî ku zarokên wî çênebûne jî ew çima nezewiciye, ji ber kesayetiya wî ya naîf e. Ew mirovekî romantîk e.

- Balkêş e di çîrokên "Nara" û "Ta" yê de tiving jî wek ku şexs be hatiye teswîrkirin. Mînak, tiving awir dide, ji ber şermê nateqe, teres dibe, tenê jinan dukuje lê mêran nakuje. Tê vê çawa şîrove bikî û ji bo vê çîrokê tu rexneyên femînîst li te hatin kirin gelo?

- Ger ez vê pirsê wek rexneyek femînîst qebûl nekim, wê bersiv na be. Rast e di van çîrokan de çek xwediyê kesayetê ye. Ruhê mirovan derbasî wan dibe. Di destê mêrxasan de bi mêrxasî diteqîn, di destê teresan de teres dibin. Her weha ez bawer im ku mirov dikare çîroka "Ta" yê bi çavekî femînîst jî bixwîne. Yanî meseleya kuştina jinan zulmek mezin e û mirov pê diêşe.

- Çîrokên te di gelek waran de serkeftî ne, sînor û şêweya wan diguhere û tam jî li ruhê çîrokan tîn. Lê di pirtûka te ya yekem de, di çîroka "Axa Pîroz" de dem demeke gelek fireh, tevnsaziya çîrokê di bin piraniya bûyeran de fetisiye, meriv dibê xwezî ev novelek bûya.

- Ev piçek girêdayî meseleya tîkiliya edebiyatê û folklorê ye. Aliyên folklorîk dibe ku di vê çîroka min de bêtir li ber çav be û dibe ku ez li hemberî hêza folklorê pir nesekinîbim. Loma jî dem dirêj bûye, bûyer zêde ne û qalibê çîrokê jî mijarê re teng hatibe, lê ji ber dema min ew çîrok nivîsand ez ne xwediyê sebrek mezin bûm loma ku ez nefikirîm dibe ku ew bûbûya novelek, rast e.

- Di gelek çîrokên te de behsa filehan pir tê kirin, di çîroka "Meqesa Zêrîn" de Aram navê filehekî ye, li Asûsa te ya çêkirî û Asûsa ku tu jê hatiyî de fileh hebûn? Çi tîkiliya te bi wan re hebû?

- Wekî gelek navçeyên Kurdistanê li cem me jî fileh hebûn û em bi çîrokên qirkirina wan mezin bûn, ev wekî tiştê normal dihat qalkirin û em li şikefta ku fileh hatibûn qirkirin, li hestiyên wan digeriyan dema ku ez

zarok bûm, ev ji bo me listik bû. Mezinên me li gencîneyên wan digerin hîn jî di kavilên dêrên wan de. Dema ku ez qala vêya dikim hin kes aciz jî dibin û dibêjin wekî ku civaka me ji kuştina wan berpîrsiyar be tu qal dikî. Baweriya min bi dîroka nivîsandî pir tune. Dîrok tiştê ku li Asûsê hîn jî tîn qalkirin bi xwe ye. Tîkiliyek min a din jî ew e, fileh nemane nuha li navçeya me lê hevalên min ên "Bavfileh" gelek in.

- Erê nêzî hemû çîrokên te dilê mirov pir diêşîne lê di pirtûka "Asûs"ê de çîroka "Hêvî" yê mirov bi awayekî din diêşîne, aciz dike, reşbîn dike û mirov naxwaze bawer bike. Ew çîrok çiqas bi rastiyê ve girêdayî ye gelo?

- Hemû çîrok bi rastiyê ve girêdayî ne, lê ez dikarim vêya bêjim tu berhemek edebî nikare bi qasî jîyanê tehl û trajîk be, mirovan biêşîne û reşbîn bike. Ez bawerim ku di kolanên Stenbol û Diyarbekirê de her roj gelek "hêvî" tîk diçin.

- Di hin çîrokên te de hevokên te kurt, tîr û tije ne bi derbekê de li serê meriv dikevin meriv dikşînin nava xwe û ev şêwe gelek li naverokê tê. Yanî meriv dikare birihetî bibêje naverok, form, şêwe gelek serkeftî li hev hatine. Mînak çîroka "Heyfa Mêran" ji ber van yekan çîrokeke gelek serkeftî û xweş e. Gava min ev çîrok xwend çîrokên hêja yên Juan Rulfo hatin bîra min. Gelo M. Dicle kîjan nivîskaran dişopîne ji kîjanan hezdike.

- Spas ji bo van gotinên te. Her çîrokek xwediyê ruhekîye û her çîrok bi her awayî nayê qalkirin. Di hin çîrokan de hewcedarî bi teswîran heye, hinek hewce ne ku bi hevokên kurt werin qalkirin, hinek divêt monolog bin, ji hinekan re diyalogên xurt hewce ne. Ji ber ku Juan Rulfo hat bîra te ez kêfxweş bûm. Bi rastî jî ji bo min kaniya edebiyatê Emerîkaya Latîn e û ez wek xwendekarek bi kêfek pir mezin nivîskarên Emerîka Latîn dixwînim. G. G. Marquez, J. Rulfo, I. Alende, G. Amado, C. Fuentes û hemûyên din ji bo min mamosteyên mezin in.

- Wek li berga paşîn jî hatiye nivîsîn, te ji mirovên biçûk û sade karakterên mezin ava kirine. Mirov difikire bê hê çiqas mirov, çî biçûk çî mezin an bûyer li bendî nivîskarê xwe ne ku di wêjeyê de cihê xwe bibînin. Bi ya te, gelo nivîskarên kurd çiqas li dora xwe dinêrin an dora xwe dibînin û jê îstîfade dikin?

- Ez hertim dibêjim mixabin di civaka me de bi qasî ku em nexwazin mijar hene. Ev jî karesata civaka me ye. Ji ber ku di civaka me de trajediyên mezin hatine jiyîn û tenê ne ev jî civaka me xwediyê ruhekî mezin e mîzahî ye jî. Zimanekî pir xurt heye. Folklorek dewlemend, lê ev hemû tîr nakin ku em bibin nivîskarên mezin. Hewce ye ku em li dersa xwe baş bixebitin, pir bixwînin ji bo ku fêr bibin divê çawa bê nivîsandin. Ji bilî vêya ez dikarim bibêjim ku hemû nivîskarên kurd li dora xwe dinêrin û dora xwe dibînin, afirandina edebî bi dîtinê dest pê dike lê dîtin tenê dîtin e.



- Piraniya nivîskarên kurd berbiçav in em gelean li ser medyaya sosyal dişopînin, ji bilî berhemên edebî, rexne an ceribandinan dinivîsin em ji wan haydarin. Lê M. Dicle hinekî bêdeng e em wek xwînerê te meraq dikin. M. Dicle çi dike? Rojê wî çawa dibore? Çi wextî, çawa dinivîse?

- Bi rastî min jî çend caran xwest ku ez rexne û ceribandinan binivîsim lê min dît ku ji bo vî tiştî serê min pir tevlihev e. Yek jî ez êdî bawer im ku ez ne mirovek pir sosyal im. Dibe ku tiştek pir rast nebe lê ez dixwazim tenê bi berhemên wêjeyî hebim. Her weha jiyana min jî ne ewqas balkêş e. Ez nuha li Stenbolê dijîm, mamosteyê cografyayê me, zewicandî me û keçek min a sê salî heye ku min ji nivîskariyê pir dûr dixîne. Piştî ku ew radikeve dem pir kêr dimîne ji min re. Ez derengê şevê li ber ronîya mûmê û bi piranî zivistanan dinivîsim.

- Hûn kîjan nivîskar, kovar û berhemên kurdî dişopînin?

- Nav gelek in û her roj kesên nû derdikevin, lê ji bo kovar û çapameniyê mixabin em karin bibêjin ku ew hîn jî êşa me ya mezin e. Heta ku ji destê min tê nivîskarên ku hene dişopînim. Û hevalên serkeftî min motive dikin, baweriya min a bi edebiyatê xurtir dikin, ez spasdarê wanim.

- Em jî spasiya te dikin.

hevpeyvîn: Mihemed Şarman-Fexriya Adsay

## DI NAVBERA HEBÛN Û NEBÛNÊ DE SÎNEMAYA KURDÎ SÎNEMAYA KURDÎ LI GOR KÎJAN PRENSÎBAN DIKARE BÊ BINAVERKIRIN?

Yılmaz Özdil

Yekemîn projeksiyona sînemayî 22yê Kanûna 1895an li Parîsê, li Grand Cafeyê, ji aliyê du birayên bi navê Auguste û Louis Lumière (*Frères Lumière*) ve hate çêkirin. Piştî wê projeksiyonê îcada *Birayên Lumière* ya bi navê "cinématographe", ango yekemîn cîhaza qeydkirin û nîşandana wêneyên bi hereket, wekî mizgîniya modernîteya sedsala 20. li her derê dinyayê belav dibe. Di heman demê de, bandora îdeolojiya nasyonalîzmê jî li ser hemû kevnesîstemên desthilatdariyê zêdetir dibû û dewletên împaratoriye yek bi yek hildiweşiyên.

Şerên di navbera dewletên mezin de û herwiha krîzên çandî û aborî dibin sedemê bikaranîna sînemayê ji bo qeydkirin û parastina arşîvên dîrokî û propagandaya leşkerî. Di vê qonaxa aloz de, ku heta dawîya Yekemîn Şerê Cîhanê berdewam dibe, rêya sînema û îdeolojiya nasyonalîzmê jî dibe yek û sînema bê hemdê xwe dikeve bin etîketa "dewletên neteweyî". Bi gotineke din, hemdemiya peydabûna hunera sînemayê li gel pêvajoya belavbûna nasyonalîzmê li cîhanê, wate û armanca sînemayê jî diguherîne û sînemayê, hem wekî hunereke nûjen hem jî wekî dezgeheke ragihandinê/propagandayê di nav saziyên dewletî de bi cih û bi nav dike. Her wisa, li cem hinek gel û dewletên rojavayî yê wekî Îran (1) û Împaratoriya Osmaniyan (2), hem bi wateya sembolîk (îcadeke nûjen û ewropayî/rojavayî) hem jî bi wateya xwe ya hunerî (derfeta jinûve avakirina dinyaya rasteqîn), hunera sînemayê dibe amrazê îdealîzekirina modernîteya (3) rojavayî. Îro, herçend pêşveçûnên siyasî û teknîkî wate û sînoren sînemayên neteweyî hinek guhertibin jî, hunera sînemayê hê jî bi tevahî ji bin nîrê dewletên neteweyî, yan jî netewegeriya dewletan derneketiye. Lê, divê mirov bi bîr bîne ku îcrakirina hunera sînemayê nisbet bi hunerên ciwan ên din giranbhatir, aloztir û zehmettir e. Ji bilî daxwaza dewletan ya bikaranîna hêz û bandora hunera sînemayê ji bo propagandayê, ev rastî jî dibe sedemeke din a girêdana sînemayê bi saziyên dewletî ve.



### Sînemaya neteweyî û dewleta neteweyî girêdayî hev in

Gelo sînemayeke kurdî wê çawa bikaribe xwe di nav vê tevna îdeolojîk de binexşîne ku sed sal berî niha hatiye raçandin? Pirsgirêkên li hember nasîn û binavkirina sînemayeke kurdî, bi piranî, ji têkiliyên di navbera kurd, nasname û sînemayên neteweyî yên dewletên serdest de "dipekin". Ji ber ku hebûna sînemayeke neteweyî, girêdayî hebûna dewlet û nasnameyeke neteweyî ye; nebûna sînemaya neteweyî ya kurdî jî girêdayî nebûna nasnameya neteweyî, ango nebûna dewleteke neteweyî ya kurdî ye. Bêyî ku em karîkaturîze bikin, li gor vê formulasyonê, sedemên pirsgirêka kurdî û sedemên bênavbûna sînemayeke kurdî yek in. Her wisa, pirsgirêka kurdî, ya ku di dîskûrên politîk ên kurdan de bi rêya peyvên "red" û "înkâr" tê zimên, di wateya temsîliyeta kurdîniyê ya di sînemayên neteweyî de, wekî veşartina (dissimulation) hemû *formên maqûl* yên nasnameyên kurdî xwe pêk tîne. Yanî, înkarkirina politîk a nasnameya kurdî dibe sedema veşartina hemû formên xweser yên kurdîniyê di sînemayên neteweyî yên dewletên li dijî kurdan. Di vê wateyê de, perdeya spî ya sînemayê ku hemû gelên xwedî dewlet xwe li ser dibînin û didin diyarkirin, li pêşiya hebûna kurdan di destên dewletên neteweyî yên dijberî kurdan de dibe perdeyeke tarî.

Qesta min ji gotina "formên maqûl yên nasnameya kurdî", ne nîşandaneke realist/objektîf a kurdîniyê ya bi destê "biyaniyan" e. Di çarçoveya meselaya kurdî de, ku zêdeyî sed salan e dewam dike, temsîlkirina kurdan di sînemayê de hindî ku bi destê biyaniyan be, di navbera zimanekî sînemayî yê objektîf/realist an jî yekî subjektîf/fiktîf de ferqên girîng nînin. Tê qebûl-kirin ku *zimanekî sînematomografîk* (langage cinématographique) yê subjektîf/fiktîf bi giştî xwe dispêre *metaforan*, lê *zimanekî sînematomografîk* yê objektîf/realist xwe dispêre *mêtonîmiyan*. (4)

**Tirk bi riya sînemayê, nasnameya kurdî wekî "nasnameyeke xirab" nîşan didin, ji bo ku nasnameya tirkî wekî nasnameyeke "modern û rewşenbîr û netewehez" nîşan bidin.**

Di çarçoveya behsa temsîlkirina kurdan di sînemayên biyanî de, sînorên di navbera metafor û mêtonîmiyê bi hêsaniyê radibin. Gelek caran, rastiyan civakî an jî politîk ên kurdan, bi rêya nîşandana "parçeyekî" xirab tî sero-binkirin. Bo mînak, mijarên li ser "jinkuştin û feodalîya kurdan" di sînemaya neteweyî ya Tirkîyê de pir caran wekî mêtonîmî/parçeyekî ne baş a rastiya kurdan tê bikaranîn û "kurdîni" wekî feodalîteyeke kevneperest tê nîşandan. Di gelek filmên tirkan de (5), "jinkuştin" (ew dibêjin *namus cinayeti*), "axaftina bi aksan ya bi tirkî", "bêfamî/cahilî", "destkurtî û feqîrî", "tund û tûjiya olî" û "cil û bergên kurdî" wekî kodên feodalbûn, ango paşdemayîna kurdan tî bikaranîn û bi vî awayî dibin amrazê biçûkkirin/biçûkdîtina kurdan. Rast e, feodalî û jinkujî, qasî hemû civakên rojavayî (tirk bi xwe jî tê de) rastiyeke civakî ya kurdan e. Lê, her çiqas ev perçeyekî ji rastiya civaka

kurdan be jî, yekem sedema avakirina "îmaja hovîtiya kurdan" di filmên tirkan de nîşandana feodalîyê nîne. Ev îmaj, berî her tiştî, di nav dîskûrên filman de li gor konseptên îdeolojîk yên veşartî tî avakirin. Di filmên tirkan de, lehengên filmîk yên sereke di avakirina "îmaja hovîtiya kurdan" de xwedî misyoneke mezin in. Ew leheng ku her car bi kêmi, yek ji wan tirkekî "modern" (6), "rewşenbîr" û welatparêz (neteweperest) e, mîna prototîpên ideal ên nasnameya fermî û modernîzma kemalist tî karakterîzekirin. Mesela, di wan filman de ji aliyekî ve kurdîniyê wekî kêmasî û kevneperestiyekê tê kodkirin, ji aliyê din jî tirkbûn, li dijî kurdîniyê wekî nasnameyeke ideal a neteweyî tê xemilandin. Sedema "afirandina" vê dualîzma îdeolojîk, bêyî ku peyvên "kurd" an jî "Kurdistan" bî bikaranîn, piştgirtin û qewîkirina nasnameya neteweyî ya tirk e. Ji ber vê yekê, di wan filman de kurd çiqas "rojhatiyên paşdemayî" bin, tirk ewqas "rojvayiyên pêşdaçûyî" ne, kurd çiqas "bêfam", "jar" û "perîşan" bin, tirk ewqas "bi aqil", "jîr" û "bextewar" in. Yanî dawîya dawî mesele tê ser gotina Atatürk: "*Ne mutlu Türküm Diyene*". Eşkere ye ku vegotina (naration) mijara feodalîyê di filmê derhênerê kurd de, heke bi zimanê kurdî û ji bo kurdan hatibe kişandin, tu cara nabe sedema neqedirgirtina nasnameya kurdan. Ji ber ku, di filmekî ku bi destên kurdan û bi kurdî hatibe kêşandin de, "kurdîni" wê di nav hiyerarşiyeye navxweyî de û bi çavekî kurdewarî bê nîrxandin. Bi gotineke din, ev nabe amrazê mezinkirin û îdealîzekirina nasnameyeke din ku xwe li dijî nasnameya kurdî ava kiriye.

### Sînemaya kurdî çi ye?

Ne bi tenê ji ber sedemên îdeolojîk, her wisa ji ber sedemên teknîkî û hunerî jî "nîşandana" dinyaya reel bi rêya sînemayê, tim û tim, li gor dîtin û niyetên ew kesên ku biryara dîskûr û esasên kêşana filman didin, tê guher-tin. Ji ber vê yekê, ji bo min, maqûliyeta temsîlkirina kurdîniyê di sînemayê de, tê wateya "heqê xwe-vegotin" û "xwe-nîşandan" a kurdan wekî kurd û bi zimanê kurdî. Ez bixwe ji gotina maqûliyeta meşrûiyeta temsîlkirina kurdan, çêkirina filmên *bi zimanê kurdî*, bi dest û derfetên kurdan û li ser jiyana kurdan tê digihim. Li ser vî esasi û li gor filmên derhênerên kurd ên ku heta niha di salonan de hatine nîşandan, yan jî li ser bingehekî dijîtal (DVD, VCD û hwd) an jî analog (şerît, band û hwd) hatine qeydkirin û min bixwe dîtine, pêşniyaza min ji bo tarîfa sînemaya kurdî ev e:

Sînemaya kurdî ji filmên ku ji aliyê derhênerên kurd ve hatibin kêşandin, ku zimanê wan bi tevahî (intégralement) an jî bi giştî (principalement) bi kurdî be û ku mijara wan li ser kurd û Kurdistanê be, pêk tê. Li gor vê tarîfê du paradoksên mezin ku ji pirsgirêka kurdî ya politîk dizên, derdikevin pêşiya sînemaya kurdî. Paradoksa yekê ev e: Sînemaya kurdî, wekî sînemaya gelekî bîndest, ji sînemayên neteweyî yên gelên serdest zêdetir pêwîstî bi piştgiriya finansman û sazîyên dewletî heye. Berevajî sînemayên neteweyî, sînemaya



kurdî ne xwedî temaşevan e, ne xwedî bazar e, ne jî xwedî nasnameyeke fermî ye. Her wisa ji ber nebûna bazar û temaşevanên kurd, ew nikare, wekî dezgehên din ên ragihandin û xwe-îfadekirinê jî, hebûna xwe *bi tamamî* bi hebûna bizavên siyasî yên kurd ve girêbide. Ev kêmasiyên aborî bandoreke mezin li ser naveroka filmên kurdî dikin û gelek caran derhênerên kurd mecbûrî lêgerîna "çîrokên sivik" dikin ku çêker û temaşevanên "ne-kurd" nikarin û naxwazin filmên kurdî çêbikin û temaşe bikin. Paradoksa duyem jî ev e: Sînemaya kurdî, heya vê gavê armanca hebûna xwe, wekî eşkerekirin û nîşandana "kurdîni" yê destnîşan kiriye. Yanî mîsyona sereke ya sînemaya kurdî şikandina *kodên politîk yên veşartina kurdîniyê* (7) ye. Lê, mixabin di halê hazir de, filmên derhênerên kurd ku mirov bikare di bin navê sînemaya kurdî de analiz bike, bixwe ji aliyê wan kodan ve hatine dorpêçkirin û veşartin. Ev rastî careke din hebûna sînemaya kurdî bi pirsgirêka kurdî ve girêdide.

Çend taybetmendiyên sînemaya kurdî yên ku li gor tarîfa min derdikevin pêş çav, ev in:

- 1) Zimanê kurdî di binavkirina sînemaya kurdî de faktora sereke ye. Lê, ji ber sedemên aborî, politîk û hunerî, zimanê kurdî nikare bibe zimanê yekane yê sînemaya kurdî. Ji bo ku em bikaribin filmê derhênerê kurd di bin navê sînemaya kurdî de kom bikin, divê ev film, ne bi tevahî jî be, bi giştî (ji % 50 zêdetir) bi zimanê kurdî hatibe kişandin.
- 2) Rola derhênerên kurd di nasîna sînemayeke kurdî de ji ya çêkeran girîngtir e. Lê derhênerên kurd di heman demê de, hem xwedî nasnameyeke kurdî ne, hem jî girêdayî nasnameyeke fermî ne. Ango, li hinek cihan û car caran wekî kurd, li hinek cihan jî li gor nasnameyên xwe yên fermî tên naskirin. Ji ber vê yekê mijar û zimanê filmên derhênerên kurd, mixabin, têra kurdbûna filmên wan nake. Ew dibe ku bibin berpirsên danasîna filmên xwe di bin navê sînemaya kurdî de. Ango, ji bilî naveroka filmên xwe, derhênerên kurd dibe bi dîskûrên xwe jî bibin wesîleya danasîna filmên xwe di bin navê sînemaya kurdî de. Kampanyaya danasîna filma dawî ya **Hiner Saleem** "*Heke tu bimirî ez ê te bikujim*" pir baş nîşan dide ka bi çi awayî derhênerê dikare bi dîskûrên xwe yên medyatîk filma xwe bike "kurd".
- 3) Filmên kurdî bi tevahî behsa mijarên politîk dikin û bi gelek lewnan dişibin dîskûrên hereketên politîk yên Kurdistanî. Bi gotineke din, sînemaya kurdî xwe li ser bîr û baweriyên dîroka kurdan a politîk ava kiriye û mîsyona xwe wekî nîşandana kurdan diyar kiriye. Ev rastî qedre hunera sînemayê (ku hunera dîtin û nîşandanê ye) ji bo gelê kurd (ku di dîrokê de her dem hatiye veşartin) zêdetir dike. Lê di heman demê de ziman û estetîka sînemaya kurdî di nav mijarên politîk de asê dike.

- 4) Di filmên kurdî de mijara filmê li gor/bi çavên lehengên filmîk yên kurd tê raçandin û kamera bi rêya wan, derdora wan nîşan dide û *cih û dûmenên filmîk ava dike*. (8) Lê, her çiqas di filmên kurdî de mirov dikare li ser hebûna kurdan behsa nêrîneke xweser bike jî, divê em ji bîr nekin; heya ku li her çar parçeyên Kurdistanê bazara sînemaya kurdî peyda nebe, pir zehmet e ku derhênerên kurd bikaribin di filmên xwe de, xwe bi yekcarî ji nêrînen oryantalist, anga xwe ji "bi çavên biyanîyan li xwe nêrîne" biparêzin.

Li gor vê tarîfê, piraniya filmên derhênerên kurd ên ku li diasporayê dijîn (9), bi taybetî yên **Hiner Saleem**, filmên **Bahman Ghobadî**, piraniya filmên derhênerên Kurdistanê başûr, filmên derhênerên ji rojhilata Kurdistanê yên wekî **Cemîl Rustemî**, **Şehram Alîdî**, **Şîrîn Cîhanî** û ji Kurdistanê Bakur filmên **Kazim Öz** dikarin di bin navê sînemaya kurdî de bîn binavkirin. Her wisa, filmên **Hiner Saleem** û **Bahman Ghobadî** ku li her derê dinyayê tên dîtin, di naskirin û çêbûna sînemaya kurdî de xwedî roleke pêşeng in. Ji aliyê din, bêtir ku em behsa kalîteya hunerî/estetîk, qezenca aborî, bandor û xweseriya naveroka filmên wan bikin, eleqe û enerjîya derhênerên kurdên Başûr divê wekî îşareta mezinbûna sînemaya kurdî li başûrê Kurdistanê bê dîtin.

*Le Monde diplomatique kurdî*, hejmar 48, Çiriya Paşîn 2013

### Çavkanî

1. Dabaşî, Hamid, *Iran Sineması: Geçmişi, Bugünü ve Geleceği*, wer. bo tirkî, Barış Aladağ, Begüm Kovulmaz, Stenbol: Pirtûkxaneya Agora, 2001, r : 1-24.
2. Evren, Burçak, *Sigmund Weinberg: Türkiye'ye sinemayı getiren adam*, Stenbol: Weşanên Milliyetê, 1995, r:35.
3. Ji bo têkiliyên di navbera sînemayê û modernîzmê de binêrin, Aumont, Jaques, *Moderne? Comment le cinéma est devenu le plus singulier des arts*, Parîs: Cahiers du Cinéma, 2007
4. Bn: «*Filmer le passé dans le cinéma documentaire: les traces et la mémoire*», Caillat, Association des cinéastes documentaristes, Parîs: L'Harmattan, 2003.
5. Filmê Korhan Yurtsever, *Fırat'ın Cinleri*, 1977, (*Cinnên Fıratê*) û filmê Ali Özgentürk yê bi navê Hazal, 1977, (*Xezal*) du mînakên pir balkêş in ji bo vê nêrîna îdeolojîk.
6. Ji bo dîskûra sînemaya neteweyî ya Tirkiyeyê binêrin: Umut Arslan YEĞEN, *Gecikmiş Modernlik, Ulusal Kimlik Ve Türk Sineması*, T.C. Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Radyo Televizyon Sinema Anabilim Dalı, Enqere, 2007.







zirkmakî bin divê ji dêvla girtîgehan em wan têxin nexweşxaneyan û wan tedawî bikin.<sup>2</sup> Teoriya duyem vê yekê qebûl nake û dibêje ku însan; bi çi awayî ji dayik bûbe ewqasî jî ne girîng e. Lewra hawirdor, perwerdehî, bandora dê û bav û hwd. li ser çêbûna karakter heye û ji ber vê jî berpirsiyar e; lewra wî bi xwe ev yek bijartîye. Heger em li gorî van teoriyan werin ser Bekoyê destana Memê Alan ku bi xerabiya xwe bûye semboleke em ê bigihên encameke çawa? A rast jî Beko bêtir em li qîza wî binerin em ê çi bi dest bixin. Lewra wexta ku Mem tê Cizîrê -berî ku were Xoce Xizir li ser Beko û qîza wî Zîn, agahînin dabû wî- û li ser şet qîza Beko dibîne, li vir ewilî xwe weke Zîna ku hatibû qesra wî nîşan dide û ji bo ku Mem jê bawer bike gustîlka tiliya xwe rê wî dide, piştî ku dibîne Mem jê bawer nake û dixwaze here Cizîrê, ji Zînê pirs sa cihekî ne kûr dike bo ku bi hespê xwe bi rehetî ji şet derbas bibe. Vê carê jî cihekî kûr wek cihekî nizm rê wî dide û wexta ku Mem dibîne ku kûr e hema berê Bozê Rewan vedigerîne. Zîna qîza Beko bi wê yekê jî qîma xwe nîne û xwe şilfitazî dike û tê pêşiya Mem û dibêje: ez li ciyê xwe rûniştîme, tu werî û namûsa min xerab bikî/bihetikîni vê pîsiyê bi ser min da bînî!<sup>3</sup> Piştî vê gotinê bazarek di nav Zîna qîza Beko Awan û Mem de çêdibe, ku Mem Zîna Zêdan li hespê Bozê Rewan kir û pê ve divê wê jî li hespê xwe siwar bike û wê jî bi xwe re bibe Bajarê Mixribîyan. Ji bêgavî Mem vê yekê qebûl dike û encax dikare ji destê wê xelas bibe. Qîza Beko piştî vê peymanê, xayintiyê bi bavê xwe re dike û ji Mem re dibêje ku tu ji cem min here û pê ve tu dê rastî kalekî bê û taybetiyên Bekoyê bavê xwe rêz dike. Vê carê rêya ku dê Mem bi çi awayî ji destê Beko bifilite nîşanî Mem dide. Karaktereke ewqas ji xerabî û berjewendîyan hez bike û ji bo vê yekê karibe "*bavê xwe jî bifiroşe*" ji bo çi li ser jinê hatiye tetbîqkirin hêjayî lêkolînê ye. Di vir de hîn berî ku Mem derbasî Cizîrê bibe ji aliyê qîza Beko Awan rastî ewqas xerabî û bêbextîyan tê, li vir berî ku Mem rastî "mêr"ekî bê rastî "jin"ekê tê. Di xirîstîyaniyê de "jin" wek alîkara "şeytên" tê qebûlkirin û hemû gunehên ku em dikîşînin jî ji ber "jin"ekê ne. Lewra ya ku mêr dibe "dara qedexê" jinek e û ji ber wê jî mifta deriyê gunehan e. Li gor rola jinê ya "dîrokî" û "olî" meriv li şandina qîza Beko binihêre ku; weke objeya xerabiyê ya ewil derdikeve pêşiya me; "jin" jî aliyê "mêr"ekî (bavê wê) ve ji bo ku biçe pêşiya Mem bibire, fen û fûtan lê bike û wî ji ser rê bibe hatiye şandin. Ku qîza Beko "werê" be kî dizane wê jî aliyê Beko bi xwe çi xerabî û dek û dolab werin serê Mem. Bi xêra qîza Beko em dikarin wê û bavê wê bidin berhev û li ser Beko bibin xwediyê fikrekê. Îcar di vir de em pîrsekê bikin. Qîza Beko di vir de sûcdar e an na? Ew jî aliyê Bavê xwe hatiye organîzekirin lê belê ji bo tiştên ku ji destên wê tînin jî tînsîr nake. Dibe ku genên xerabiyê ji bavê xwe stendibe û ew bi xwe jî li dijî van xerabîyan be, lê wexta ku em weha bibêjin wê pîrsek weha jî bê kirin: "Wê

<sup>2</sup> Terry Eagleton, *Kötüllük Üzerine Bir Deneme*, wer. Şenol Bezci, weş. İletişim, Stenbol, 2012, rp.10

<sup>3</sup> *Memê Alan*, berhevkar: Roger Lescot, weş. Avesta, Stenbol, 1997, rp. 52 di dewama nivîsê de hemû jêgirtinên ji vî metnî jî vê çapê ne û hejmara rûpelê dê piştî jêgirtinê di hundirê kevanekê de bê nîşan dan.

çaxê gunehê Beko çi ye?" Beko jî ev xerabî bi rêya "gen"an jî dê û bavê xwe stendiye.

Di vir de em tiştêkî weha bibêjin. Em di destana Memê Alan de li ser zaroktiya Beko bi tiştêkî nizanin. Ka gelo li hawirdorek çawa mezin bû? Ger na? Dê û bavê wî tahde lê kirin an na? (Hêja ye ku meriv bi nêrîneke psîkalanîtîk nivîsekê li ser vê mijarê binivîse), li derdora ku mezin bû, însanên ku xerabî dikirin ji aliyê civakê ve qîmet digirtin an na? - Gerçî di cînan de li ser xelkê Cizîrê gotinên neyînî hene weke mînak, di cihekî de Hesên ji birayê xwe Çeko re weha dibêje "tu dizanî, bajarê me, bajarê fesadan e/ tê da tune mêrikî bi namûs û lawekî bavane"(95) di vir de xuya ye ku mubalaxayek heye lewra Hesên ji bo ku Mem xelas bike agir bi mala xwe dixîne û ew têrê nake di ser de kurê xwe jî diavêje nav êgir. Yanî fedakariyek pîr mezin ji bo mêvanê xwe dikin. Tenê ji ber ku "mêvan" e. Em bersiva van pîrsan nizanin. Lê belê hew em dizanin ku Beko yekî Awan e, şeytan e û mîfsid e.<sup>4</sup> Îsanek bêyî ku fêde û berjewendiyên wî hebin gelo dikare ji bo çi xerabiyê bike, ji bo çi dike? Ev pîrs bila li vir li benda bersiva xwe be.

Rasthatina Beko û Mem piştî ku ji qîza Beko vediqete û pê ve wek gotina wê derdikeve. "Kalekî rîspî emrê wî gihaye heftê û pêncane"(56) di devê deriyê bajarê Cizîrê li benda wî ye. Her çiqas Memê Alan him jî aliyê Xocê Xizir û him jî jî aliyê qîza Beko ji bo ku bi tedbîr tevbigere hatibû şîretkirin jî ne mimkun bû ku xwe ji destê wî xelas bike. Kîjan însan be jî jî kalekî rîspî û heftê û pênc salî hêviya xerabiyê nake. Lewra meriv dibêje îsanekî werê destê xwe ji dinyê şuştîye û belkî haziriya axîreta xwe dike. Lê Beko hîn jî bi awayekî jidiyayî bi dinyê ve girêdayî ye û ji bo vê yekê jî çi ji destê wî tê tînsîr nake. Beko, Mem dawetî mala xwe dike, Mem pêşî qebûl nake, lê dibîne ku Beko ji bêrîka xwe reşbelekekê derdixê û tê de xwedêgiravî bav û kal û apên Mem temiya wî li Beko kiriye, wan gotiye bila li cem te bimîne û lê miqate be. Mem jî vê yekê bawer nake, lewra wexta ku biryara çûna Cizîrê dabû tevî bavê wî, tu kesî navê Cizîrê ne bihîstibû ne jî di xewnên şevan de dîtibû. Lê wexta ku di binê reşbelekê de mora bav û kal û her du apan dibîne jê bawer dike û dide dû wî. Lê wexta digihê nêzîkî mala Beko şîreta qîza wî tê bîra wî û dibîne ku tiştên wê ji bo mala bavê xwe gotibûn rast in, hesp radike çargavan û jê bi dûr dikeve.

Me got Beko yekî rîspî, heftê û pênc salî ye. Tevî vê Beko jî kitêbên remlan jî fahm dike û jixwe di van kitêban de hayê wî ji hatina Memê Alan çêbûye. Tevî ku tu dijîmantî di navbera wî û Mem de tune ye jî berî ku Mem derbasî bajarê Cizîrê bibe plan û haziriya xerabîyan dike. Ka gelo derdê wî çi ye, çi tahda Mem gihîştîye wî, çi fêda wî jî vê xerabiyê heye. Di vir de bila şaş neyê fêhmkirin ku ji bo fêdeyê caiz e ku Beko xerabiyê bike. Lê yekî ku xerabiyê bike fêdeyek an jî berjewendiyê wî hebe belkî meriv karibe jê re

<sup>4</sup> Ev her sê rengdêr di destanê de jî bo Beko tînin bikaranîn. Heta di cihekî de qîza wî bi xwe weha dibêje: "tu guh mede wî, ew bavê min, Bekoyê Şeytan e."(rp.56)



hêncetekê bibîne. Lê di ya Beko de tiştêkî weha tune. Beko tenê heqê navê xwe dide; awantî, şeytanî û mifsidiyê dike. Belkî meriv karibe bibêje tenê ji xerabiyê "haz"ê distîne merivekî sadîst e. Wexta ku meriv ji hêla "haz"ê lê dinere meriv dikare ji nav tevgerên Beko derkeve. Lê tiştêkî weha ku êdî- di rûpelên pêş de em ê bibînin- qesta jiyana mirovan dike, meriv dikare bi hazê rave bike? Ji vir û pê ve ev yek dibe "nexweşî" yek û divê bê tedawîkirin. Lê em dibînin tevgerên Beko ji aliyê civakê û ji aliyê mîr wek tevgerên dînan nayên dîtin. Di ser de mîr di gelek cihên krîtîk de bi ya wî dike û bi aqilê wî tevdiqere. Jixwe Beko wezîrê mîr e û meriv şaş dimîne çawa yekî ku werê aqlê wî timî li ser xerabiyê dişixule, ji bo çi dibe wezîrê mîrê Cizîra Botanê. Belkî jî ji bo maqamekî wek wezîrtiyê mirovine weha hewce ne. Lê di dawiya dawî de ev xerabiyên ku Beko dikin him dibe sebaba jiyana wî û him jî dibe sebaba hilweşîna mîrtiya Cizîra Botanê. Lê xuya ye zerara ku digihêje Beko ji wî re pirr ne girîng e; çimkî ew ji wê zewqekê û hazekê distîne. Tiştên ku "haz"ê didin meriv bi giştî wextekî dirêj nadomin, ji ber vê jî Beko xerabiyê li ser xetek lîneer (li ser dirêjahiyê) domdar dike û bi vê yekê dema haza xwe dirêjtir dike.

Mem li mala her sê birayên celalî, Hesen, Çeko û Qeretacîn dibe mêvan û ji wan re derdê xwe dibêje. Di vir de weke ku me li jor jî got fedakariyek gelek mezin nîşan didin. Heta ji bo ku Memê Alan derdê xwe ji wan re bibêje Çeko dev ji Zîna ku "destgirtî û qalandariya sê salan" (94) e berdide û ji bo îşê wî bibin serî tev her du birayên xwe dikeve tevgerekê. Ji bo ku bielimin bê dilê Memê Alan ketiye kê organîzasyonêkê çêdikin û hemû keçên Cizîrê -1200 keç- tî ser kaniya Qestelê. Zîn jî yek ji wan keçan e ku hatiye ser kaniyê. Piştî ku Mem çav li wê dikeve dihere ser kaniyê û ew û Zîn dest bi muhebbetê dikin. Wexta ku Beko vê yekê dibihîze zûzûka planekê çêdike û li rêya gihandinê vê agahiyê digire ka bê wê bi çi şiklî û formatê ji mîr re bibêje. Piştî ku difikire rêyeke weha dibîne ku mîr mecbûr dimîne ku bi ya wî bike. Lewra Beko ji mîr re dibêje: ji bajarê mixribê padîşahê kurdan hatiye navê wî Memê Alan e, li cem her sê birayên Celalî dimîne û çavên wan lê ye te ji mîrtiyê bikin û li şûna te wî bikin mîr û hakimê bajarê Cizîra Botanê. Di vir de jî bo mîrekî tiştê herî girîng text û hukimdariya wî ye û Bekoyê ku bi vê yekê dizane jî dixwaze bi vê "tîrsê" mîr qanih bike. Wexta ku mîr vê yekê dibihîze ewilî wek bawer nake dixuye û jê re dibêje ku ev tişt derew bin ew ê wî bide ber devê şûran. Lê Beko di cih de wî qanih dike û wezîfeya xwe tîne cî. Di vir de weha dixuye ku mîr ji berê de li tiştêkî weha digere. Lewra ji berê de jî her sê birayên celalî -di heman demê de pismamê mîr in- hez nake û wexta ku Beko vê meseleyê dibêje zû ditefsilîne û ji Beko pîrsa fikra xelasiyê dike û ew jî li gorî mifsidiya xwe rêyekê li ber mîr dixwe. Mîr ji bo rastkirina agahiya ku Beko daye wî ji tu cihên din napirse, lewra desthilatdariya wî di rîskê de ye û ji bo vê yekê jî divê tehdît zûka bê berterafkirin.

Bekoyê Awan planeke weha çêdike: bila mîr xwarinekê çêke û bangî hemû Cizîriyan bike û bila Hesen, Çeko û Qeretacîn mêvanê xwe jî bi xwe re

bînin. Wexta ku her kes hat û pê ve ez ê fermanekê bi navê mîr binivîsim ku Ecem serî rakir û tene ser bajarê Cizîra Botanê, wê çaxê de her kes derkeve serê çiyên û ez ê li ser nan û erzaq bisekinim û axûya Silêmanî têxim nanê Memê Alan. Bi vî awayî kes nizane bê ji çi miriye û em ê jî jê xelas bibin. Ev plan dikeve serê mîr û weke ku Beko gotibû dike. Wexta ferman hat xwendin û gotin bila her kes xwe bigihîne serê çiyên Memê bê dilê wî bû û nedixwest here. Ev yek ji Hesen re got. Wexta ku Hesen ev yek ji mîr re got Beko berî mîr bersiv dayê û got "ma çira mêvanê te li xwe datîne navê mîran û padîşane?/ma qey karê mêran nîn e teqandina sîlehane?" (125). Mem mecbûr dimîne diçe lê çavên wî bi awayekî li rêya vegeerê ye û tenê bi şertekî dikare vegere, ew jî birîna bi şûran e. Mem jî radibe lahûrê giran ji kalê derdixwe û lingê xwe birîndar dike. Piştî vê Hesen car din ji mîr rica vegeera Mem dike. Vê carê bela ku Beko ne li cem mîr e, vê yekê qebûl dike û Mem jî berê xwe dide Cizîra Botan.

Wexta ku Beko axûyê dixwe xwarina Mem û vedigere cem mîr dibîne ku Mem ne di nav wan de ye. Mîr meselê ji Beko re dibêje. Beko hingê planeke din çêdike. Dibêje 'ez ê ji artêşê dûr bikevim û ez ê emrekî binivîsim û bibêjim şer qediyaye bila herkes vegere mala xwe'. Piştî ku berê artêşê kete Cizîrê her sê bira ketin tatoleya Memê Alan bê wê wî çawa xelas bikin. Lewra wan digot hayê Memê ji xelasbûna şer tune ye û jê heye ku wê bi mehan şer dewam bike û hebe tunebe niha li cem Zînê ye û em bi vî awayî vegeerê dê mîr, Mem û Zînê li cem hevdu li qesrê bibîne. Wan jî planek çêkirin. Li gorî planê Çeko û Qeretacîn ketin pêşbaziyekê her yekî digot hespê min beza ye. Her ku çû dengê wan bilind bû, şûrê xwe kişandin. Piştî vê Hesenê birayê wan çû jî mîr reca kir got bila her du berê hespê xwe bidin Cizîrê û kî ji wan berê gihîşt Cizîrê em ê zanibin ku hespê wî beza ye. Lê Beko fahm dike di gotina van Celaliyan de tiştêkî heye û dixwazin Mem xelas bikin û pêşniyaza ku hemû kes têkevin pêşbaziyê dike. Mîr dizane gotina Beko ne vala ye û fermanê dide her kes hespê xwe dide çargavan. Beko û mîr berî gişan digihên bajarê Cizîra Botan û Beko ji Mîr re dibêje niha xweha te Zîn meraqa te kiriye û bi hev re diçin odeya Zînê. Li vir mîr û Beko, Mem li heremê li hêla jinan dibînin û sebêbê vê dipirsin. Wexta dest bi guftûgoyê dikin Sitiya jina Hesen jî meraqa Mem kiribû bi pîrsê elimîbû ku Mem hatiye Birca Belek. Wexta diçe qesrê dibîne ku Mîr û Beko hildikişin qatê jinan û hema ew jî dide dû wan û di pacê re wexta ku Mem wê dibîne guliyê Zînê di hoçikê hewranî re şanî û di pacê re wexta ku Mem wê dibîne guliyê Zînê di hoçikê hewranî re şanî Sitiyê dike. Sitî xwe digihîne Hesen, ew jî tê ji pacê re dibîne ku rast e, Mem di bin kurkê de Zîn veşartîye. Vedigere malê û bi şûran li hespê û heywanan di wî disekinîne, piştî Hesen agir bi mala xwe dixwe, cardin Sitî tê xwe diavêje dextê mîr ku Hesen ji vê rêyê vegeerê cardin bi awayekî Beko nahêle ku biçe. Hesen dibîne ku mêvanê wî di talûkê de ye, vê carê radihêje lawê xwe û wî diavêje nav êgir da ku mîr bi ser wî de were û mêvanê wî fersendekê bibîne û xwe xelas bike. Vê carê jî Beko hewl dide ku mîr neçe lê mîr sebra wî







derbas nebe, nabe û gelek caran navê wî li şûna "xerabî" yê jî tê bikaranîn. Ev yek "mezinbûn" û "serkeftîbûna" karakterekî nîşanî me dide. Çawa ku Oblomov, Gregor Samsa, Madam Bovary û hwd. ji navekî wêdetir tiştên din jî temsîl dikin. Di edebiyata me de jî navê "Beko" ji navekî bêtir xwedî temsîliyetekê ye. Ji bo me jî ev yek serbilindiyek e. Karakterekî "xerab" e lê "baş" û serkeftî hatiye hûnandin.

Ji tiştên xerab tiştên çê jî derdikevin carinan. Lê em ê çavê xwe, ji bo ku ji tiştên xerab tiştên çê derkevin, bigirin an na? Di hevpeyvînekê de ji André Gide dipirsin gelo ji ber çî ji Swîsreyê romanên mezin dernakevin. Bersiva wî balkêş e. Dibe ji ber ku li wir kuştin tune. Ev yek -çêbûna ji xerabiyê- bi awayekî eşkere di destana Memê Alan de xuya dike. Ger ku "fêde" yek xerabiyê Beko Awan hebe ew jî ev e ku bi xêra xerabiyê wî evîna Mem û Zînê gihîştîye heta îro û wê her jî bidome. Lê wê Beko jî bi wan re bijî, çawa ku gora wî jî li kêleka gorên Mem û Zînê ye...

### Çavkanî

<http://www.milliyet.com.tr/2000/11/24/entel/ent1.html>, tarîxa gihandinê, 24.03.14

Eagleton, Terry: *Kötülük Üzerine Bir Deneme*, wer. Şenol Bezci, weş. İletişim, Stenbol, 2012

*Memê Alan*, Ber. Roger Lescot, weş. Avesta, Stenbol, 1997

## KALAŞNİKOF SER DE TARÎX MEZG Î XOVÎRRAKERDIŞ

Abdullah Çelik

Romanê Deniz Gunduzî *Kalaşnikof*, bi sereştîşê (erşawitişê) Beşê III û IX yê xebata Walter Benjamîni *Termê Tarîxî Ser o* dest pêkeno. Benjamîn Beşa III. de behsê ci keno ke, nuştoxê tarîxî, tarîxî ra senî ewnûyeno; "Tu serebûtêk seba tarîxî vîndîbîyaye nêhesibîyeno. Oxro ke ancax merdim tîyo ke xelisîyayo eşkeno bi umûmîyet vîyarteyê xo rê wayîr vejîyo."<sup>1</sup> Beşa IX de zî behsê tabloyê resam Paul Kleeyî, ke nameyê xo *Angelus Novus* o keno Benjamîn. No tabloyê meleketeke o. Benjamîn seba tûvalo ke tablo de yo de, behsê rewşê tarîxî yo ke dûrî beno û vîndî keno ra pey no tesbîto balkêş keno: "Çiyê ke ma rê sey yew rêzila serebûtan asenê, o sey yew felaketêk vînenê, felaketêko enkazê înan bêvîndertîş têsere beno û erzîyeno verê lingan. Melekete waştêne ke tikêna vîndero, merdeyan ganîkerdiş, parçeyê şikiteyan reyna ardiş pêser..."<sup>2</sup> Gunduz nê di pasajan vernîyê romanî de ronayîşî de neheq nîyo, zîra temaya romanî tam zî no parçebîyayîş û vîndîbîyayîşê tarîxî ser o yo. *Kalaşnikof*, romanê nêxelisîyayeyan, merdimê ke tarîxê xo, kulturê xo, ziwanê xo verê vîndîbîyayîşî de yê, bi vatişê Deryus Shayeganî, "merdimê ke erzîyayê teberê tarîxî" yo.

Goreyê Nurdan Gurbîlekî, çiyê ke Walter Benjamîn tezê xo yê tarîxî de erzeno vernî, "tarîx neke xezînayêka do bireso neslê neweyan o, yew enkaz o" ser o yo. Ez vano qey "estûnaya romanê Gunduzî *Kalaşnikofi* no tesbîto ke Gurbîlekî serê termê tarîxî yo ke Benjamîn kerdo ser o yo" vatiş ca de beno. Ma beşa yewine ya kitabî de hîna zehf rastê metnêko sînoranê saysînfîkşîni de gêreno yenê. Karakterê romanî, candeyêko cayêko fezayî yo ke nêno zanayene de ciwîyeno û însan nîyo. Ma naye zî behsê înan o ke derheqê owncê leşê ke cemedîyan de dîyê ra fehm kenê. "Organê înan ma rê şertanê planetî do tarîf bikerê û ma zanayîşo ke analîzê nê organan fisto xo dest binîme çîmanê xo ver û na cuya newa, newe ra bimunîme, vejîme meydan."<sup>3</sup> Taybetîya nê candeyî, bi sayeyê objeyê ke destê xo paneno ci sîmulasyon kerdene, nê sîmulasyonê ke virazîyenê reyde zî medenîyetê candeyo ke destê xo panayo

1 Walter Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, wer: Nurdan Gürbilek, Metis Yayınları, Stenbol 1993, r. 40  
2 e. n. v. r.43  
3 Deniz Gunduz, *Kalaşnikof*, weşenxaneyê Vate, Stenbol, 2013. r. 18



ci rê raywanîye kerdene ya. Bi ziwanê ê candeyî îmkanê ma hem tarîxê planetan hew zî serebûtêko tarîxî yê dinyayî rê ewnîyayîşî beno. Nê kesî ke, çiyê ke feza de qewimîyenê û kulturê planetê ke vînenê bi sîmulasyonan gêrenê, eynî wext de wezîfedarê muzeyî yê. Çünke serê fezayî de muzeyêk viraştiş, seba averşiyayîşê medenîyetê xo çiyêko fehm beno yo û o qas zî giran o; "Na muze depoyê fikirîyayîşê ma, bi vateyo bîn mezgê medenîyetê ma ya."<sup>4</sup> No muzeyo ke virazîyayo de, çiyê ke hendayê keştî yê ra hetanî çiyê ke hendayê zerreyêkê tozî yê vînayîş mumkun o.

Nê cigêrayoxî, planeto ke nameyê xo dinya yo de, dest bi di leşê însanî yê ke mîyanê cemedîyan de dîyê etudkerdişî kenê. Înan ra yewe Rojda ya yew zî Şayîr o. No cigêrayîş mi seba meraqê kesêkî ra ver bi macerayêk şino. Meraqê no kesî serê "gelo merdimi candeyê senîn ê" ser o yo. No kes senî ke destê xo ê leşê ke mîyanê cemedîyan de dîyo ra nano dekeweno sîmulasyonî û çiyê ke vînenê ey fînenê dehşetêk. Tam tîya de vatox, ma beno wextêko cuya ke no herêmo ke bi cemedîyan girewte yo. Hîkaye tîya ra pey di tewirî herikîyena, ma hîkaye hem ziwanê cinîya ke (Rojda) binê cemedîyan ra ameya vetene ra, hem zî ziwanê planetijo ke destnayîşê cinîye ra pey bi sayeyê sîmulasyonî destê xo cinîya cemedî rê nano ra goşdarî kenê.

Tîya de ney vatişî de havil esto; mumkun nîyo ke tarîx bi fekê merdimê ke medenîyetê înan verê vîndîbîyayîşê de yo binusîyo. Xora ma vînenê ke wina nîyo. Gunduz zî romanê xo yo *Kalaşnîkofî* de ney ser vindeno (binê ney xêze keno). Beno ke destpêkerdişê nuştişê romanê xo de sebebê Benjamîni referans girewtîşî zî no yo. Seke ney ser o nêzdî şiyayîş, ver bi metaforê tarîx û parçebîyayîşo ke Gurbîlekî bi taybetî bala xo dana ci, *Kalaşnîkofî* hîna fehmbîyaye keno. Goreyê Gurbîlekî wexto ke Benjamîn çiyê tarîxîyan ra ewnîyeno, "neke erjê ke dewamîya kulturê peyda kenê; objeyê ke qedênîyayê û erzîyayê goşeyêkî, pişontê kulturê arêkerdişî 'îmgeyê tarîxî, objeyê tarîxî yê ke tewr pakbîyayeyan de vînayîşî' xo rê amanc girewtêne. Çiyê ke bingehe xo yê maddîyan vîndî kerdê labelê reyna zî reya peyêne şewle danê, roştîya na şewle de bi heme îmkanê xo reya peyêne xo nawnenê,"<sup>5</sup> vînayêne. Vatoxê hîkayeyî behsê beriqê roştîyê ke tim rastê înan yeno, keno. Beriqê roştîyê ke behsê înan beno, beriqê parçeyê medenîyetê ke erzîyayê teberê tarîxî û Benjamîni zî serê ci de vindeno yê. Nê heme objeyî binê roştîya çilayêke de mana gênê. "Na lamba medenîyetê ma bi xo ya. Na lamba îdeolojîyê medenîyetê ma ya. Na lamba bawerîya ma ya."<sup>6</sup>

Vatişo saysinfîkşino ke beşa yewine ya romanî de yo beşa diyine de cayê xo dano vatişêko fantastîk. Vatox beşa diyine de yew vaşêko sebebê halusî-nasyonî ben ora behs keno, qehramanê hîkayeyî senî ke o vaşî ra weno xeyalan vînenê. Vatox (keso ke sîmulasyonî de yo), wexto ke dekewenê mezgê merdimê ke cemedîyan ra vetê mîyan, kesêko nameyê xo Misto Kor o vîne-

4 e.n.v. S.14

5 Walter Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, Çeviren: Nurdan Gürbilek, weş. Metis, Stenbol, 1993, r.8.

6 Deniz Gunduz, *Kalaşnîkof*, weşanxaneyê Vate, Stenbol, 2013. r. 28.

no. "Yew merdim vejîyo yew kursîyê berzî ser û bi mîkrofonê verê xo xîtabê yew cematî keno. Belê ez reya verêne nê merdimî nas kena. No pîyê mi Misto Kor o."<sup>7</sup> No kes helbet eşkera keno ke merdimê ke binê cemedîyan de yê çira uca de yê. Çünke vatox raywanîya ke mezgê cinîya ke destê xo paneno ci de dîktatoranê tarîxî vînenê. "Hema vaje ez pêro tarîxê merdimîye vînenê. Hîtlerî, Stalînî, Napolyonî, İskenderî û hîna zafîna vînenê."<sup>8</sup> Sebebê nê heme parçebîyayîşan û vîndîbîyayîşê nê çaxê cemedîyî nê yê. Labelê ez vano qey vîndîbîyayîşê şarêkî tena yew dîktatorî reyde îzehkerdiş xelet beno. Naye de, vano ke, gereke merdimê ke kulturê xo verê vîndîbîyayîşî de yê zî gereke wezîfeyê xo bîyarê ca.

Beşa diyine de awiro lêlo ke bi afyonî vejîyeno meydan sebebê lêlbîyayîşê rastîye zî beno. Tîya de hem sereyê vatoxî hem zî yê wendoxî tîmîyan beno. No tîmîyanbîyayîşo ke vejîyayo meydan, seke mi verê cû zî behsê ci kerdbi ma beno vatişêko fantastîkî. Çiyê ke zor o zî, tîya de *Kalaşnîkof* sey yew tewiro edebî fantastîk çiqas *fantastîk* hesabîyeno. Labelê ez vano qey ma roman *fantastîk* û *serêbîyayeyî* bihesibnê xelet nêbeno.

Keso ke sîmulasyonî do, wexto ke mezgê cinîya ke cemedîyan ra ameya vetene ra ewnîyeno, kesêko resaye yo ra vêşê kesêko hîrêyin vano ke, mi yew doman dîyo. Şaş beno, çünke mîyanê cemedîyan ra tena leşê di resayeyan vetê. "No senî bî, senî bî ke aye m adîme? Çiyode zaf balkêş, ez hîna zî bawer nêkena! Gelo ti vajê ma yew cayê sîmulasyonî de xeletî kerde? Ney... Ecêba ecêban, a çira Domanî vînenê û ma nêvînenîme! Doman çira tîya mîyanê meyîtan de çin o!"<sup>9</sup>

Karakterê romanî yo planetij vano qey mîyanê sîmulasyonî de sîmulasyon esto. Tîya de raywanîya ke mezgê Rojdayî ra ver bi dinyaya hîrê merdiman beno halêko kompleks gêno. Yewine cuya Şayîrî, diyine yê xo, hîrêyine zî domano ke mezgê Rojdayî de yo. Nê hîrê tewirê asayîşî, qasê şaşîya keso ke sîmulasyonî de yo heyranîya ci zî xo reyde ano. Verê teknolojîyo averşiyayeyo mezgî yê merdiman de heyret keno.

Tzvetan Todorov edebîyato *fantastîk* ser o no tesbît keno; eke wendox û qarakterê hîkayeyî seba fehmkardişê çiyê ke dormareyê eynî hişo lêl de qewimîyenê bi eynî tîmîyanîya sereyî bixebitîyo, no hişo lêl, roman yan zî qewimîyenê bi eynî tîmîyanîya sereyî bixebitîyo. Goreyê Todorovî *fantastîk*, hîkaye sînorê edebîyato fantastîkî de tepişeno. Goreyê *Kalaşnîkof* de Gunduz, verê persa "rast a yan xeyal a?"<sup>10</sup> de bêqerar mendiş o. *Kalaşnîkof* de Gunduz, hem wendox hem zî qarakterê romanî mîyanê yew tîmîyanîya sereyê ecêbî de heps keno. Ney zî afyono ke Rojda û Şayîr şuxulnenê rê besteno. Heta de yew cayê romanî de vano ke, nê çiyê ke yene ciwîyayene rast nîyê, çiyê rast o yo ke, dinyaya xilta ke afyon vejeno meydan o. "Belê çik ke esto, Bengî de esto."<sup>11</sup>

7 e.n.v. r. 26

8 e.n.v. r.27

9 Deniz Gunduz, *Kalaşnîkof*, weşanxaneyê Vate, İstanbul 2013. r. 28.

10 Tzvetan Todorov, *Fantastik*, wer. Nedret Öztokat, weş. Metis, Stenbol, 2004, r.9.

11 Deniz Gunduz, *Kalaşnîkof*, weşanxaneyê Vate, Stenbol, 2013. r.30



Peyê beşa hîrêyine ya romanî êdî xo ma rê akeno. Ma beşa hîrêyine de fehm kenê ke, Rojda kam a, Şayîr kam o. Ma pê hesîyenê ke yew ceng, yew rijîyayîş esto. Ma ge Rojda ra ge planetîjî ra goşdarî kenê ke, o ceng de dejê tersinî yenê ciwîyayene. Ma şahîd benê ke, merdimê ke yew şikefte rê heps biyê senî parçe benê. Zemanê hîkayeyî tîya de hêdî-hêdî fehm beno. Çîyê ke vajîyenê, çîyê ke hezar û newsey û hîris û heştî de Dêrsim de qewimîyayî yê. Rojda û Şayîr ê wextan de di domanê qijkek ê. Ma fehm kenê ke ê ceng de heme merdimanê xo vîndî kerdê. Rojda ê serrê xo yê domanîyî bi nê vateyan vano; "Ez domane bîya, leşkeran dormeyê birranê ke ma xo tey wedarîto çarnayênê û sey heywanê nêçîrî ma fistêne xo dest ca de ardêne pêser." Tira pey trajîk o. Rojda zî sey merdimê binan heme merdimanê xo o qirkerdiş de vîndî kena. Rojda û Şayîr qirkerdişî ra xelisîyenê, wextêk koyan de tena gêrenê, tepîya tepîşiyenê û sey merrî dîyenê eskeran. Pîyê Rojdayî Generalo ke nameyê xo Misto Kor o yo, pîyê Şayîrî zî eskerêko nameyê xo Îsmo Ker o yo. Ez vano qey tîya de îronî, sey yew tebereştişêko kulturel resm beno. Xora nê di eskerî eynî wext de kesê ke sereye tertelewê Dêrsimî de yê yê. No malumat, Rojda û Şayîr de hîsê qesas girewtiş bi pîyanê xo virazeno. "Pîyê mi kamo: Pîyê mi sey û bêkes. Pîyê mi pînc û heram o. Bê kok û bê esl o. Piştîya xo qels bîyo pîl. Cewherê ey mîyanê dejî de gevj dîyo. Adîrê tenayîye de ameyo kuwayene û bi hêrdî awe dîyo."<sup>12</sup>

Travmayo ke Rojda û Şayîr ciwîyayê, hetanî ruhê înan sîrayet keno, vera-vera her diyarî zî keno di însanê binasname. Roje bi roje, persa "ma kam ê?" ke xo ra persenê înan hîna zehf nêzdîyê sînorê nedîyariye keno. Awa yo hetêk de keyeyê ke domanîya xo uca de verdayê, heto bîn de keyeyê ke tede pîl biyê. No çutenasnameyî înan vera-vera keno parçeyê domanîya înan. Amancêkê înan esto êdî, pîyê x ora qesas girewtene.

Ma peynîyê romanî de fehm kenê ke di kesê ke binê cemedîyan de dîyayê kam ê. Ê Rojda û Şayîr ê. Virara Rojdayî de yew tîfingo kalaşnikof esto, hetê aye de zî leşê Şayîrî aseno. Ma fehm kene ke domano ke mezgê Rojdayî de ge aseno ge vîndî beno zî, îngeyo ke bi hêvîyê înan ameyo meydan. Çünke do-man, sey rêça ke mîyanê hêgayo girdo medenîyetî de yo resm beno. Domanî temaşe kerdene, înan beno, cuya înan, kulturê înan û zîwanê înan...

## REWTE GORRANKARÛY QALLIB Û NAWERROK LE ŞÎRÎ HACÎ QADIRÎ KOYÎ DA

Ebdulxaliq Yeqûbî

Porto: lem wînterê de Newell dadrêt ewe biselmêndirêt ke Şîrî Hacî Qadirî Koyî sê qonaxî gîrsanî le barî qallib û nawerrokewe birriwe. Qonaxî yekem ew qonaxê yê ke Hacî le qallibî Şîrîyî xezel kellik werdegrêt û têt da pîrî basî çîndî le meserul dekat. Le qonaxî duhem da, qeside debête qallibî Şîrî Hacî gîrande wînde le nawerrokî nîştimanperwerane û şorîşgêrrane nîştimanperwerane. Duwayîm qonax, qonaxî be karhênanî qallibî mesinewî yan mesinewî ke le Şîrî le basîkîrdimî babetî nîştimanî û rexney şorîşgêrrane be mesinewî yanî zî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope.

Wîşegelî werriwî: Hacî Qadirî, Kurdistan, qallibî Şîrî, xurbet.

Porto: lem wînterê de Newell dadrêt ewe biselmêndirêt ke Şîrî Hacî Qadirî Koyî sê qonaxî gîrsanî le barî qallib û nawerrokewe birriwe. Qonaxî yekem ew qonaxê yê ke Hacî le qallibî Şîrîyî xezel kellik werdegrêt û têt da pîrî basî çîndî le meserul dekat. Le qonaxî duhem da, qeside debête qallibî Şîrî Hacî gîrande wînde le nawerrokî nîştimanperwerane û şorîşgêrrane nîştimanperwerane. Duwayîm qonax, qonaxî be karhênanî qallibî mesinewî yan mesinewî ke le Şîrî le basîkîrdimî babetî nîştimanî û rexney şorîşgêrrane be mesinewî yanî zî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope. Em sê qonaxe Şîrîyîye hellbet hawsera wînterî gelî xoy degate çillepope.



core Hacî rêgay xoy le zorbey ş'airanî tirî klasîknûsî qutabxaney Baban ciya kirdewe. Em rewte le ş'irî Hacî Qadir da le nûsînî ş'irî dilldarî le qallibî xezel da dest pê dekat û le rêgay honînewe ş'irî meylenîştimanperwerane le qallibî qesîde da berdewam debêt û be guncandinî hizrî şorrişgêrrane û rexnegirane le qallibî mesnewî yan cûtserwa da kotayî pê dêt. Xallî şayanî serinc le rewî çendan salley em gorrankarîyane da ewe ye ke em hewraz û nişewane le qallibî û qise yan form û fikrî Hacî da tawtesîrî ew gorrane gewreyey jiyânî ewî pêwe diyare ke têt da Kurdistanî be cê hêşt û jiyânî dîrûdirêjî xurbetî hellbijard. Lem witare da hewill dedrêt le rêgay piştbestin be deqî ş'irekanî Hacî û le ser destî mîtodî lêkdanewey nawerrok (content analysis) û tetelley kirdinî mutîfe (motif explanation) ş'irîyekan bas lem sê qonaxe û nîsbetî nîwan qallibî û nawerrokyan bikrêt.

### Qonaxî yekem: Xezel

Dîwanî Hacî, bîst xezelî têda ye û zorbey ew xezelane le barî ziman, darîştin, mutîf û nawerrokewe lasayî kirdinewey ezmûnî ş'irî klasîkî pêş xoyan in, be kurdî û farisîyewe û çî tazegerî û tazekarîyekî ewtoyan têt da nabînrêt. Wêdeçêt beşêkî berçawî ew xezelane ezmûnî serdemî gencî û jiyânî ber le xurbetî Hacî bin. Ew beşe kemey tir (dewruberî şeş xezel), ke paştir be nimûne basiyan dekeyn, çend xezelêkin ke tecrebey jiyânî xurbetî û puxteyî ş'airaneyan pêwe diyare û pêdeçêt ezmûnî ew sallane bin ke Hacî maweyek buwe Kurdistanî cê hêştuwe û le xurbetî gîrsawetewe û le halletî lawî û xawî hatuwete derê û ziman û hizrî geyîştûne.

Ba sereta le goşenîgay lêkdanewey mutîfî ş'irîyewe çaw le xezelekanî nûsraw le Kurdistan û serdemî gencîy Dîwanî Hacî bikeyn. Eger wişey 'kurd', wek hêmayek bo layenî niştimanperwerane be hemû liqekanîyewe, wate 'Kurdistan, kurdane, kurdî, ekrad, kurmanc, kurmancî', wek mutîfî serekîy ş'irî Hacî werbigrîn, debînin em mutîfe le serleberî xezelekanî serubendî jiyânî Kurdistanî Hacî da tenya yek car be kar debrêt; ewîş lem dêrre ş'irîyey xezelî 'ta billîy ferqî heye':

Le nuqûşî xezelim çîn û xeta damaw in  
Kê dellê emtî'eyî kurd e kellaş û kepenk (Dîwanî Hacî, c. II- r.77)

Xallî serincrakêş lêre da ewe ye ke wişey 'kurd' lem xezele da hellgirî çî bar û biwarêkî niştimanperwerane nîye û pitir amaje bo dab û destûr û kultûrî kurde ta layenî siyasî û şorrişgêrrane. Em xalle be taybetî pitir rûn debêtewe eger xwênerewe serinc bigirête dêrre ş'irekanî pêş û paş em beyte û manay wişey 'kurd' le zemîne em sê beyte û sertapay xezeleke da lêkbi-datewe:

Ey mehî çarde seyri mehî dû hefte bike  
Wek minî dabinê çawî min û to nagene yek

Le nuqûşî xezelim çîn û xeta damaw in  
Kê dellê emtî'eyî kurd e kellaş û kepenk

Bo temaşay belek û zendî spî û çawî bellek  
Niştuwe lem dere 'aşq wek Hacî lek lek (Dîwanî Hacî, c. II, r.76-77)

Xallî dûhem le ser ew xezelane ke morkî serdemî gencî û jiyânî Kurdistanî haciyan pêwe diyare e teqlîdî bûnî ziman û nawerrokyan e, be taybetî lasayî kirdinewey û kewtine jêr tawuteasîrî pêşengî qutabxaney Baban, wate Nalî. Em qiseye pitir û wîrditir werrast degerrêt eger bizanîn ke Hacî le nêw ew 14 xezeley ke be ray min ş'irî qonaxî lawî û jiyânî feqêyetîy nêw Kurdistan in nîzîkey 10 car amajey rastewxo be naw û ş'irî Nalî dekat û zorbey car pesindyan dekat û pêyan da helldellêt. Bo nimûne, serinc bigirine em dêrre ş'irane le çend xezelêkî da:

Nalî û xakî bebe, Hacî û Koye be mesel  
'Eynhî Hafîz û Şîraz e, kelîm û Hemedan (Dîwanî Hacî, c. II, r. 93)

Suleymanêke Nalî, xawenî dîwan û ferman e  
Nîye kes bête meydanî meger Hacî xudasa ye (Dîwanî Hacî, c. II, r. 132)

Be tezmîn ferdekî Nalî dehênim ta refîqanim  
Bizanin ferqman zor e xezef qet wek guher nabê (Dîwanî Hacî, c. II, r.177)

Be kurtî dekrêt bigutrêt Nalî lew 16 xezeley ke ber le jiyânî xurbetî nûsiyunî çî dahênanêkî şayanî serinc û taybet be hizrî û zimanî xoy bedî nehî-nawe û nek her le fikrî û fezayî niştimanperwerane be dîr buwe, bellku zor le jêr karîgerêtîy ş'airanî pêş xoyşî buwe. Hacî le wêstgey yekemî em qonaxe, wate qonaxî ş'irnûsîn le qallibî xezel da, pitir dirêjepêderî rêga û rêbazî kelle ş'airanî le çeşnî Nalî û Kurdî û Salim buwe û le dahênanî ziman û cîhanbînîy ş'airane da lewanî teneperanduwe û sinûrî ewanî nebezanduwe.

Bellam em qonaxe wêstgey dûhemîşî heye û ewîş ew 6 ş'ir in, her le qallibî xezel da, ke wêdeçêt le jiyânî awareyî û xurbetî Hacî da nûsraw in. Em çend xezele le barî ziman û cîhanbînîy ş'irîyewe lew 14 xezeley ke basman kirdin ciyawaz in, be corêk ke xwênerewe hest dekat Hacî lem xezelane da hewill dedat rêgayek, her çend biçûk û tengeber, bo hellwêstî niştimanperwerane û hizrî şorrişgêrrane xoş bikat. Be witeyekî tir, Hacî lem 6 xezele da xerîke meşqî hellatin le texezulî ş'airaney takekesî û rû hênane tefikîrîni niştimanperweraney neteweyî dekat. Bo nimûne, le xezelî 'Ceberûtî Ke Şîka', ll 64-65, le layekewe ziman û hizrî Hacî lew hallete lasayî kirdineweye rûtey xezelekanî serdemî jiyânî Kurdistanî derbaz buwe û le layekî tir amaje ş'irîyekan zêtir rûyan le mirove, wek kesêkî xerîb lem cîhane da, nek m'êşûqêkî romansîy ş'irî texezulîy teqlîdî. Be witeyekî tir, lem xezelane da layenî felsefî



û hizrî be ser layenî romansî û 'îşqî da zall e û wêdeçêt Hacî lem şî'irane da  
tecrebey 'eşqî şexsî cê dehêllêt û berew ezmûnî 'eqillî cem'î derrwat:

Ceberûtî ke şika dill le huzûrî melekût  
Hate em 'alemî nasûte xerîbêkî nesût

Naheq e şekwe le bê 'ehdî û bê perwayî  
Key wefayêkî eda kirduwe? Sed def'e zimût

...

Herçî lew lawe neyê min lewê nayinasmewe  
Ewî nasiyute m'emûr e be emirî ceberût

Nanî xoy takû be tendûrî germ pêwe neda  
Narriwa Hacî eger çawî derênin be bizût (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 64-65)

Xallî dûhem ewe ye ke mutîfî 'kurd', be hemû liq û popekanîyewe, lem  
xezelaney qonaxî jiyânî xerîbayetîy Hacî da tenya dû car, ewîş le diwabeytî  
xezelî 'Zemane' da, ll 118, dûpat debêtewe:

Le kurdan xeyrî 'Hacî' û 'Şêxî Xanî'  
Esasî nezmî kurdî danenawe (*Dîwanî Hacî*, c. II, r.118)

Bellam mutîfî 'xurbet' yan 'xerîb' çar car lem şeş xezele da dûpat debi-  
newe û hemûşyan hellbet le zemîneyekî meylew wetenxwazî û nîştiman-  
perwerane da. Bo pitir rûnkirdinewey ciyawazîy nêwan ew dû cor xezeley  
dû qonaxî ciyay jiyânî Hacî, dekrêt berawirdêk bikrêt le nêwan dîdî Hacî  
bo 'zullf', ke mutîfêkî bawî xezelî şî'irî klasîkî ye, lew dû cor xezeley gorrî-  
da: Xezelî tafî gencîy û jiyânî Kurdistan û xezelî serdemî puxteyî û ezmûnî  
xerîbayetî. Le xezelî 'Bestey Zullfî Nîgarêkim' da, ll 49-50, ke xezelî sedremî  
jiyanî Kurdistanî Hacî ye (le beytî çwarem da, Hacî basî feqêbûnî xoy dekat  
) û lem dêrre da:

Bestey zullfî nîgarêkim resen bazî deka  
Seffî mujganî le tabûrî supay xazî deka (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 49)

Lem dêrre şî'ire da 'zullf' be şeweyekî zor asayî wesf dekrêt. Le layekewe,  
hîç taybetmendîyekî ciwanî nasane be zullf nadrêt û zullf tenya pajêke le  
cestey yarêk ke xerîkî resenbazî ye; le layekî tirewe, ewey debête nawendî se-  
rincî em dêrre nek zullfî yar, bellku xudî yare û taybetmendîy biwêrî (resen-  
bazî) û dilêrîyekey (hawşewe bûnî seffî mujganî le tabûrî supay xazî). Puxtey  
qise ewe ye 'zullf' lem xezele da dewrêkî ciwanî nasaney ewto nagêrrêt û  
Hacî neytiwanîwe form û wata û karkirdêkî niwê, lanîkem le baziney şî'irî  
klasîkî da, bem mutîfe bibexşêt.

Bellam le xezelî 'Be Qisey Bêserupa Tallî Meke', ll 62-63, ke xezelî serdemî  
puxteyî û geyîştuwîyî hizr û zimanî Hacî ye le henderan (le diwadêrrda Hacî  
basî neçûnewey bo willat û basnekirdin le xurbetî xoy dekat), mutîfî 'zullf'  
bem şeweye be kar dêt:

Zullfî sed def'e gutî: Xane xerab ruwî mederê!  
Heyf e berbadî meke şanî min û şewketî xot (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 63)

Lem beyte da komellêk ciwankarîy derbirrînî zor wird û ş'airane le ser  
'zullf' kirawe ke selmênerî ewen Hacî lem qonaxey ş'airîy xoy da be dîdêkî  
ciwanî nasanewe lem mutîfe bawey şî'irî klasîkî riwanîwe û be karî hanîwe.  
Yekem, lem dêrre da, 'zullf' kesayetîy pê dedrêt (ciwankarîy tişxîs yan 'per-  
sonification') û debête nawendî serincî deq. Dûhem, 'zullf' nek her xawenî  
kesayetî ye, bellku dête deng û rexnegirane dedwêt, û lem rêgeyewe nasna-  
mey serbexo û taybetî xoy deselmênêt. Sêhem, Hacî zor zimanbazane tiwan-  
yuyetî destewajey 'şan û şewket', be şewey lef û neşr, be ser 'zullf' û denge  
şî'irîyeke da bibeşêtewe (şan hem be watay rêz û hurmet, hemîş ew şiwênay  
zullf be serî da billaw debêtewe).

Her çonêk bêt, ewey lêre da xallî nawendîy basuxwasî em wîtareye ewe  
ye ke Hacî le qonaxî nûsînî şî'ir le qallibî xezel da, be her dû corî amaje pêk-  
raw, hizrêkî nîştimanperwerane û hestêkî şorrişgêrraney ewtoy nebuwe ke  
bixwazêt lew rêgeyewe cîhanî şî'irî xoy le cîhanî şî'irî ş'airanî pêş xoy cu-  
dawaz bikat û şeqlêkî taybetî fikrî û formî be berhemî xoy bidat. Bellam, wek  
pêştir çûke amajeyekim pêda, wêdeçêt le hendêk şiwênî ew 6 xezeley ke le  
diyarî xurbet nûsiyunî sûke lengerêk le ser hestî wetenxwazî û xurbetnîşînî  
degrêt û wirde wirde rêge bo cîhanêkî nwêy hest û hizrî ş'airaney xoy xoş  
dekat. Bo nimûne, her le diwadêrrî em xezeley berbasî sereweman da dengî  
şî'irî rû le Hacî dekat û pêy dellêt:

Boçî yaranî weten dill deşkênî 'Hacî'?  
Zahîren naçiyewe to basî meke xurbetî xot (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 63)

Lem dêrre şî'ire da, 'yaranî weten' û 'xurbet' dû nîşaney girîngî wersûr-  
ranî hizrî û zimanî Hacî le hember riwanîn û ravey bo 'yar' û 'xurbet'; wate  
lêre da, be pêçewaney ew xezelaney ke le nêw willat da nûsînî, yar çîtir bo  
Hacî birîtî nîye le dilldar, m'êşûq, yan xoşewîst, be taybet le regeze mêyekey,  
bellku pitir ew kesane degrêtewe ke 'eşqî nîştimanyan le dilldaye û pallpiştî  
kêşe neteweyiyekan in. Be heman pêwdang, xurbet lem şî'ire da birîtî nîye le  
dûrîy Hacî le şiwênî jiyânî dilldarî cîhanî texezul asay, bellku negerranewey  
bo nîştiman be enqest û be pêy wîst û xwastêkî naçarî û naguzîrî.

Egerçî em dagerrane rêjeyiyey Hacî bo lay wetengerayî û nîştimanxwazî  
her le qallibî xezel da buwe, bellam be hoy taybetmendîy xezelî klasîk ke  
deretanêkî ewto be hizr û têfikirîn û basî derewey 'eşq' û dilldarî nadat ney-



tiwanîwe lewe ziyatir xezel bikate ew bestênêy ke nawerrokî hizrî nîştimanperwerane û şorrişgêraney tê da bixategerr. Hacî bo wedî hênanî em mebeste ruwî kirduwete qallibî qesîde.

### Qonaxî dûhem: Qesîde

Serleberî Dîwanî Hacî Qadir şeş qesîdey têda ye û wêdeçêt Hacî lem şeş qesîdeye da rêgay xoy be yekcarî le qallibî xezelî teqlîdî û ew nawerrokey ke le gell em qallibe deguncêt, wate texezul û basuxwasî dilldarî û xewn û xulyay aşqaney takekesî, ciya kirdibêtewe û arasteyekî nwêy girtibête ber ke birîtî ye le wesfî weten û xoşewîstî bo xak û rizgarîy willat û be giştî nîştimanperwerî.

Be ray min, wazhênan le xezel û hellbijardinî qesîde le rewî gorrankarîy qallib û nawerrokî şî'irî Hacî da akamî wazhênan le lasayî kirdinewey hizr û pêkhatey şî'irîy ş'airanî qutabxaney Baban e, be taybetî Nalî. Dekrêt qonaxî nûsînî qesîde le şî'irî Hacî da naw binêyin 'qonaxî gwastinewe berew gutarî nîştimanperwerî û şorrişgêrî'. Eger le riwangey mutîfî şî'irîyewe lem baseman birrwanîn, debînîn jimarey dûpat bûnewey mutîfî 'kurd', be hemû liqekanîyewe û be manay nîştimanperweraney em wişeyewe, lem şeş qesîdeye da 23 care û eme selmênerî ew xalle ye ke em gutare ta çende qûll û pitew le hizr û pêkhate û zimanî şî'irîy Hacî da regî dakutawe.

Hellbet pêwîste em xalle mêjuwîye we bîr xwênerewe bihênînewe ke le niywey dûhemî sedey nozdehem û le nêw gerriyanî şî'irîy ewkatî rojhellatî nawerrast be giştî û le nêw şî'irî klasîkîy Kurdî da be taybetî gutarî nîştimanperwerî û şorrişgêrîy neteweyî gutarêkî taze babet û şeşillneşkaw bû û her boye Hacî neydetwanî em gutare nwêye le nêw qallibî teqlîdî xezelî klasîk da cê bikatewe. Ke wate hellbijardinî qallibî qesîde le layen Hacîyewe, be ray min, hellbijardinêkî naçarekî ye, çî wek qallibî şî'irî klasîkî, çî wek pêdawîstîy nawerrok û babet.

Em qonaxe paş manewey çend sallî Hacî le jîyanî xurbetî Îstamboll da dest pê dekat û detwanîn billên her şeş qesîdey Hacî berhemî jîyanî tarawgeyî û xerîbî ew in. Bo nimûne, le qesîdey 'Gutim be Bextî Xewallû' da, ll 38-47, Hacî her çende ta radeyekî kemuzor berhest hêşta her be zimanî teqlîdî şî'irî klasîkî neweyekî pêş xoy wesfî weten û wênay dîmenekanî nîştiman dekat, bellam rastewxo pesindî zimanî kurdî dekat û le heman katîş da be dîdêkî rexnegiranewe seyrî peywendîy nêwan zimanî kurdî û kurd, wek gelî xudanî ew zimane, dekat. Xallî girîngtir ewe ye ke Hacî şan û şewketî zimanî kurdî le gell zimanî farsî berawird dekat û rexne lew kesane deqrêt ke zimanî kurdî le bincubinawanewe be kemtir le zimanî farsî dezanin û taneke le serxawenî zimaneke, ke kurd bêt, helldeginin. Hacî lem qesîdeye da seretay gutarî rexnegiraney xoy le hember mîlletekey dexate gerr û em halletê le zorbey qesîdekan da berhest û berçawe:

Şebîhî colle ke razî nebê be serdirrî xoy  
Mellên fesahetî kurdî be farsî nagat

Belaxetêkî heye hîç zubanê naygatê  
Le bê te'essubî kurdan e bê rewac û beha (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 46)

Le qesîdey 'Xakî Cizîr û Botan', ll 93-100 gutarî rexnegiraney Hacî le hember kurd le halletî metirsî le ser zimanî kurdî dadekişet bo halletî herreşe le ser xakî Kurdistan û desellatî mîrî kurdî û le rehendî kultûriyewe derrwat berew rehendêkî siyasî:

Xakî Cizîr û Botan, y'enî willatî kurdan  
Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan

Wa rêgetan debesirê 'elatî Caf û Billbas  
Ger mirdûn le germên memn'û e biçne kwêstan

...  
Kwa walîy Senenduc, begzadey Rewanduz  
Kwa hakimânî Baban, mîrî Cizîr û Botan?!

...  
'Hacî' kesêk e bêkes bo êwe qurr depêwê  
Gwêy lê girin zerîf e, nagirin bella le xotan (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 93-100)

Her lem xezele da seredawêk le gutarî dije koneperestîy ayinî û dîndarîy xellk hellixelletênaney taqmêkî ewkatî komellgay Kurdî le çeşnî şêx le nawerrokî şî'irî Hacî da xûya debêt:

Parranewe û tewekkul lem 'esre pare naka  
Tîre du'ay cewşen, peykan e hîrzî meydan

...  
Her şêxê kewte şiwênî yek dû kesî reş û rût  
Xellkî be mûr dezanê, xoy Hezretî Suleyman (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 97)

Her lem qesîdeye da Hacî bas le komellêk willat û nawçey ciya ciyay cîhan û be taybetî Urûpa dekat ke bûnete dewllet û kîyanî siyasîy serbexoyan pêk hênawe û diwatir amaje bewe dekat ke hokarekanî ew serbexoyiye çîn:

Binwarre s'eî û xîret êsta le Dewlletî Rom  
Xoyan xezênedar in, xoyan tebîb û sulltan

Her diwênê ehli 'Sûdan' hestane pê wekû şêr  
Êstêke musteqîll in mehsûdî kullî ediyan



'Bulxar' û 'Sîrb' û 'Yonan', hem 'Ermen' û 'Qeretax'  
Her pêncyan be t'edad nabin be qedidî Baban

Her êke musteqîll in, kullêkî dewlletêk in  
Sahêbî ceys û rayet, erkanî herb û meydan

Hem heqîyane Ermen, xîretkeşî yektir in  
Wek ême nîn le gell yek d'ewa biken be şîran  
Bo fennî herb û sen'et, bo zebt û rebtî millet  
Deynêrine Urûpa gewre û biçûkî xoyan (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 99)

Puxtey basî em beşe ewe ye ke Hacî nawerrokî lem çeşney, ke be tewawetî le nawerrokî xezelekanî ciyawaz e, le qalibî qesîde da guncanduwe û emeş pajêke le rewî ew gorrankarîyey ke le ziman û pêkhate û cîhanbînî û hizrî şî'irî Hacî da hatuwete arawe. Ke wate, Hacî destberdarî qallibî xezel buwe, le ber ewey destberdarî texezul û têrrwanînî 'eşqî asmanî û romanusî buwe û ruwî kirduwete xwêndinewey waqî'ekanî komellga û netewekey û her boye le qonaxî dûhemî gorrankarîy qallib û nawerrokî şî'irekanî da le delaqey qesîdewe peyamî ş'airaney xoy be gwêy berdenganî degeyenêt. Ke wate, be ray min, qesîdekanî Hacî le serubendî jîyanî tarawgenişînî û xerîbayetîy Îstamboll da nûsraw in û yekem wêstgey formî û fikrî bûne le wersûrranî cîhanbînîy Hacî le 'texezulewe' berew 'tefekur', le îman be 'eşqî teqlidî û dilldarîy romanusyane berew bawerrî nîştimanperestî û wetenxwazî. Hacî le heman kat da rexne le milletî xoy û barudoxî berdest deqrêt û şan be şanî eweş han danyan bo derbaz kirdinî xoyan lew doxe û hewilldan û hîmmed-kirdin bo dirustkirdinî kîyanêkî neteweyî be giştî û dewlletêkî Kurdî be taybet. Bo em mebeste diwa qallibî şî'irî ke têy da Hacî hizrî nîştimanperwerî û bawerrî şorrişgêrrîy xoy degeyenête çillepope qallibî mesnewî yan heman cûtserwaye.

### Qonaxî sêhem: Mesnewî (Cûtserwa)

Le şî'irî klasîkî da taybetmendîy qallibî cûtserwa lewe daye ke boy heye hizr û peyamî ş'air be pişûdirêjî (qallibî cûtserwa wek xezel û qesîde nîye ke jimarey beytekan diyarîkiraw bêt) û bê dillerawkey dozînewey serwa (be pêçewaney xezel û qesîde, le cûtserwa da her beyte serway xoy heye) le xoy da biguncênêt. Hacî le diwa qonaxî rewî gorrankarîy cîhanî şî'irekanî da qallibî cûtserway be kar hênawe û be dillinyayiyewe dekrêt bigutrêt hemû cûtserwakanî dîwanekey berhemî jîyanî tarawgenişînî û diwasallanî jîyanî ew in. Eger bixwazîn bo selmandinî em qiseye pişt be şî'irî xudî Hacî bibestîn, dekrêt amaje bo beytêk le cûtserway 'Udeba Çake', II 188-196 bikeyn ke têy da basî 'Bircî Îfil' Paris kirawe:

Dexîl şêx û mêx mebin ebeda  
Hîç kesê rizqî hîç kesê nada

Ey xerîkî rimûz û naz û niyaz  
Urûpa fennî geywete 'îcaz

Qulleyî 'Îfil'î le Eflake  
'Eksî ew gerdişî le jêr xake (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 189)

Wek zorbey tojeran basyan kirduwe Hacî debêt sallî 1897 koçî diwayî kirdibêt; sazkirdinî burcî benawbangî Îfilîş çend sallêkî xayand û sallî 1889 kotayî pê hat. Ke wate, em burce debêt 8 sall pêş mirdinî Hacî dirust kirabêt û eme nîşanderî ewe ye ke Hacî le diwasallanî jîyanî û le serdemanî tarawgenişînî da basî em burce le cûtserway 'Udeba Çake' da kirduwe.

Cûtserwakanî Hacî destpêkî bizutinewey şî'irî şorrişgêrraney kurd in: Şorrişî dijî dujminanî gel, şorrişî dijî koneperestîy ayinî, şorrişî zeq kirdinewey diruşmî neteweyî û siyasî, şorrişî hizrî rexnegirane be nîsbet komellgay Kurdî. Hacî şorriş be hemû ew manyaney gorrîn dekate nawerrokî serekîy şî'irekanî diwasallanî temenî xoy û bo em mebesteş qallibî cûtserwa helldebijêrêt. Em şî'irane şî'irî wirya kirdinewen û wirya kirdinewey pêwîstî be qallibêkî sûk û sana û xobedesteweder û aşikiraker û leherader heye, wate qallibêkî le çeşnî cûtserwa.

Ew taybetmendîyey ke şêwazî têrrwanîn û bîrokekanî Hacî le cûtserwakanî da le çaw qesîdekanî ciya dekatewe toxtir kirdinî rexne û tanekanêtî le gelî xoy, û em car nek be parêzewe, bellku rastexo û bê sillemînewe û be zîmanêkî zibir û tîj rimî rexney be zigî gutare baw û bebrewekanî serdemî xoy da dekat û helliyan deweşînêtewe. Bo nimûne, le heman cûtserway 'Udeba Çake' da, II 188-196 Hacî, be pêçewaney qena'etî bawî serdemî xoy, pêwîstî wa nîye Kurd be îdrak bin, yan qewmêkî şêr sîfet bin: (Ew dellê 'Qewmî to hemû mar in'.)

Kê dellê Kurdekan be îdrak in  
Bes e em neqse giwê le min naken

Le qisey saxî min xelex degirin  
Wahîmey şêxekan le dill degirin

...  
'Eşqbazî û hewayî derwêşî  
Milletî xiste feqîr û bêîşî

...  
Ew kesey dewllemdindêkî çak e  
Bendeyî Romîyanî napak e

...  
Lêy gerrê qewmî to hemû mar in  
Diz û hîz û piyawkuj û har in

...



Be qisey çake destyan degirim  
Terkî nakem be lome ta demirim (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 188-196)

Hacî le songey ewey jyanî Îstemboll dîd û têrrwanînêkî niwêy pê bex-  
şiywe tenanet kelamî dînîy baw be şêweyekî taybet be xoy rave dekat û dijî  
ew bawerrane radewestêtewe ke pîroz û cêgîr kirawin û le heman kat da  
dijî berjewendîyekanî mirov û pêşkewtinî komellga be kar hatûn. Nimûney  
xwarewe bellgey em boçûneye:

Boçî fermûyetî nebîy emîn:  
'Etlîbiwa 'ilimkim wilu balsîn'

Nêr û mê lem hedîse ferqî nîye  
Ger mela nehîy fermû dînî nîye (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 189-190)

Lem cûtserwaye da Hacî nek her rexnegirî tundutîjî hendêk binema ti-  
yorîkekanî diyanetî teqlîdîy serdemî xoyetî, le çeşnî tefsîrî zorîney melakanî  
ew serdem û tenanet serdemî êmeş, bo ew hedîsey gorîn, bellku dij be zor-  
bey here zorî ew piraktîk û kirde dînî û be naw dînîyane radewestêtewe  
ke, be bawerrî ew, serçawey sistî û nuşustîy komellgan, wek lem nimûnaney  
xwarewe da be raşkawî em peyame radegeyenrêt:

Xaneqa û şêx û tekiyekan yekser  
Pê m billên nef'îyan çî ye axer

Xeyrî t'elîmî tenbellî kirdin  
Cem'î emlak û xezne ko kirdin

Def'eyek îmtîhanyan naken  
Têbigen zehre ya ne tiryak in (*Dîwanî Hacî*, c. II, r.188)

Eger le goşenîgay dûpat bûnewey mutîfî 'kurd', be hemû liqekanîyewe,  
le cûtserwakanî şî'irî Hacî birrwanîn, debînin em mutîfe 45 car lem cût-  
serwayane da, ke jimareyan degate 18 cûtserwa, be kar hatuwe û bêguman  
hemûşyan le paş zemîneyekî nîştimanperwerane û netewexwazane da kellk-  
yan lê wergîrawe. Em jimare zorey mutîfî kurd, ke dû hêndey heman mutîfe  
le qesîdekanî da, ewe deselmênêt ke nawerrokî nîştimanxwazî û şorrişgêr-  
rane le şî'irî Hacî da geyîştuwete ewperrî xoy. Ke wate, Hacî bo geyandinî  
peyamî xoy be raşkawanetirîn şêwe û diruşmawîtirîn hallet ruwî kirduwete  
qallibî cûtserwa.

Le layekî tirewe Hacî le cût serwakanî da le jêr rikêfî karîgerêtîy ş'airanî  
pêşengî qutabixaney Baban rizgarî hatuwe û be pêçewaney xezelekanî, ama-  
jey zor û zeq be nawekanyan nakat. Bo nimûne, le hemû cûtserwakanî da

tenya çend carêkî kem nawî Nalî dehênêt, ewîş ew katey ke le pena nawî  
ş'airanî tir basî Nalîş wek yek le ş'airanî kurd dekat, wek le şî'irî 'Şehsewarî  
belaxetî kurdan', ll 217-226:

Şehsewarî belaxetî kurdan  
Yekketazî fesahetî 'Baban'

Mistefa texellusî 'Kurdî'  
Xezelî kirde berbutî kurdî

Nawî 'Sahêbqîran'î xasî ewe  
Çunke lem 'erse espî ew bedew e

Ew ke noşî şerabekî tallî  
'Nalî' lew 'esre da buwe tallî

'Nalî' ustadekî gelê ça bû  
Xizrî abî heyatî m'ena bû (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 217)

Wêdeçêt lêreş da Hacî pitir mebestî parastinî layenî neteweyî û nîştimanîy  
meseleke bûbêt û le rêgay rîzkirdinî nawî ş'airanî kurd xwastûyetî mîllete-  
key mîratî edeb û zimanî xoy le bîr nekat û bîparîzêt, wek çon le cûtserway  
Le Meydanî Behara' da, ll 247-252 dellêt:

Weku bîstûme ey yarî nikupey  
Le tarîxî Cem û Eskender û key

Be şîr û xame dewllet payedar e  
Emin xamem heye, şîr nadiyar e (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 251)

Diwayîn xallî şayanî baskirdin derbarey cûtserwakanî Hacî ewe ye ke  
Hacî nek her rexne le gutarî dîndarîy teqlîdî deyrêt, ke wek pêştir amajeman  
pê kird be bawerrî ew regurrişey hemû diwakewtinekanî komellgay kurdî  
ye, bellku gutarî dînî be şêweyek dehênête arawe ke şan be şanî gutarî nîş-  
tîmanperwerane le pênewî wiriya kirdinewey xellkî Kurdistan da bikewête  
gerr. Nimûney diyarî em şêwe hellsukewtey Hacî le gell em dû gutare le  
kurtecûtserway 'Ya Îlahî' da, ll 196, debîrêt:

Ya îlahî be ayetî munzel  
Be çwar yarî Ehmedî mursel

Bê newayanî mullkî Kurdistan  
Her le gawanî ta degate şîwan



Le xewî cehil û mestî û xeflet  
Be xeber bên be nexmeyî rehmet

Pakî derçin le karî nabemehel  
Romî rafirrênin bo derî esfel

'Hacî' ye şî'irekanî wek Kawe  
Rojê debiyên direfşî helldawe (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 196)

Lem şî'ire da debînîn komellêk nîşaney gutarî dîndarî le çeşnî 'ayetî munzel', 'Ehmedî mursel', 'nexmeyî rehmet' û 'derî esfel' dest dexene nêw destî hendêk hêmay gutarî nîştîmanperwerîy wek 'mullkî Kurdistan' û 'direfşî Kawe' be mebestî zeqkirdinewey peyamî şorişgêrraney Hacî ke 'be xeber hatinî bê newayane le xewî xeflet' û 'rafirrandinî Romî' ye le xakî Kurdistan.

Be kurtî, detwanîn billêyin Hacî Qadir toxtirîn û zeqtirîn hellwêstî nîştîmanperwerane û şorişgêrraney xoy le qallibî cûtserwa da guncanduwe. Ho-karî em zeqbêjîyeş le cûtserwakanî da degerêtewe bo, le layekewe, têgeyîştin le girîngîy gutarî nîştîmanperwerane bo rizgarîy gelî jêredestî xoy, wate kurd, û le layekî tirewe, qull û çirr bûnewey ezmûnî xerîbayetîy diwasallanî temenî û hawkat teşene sendinî 'eşqî willat û evînî ew xellkey lêyan dûr buwe, wek çon lem çend dêrrey cûtserway 'Le Meydanî Behara', II 247-252, em xallane derdekewin:

Meken men'im hemû raste meqalem  
Be burhan û hedîsî fexrî 'alem

Weten mehbûbeyeke hucrearay  
Nîşaney dîn û îman e temennay

Le 'Adem' bigire ta dewranî êsta  
Yekêke Hacî lew xellke hellista

Ke xemxwarî bika bo mîletî xoy  
Le beynî gewrekan û şêxî bê poy

Zemane tûşî derd û xurbetî kird  
Xemî Koyê perêşanî hemuwî kird (*Dîwanî Hacî*, c. II, r. 250)

### Encam

Lem witare da bas le sê qonaxî rewî gorrankarîy qallib û nawerrok le şî'irî Hacî Qadirî Koyî da kira. Qonaxî yekem ew qonaxe ye ke Hacî hêşta Kurdistanî cê nehêştuwe û xezel dekat be qallibî serekîy şî'irekanî û her bem pêyeş, nawerrokî şî'irî em qonaxey texezul û dilldarî û basî m'êşûq û zullf

û qed û ballay yar e. Lem qonaxe da Hacî pitir lasayîkerewey şî'irî ş'airanî pêşrewî qutabxaney Baban e û babetî kurdayetî çî pêge û cêgeyekî nîye. Qonaxî dûhem qonaxî nûsîn e le qallibî qesîde da ke têy da Hacî wirde wirde rû dekate babetî neteweyî û pesindkirdinî xak û çiya û çollî nîştîmanekey. Hacî lem qonaxe da Kurdistanî cê hêşituwe û qesîdekanî Hacî le ezmûnî jiyani xerîbayetîy Îstemboll da nûsraw in. Lem qonaxe da Hacî tefekur û 'eqlî neteweyî cênşînî texezul û 'eşqî takekesî dekat û mutîfî Kurd be firawanî be kar dehênêt. Le diwa qonax da, wate qonaxî sêhem, Hacî le qallibî cûtserwa kellik werdegrêt û zeqtirîn hellwîstgelî siyasî û nîştîmanperweraney le dû tiwêy em qallibe da deguncênêt. Cûtserwakanî Hacî akamî ezmûnêkî dîrudirêjî jiyani awareyî û tarawgenişînîy diwasallanî temenêtî. Mutîfî 'kurd' lem qonaxe da zêtirîn rêjey bekarhênanî heye û şî'ir lem qalibe da zor car rêrewî peyamî raşkawane degirêt.

### Serçawekan:

Serdar Hemîd Mîran, Kerîm Mustefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, Billaw kirdinewey Kurdistan, Sine, 1970

Kemal Xembar, *Berew Cîhanî Şî'irîy Çend Ş'airêk*, Dezgay Aras, Hewlêr, 2008

Culler, Jonathan, *Literary Theory: A Very Short Introduction*, 2<sup>nd</sup> ed. Oxford University Press, 2011

Perrine, Laurence, *Literature: Structure, Sound, Sense*, Harcourt, New York, 1993

Brooks, Cleanth, "Irony as a Principle of Structure", in *Critical Theory Since Plato*, 3<sup>rd</sup> ed. H. Adams, Belmont, Wadsworth Publishing Company, 2004

Payende, Hussain, *Goftman Neqd, Muqalatî Der Neqd Adebî*, Tahran, Anteqarat Nîlufer, 1970

tîpguhêzî: Recep Aşar



## HEVPEYVÎN BI BÛBÊ ESER RE

### "Tenê Girî Ne Qedexe Bû"

Li ser Hefsa Diyarbekirê gelek tişt hatin gotin, lê mixabin piranîya wan bi tirkî bûn. Me weke kovara *Zarema* xwest ku bi nivîskarê *Gardiyanê Bûbê Eser* re li ser wî mekanê wehşetê û romana wî ya ku weke wesîqayekê ye hevpeyvînekê bi kurdî bikin. Bûbê Eser piştî derbeya îlonê sê salan di wî mekanê wehşetê, di "5 Nolu"yê de ma û şahidê gelek qewamên li wir e. Bûbê Eser niha li Swêdê dijî. Ji êşkenceyên ku li wir hatin kirin bêhtir (jixwe romana *Gardiyan* rismekî mezin datîne ber me) me xwest ku derûdora wî mekanê ku di dîroka însaniyetê kêma ciyên mîna wî hene fêmkirin.

-Min du romanên te xwendin; *Gardiyan* û *Jiyanek*. Romana bi navê *Jiyanek* mirov dikare weke rêya te ya ku diçe Hefsa Diyarbekirê jî şîrove bike; yanî şert û mercên ku te ajotin ber bi wî mekanê wehşetê de û *Gardiyan* jî mirov dikare weke; şahidiya wir, analîza wir, xwestina fêmkirina kirinên li wî ciyê û helbet teşhîrkirina wir bixwîne. Ez dixwazim ku ji vir dest pê bikim: gelo çi bi rêya wêjeyê be çi bi rêya pevxistinên din be mirov çiqasî dikare heqîqeta ku li wir hûn pê re rûbirû man vebêje? Gava ku tu qal dikî an te nivîsî çi kêma ma/dimîne, çi zêdeyî derdikeve holê?

-Bawer bike mirov çiqasî li ser wê girtîgehê binivîsîne, bêje wê kêma be. Ji ber zilm û wahşeta di wir de li ciwanên kurdan dikirin ne hatiye dîtîn, ne hatiye bihîstin û rûdaneke weha li ser rûyê vê cihana ku em lê dijîn, nebûye û nabe. Ji ber vê yekê ye ku divê ew kesên li wir mane her yek ji aliyê xwe de tiştên li wir dîtine, bihîstine û jiyane bêjin û binivîsin, belkî hin quncikên tarî yên wê girtîgehê bi vî awayî rohnî bibe. Lê...

Berî her tiştî divê çi bi serê kê ve hatibin bê şerm û tirs bibêjin. Dema ku ev yeka bibe dibe ku em bikaribin bi saya vê, wê girtîgehê, armanc û kiryarên wê ji bona gelê xwe û cîhanê bibêjin da ku ew jî rastiya wir fêmkirin.

Lê em kurd şermokî ne. Em gelek caran rastiye vedîşêrin. Yanî hin tiştên ku hatine serê me, wê nabêje dema ku em dibêjin ya jî dinivîsinin weke hatibe serê kesên din. Wê, dibêjin û dinivîsinin. Weke mînak: Em dibêjin gardiyanan job radidan girtiyan, lê em ji bîr dikin ku em jî yek ji wan bûn. Çima em nabêjin job rada min, gû bi min da xwarin, ûhwd.

Loma girînge ku divê kê-kê li wir çi dîtîbin, çi hatibin serê wan, wê weke ku bûye bibêjin. Bê fedî û şerm. Bila bê zanîn ku ji tiştên ku dijmin anîne û tîne serê me re, divê meriv ji ber wan fedî neke û bibêje. Ji ber ku ew dijmin e û dijmin dikare her tiştî bîne serê mirov.

Loma jî li gor min hê jî ew tiştên li wê girtîgehê dianîn serê me baş nehatiye fêmkirin, ji ber ku herkes rastiya xwe nabêje û vedîşêre ya jî dixê hustiyê kesekî din.

Gotina min ev e: Divê herkesên ku li vir jiyane, mane, tiştê hatine serê wan bibêjin. Lê çawa bûye weha bibêjin. Wê gavê mirov dê bêhtir, baştir û rehetir bûyer û kiryarên wir fêmkirin, bide fêmkirin.

- Dibe ku ev şerm, ev jixwedûrxistin, ev neqebûlkirin ji ber xwestina nebawerkirinê be? Em pê zanin ku gelek kesên di *Auschwitzê* de mabûn, an kesên ermen ku ji qirkirinê xelasbûbûn têgihîştina/mêjiyê wan qebûl nedikir ku ew ji daîreya însaniyetê hatine qewirandin. Belkî mîna ku tu dibêjî em li quflên civaka xwe jî vegezin. Gelo dema hûn di wir de bûn civakê tiştê ku divê bikira kir, an hêviyek we hebû ku tiştekaribe bê kirin, di dawîya dawî ew girtîgeh di nav dilê Kurdistanê de bû û gava ku hûn derketin, derdora we bi çi çavî li we nêrî, ji bo ku birînên we derman bibin bûn alîkar an hûn hêvîşikestîbûn? Bi kurt û kurmancî rewşa civaka me li hember vî mekanî çi bû wê demê?

- Ev pirseke gelekî zehmet e ku mirov bersiva wê rast e rast bide. Ji ber ku hin tişt hene ku ji bona civatê şerm e, loma jî mirov naxwaze wê şermê bi êşkere veke an bibêje. Ji ber vê ye ku gelek quncikên wê girtîgehê hê jî ronî nebûne.

Dema ez di girtîgehê de bûm, her hêviya min û ya kesên di wirde ew bû ku wê heval û partiyên Kurdistanê li hember vê derkevin û şerê azadiya gelê xwe bi mîrxasî, bi camêrî û bi awayekî neteweyî bidin. Lê heta ez derketim ev nebû. Piştî derketinê jî hêviya min bi temamî şikest.

Dema ez ji girtîgehê derketim, kesên nêzikî min, mirovên min zikê wan bi halê min dişewitî ku ez ketim çi halî. Ji ber ku tenê hestî û çerm mabûm. Girtîgeha di dema me de xwarin û şuştin lê tunebû, em hemû girtî kiribûn hestî û çerm.

Lê dema ez bi xwe ji wê girtîgehê derketim hê jî tirs û sava leşkeran li ser xelkê gelek bû. Kesên ne nêzikî me bûya newêribûn zû bi zû bihata dîtina meriv. Carna dema ez jî derdikevim û li qahweyek nas rûdiniştim û çend kesan xwe didan dora min ku halê min bipirsin. Ez jî yekser diketim mijara girtîgehê, lêdan û êşkenceyên wir. Di nava axaftina xwe de min dinêrî kesên dora min hêdî hêdî belav dibûn. Dûre min fêmkirin ku ew ditirsin. Ji ber ku wan gotinên min li gor wê demê û li gor rûniştina qahwê ne di cih de bûn. Loma jî kesên der û dora me xwe ji me disitirandin. Zû bi zû nêzikayî li me nedikirin.



Ji ber vê bû ku kesên ji girtîgehê derdiketin bêtirên wan ew malbat û mirovên xwe bi hev re eleqeder dibûn. Lê carna hevalbendên rêxistinê jî bi dizî xeber dişandin û hevalê me dipirsîn.

Lê ez bi xwe civaka me ya wê demê gunehkar nakim. Ji ber ku zilm û zordariyek mezin li ser wan hebûn. Wan şoreşgerên berî 12 îlona 1980yê jî hemû wenda bûbûn. Loma jî civat bê hevî mabû û tenê kesan dixwestin xwe bisitirînin.

- Ji tawanbarkirinekê bêhtir dixwazim ku rewşê fêr bikim. Rewşa derdorê, rewşa kes-komên ku bi hawakî bi wî mekanî di nava têkiliyekê de bûn. Mesela di destpêka romana te *Gardiyan* de jî nêzîkbûnek hebekî ecêb û xwînsar li hember xardiyanekî heye, vegotin jî bi piranî di ser wî re dimeşe. Sîdar mîna ku bixwaze wî jî fêr bike dixuye. Gelo gava ku tu ji wir derketî te û tu xardiyanan we hevdû dît? Û xardiyanên ku we karibûya têkiliyek hebekî însanî bi wan re daniya qet hebûn? Mesela tu xardiyanên ku bi tiştêkî biçûk be jî carna alîkariya hin girtiyan dikirin hebûn?

- Di nava gardiyanên girtîgeha zîndana Diyarbekirê de bi tu kesekî re çenek rehm ango insaniyê tunebû. Tunebû, ji ber ku ew kesên bijarte bûn. Yanî bi gotineke din gardiyanên wir ew kes bûn ku divê tenê karê wan lêdana girtiyan bûya, ya na nikaribûn li wir bibûna gardiyan.

Hilbijartinên wan jî li ser du asasan pêk dihat. Yek: Ew kesên ku nû dihatin leşkeriyê ku destpêka leşkeriyê jî gelek zehmet bû. Yanî jê re dihat gotin dewra ecemîtiyê. Ev dem dema ku wan jî gelek lêdan dixwarin. Ew kesanan dikirin gardiyanên girtîgehê û yuzbaşî Esat Oktay ji wan re digot: "Kî çiqasî li van dijminên gelê me bidin, kî çiqasî tadê û zilmê li van komunîstên dijminê dîne me bikin, ewên li vir azad bin. Yanî nobedarî, lêdan tade wê tunebe. Eksê wê kesên weha bikin, wê li vir azad bin. Bixwin, vexwin û li kêfa xwe binêrin." Weha jî dikir. Mirov dikare bibêje hema hema her êvar yuzbaşî Esat ew gardiyan bi vexwarinê serxweş dikirin. Weke esrar û araq bi wan didan kêşandin û vexwarin. Ew serxweş dikir û bera ser serê girtiyan dida. Loma jî kesên weha û bi vê rehetiyê û lêdana kesên zana êdî nedixwestin vegehin cihê ecemîtiyê. Ji ber ku li vir lêdaneke zêde li wan dihat kirin. Ecemîtiya leşkerên tirkan jî gelekî zor û zehmet e.

Yên din jî ango gardiyanên din jî ji ew kesên ku dijminên kurdan û li gor gotina yuzbaşî yên kurdên komunîst û anarşîst bûn. Yuzbaşî bi nav leşkeran diket û digot: "Kî dixwazin li dijminê gelê xwe, dijminê dîne xwe û li komunîstên kurdan bidin, bila bên ba min ez ê wan bikim gardiyanê girtîgeha Diyarbekirê ku ew kesên dijminê mîletê me, dijminê dîne me hemû li wir in." Loma jî yên dijminatîya wan bi kurdan re hebûn, dibûn gardiyanê girtîgehê da ku bikaribin li gor dilê xwe lêdanê li me bikin. Ew jî ji kesên faşîstên tirkan bûn.

-Piştî ku tu derketî te tu xardiyan dîtin? A din jî heya roja îro tu kes ji bo kirinên wir hatiye darizandin gelo?

-Dema ji girtîgehê derketim, min nexwest ji welatê xwe û bajarê xwe dûr bikevim. Lê piştî berdana xwe tê gihîştim ku mana min li welatê û li bajarê min zehmet e. Loma bi saya xalê xwe min karê jina xwe ku li Diyarbekirê hemşîrebû, rakir welatê wê hêla Behra Reş. Sedem ji vê ew bû ku ez bikaribim li gel hevjin û zaroka xwe keça xwe "Rojbîna bavê xwe" ku dema di zindanê debûm hatibû dinyê, bijim. Zor û zehmetiyên li wir ku me dît nikarim hemûyan li vir bibêjim, kesên jiyana min a li wir meraq dikin bila romana min *Gardiyan* bixwînin wê bêhtir bibin xwedî zanînin berfireh.

Ez li wir rastî kesekî ku dema ez di girtîgehê de bûm, hatim. Ya rast ne ku ez rastî wî hatim, ew rastî min hat û xwest hemû kiryar û bûyerên wir ji bona min bibêje da ku ez jî wan belav bikim. Wî dixwest bide diyarkirin ku hemû kiryar û bûyerên wir li gor plan û projeyên yuzbaşî Esat dihatin birêvebirin. Tenê dikarim vê bibêjim ku kî jiyana min a li wir û kiryarên girtîgehê dixwazin fêr bibin bila *Gardiyanê* bixwînin. Her tişt bi devê wî û li gor gotinên wî hatine nivîsîn.

Heta niha min nedîtiye û nebihîstiye ku ji wan gardiyanên li zindana Diyarbekirê yek jî hatiye darizandin. Ji xwe tiştêkî weha bibûya, dibû ku tiştên gelek ecêb jî derketina.

- Gelek tişt li ser kirinên wir hatin gotin, ez nabêjim êşkence, binavkirina êşkenceyê tiştêkî din e (yekûna kirinên li wir di nava kategorîzasyonê de ye bi min), çî ji romana te *Gardiyanê* çî jî ji hevpeyvînan kesên ku di wir de mane, em derkevin rê wê gelekî zehmet be ku mirov karibe listeyek awayên êşkenceyên ku li wir dihatin kirin derxîne, digel ewqas vegotin (hevpeyvînan di kovara Serbestî ku hejmarek taybet li ser şahidiyên Hefsa Diyarbekirê derxistibû mînakên baş in) hîn jî dawîya awayên êşkenceyên ku nehatine gotin derdikevin. Gelek tişt li ser van kirinan hatin gotin. Gelo ev kirin bi tesadûfî, li gor rewşê, di wê kêloyê de derdiketin holê an li ser wan difikirin û dikirin, yanî plan-programek/bernameyek awayên êşkenceyan hebû?

- Belê kirinên jixweber bi rihetî û di demên kin de derbas dibin. Lê piştî hatina yuzbaşî Esat Oktay Yildiran her tiştên wir êdî li gor bernameyê dihatin kirin. Bernameya wan jî ew bû ku me ango kesên li wê girtîgehê hemûyan bikin tirkên baş. Ya din heger nekin tirkên baş jî bikaribin wan ji doza gelê wan dûr bixin û êdî kes nebêjin em kurd in û doza kurd û Kurdistanê bikin.

Loma jî dema projeya wan li ser vî asasî pêk hatibû ku me ango girtiyan wir weke xwe bikin. Ji ber wê jî her êşkence û lêdan li gor fikir û ramanên li ser dihatin fikirin, pêk dihatin. Weke mînak: Dema yuzbaşî gardiyan di civandin û ji wan re digot: "Kî bikaribe şikil û awayekî lêdanê yê nû peyde bike an bibîne û ew bikeve serê min ez ê du rojan betlanê bidim wî kesî."



Loma jî ji bona diyarî û betlanê her êvar xew li gardiyanan jî tunebûn. Ji ber ku serê xwe bi dîtina şikil û awayekê êşkencê yê nû mijûl dikirin.

Her weha yuzbaşî jî her di nava fikir û ramanên dîtina metodên êşkencê yê nû de bû. Loma kiryarê wir yek jî ne jiberxwe pêk dihat. Hemû li gor destûr û bernameya wir û bi awayekî bîrewerî pêk dihatin. Li wir tiştên tesadufî tunebûn. Kesên li wir dihat kuştin bi tesadufî bû. Yanî digot ev ji ranzayê ket û mir. Digotin: Dilê wî sekinî û mir. Lê hemû derew bûn, ji ber kesên li wir dihatin kuştin hemû bi emrê yuzbaşî bûn.

- Tu diyalogên te û Esat Oktay bi hev re çêbûn qet? Dihat nav we? Di romana te *Jiyanekê de* (ku mîna bîranînên te ne) dibêjin qey Sîdar miriye û wî ji qatê çaran diavêjin, gelo birra jî te avêtin, çawa bû ev mesele? Dema te avêtin Esat Oktay jî li wir bû?

- Belê te ev pirs hinekî tevli hev kir: Lê ez ê rast bikim. Esat Oktay bi qasî tê bîra min û ez ne şaş bim ew sala 1981ê bi wazîfe û bi berpirsiyariyeke mezin hat girtîheha 5 noluyê û ew mudurê wir û berpirsê her tiştê wir bû. Ew dihat nava me, lê dema dihat li gel wî gelek gardiyan û kûçikê wî Co hebûn. Bi tena xwe û bi çend gardiyanan tenê dernediket an nedihat nava me û qawîşên me.

Têkiliyên min û wî yek carê çê bû ew jî weha bû: Ji du mehan carekê kaxitek ku hemû sûcên ango tewanbarên ku li me dihat kirin tê de nivîsandî ji me re dihat. Li gor wê jî gardiyanan û yuzbaşî bi me re muamele dikirin. Ya min jî têde dihat nivîsîn ku "Bûbê rêxistineke nehîni û çekdarî damezrandiye û rêveberiya wê ya bilind dike." Ji xwe ev têrî dikir ku hema li wir cezayê min bibirin. Loma jî carekê gardiyan ba min kir û ez yekser birim ba yuzbaşî, ji xwe çuyina ba wî têrî dikir ku wê bobelateke bê serê te. Loma dema ez gihîştim ba wî min fêhm kir ku ya kuştîme ya jî "îtîrafçî" me. Dema nêzîkî wî bûm, min qomûta xwe da û li benda wî rawestiyam. Hema wî yek ser got:

- Bûbê tu KUKçî ye ya jî APOçî

Çima ev pirs kir, ji ber ku yê navê min dabû hevaleyê min ê berê ku derbasî nava refê PKKê bûbû, di dema girtina xwe de hema navê min dide û dibêje; "Hema wî ango Bûbê bînin ew her tişt e" û tiştên li ser min jî hatibûn girtin hemû belgeyên KUKê bûn. Lê di lêdan û êşkence de ji ber ku min qise nekir, wan jî nema dizanibûn ku bi rastî ez ji kîjan rêxistinê me. Lê ez li ser navê KUKê hatim darizandin.

Ji ber vê yuzbaşî ew pirs ji min kir û min got: Ez ne endamê tu rêxistinan im. Loma wî got: Here em ê dûre hev bibînin. Ji ber ku tam di wê navberê de dawa me KUKê hatibû vekirin û roja dadgehê hindik mabû. Loma wî xwest ku karê xwe yê bi min re bihêle piştî dadgehê ku li gor dilê xwe kirinên xwe bi min bike. Lê çî mixabin di dadgeha ewil de ez hatim tahliyekirin ango berdan. Lê yuzbaşî ev qebûl nekir loma wî du mehan ez dame rawestandin. Piştî wê ez ji nû ve şandim cihê êşkencê li wir jî 50 rojan mam û dema ez

derxistim hember dadgêr, wî got: "Ev tahliye bûye. Şandine ba min çî?" Hêrs bû îfadeya min negirt. Ez şandim ba dadgêrekî din wî jî çend pirsên beradayî kir û got tu tahliye ye. Ji ber vê ez ji xezaba yuzbaşî xilas bûm.

Ez di 02.01.1980yê hatim girtin wê gavê ne girtîgeha 5 noluyê hebû ne jî yuzbaşî Esat. Loma jî di girtina min de û di êşkencê li min hatin kirin de têkiliyên yuzbaşî Esat tunebûn. Bi lêdaneke gelekî zor û dijwar dixwest ku min bidin axaftin û wan belgeyên li ser min hatibûn girtin ji wan re şîrove bikim. Lê min nekir û qet yek gotina ku wanê jê fêde bidîtina negot. Loma jî bi zêde ceryandayînê dilê min disekine. Ji ber ku ez memûrekê dewletê jî bûm wan nikaribûn weke herkesên ku dikuştin, diavêtin an vedîştin, min jî veşêrin. Loma biryar dan ku min di qatê çaran de bavêjin û bêjin "xwest bireve loma xwe avêt" lê bi wê avêtinê ez li ser teksiya wan ya reş dikevim û dilê min ji nû ve de dişixule. Yanî wan him ez kuştim û him jî bi wê avêtinê ez dîsa li jiyane ve gerandim.

- Nizanim bê wê çiqasî ehlaqî be ku meriv di wan şertan de qala berxwedanê bike. Li "5 nolu" yê bi giştî rewşa girtiyan çibû, kesekî karîbû tiştek red bikira, ku bi tiştêkî biçûk be jî we di wê rewşê de dikarîbû li ber xwe bida, di "qawîşa" we de rewş çî bû? Çi we li ser nigan/li heyatê dihişt, we xwe bi çî digirt?

- Tiştê herî girîng ew e ku mirov bikaribe behsa wê girtîgehê û her bûyer û kiryarên wir bike. Loma jî tiştên hatin serê me girtiyên wir hema hema bi awayekî bi lez bû bez û bi kontrol û proje bûn. Lê em di wî warîde bê tecrube bûn. Di nava me girtiyan de jî yekîtiyek ku em bikarin li hev guhdarî bikin tunebû. Me di girtîgehê de jî weke rêxistinên xwe yê derve dikir. Yê derve li hevbûna em jî li hev bûn, di nava wan de şer û pevçûn hebûya li wir di nava me de jî wê yekê destpê dikir. Loma jî tu caran yekîtiyeke li gor dilê me girtiyan ku heta ez li wir bûm pêk nehat.

Bi awayekî gelemperî em girtî ji xamê de hatin girtin loma jî piraniya hema hema hemûyan (ji bilî çend îstisna û berxwedana hin camêran bi serê xwe) me çî emrê dihat dayîn pêk dianî. Di destpêka êşkenceyan de me û gelek qawîşên din jî me di berxwe da. Lê ji ber ku yekîtiya me û jihevbariya me tunebû, ew berxwedan hêdî hêdî têk çû. Tiştên xwestin me pêk anî û wan jî her ku çû li me jidandin heta ku em hemû jî desthilat xistin. Piştî wê jî çî daxwaza wan heba me pêk dianî.

Di qawîşa me de em hemû KUKçî bûn. Tiştên ku em li wir li ser nigan dihiştin baweriya welatparêzî û şoreşgeriyê bû. Ya herî girîng jî baweriya bi rêxistina xwe bû; vê yekê dikir ku em qise nekin, her çiqasî me tiştên wan pêk jî dianî, lê di hin waran de me xwe diparast.

Tiştê em li ser nigan dihiştin weke min got baweriya welatparêzî, ji gelê xwe hezkirin û ji rêxistina xwe bawerîkirin bû. Her em li bendê bûn ku wê rêxistin dest bi şer bikin û li hember dagirkeran wê şerê azadiya welêt geş



bikin. Em her bi vê yekê dijiyan û ev bû sedem ku em li ser nigên xwe man heta ku ji girtîgehê derketin

- Qedexeya axaftinê çiqasî dewam kir, hîsek çawa bû gelo, li ser giyana we çi tesîr dikir?

- Tu tişt weke qedexekrina zimên ne zehmet û zor e. Di jiyanê de ya herî zor ev e. Tu zindî be, di nava hevalên xwe de be û tu nikaribe bi zimanê xwe qise bike. Ma gelo wê çi ji vê zortir hebe. Loma jî vê rewşê di warê nefsi de tadeyeke mezin li me dikir ku em roj bi roj xerabtir dibûn. Lê dîsa jî car carna me rê û olax didît ku em li gel hev qise bikin. Me di wan şertanan de jî bi zimanê xwe qise dikir. Lê di gelek qawîşan de ango di hemû qawîşan de zîlamên karbidestên girtîgehê hebûn. Dema ku bidîtina an jî lê hay bibûna ku em kurdî qise dikin, ev digihandin îdarê û li gor wê jî me cezayên xwe didît.

Ji ber wê zîlm û zordariya wan bû ku dema ji girtîgehê derketim min soz da ku ez ê tu caran bi tirkî nenivîsînim û bi kurdan re bi tirkî qise nekim. Di warê nivîsê de min ev soza xwe pêk anî. Ew roj ev roj e ku tenê bi kurdî ji sala 1986an û virde dinivîsînim. Lê di warê axaftinê de gelek caran min hin zehmetî kişand da ku bi hin kurdên me yên ku naxwazin bi zimanê xwe bi-axifin, bi tirkî qise kir ku ew jî vê fêhm bikin û dev ji tirkî berdin lê weha xuya ye tirkî ketiye xwîna piraniya rewşenbîrên me. Ji ber vê ye hê jî gelekên wan naxwazin dev ji tirkî berdin.

- Qesta min neaxaftina bi tu zimanan bû, ne hew a bi kurdî. Di gelek şahidiyan de derdikeve hemberî me ku bi mehan axaftin qedexebû. Gelo di "qawîşa" we de axaftin serbest bû, ev qedexeya neaxaftinê li ser we jî tunebû?

- Belê demê, axaftina me ya bi hev re di hundirêqawîşê de qedexe kirin. Ne tenê axaftin her weha ken û henek û bi awayekî rehet rûniştin û razan jî qedexe kiribûn. Ev qedexe ne tenê ji bona çend an hin qawîşan bûn. Ev qedexeyeke ji bona temamên qawîşên girtîgehê bû. Loma jî me nikaribû bi hev re qise bikin, bikenin û rehet razên. Weke mînak: Dema ku em razên divê em li ser piştê û dirêjkirî bûna. Her weha divê herdu destên me jî li ser zikê me bûya. Kesên ku bi vî awayî ranezana lêdan dixwarin. Heta çûyina tûwalete jî kiribûn bi awayekî li gor wan nîzamî. Di dema çûyîn û hatina tûwelate jî divê herdu destên me bi kulîmekên me ve zeliqandî bûna. Ya na dîsa lêdan dibû para me.

Rojekê bûyereke ecêb li qawîşa me qewimî û wê ecêbê jî gelekî kenê me dianî. Hingî kenê min hat min nema dikaribû xwe bigirta. Loma min xwe li ser ranza binî dirêj kir û lihêf avêt ser serê xwe û têra xwe keniya. Hingî keniya hêsiran di çavên min re avêtin. Tu nabê gardiyan ji vê rewşa min haydar bûbûn, ew jî bi dizî dikevin hundir. Ez qet li hatina wan hay nebûbûm. Dema li ser serê min rawestiyan û deng li min kirin, hema yekser min

lihêf ji ser serê xwe avêt komûta xwe da lê hê çavên min şil bûn. Loma gardiyan pirsî çima hêsir ji çavên te tê. Hema min yekser weha bersiva wan da.

- Dayika min hat bîra min, ji ber ku gelekî nexweş bû, dibê ku miribe. Loma ez jî ji ber vê xemgîn bûm û bi dizî giriyam da ku kesên din nizanibin ku ez digirîm. Lê ji ber ku heta wê demê girî qedexenekiribûn, li min nedan. Lê ji wê rojê pêve êdî girî jî qedexe kirin.

- Ku tu ji roja îro de li wan rojan dinêrî tu herî pir li ber çi dikevi gelo û qet kêliyên ku tu kêfa xwe pê tinî hene?

- Nizanim vê çawa bibersivînim? Pirsek zehmet e. Ez niha li ber wê yekê dikevim ku di wirde em ne yek bûn. Me piraniyan li hev guhdarî nedikir. Me weke rêxistinên xwe yên derve hereket dikir. Heger em li hev bûna, di nava me de yekîtiyeke weke ya girtiyên wê girtîgehê hebûya, dibû ku me ewqasî lêdan û êşkence nedîtibûna. Ez niha gelekî li ber vê dikevim.

Tiştên ku kêfa min dianî û niha jî pê serbilind im ku di bin ewqas zor û zehmetiyan de me dîsa di berxwe da. Weke karbidestên girtîgehê tiştên ji me dixwestin neda dest wan. Her çiqasî hin "muxbîr" jî nav me derketin jî lê wan jî zêde zerar nedan me. Derketina çend kesên ji xwe û ji rêxistina xwe nebawer jî normal bû. Lê bi awayekî giştî berxwedan û serhildana zîndana Diyarbekirê bû deng, bû nav, bername û sembola berxwedanê. Ya girîng ev e û divê em vê derxin pêş...

- Nizanim... bi qeysa "berxwedanê", teslîmiyeta di wir de (ez bi hawakî neyînî nabêjim, weke rewşeke însanî), weşeta di wir de, armanca vê weşetê xulasa her tiştê wir ez dibêjim ger meriv li ser bipeyive û fêhm bike. Bi qeysa şahî û serketinan komkujî, qirkirin, felaketên mezin jî însanan ber bi hev ve diqedimînin û wan dikin xwedî dîrokek/çîrokek hevbeş. Zîlm û komkujiyên ku li ser kurdan hatine kirin, ez bawerim ji tiştên ku "netewa kurd" derxist/derdixê holê ên herî sereke ne. Di nav vê zîlmê de jî Hefsa Diyarbekir ciyekî pir taybet digire. Mekanên wilo li tevayê cîhanê dibin muze, millet li çîroka xwe xwedî derdikeve. Em dibînin ji bo ku dewleta tirk vî pelê dîroka xwe a qirêj bişewitîne û bide jibîrkirin, ji ber çavan û pê re ji bîra însaniyete rake dixwaze ku wî mekanî bike dibistan. Ji bo vê hewldanê tu çi dibêji? Rêxistin û komeleyên kurd ji bo vî mekanî bikin muzeyek bi qeysa ku divê dixebitin gelo?

- Te noktaya herî girîng destnîşan kir. Loma jî dibêjim ku tirk û karbidestên wan tim li ser karê xwe ne ku komkujiyên bikin û wan binax bikin ango veşêrin. Ew karê xwe dikin. Lê divê em weke kurd jî karê xwe bikin. Wan komkujî, tade û êşkenceyên li me û li gelê me kirine bibêjin, binivîsînin, bikin film û şano da ku heta jiyan hebe wan bûyerên qirêj yên karbidestên tirkan kirine bijîn. Bijîn da ku dinya bizanibin tirkan ji dema osmaniyan û heta vê gavê çi anîne serê me, binasin. Loma jî divê em binivîsînin û wan nivîsan bikin filmên sînemeyê, bikin şano, bikin destan da ku kurd, wan bû-



yerên ku bi serê wî de hatine ji bîr nekin. Mînakekê bidim: Romana min ya bi navê *GARDIYAN* ku li ser zîndana Diyarbekirê weke roman ku ji serpê-hatîyên rast pêk hatiye, dikare bibe filmekî baş. Heger ev bi awayekî profesyonel bibe filmekî kurdî wê gavê em ê bi serkevin. Ne tenê ev her tiştên ku li ser wê hatine nivîsên divê mirov bike film û şano. Lê ez weha bawerim kurdên me di vî warî de jî qels in. Bi qasî ku ez dizanim hema hema wir dike bê jîbîrkin. Êdî ew zêde bala kesan nakşîne heyf e lê...

Ji bona ku wir bibe muzexane divê mirov kar û xebatê bike da ku hemû xelkên Diyarbekirê rake ser lingan û daxwaza ku wir bibe muze bikin. Heger ji bona mirovekî bi milyonan însan radibin, divê ji bona wir bibe muze divê em çend milyonan rake ser lingan? Heta ku wir nebe muze jî divê mirov dev ji xebatên demokratîk bernede.

Divê bûyer û kiryarên wir êdî ji nivîsandinê derkeve û ew tiştên hatine gotin û nivîsîn bibe film, film û filmên sînemayê...

**-Ez bawerim meriv wê bi hevpeyvînekê nikaribe tiştên ku li wir bûne bîne zimên, mîna ku meriv ji golekê tasek av dagire, lê dîsa jî hin hestên derheqê wir wê gelekî bi kêrî me bîn. Ji bo bersivên te yî hêja ez gelekî spas dikim...**

- Ez jî sipasî we dikim ku hûn bi karekî weha ve rabûne. Ya girîng ew e ku em bi hev re bikaribin wan bûyerên qirêj ên wê girtîgehê derxin ronahiyê da ku di tarîtiya wê de çî dihat serê me kesên di wir de bîn zanîn. Mala we ava ku we bi vê xebatê ji nû ve de ew girtîgeh û bûyerên wir anîn bîra min.

hevpeyvîn: Hesenê Dewrêş

## GIRYAN: LE NÊWAN QALE MERE Û MÎR MEHMUDÎ BABAN DA

Cebar Cemal Xerîb

Lem witare da hewll dedem şitêk le ser huzn û giryanî qûllî her takêkî kurd billêm, bo eweş pena bo sê aliyet debem. Yekemyan: Tasanî her yekêyan e (wata her takêkî kurd) beranber mosîqa û awazî pirrî huzn, Qale Mere wek nimûneyekî bala û nîzik bo mosîqay pirr huzn. Duwemyan: Aşkirkirdinî ew huzne ye le jîyan û derûnî take takey kurd da, Mîr Mehmudî Paşay Baban wek nimûne yekî takî kurd. Lêre da xom beqerzarî Cladius James Rich dezanim bo ew zanyariyaney le ser ew mîrey kurd le katî serdanekey bo Silêmanî le sallî 1920 le serdemî Fermanrreway Babanekan tomarî kirdûn, Mamosta Hemey Hemebaqî kirdûnî be kurdî. Sêyemyan: Ke berray min regî here qûllî giryan û xesaretî kurdî têt da ye, ewîş derkirdinî kurd e le herdû nîştiman 'nîştimanî cugrafya' û ser nexşe û 'nîştimanî rûhî'.

Bêguman min hest be firawanî giringî ew babete dekem, belam bebê sûdî nazanim ke behoy çend riste û amajeyekî giring dergayek le ser em babete bikemewe. Deşa diwatir şareza û bîrmendan giryan wek çemkêkî giringî şunasî kurdî binasênin.

Demêk bîrim lewe dekirde we boçî hemû kurdêk legell gwê lêbûnî le şimşalle pirr huzn û mîlankoliyekey Qale Mere tûşî têrraman û sersambûn debêt, eger bo lehzeyekîş bêt detasê. Ew awaze filat û yekaraste û pirrgiryaney, le kwêy takî kurdewe serçawe deşê? Erê, berast ewe her henasey piyawêkî pirr şiko û be temene, ke kunî qamîşêk awazêkî pêdebexşê? Ewe tenha semay çend penceyekî wişk û zibr e, sîhrêk lew parçegoşte dekat ke nawî dille û ta piley westan hêminî dekatewe? Min hergîz giryan û lawandinewey ew afrete gencem bîr naçêtewe, ke bo mirdinî mêrdekey degutin, ewe sî û ewen-de sall e be ser ew lawanewey da têdeperrê sîmay peşokawî ew jine û dengî bêendaz pirr xefetî ew jine ke payize payizey degut, naxim radeçillkênê. Ew kate, ew denge tenha wek mindallêk deytasandim û regî giryanêkî qûllî le qûllayî bîrkirdinewem da deçand.

Emrro depirsim, erê ew giryaney tenha giryanî jinêk bû bo mêrde koçkir-duwekey? Erê ewe tenha xefetî ledestçûnî kesêk bû? Erê ew 'payize payizey' bo lehzeyekîş asmanî willatekey çoll nekird tenha lawaneweyek e bo piyawêk ke le katî karkirdin da mirduwe?



Min hîç le lawanewekanî ew afrete Germîyane tênegeyîştîm ke lew perrî dinyawe, le qullayî bêbinî Germîyanewe berew Rûm dehat, ew afrete hemû kes Enfalkirawe bê ewey bizanê kesêk gwêy lêgirtuwe, bê ewey bizanê kesêk agay lêyetî, lew perrî terîkî û tenhayî xoy da, sedayekî denard bê mollet û ruxset, tûndtir le Gerdelûlekanî Katrina û erzhejênekanî tisonamî hemû awe-danîyekanî naxî kurd Xapûr dekat, biyabanêk le meynetî le rûhî da dexul-lqênê.

Hemû ew pêşekiyem bo ewe ye bigem be rastîyek yan qena'etêk ke şînî 'Enfal' şînî kesûkarî winbûwe ledestçûwekan e, şînî çend kesêk e ke carêkî dîke azîzanyan nabîninewe? Germî ew şîne hesretî çawerrwanîyekî bîst sal-le ye? Giryanêke bîst salle çawerrêy teqînewe dekat? Mêjû eweman pêdellê ke jîyan le însan nizîktir e ta mirdin, hemû rûdawekan ewe aşkira deken ke diway kost û nehametî însanekan dest be jîyan dekenewe wek hîç ruwî nedabê. Edî ew kostxwazî meylî şîngêrî ye le kurd da, le kwê we serçawe degrê? Ewe kurde tiwanay bergegirtinî karesatî nîyew hemîşe karesatekan legell xoy degêrrê, jîyan le xoy dûr dexatewe?

Min namewê le Enfal bidwêm, namewê le rûdaw û karesat gelêk bidwêm, tenha le biyaban û ser rojnamekan rûyandawe, biyaban lew perrî hêminî da, lew perrî tarîkî bêrehmî da dillenakamill û însanesadekanî şardewe rojnamekan û kenallekanî rageyandin dîsanewe lew perrî bêrehmî da lew perrî fewza û serşetî da dillebrîndar û kesebecêmawekaniyan pilişandewe.

Min demewê le Enfalêk bidwêm, le tirsêk bidwêm kurd le qûllayî zeynî da deybînê, tirsêk le t'erîf nehatuwe, tirsî lêkdabirranî dayk û korpe, pîr û genc, tirsêkî qûllî lêkdabirran lew perrî 'eşq û xoşewîstî da.

\* Ewende pêmekene xirap e.

\* Erê xizmîne hergîz tekbîr meken xirap e.

\* Dillim naye pîr be çawim seyrî korpekanim kem.

Sedan riste û gutey pîr tirs û nawmêdî -sedan tika û agadarkirdinewey pîr le giyanî lêk dabirran û yektir nedîtinewe.

\*\*\*

Rûhî Enfal, Enfal be manay lêkdabirran û pêçanewe, Enfal be manay let-kirdin û bizirkirdin, Enfal be manay zebr û zeng û toqandin hênde be qûllî regî le naxî yadewerî kurd da kutawe, hênde bêrehmane û dillrreqane pelamarî dawîn, hergîz ciyawazî nekirduwe le nêwan şa û geda da, le nêwan zana û nexwêndewar da, le nêwan xanedan û sepan da, ke mehalle hîç kesêk ta emrro tirsî Enfal rawî nenêt û hêndey regî jîyan lêyewe nizîk nebêt.

Hîndîyekan yan beşî here zorî kîşwerî reş, eger fermande bin yan fermanber, serokî willat bin yan zibillrrej, eger mallyan be ser nan û zeytun û beharat da wêran bêt, yan her hîçiyen nebêt bîxon, ewe birsiyayetî wek dirrinde û Enfal hergîz le kollyan nabêtewe. Detwanî û zor be asanî perasuwe der perrîwekanî her kamêkyan bijmêrî, ke regî ew perasuwane le qûllayî birsî-

yetiyekî sextî mêjû da ye. Tirsî nezokî xak û wişkbûnewe û mirdin le birsan le naxî hemû goranîyekan û ferheng û kilturyan regî da kutawe, ew tirse çon le çaw nexoşêkî req helatû û zerdelle da diyar e, her be heman şewe le çawî Endêrra Xandî cestey ew afrete serokeş da diyar bû.

Xemokîyek, hêminîmonîyek ke yekem barînî befr le dem û çawî xanimêkî Swîdî yan piyawêkî kamillî Danîmarkî yan kiçe gencêkî Finlendî be cêy dehêllê, xemokî dapoşînî willat be befr bo mawey şeş mang û ziyatirîş huz-nêkî hênde qûll le naxî her kesêkî danîştuwî ew willatane dirust dekat ke beranber hetawî sûtênerî rojhellatîş natwanin xoyanî lê rizgar ken.

Ba ew dû nimûney serewe (tirsî birsiyetî Efrîqa û xemokî kîşwerekani befr) wek kelleke bûnî huzn lay kesanî dîke wergirîn. Min nazanim morkî ew huzn û mîlankolîyey kurd naw binêm Enfal, tirs le mirdin û lêkdabirran yan her nawêkî dîke, bellam dezanim Enfal le dergayekî ewende firawanewe hate naw ferhengî kurdî ke deşê xudî Enfal '1988' yan newe be cêmawekanî le bîr biçinewe û nemênin, bellam manayî ferhengî-kilturî ew wişeye, hergîz le bîr naçêtewe û bo deyan rûdawî hawşewe be kar dehênrêt.

### Huzn le jîyanî rojaney Mehmud Paşa da

Mîr û paşa kurdekan, her çende hukimrranî willatî xoyan bûn û supa, salar û serbazyan hebuwe, her çend fermanyan dawê û yasayan derkirduwe, bellam le serdeme here zêrîniyekanyan da tirsî neman û tefr û tunakirdin û enfalkirdin le çawyan da rrengî dawetewe, her bo nimûne le mêjuwî nizîk da be tewawî le 10î Adarî 1820 da, wate 286 sall û 9 mang û rojêk pêş emrro (be rêkewtî nûsînî em witare), emrro ke to em witarey têt da dexwênitewe, Cladius James Rich rojhellatnas û kurdnasî gewre, le ser zimanî Mehmud Paşay gewre û piyawî be desellatî serdemî xoy denûsê "Bem core geyîştîne koşkeke, ke derwazeyekî nizim û tesk û datepîwî hebû, be endazeyek pîs bû, lam wabê şayistey fermandarêk nebê", em serince û çendan serincî dîke ke Mehmud Paşa le rûxsarî rîç da deyxwênitewe, boye basî jûrêke dekate û wek biyanûyek be Rich dellêt "Xwalêxoşbûy bawkim, em jûrey dirust kirduwe, bellam pêwîstî bedestpêdahênanewe heye. Kê cêgayek çak dekatewe, eger bizanêt têt da nahesêtewe? Haka Turkekan, yan Êraniyekan, çend rojêkî tir wêranî dekenewe".

Ew kate Mehmud Paşa, piyawêkî tendirust û be desellatî sî pênc sallan buwe, hîç hoyekî babetî amade nîye bo nawmêdkirdinî ew piyawe, cige le regî tirsêk, regî tirsêkî kuşinde û bêrehm, tirsêk ke tenha desellat narûxênê, tirsêk ke tenha giyanekan dirwêne nakat, na ewe sîmay tirsêkî zor nizîk e, ewe sîmay hêrişêkî berdeyam e, hêrişêk derwazey şar û derwazey mallekan û derwazey hukimrranî wek yek wêran dekat, hêrişî ew celladaney hergîz bîr lewe nakenewe ke qurbanî mafî bergirî -mafî skalakirdinî heye, mêjû tê-deperrê celladekan be heman sîmawe, bellam be nawî ciyawaz bo ême be cê dehêllê.



Tirsêkî nihênî nahêllê paşay willat dest be jûrekey da bihênê, nahêllê derwazekanî çak katewe, her ew nihênîye Mehmud Paşa le jîyan û genci-yetî-hukimrranî rasteqîn e destênêtewe û teslîm be zîndanekanî dînî dekat.

Lêrewe dîsanewe depirsim ew xeme qûlley Mehmud Paşa bo mindalle sê sallanekey, ew dilltengî û kesere tenha hoyekey ledestdanî mindallekeyetî ke be 'nexoşî lerizuta' mirduwe? Carêkî dîke dawa le Rich dekem bo ewey yarmetîm bidat û ew 'huznem' wek xoy bo bigêrrêtewe.

"Diwênê êware, diway karesateke (wate mirdinî mindallekey Mîr Mehmud), çûbuwe herem, mindallêkî birazî be wişey 'babe' bangî kirdibû, dengî ew mindalley nawekey hênabû lewe girantir bû bitwanê bergey bigirê, boye qîjandibûy, kewtibû be dem da û le hoş çûbû. Rich -tişrînî Yekemî 1820." Her şêwekarêk curetî ewe bikat wênay Mîr Mehmud bikêşê, debê tiwanay ewey hebê, xemgînîyek, huznêk be qûllî mêjû, be baristeyî sê sed sall barîn le çawanî da pîşan bidat. Hergîz ew qîjandine, qîjey bawkêk nîye bo mindallekey, ew payize payize lawaneweyek nîye bo kesêk, awazî şimşallekey Qale Mere semay çend penceyekî pîrellok nîye -ewane her hemûyan raweşandinî nihênîyek in, nihênîyek nizîk û le bose da, nihênîyek nek tenha le regî mirdin nizîktir e, bellku le regî mirdin xawen heqîr.

Kurd yekem netewe nîye tûşî tirsî Enfal û bizirkirdin bûbê, bellku yekem netewe ye ew çarenûsey be serda helall kirabê. Yekem netewe ye be dirêjayî mêjû, be mirroşewe, bizirkirdin û Enfalkirdin û dagîrkirdinî helall bêt. Rast e le pişt wişey helallewe rewayetîyekî ayînî heye, wata helall destewajeyekî dînî ye, bellam min lêre bew manaye be karîdênim ke qurbanî hîç mafêkî bergirîkirdin û narrazîbûnî nîye. Berx çeqoy le ser e, ballinde çeqoy le ser e, wata her kam le wane hellal in seryan bibirri, wata paraneweyan bergirîkirdin le serbirrinî merrêk le kulturêkî dînî baw da hergîz binemayekî aqilane yan 'adîlaney' nîye. Tirsî kurd, tasan û xemzedebûnî, tenha le helallkirdinî 'bizirbûnî da ye' nek le mirdin.

## Felsefe

### Yan hîkmetî barimte

Mîr Mehmud wate Mehmud Paşay Baban ke le serwextî geştekey Rich da mîrî îmaretî Baban buwe, barimteyî xoy awa bo Cladius Rich degêrrêtewe:

"Katê le Kirmaşan le birî bawkî Xwalêxoş bûm barimte bûm, bawkim le ber rûdawekanî rojgar naçar bû hawkarî Turkekan bikat. Bem core jîyanî minîş kewte metirsîyewe, şazadey Kirmaşan şewêkyan daway kirdim bimkujê. Minyan be dest bestrawî bo bird, şazadeş xo le heywanêk da danîştîbû, nawerrastekey pir bû le momî dagîrsaw, celladîş be pêwe sazu amade westabû, bo becêhênanî karekey, boye eme dellêm çunke zorbey ewaney le meydanî şeref da be dest bestrawî debirêne berdem cellad tirs dayan degre, be rastî dîmenêkî tirsnak bû. -Ya Xwa neybînît-". Mîr Mehmud pêş ewey bibête paşay Baban, pêş ewey gewre bêt û le siyaset bigat, pêş ewey azad bêt û jîyan binasê, barimtebûnî nasîwe. Ew mindalley le berdem şîrî cellad westawe, ew mindalle bê hêz û bê desellat û bê gunah e, tenha mindallêk

nîye ke le cesteyekî çend kîloy da ye, bellku ew mindalle rûhî barimteyî gelêk e, îradey barimteyî gelêk e, çarenûsî barimteyî gelêk e, le berdem şimşerî cellad da barimteyêke neheqî skala û neheqî qisekirdin û neheqî pirsyarî heye. Têgeyiştinî ew tenha legell cellad da ye, ew detwanê tenha yek take peywendî bidozêtewe lew hawkêşe alloze da ewîş peywendî nêwan 'milî bêhêz û barîk' û 'şimşerî tîjî' celladeke ye. Lêre da cellad û barimte dî kayey naw hawkêşeke nîn, dî edat nîn bo çareserî kêşekan, ewan herdûkyan wek yek dî lubok in bo tollekirdinewe.

Min lêrewe têdegem, giryan û huznî Mehmud Paşa bo mirdinî 'mindalle sê sallanekey' nîye, bellku giryan û hawarêkî tecîlkiraw e, le şewî barimteyeyewe, le qûllayî mêjuwewe.

Emrro Qale Mere hîç nakat, hunerî ew tenha gwastinewey hawar û nalley Mehmud Paşa ye le hêminî da, tenha ew awaze, tenha ew pencepîrellokane detwanin qîje û giryanêk bikene zemenêk bo teemul û tasan.

Ewey lew çîroke û lew parçeqamîşe û le lawaney payize payize destman dekewê, ewe ye ke ta emrro rûhî mindalle sawakey kurd, rûhî birryardan û girêy çarenûsî kurd le şiwênêk barimte ye. Deşê emrro ew t'erîfe gorra-bê, tiwanay birryardanman barimte bê, ta emrro rûhî ew mindalley kurd le sinduqe leşkan nehatuwekanî Bexda da ye, ew sinduqeş pîr hîkmet û pîr nihênî, pîr tirs e eger bişkewête dest kurd, bemanay ewe naye rûhiyetî barimteyman rizgar debê, nexêr, Bexda weku şiwên û weku desellat weku xawen heq û qiseker wek şazadekey Kirmaşan take birryarder e.

Rûhî barimteyî peragendeman emrro le Enqere ye, emrro le Taran e -her be heman araste û her be heman wata. Cestey bexoll buwî enfalkirawekan tenha le 'er'erî 'Erebistanî Si'udiye nîye, tenha le biyabanekanî Nugireselman û semawe nîye, bellku ewc ceste enfalkirawane bebê ewey rizî bin yan bûbine xoll emrro le sinduqe nihênîyekanî Turkiya û Êran dan.

Belatanewe seyr nebêt ke le hemû paytexte be desellatekanî dinya, paytexte pîr şiko û razawekan, paytexte pîr lezetekan beşêk le rûhiyetî barimteyî kurduyan laye, lew dî û şeçame razawekanyan, le qullayî jêzemîne tarîkekanyan, Mehmud Paşayekî mindall, Mehmud Paşayekî herzekar zîndanî ye eger sê sed sall pêş êsta, şazadeyekî Kirmaşan tiwanîbêtî rûhî barimteyî kurd le cestey Mîr Mehmudî mindall da bibate jêr şimşerî cellad, ewa emrro her siyasetmedarêkî Estenboll, her axundeyekî bedesellat û her bikerêkî Emrîkayî zor be asanî detwanê 'rûhî barimteyî kurd' berêtewe jêr şimşerî heman cellad ke tiwanayekî hezar hênde û şimşerêkî le mû barîktirî heye.

## Nîştimanî duwem

### Yan nîştimanî rûh

Yekem pênasay îsanekan, le seranserî dinya 'nîştiman' e, nîştiman yan willat le mana giştîyekey da, hellgirî komellêk delaletî kulturî, dînî, siyasî, neteweyî ye, to le kam willatewe hatuwî? Willateket nawî çî ye? Regeznamey çî willatekêt pê ye? Hemû ew pirsyarane demanbenewe ser 'nawî willatek' yan 'nîştiman' ke deşê le ser nexşe be çend hêllêkî sîr le tewawî dinya ci-



yakirabêtewe, wata ew 'nîştımane' nîştımankî berceste û madî ye, ew nîştımane, willateke cugrafyayekî diyarîkirawî heye. Ew willate 'cugrafyayey' le ser nexşe diyarî dekrê, ew nexşeyey peywendîyekanî dinya rêkdebat û serokî heye û dewllet berrêwey debat û hawwilatiyanî têy da dejî, netewe îlanî wicudî xoy têy da dekat, ew kayine pırr sîhr û nihênîye gewretırın û pırr huzntırın şıkestî kurdî têy da berceste buwe, winbûnî cugrafyaş gewretırın winbûn û bizırbûn û Enfal e be zımanî emro ke mêjû dıbetî. Şıkestî gewrey kurd le şıkestî cugrafya da ye, nebûnî cugrafya, yan bizırbûnî hıç peywendî bewewe nıye ke to xak û willat û çıya û şar û ladêt nebêt, hıç peywendî bewewe nıye ke to rêga û ban û rûbar û serçawey newtî kanzayıt nebêt, bellaku tenha û tenha peywendî bewewe heye ke to çend hêllêkî sûrit nebêt ke le ser nexşe willateket bo ciya bikatewew nawî binê.

Min lêre da û lew lehze da wek kurdêk le qûllayî mêjuwewe hatibêt ew şıkeste gewreyey cugrafyam pê qebull nakrê, lêrewe biryar dedem ew dorane gewreyey kurd, le naxî mêjuwî xoy da qerebûkemewe. Bêguman dezanım çı erkêkî qursım le ser şane, qerebûkirdinewey dorranî nîştımankî û willat le ser pantayî cugrafya, bellam hewll dedem her le naxî mêjuwî nizıkewe bew qerebûkirdinewe girıngê bigem. Boye her lêrewe ewe radegeyênım ke hemû insanêk dû nîştımankî, yan dû willatî heye ke girıngî hıçıyan le wî dıke kemtır nıye. Yekemyan: Ew çend hêlle sûrey ser nexşe ye ke ême wek kurd têy da dorrawın û nımane. Duwemyan: Nîştımankî fırawan û bêsinûre ewış 'nîştımankî rûh e'. Rast e nîştımankî rûh, willatêkî bêsinûr e, bellam bê t'erıf nıye, min lew rojewe dest pê dekem ke dın tewawî pantayî ew nîştımaneş dagır dekat û be taybetî ew rojey ke kurd 'İslam dekate nîştımankî xoy', nîştımankî rûhî babetêkî fıre girıng û fıre fırawane, demewêt le dahatû da serbexo wıtarêkî têr û pırr le ser nîştımankî rûhî binûsim, bellam lêre da min tenha lew layeney dedwêm ke bo em babetem pêwıst e.

Kurd lew rojewe İslam qebull dekat nebote xawenî dewlletî bawerpêkirawî xoy, le ser nexşe, ew xewney birde naw nîştımankewe ke le rûhî da hebû, îradey xoy teslîmî ew nîştımane dekat, peywendî kurd be İslamewe peywendîyekî rûhî ye, ew xelife û sulltanekan wek serwer û serkırdê û cênşınî pêxember temaşa dekat û bew araste û asteş xoşî dewên û gwêrrayellıane, çunke ewan be hemû tiwanayanewe nîştımankî rûhî kurduyan kontrroll kirdibû. Hemû netewe xawen bawerî û musillmanekan le yekem fırsê da dewlletî xoyan dirust kird û xoyan le nîştımankî gewrey rûhî ciya kirdewe, nîştımankî be hêllî surewey ser nexşeyan le hemû nîştımankî dıke be girıngtır û xoşewısttır zanî. Her le 'Fars û Turk û Efxan' û ta degate Ozbek û Elban gewretırın hewlləkanyan û qurstırın şerrekanyan le ser ewe buwe ke dewlletî xoyan hebê yan hemû musillmanan le jêr sayey ewan da bin. Tenha kurd bewe razî buwe dest le nîştımankî xoy hellgırê, bır le dewllet û serbexoyî nekatewe bellam ême dezanın nîştımankî bırıtî nıye le şax û şar û doll be xellkekeşıyewe, na, nexêr, nîştımankî tenha çend hêllêk e, çend hêllêkî sûr e ke le hemû dınyat ciya dekatewe. Kurd pışt lew çend hêllesûre dekat û nîştımankî rûhî gewre helldebıjêrê ke take t'erıfı ew nîştımankî e, tiwanewe

le naw İslam da, qebullkirdınî yasa û binemakanî dewlletî İslamî baladest e. Ew nîştımaney qerebuwî willatî ser nexşey bo kurd dekirdewe, nîştımankî rûhî bû, her lêreweş giryanî qûllî kurd destî pê kird, giryanêk bo ledestçûn û bizırbûnî nîştımanekey bo ebed.

\*\*\*

Sêyem xelıfey musillmanan 'Usmanî Kurî 'Efan' bew perrî birtıjıyewe kitêbî pırozî musillmananî be yek zarawe nûsıyewe û ew kitêbeş buwe destûr û t'erıf û pênasey ew nîştımaney bawerraranî kurd le rûhî xoyan da têy da dejiyan.

Huznî here qûllî kurd ew roje dest pê dekat ke ew nîştımaney hêrışı dekrête ser û beşêk le pıroziyekey dexene jêr pırsıyarewe. Ew destûr û kitêbe bo her musillmanêk bırıtî ye le sed û çwarde sûret, her sûrewey binaxeyî dıwarêkî ew nîştımane ruhiyefırawane ye.

Lawanewey ew jınebirındarey germıyan, ew jıney kes nazanê le çı goşeyekî dınya dejî, lawaneweyek nıye bo kurî û kıç û mêrd û malle le dest çuwekey ke hergız nayanbınêtewe. Na ewe giryanî naxî kurd e wextêk lew nîştımane rûhiye derdekrê!

Eweş le katêk da ye ke sûretêk be hefta û pênc ayetewe hêrış dekate ser binema here serekıyekanî ew nîştımane rûhiyey kurd û wêranî dekat. Bew kare kurd wek tak û wek netewe lew willateş derdekrê ke wek bawerî û wek qerebû bo nîştımankî fanî ser kaxez dirustıkirdibû.

İdî ew kitêbe pırozey xelıfey sêyem bo hemû xawen bawerrêkî nardıbû, be nuqsanî degate dest bawerraranî kurd û le ciyatî sed û çwarde sûret tenha sed û sêzde suretî degat.

Pırsıyarî here serekı ewe ye, lem nuqsanî, kemûkurıye dıni ye bawerrdarı kurd agadar e? Erê ew agadare bira dıniyekanî ewyan lew nîştımane rûhiyesh kirdote derê? Erê ew bawerrdare ewe dezanê ke nebûnî suretêk le kitêbe pırozekey ew da, ew wıteye retdekatewe ke dellê 'emro dınekem bo tewawkirdın'.

Min zor be daxewem katêk nîştımankî duwemî kurdim dozıyewe wêran kirabû, lew nîştımane rûhiyesh da kurd her berdest û perawêz û bêkes bû. Her eweşe demanbatewe ser sımey bınerrêtım em wıtar e, ewış qûllbûnewey giryan e, tasanî hemûman e le berdem şımşallekey Qale Mere da, westanî 'eqıllman e le naw seday lawanewey jınanî germıyan.

Min her zû zanım legell hawarî jınêkî temen penca salley Barzanî da, katêk temaşay kelûpelî gerrawî enfalkırawekanî dekird û deygut; "Ew doxıne hı mêrdekey min e, dıwênê bû, dıwênê bo xom, bom çınî" lew kate da lewe têgeyiştım ewaney lewê bûn her hemûyan mirdın, be rastı mirdın, tenha bo ewe henase deden ta cesteyan le rojgar da bırızê.

Boye hemû awazêkî mılankolı, hemû dengêkî pırr huzn ew laşey mirduwey naw kurd be aga dênê le dınyay dadebırrê.

tîpguhêzî: Erol Şaybak



## REWŞENBÎRÊN ÇEPGIR Û KURD: EDWARD SAID, HAMID DABASHI Û TARIQ ALÎ

Barzoo Eliassi

Yek ji taybetmendiyên berbiçav ên retorîka rewşenbîrên çepgir ew e ku hêzên Rojavayî wek jêderka gelek xerabiyên li Rojhilata Navîn dibînin. Ev xerabiyên han gelek caran wek emperyalîzm, kolonyalîzm, neolîberalîzm, dagirkerî, cixirandina mezhebgîriyê, şer, îstismara aborî û hwd. tên bilêvkirin.

Ev sekna çepgiran di peywenda Rojhilata Navîn de bêtir eşkere dibe; cihê ku nivîskar û zanyarên wek Edward Said, Tariq Ali û Hamid Dabashigelek caran bi awayekî bijarker (selective) li dijî YE û Îsraîlê aliyê Filistinîyan girtine. Lê belê kêma caran li ser giliyên siyasî yên nufûsa mezin a kurdan a li Rojhilata Navîn disekin, ku marûzî kêmgîriya (discrimination) etnîk, nîjadkuji, zimankuji û pişaftina çandî maye.

Diyarkirina vê yekê gelekî girîng e: Hêzên kolonyal ên wek Brîtanya û Fransa li gor kêfa xwe sînorên Rojhilata Navîn a hemdem xêz kirin, lewma tevî ku berpirsiyarên sereke ew in, dîsa jî serdestên kurdan ne îngilîz, fransîz, emerîkî an îsraîlî ne; lê dewleta Tirkiyeyê, dewleta Îranê, dewleta Sûriyeyê ye û heta demên nêzik dewleta Îraqê bû. Van dewletan gelê kurd ji hêla çandî, siyasî û aborî zêft kiriye.

Ligel ku pareke mezin a rewşenbîr û nivîskarên çepgir seraqet heşmetkarên hin tevgerên neteweyî ne -yên wek tevgera Filistinê- û wan wek tevgerên dij-emperyalîst/dij-nîjadperest/dij-kolonyal dibînin; hin ji wan meyl dikin ku tevgerên neteweyî yên kurd marjînalîze û bêdeng bikin û wan wek pirsgerêkên navxweyî yên hin dewletan bibînin û nikarin parçebûna nasnameya kurd bibînin ku bi awayekî dîrokî hatiye sepandin.

Ev rewşenbîrên hanê (mînak Tariq Ali û Hamid Dabashi) ji alîgiriya guherîna van dewletan an parastina mafên neteweyî yên kurdan bêtir, alîgirê wê yekê ne ku ev dewletên otorîter ên heyî (ku ew bi xwe damezirînên emperyal û kolonyal in) serdestiya xwe bidomînin.

Jê wêdetir tevgerên neteweyî yên kurd gelek caran wek wekîlê dek û dolabên emperyalîst û siyonîst ên li dijî Rojhilata Navîn tên dîtin. Ev rabêj, bi

armanca ku daxwazên kurdan ên mafên siyasî, aborî û çandî paşguh bikin ji hêla Îran, Sûriye û Tirkiyeyê ve tê bikaranîn.

Çepgir û rewşenbîrên xuyanî yên wek Noam Chomsky, Harold Pinter û Dario Fo dema ku rewşa komên cuda yên bindest ên Rojhilata Navîn rave dikin ji Ali, Said û Dabashi bêtir hevgirtî û hewîner in.

Chomsky ku herwiha Filistinîgîrekî xurt û hevlekî Saîd ê vê dawiyê ye, tim û daîm him polîtîkayên erjeng yên tirk ên li dijî kurdan û him jî bazirganiya çekan a Emerîkayê ya ligel Tirkiyeyê rexne dike.

Bi heman awayî Pinter pir zû bi tevgerên Dij-Aparteîd tîkiliyên xurt danî û dijberê sext yê dagirkirina YE' yê ya 2003yan a Îraqê bû, lê herwiha mafên zimanî yên kurdan diparêze, ku vê yekê kiriye ku li Tirkiyeyê jê neyê hez-kirin. Bi heman awayî Fo zexta tirkan bi vî awayî rave dike: "Kurdistan dijî. Ew di hişê her takekesê gelê kurd ê 35 milyonî de dişewite, ku nasnameya wan hatiye dizîn û li Tirkiye, Îraq û Ewropayê bûne penaber. Ew di agirên Newrozê de û di zindanan de, ku 12,000 girtiyên siyasî di hucreyên tecrîtê de defnîkirî ne, dişewite û dijî. Ew di bîr û birînên wan kesan de dijî ku wenda bûn û êşkence dîtin. Ew dişewite û dijî li çiyayên berxwedanên navdar, ku cîhana rojava jê re dibêje terorîzm."

Berovajî Chomsky, Pinter û Fo, Said ne ku tenê mafên kurdên niştecihên du dewletên ereb-desthilat ên neteweyî marjînalîze dikir, lê herwiha helwesteke parêzvanî jî nîşan dikir dema ku rejîma Seddam di salên 1980yî de gaz berdida ser kurdên Îraqê. Bi tenê carekê Said, xwe dispart raporeke CIA'yê, derbareyê rastiya nûçeyên bikaranîna Seddam a çekên kîmyewî ya li dijî kurdan gumana xwe dianî zimên û ji bo vê wehşetê artêşa Îranê tawanbar dikir.

Said di *London Review of Books*ê de destnîşan dikir ku "Angaştê ku Îraqê gaz berdaye ser welatîyên xwe gelek caran dubare dibe. A soxî ev yek ne zelal e."

Balkêş e, derbare bêdengkirina raya giştî ya navneteweyî ku rû-bi-rû bû bi hovîtiyên ku li Îraqê li kurdan û şiiyan dihatin kirin, ramanên Said û berjewendiyên Emerîkayê nêzî hev dibûn.

Bêhemd an bi qestî dema ku Said alîgiriya rejîma otokratîk a Sedam Husên dikir, derawaya wî ya gerdûnî dibû yeke partîkularîst, ku vê rejîmê nasnameyeke xeternak a ereb diparast.

Ji ber ku zanista postkolonyal zêde zêde di bin bandora Said de maye, wê bandor li gelek bîrmendên postkolonyal kiriye ku di riya Said re bimeşin; li dijî siyonîzmê bin û wek sembola rojeva çepgir û dij-emperyalîzmê li ser tevgerên Filistinî binivîsin.

Bi heman awayî Dabashi jî di pirtûka xwe *Iran: A people interrupted* de bahs dike ku Îran bi dirêjiya du sed salên dawî, bûye warekî wisa ku bêhna xebatên akademîk û lêkolînan jê difûre û bi hêviyên Îraneke kozmopolît tije ye; lê di heman demê de jî bêtir ku hevgirtî be angaşt dikir ku ew nijadperestiya fars rexne dike. Di pirtûka Dabashi de termên farisî û îranî jî dêvla hev tên



bikaranîn û lêpîrsîna derawaya gerdûnî ya zimanê farisî nake; ku ev derawa şîdeta sembolk e û encama pişaftina çandî ye ku bi zextan hatiye sepandin.

Derbareyê rewşa kurdan a di dîroka Îranê de, Dabashi behsa kurdan dike û behsa wê yekê dike bê kurd çawa ji dawîya salên 1970yî- sala ku Komara Îslamî ya Îranê hat avakirin – bi vir de bi awayekî nefambar (inexplicably) heşt caran ketin qada siyasî ya dîroka Îranî.

Şayesandinakurdan a Dabashi jî problematik e, ji ber ku kesî tu carî maf an cihê ku giliyên xwe yê siyasî bi lêv bikin nedaye wan. Ji dêvla wê, ew bi awayekî guhnêder behsa kurdan dike wek “şerkerên ku xweseriyê dixwazin” (rp165), an wek “tevgerên kurdan yê cudaxwaz” (166) û wek komeke “bin-netewe” (258) ku dikare qaşo Neteweya Îranî ya kozmopolît bike pêk-hateyeke eşîrî ku ev yek jî wê encamên dabeşker û têkçûyî bi xwe re bîne.

Dema ku Dabashi hewl dide çandê îranî ya kozmopolît bisêwirîne, derbirînan derbareyê kurdan û Îranê berpêş dike ku îzaha wan pir dijwar e û dikarin her xwînerê rexnegir şaşwaz bikin: “Heger kurd ji Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriyeyê biciviyana û welatekî xwerû-kurd ava bikirana şevpestê netewe-dewleteke ji hêla etnikî paqijkirî dê bi tenê modela qebileperestiya ruhbanî, ku niha li Îranê desthilat e, xerabtir bikira,” û “Wek netewe-dewletekê, piştî Îslamîzasyona serkeftî ya saziyên wê bi çaryek sedsalekê hîn jî Îran warê wê çanda siyasî ya kozmopolît e.”

Dabashi ji hêla retorîkî ve daxwazên kurdan yê bo afirandina netewe-dewletekê ceza dike; ji ber ku qaşo ew ê rê li ber “şevpestekê” an “paqijîya etnik” veke. Bi awayekî durrî aqilan, têkoşîna kurdan a serxwebûna siyasî jî ji hêla Dabashi ve bi piştgirtina hêza ruhban a Îranê tê tawanbarkirin. Yanî Dabashi bi awayekî neşkere ji kurdan dixwaze ku mixalifiya xwe biqedînin û durr bikevin ji têkoşîna li dij serdestiya farisan, serdestiya ku li Îranê komên ne-fars kêr digire.

Dabashi wek warekî çanda siyasî ya kozmopolît behsa Îranê dike û ev bawerîya çewt nîşan dide bê ew çiqasî ji rastiya civaka Îranî durr e, cihê ku emperyalîzma çandî ya faris şerma çandî hêdî hêdî zerkî komên ne-faris dike û nahêle kurd navên bi kurdî li zarokên xwe bikin an jî bi zimanê xwe perwerdehiyê bistînin. Heger ev newekheviyên han encamên qaşo çanda siyasî ya kozmopolît a Îranê bin, hingê kozmopolîtî ji amûreke veşartina serwerîya farsî pê ve ne tiştek e.

Eşkere ye ku bo Dabashi, xwedîbûna mafên neteweyî ji bo piraniya cihanê xwezayî xuya dike û di heman demê de li hember kurdên bêdewlet retorîka dekonstruktîv divirvirîne.

Dema ku neteweperestiyên komên bindest (subaltern) bi rêkûpêkî tîn problematîzekirin û dekonstruktekin û dema ku ev komên bindest jî dixwazin ala xwe bilind bikin û wî tiştê ku bi tenê di destê neteweya serdest de ye bi dest bixin, ev dustandariya kambax berbiçavtir dibe.

Tevî ku neteweperestiya komên bindest wek afirandina cudaxwaziyê tê dîtin, neteweperestiya komên serdest wek parastina bihevrebûna civakî, bi-

ratî û yekîtiya li nav cudahiyan tê dîtin; helbûkî di rastiye de ji hêla newekheviyên polîtîk, çandî û aborî cudahiyan mezin diafirîne.

Van rojan, Tariq Alî vîdyoyek weşand ku tê de piştgiriya tirkan dike, ên ku bi wêrekî li hemberî hikumata Erdoğan a otorîteryan şer dikin û qaşo çirûska hêviyekê li parzemîna Ewropayê vexistine.

Ew bi helwesteke biçûkbîn van protestoyan û tiştên ku diqewimin li Spanya, Portegal û Yewnanîstanê dide ber hev, cihê ku ewropiyên naskirî dibin xala normatîf a danberhevê. Lê belê divê em bi cidîyet dîsa li ser derawaya Alî bifikirin.

Li dijî rejîma otorîteryan a ku Ali bahs dike, vî dehsalê dawî li Tirkiyeyê bi riya tevgerên civaka sivil bi sedan ciwanên kurd di ber xwe dane. Di maweya van xwepêşandanên de ew di bin hovîtiya şîdeta polêsan de mane û ketine hefsan. Çima Alî tu carî wek kesên wêrek behsa wan nekiriye?

Dema ku kurd protestoyan dikin, ew wek kesên ekstremîst, terorîst û cudaxwaz tîn dîtin, ji ber ku qaşo protestoyên wan bi tenê berjewendiyên kurdan derdibirin. Û dema ku bi temamî protesto nakin an jî qismen beşdarî protestoyan dibin, ew wek kesên ku ji rejîma li ser kar razî tîn dîtin.

Derawaya rewşenbîrî ya Ali, Dabashi û Said nîşan dide ku ew ne bêalî ne an jî ne ne-nasnameperest (non-identitarian) in lê rewşa wan rîyeke taybet derdibirîne da ku em bibînin ku cihan ji hêla etnikî, çandî, îdeolojîkî û siyasî tê sêwirandin. Derawaya wan nikare gerdûnîtiya gerdûnî bixwaze, lê belê gerdûnîtiyeke xweserî hinekan e ku xizmeta hin berjewendiyên dike.

Hişmendiya rexnegîr a navdar a Said bi tenê bi bilêvnekirina zilma li hember kurdan namîne, herwiha rastiyan jî berovajî dike û dibe alîgirê hêzeke stemkar. Bi awayekî paradoksî Said rola rewşenbîr wek “gotina rastiye ji desthilatê re” pênase kiriye. Ev berovajîkirina Said bi hinceta ku ‘haya wî ji rewşa siyasî ya kurdên Rojhilata Navîn baş tuneye’ nikare bê şuştin. Bê-haybûn ne bêgunehîye; lê heger bi wan bastûrên desthilatê yê ku li cihanê newekheviyan didomînin razî be, pesendkirin e.

Belkî ji bo ku Ali û Dabashi kurdan wek nûnerên rastî û nîrxên gerdûnî bibînin û bibin heyranên wan û wan pîroz bikin, divê kurd biqîrînin û bibêjin “bimire YE û Îsrail” û/an “bimire kapitalîzm/neoliberalîzm”; belkî paşê li klûba rabêja çepgir a wêrekî û berxwedana heqîqî bikêfxweşî bînin pêşwazî-kirin.

ji îngilîzî: Umran Aran



## KANIYA FENTEZIYAN

Mihemed Şarman

### Destpêk/Hişyarî

Ev nivîs ji serî heya binî nivîseke şexsî ye. Ne xîmê wê li ser rê û rêbazên rexneyê ava bûye, ne piştî xwe dide teoriyên navdar û dagirtî wek vegotin-sazî, diyalojî, klasîzm, modernîzm, postmodernîzm û hwd (gelo hewceye van e!), ne jî li pey qanîhkirina xwîneran dikeve. Tenê ji bo xatirê amûrê xwe ku ew jî berhema Lokman Polat ya bi navê *Kaniya Stockholmê*, ji bo xwendin û nirxandineke mîzahî da ku pêşiyê kêfê bide xwediyê xwe piştî çend heb xwînerên xwe (ev jî hewqas ne girînge) hatiye nivîsîn.

Berpirsiyarê vê nivîsê yek kese: Ew jî nivîskarê vê nivîsê ye, çer û dijûn pesin û kêfxweşiyê xwe hemî ji min re bikin ezê ŞADÛMAN bim. Mixabin heya ji min hat min destê xwe ji sûdwegirtineke civakî, keyfgirtineke kolektîf çî zanim mildayineke têkoşîna netewî şuşt. Ne bi kêrî civakê tê (ax u eman civakê!) ne bi kêrî çekirina menemenê tê, kurt û kurmançî ji bo wan kesên zor toplumsal gerçekçiyar ne hêjayî du hêkane.

*"Li bajarê ewrûpa rastî Lokman Polat hatim bê pênûs digeriya.*

*Dil dixwaze nobel bistîne dayê ka Lokmanê min bîne"*

(ji ferhanga kurdî ya înteraktîv *tirşiknet* ê, xala Lokman Polat. 07.01.2014)

### Parodî an Rexne

Heya nuha min tu berhemên Lokman Polatî nexwendibû. Tenê min çend nivîsên wî di hin malperên kurdî de xitim û carî kiribû ewqas. Ku em li ser rêbaz û rexneya camêr wek şeweya wî bibêjin:

Di rojê sar û seqem de li Amedê ez û hevaleke xwe me berê xwe da cihê pirtûkfiroşekî kurdî. Gava em nêzî dikana pirtûkfiroş bûn lembaya hatûçûyê ya sor pêket, em tam 50 saniyan li bendê man. Me herdûyan jî jixwe re got em kurd çiqas bêsiûd in, vê sir û seqemê ka çima ya kesk vênakeve ya sor vêdikeve. Piştî mîna ku Xwedê dengê me seh bike, were hewara me, di cih de çî ecêb lampeya zer pêket paşê ya kesk, em bi kêfxweşî derbasî hemberî rê bûn. Me ev hersê reng wek îşareteke manîdar şîrovand, me deriyê pirtûkfiroş vekir.

Pirtûkfiroş jinek bû, nizam çima Gulfiroşa seydayê nemir Cegerxwîn kete bîra min, Min bi beriya du salan li ser vê helbestê, gotareke pir hêja nivîsibû, min di gotara xwede wiha gotibû :... (Ji ber ku ev gotara pir dirêj e me ji bêgavî ev nivîsa navborî qut kir. *Zarema*) bi bişîrinên germ em pêşwazî kir. Min çavê xwe li ser pirtûkan gerand, pirtûkeke berg zer bi ber çavê min ket, min dest avêtê, çend rûpel qulipand, çend tişt xwend bala min kişand min pirtûkek kirî. Piştî min pirtûk kire binçenga xwe ya çepê em ji dikanê derketin. Gava em hinekî meşiyar min pirtûk ji binçenga xwe ya çepê derxist xist ya rastê,

Qasek şûnde min pirtûk ji ya raste derxist kire ya çepê.

Qasek şûnde min pirtûk ji ya çepê derxist kire ya rastê.

....

(Ev heman hevok du rûpelan didome ji ber ku cihê me tunebû me di vir de birî. *Zarema*)

Ez çûm malê, li ser maseya xwe ya çargoşe rûniştim, min ev mase ji marangozekî kurd kiribû, ew jî wekî her kurdî gelek belangazî, zilm û zordarî dîtibû. Min gotibû divê tu maseyek wisa ji min re çêkî ku ez gelek berhamên hêja li ser wê binivîsim... (Mesala masê bi me, ne têkildarê nivîsê yê em ji bêgavî di vir de dibirin. *Zarema*)

### *Kaniya Stockholmê. Kurteya pirtûkê*

Ev berhem ji 14 beşan pêk te, her beş li ser jinekê ye, her jin li ser du piyane, her pê li ser ser û çavan e... Bi şeweya vegotinê (rojnivîsk çêtir lê dihat) hatiye nivîsin. Navê vebêjêr Dilperîn e. Dilperîn yanî dilperitî, dilnazik. Lê di hin cihan de nivîskarê pirtûkê ji bîrdike ku ev rojnivîsk an vegotina Dilperîn e, rasterast li ser navê xwe diaxive, ji nivîsên xwe yên (Lokman Polat) berê jêgirtinan dike. Ev yek jî dide nîşan ku meriv dikare Dilperîn bi hêsanî wek Lokman Polat bigire ku hûn bawer nakin pirtûkê bixwînin ez nikarim dîpnot û mîpnotan ji we re derxînim.

Dilperîn nivîskareke, li sirguniyê dijî, di pirtûkê de gelek caran êş û azara sirguniyê tîne zimên. 12 caran dibêje sirgunî zor e, 6 caran dibêje zehmete, 2 caran dibêje meriv bêriya dê û bavê xwe dike, 4 caran dibêje sirgunî dijwar e, dîsa 5 caran jî dibêje sirgunî xizanî ye. Meriv ku li ser van reqeman hûr bibe, meriv dê bibîne ku ev reqem ne badilhewa hatine rêzkirin an ji bo xatirê tesadufekê jî nînin. Wek mînak hûn van reqeman kom bikin hûnê reqema 29ê peyda bikin. Ev jî eşkere serhildanên kurdan simbolîze dike, ji ber taybetmendiya van sembolan meriv dikare xwendineke cuda bike lê ew ne karê min e.

Nivîskar di van rojên tengazarêmarînî de her tim diçe kafeyekê rûdinê. Konê xwe yê reş li wir vedike. Li derê kafeyê kaniyeke gelek jan dostî heye. Kengî çav bi kaniyê dikeve kaniya gundê wî dikeve bîra wî, hincaran ji ber vê rewşa jan ziryanî gelek hêjarê şamilî dibe. Ku hûn berhama Edward Said "Kış Ruhu" bixwînin hûnê heman tiştî di wir de jî bibînin retorîk, nirxan-



dina sirguniyê ne kêmi vê berhama navborî û navdare. Lê mixabin qîmeta van yekan nehatiye fêhmkirin, belkî piştî vê nivîsê ev pirtûk were naskirin û şadûmankirin.

Ev kanî di heman demê de kaniyeke balkêş e. Ji ber ku maseyek taybet li ber vê kaniyê heye. Kî li ber vê kaniyê li ser vê maseyê rûnê teqez yek tê dibe hevalê wî. Hevalekî wî jê re dibêje ev mase cihê tekiliyên yekşevî ye. Gava ku nivîskarê gewre vê yekê seh dike êdî ji ser masê ranabe, dibe abone, ebeden masê dagir dike. Heqet her roj jî jinên xweşik û delal tên ser vê maseyê rûdinên. Ew bi nivîskar re sohbetê dikin. Mijara sohbetên wan tev li ser kar û barê entelektueliyê ne. Ji felsefe, sosyolojî, edebiyat û marksîzmê bigirin heya antropolojiyê gelek tişt tên niqaşkirin (!) Çi ecêb e kîjan jin li hember Dilperînê jan bi jan rûdinê dil berdide camêr, êvarê jî li otelekê, an li mala jînikê ew û nivîskar bi hev şadûman dibin. Îcar hin ji van jinan porê xwe kur dikin, dev ji nivîskar bernadin, dixwazin têkiliyên xwe yên yekşevî bi boçika zewaceke daîmî ve girê bidin. Lê mixabin daxwaza van jinên belengaz nayê cih lewre nivîskar di cih de wan rênas jiyân dike dibêje ez zewicîme xwediyê jin, zarok, 700 mihên çiyayî me ji xwe re mehdî zana û efendî bin. Ku bi we divê şadûmaniyê berdewam be, bi we navê bela xwe ji min vekin. Ev jin jî ne tekrenge ne unîter in, têra xwe federal û xweseriya demoqrat in. Cur bi curin zer, esmer, kej, îtalyan, frensî, heta mongolî jî hene. Mase têra xwe enternasyonal e, jixwe nivîskar jî xwe weke yekî marksîst û enternasyonal dide nasîn. Ev yek jî hevgerêdana naverok û şewaza berhemê dipeyitîne.

Ezê di vê giregotara xwe de hewl bidim ku her beşê vê pirtûkê yek bi yek bihetikînim. Lewre jixwe nîyet û armanca min hetikandine. Ger hûn di vê nîyeta min de tiştêkî xirab bibînin ji kerema xwe re vê pirtûka sosret bixwînin. Piştî berê xwe bidin min.

### Berhemeke Bêhempa

#### Beş.1.

Beşeke kin, nivîskar di vê beşê de kaniya bextewariyê dibîne, lê hê hay jê nîne ku ev kaniya dê wî şadûman bike.

#### Beş.2.

Nivîskar (Dilperîn) dibêje ez êdî her roj dihatim li ser vê kaniyê rûdiniştim. Hê pê nehisiyaye ku çi taybetiya vê kaniyê û maseya li ber kaniyê heye. Yanî hewldanê wî hê saf û ji ajoyeke pastoral derdiçe. Îcar meriv pirseke eletewş bike çima kanî?

Helbet ku hûn jî dizanin kanî di kelepora kurdî de cihê flortêye (wek seyrangeh, roja newrozê, dawet jî ji van dem û mekanan in). Lewre keçik gava diçin ser kaniyê teqez rastê xortan tên. Ji ber ku kanî cihê kombûna keçikan munasib û guncane kes nikare bêje çima hatiye ser kaniyê û bi awayekî îlegal kanî dibe navenda flortê. Ne florteke ku meriv pê bextewar be, destê hev bigire an tiştêkî din. Tenê awir hene, ev awir in ku bi barê keran hestiyarî, ajo,

şehwet, barkirî ne bi awayekî kosmosî her tiştên xwe yê dil û rih ji muxateba xwe re dişînin (Lazim e meriv li ser van awirên miştenerjî jî tiştêkî binivîse).

Dilperîn li welatekî modern ji daxwaziyên xwe yê flortê re dîsa kaniyê dike navend. Gelo ev yek jî ber sîdwergirtina folklorê kurdî ye an bêhaybûna nivîskar e ku hê nizane li kû derê dijî di ser de li metroyan çîrokê kadîne dibêje.

Di vê beşê de li ser piştî çend peyvên wek sirgunî, zor, zehmet û kurd ji hev heznakin nivîskar tespitân dike. Piştî Dilperîn rastî kevnehevalekî xwe tê ew di nava sohbeta xwe de dibêje ev cihê têkiliyên yekşevî ye. Ev agahdarî tevnsaziya pirtûkê hemû diyar dike, kapê vegotinê dixê dest xwe. Û nivîskar dibe aboneyê maseyê û jiber ku ji hevalê xwe xilas bibe wiha dibêje: "Lêbelê di esasê xwe de min xwest ku ez wî li wir tenê bihêlim, ji xwe re jineke yekşevî peyda bikira" (rp.20).

Helbet meriv nikare, jixwe ne hewce ye jî îtirazê li vê yekê bike. Heqet ev nîyet û armanca zelal e. Dilperîn bi min hevoka wî ya herî baş, durist, guncan e. Lê îcar gava tevahiya berhemê binihêre, meriv nikare bi hevokrebenê gunehê vê pirtûka sosret sivik bike.

#### Beş.3

Ne hewce ye, heman rûniştin didome.

#### Beş.4.

Rûniştin berdewame lê êdî sermiyanê masê hêdî hêdî eşkere dibe. Dilperîn (vebêjer) jinekê dibîne li hember maseya wî rûniştiye, tabî ev jînik ji xwe re pirtûkekê dixwîne, tabî rind e, spehî ye bi gotina Dilperîn têra xwe seksî ye. Jixwe em ji hin tabloyên resaman jî pê dizanin ku jinek hem delal hem jî xwende be îcar ku pirtûk jî di destê wê de be têra xwe lîbîdoya meriv har dike, meriv ber bi xwe dikişîne. Xebatkara kafeyê daxwaza naskirina Dilperîn ji vê hurmetê re dibe. Hurmetê ser maseya wî. Piştî çend kelaman jînik ji Dilperîn pirsar welatê wî dike. Dilperîn dibêje ez ji Kurdistanê me. Jînik di cih de dibêje: "Neteweyên rojhilata navîn girtî ne di nav qalikên xwe de dijîn. Wekî me ne modern in (rp.29). Minak ev pirtûka dest min behsa seks û erotîzmê dike li ba we bûya we yê qedexeyê bikirana". Çi tesadufeke xweş; jineke delal, xwende, pirtûk di destê îcar pirtûk jî li ser seksê! Çiqas bêhna Piştî jînik dibêje ez meraq dikim gelo di berhemên kurdî de jî erotîzm û seks heye. Çi pirseke manîdar? Dilperîn dibêje di pirtûkê nivîskarê tirk wek Ahmet Altan de têra xwe erotîzm heye, ez romanên wî gelekî diçibînim. Piştî didomîne jînik bi îsrar agahdariyan dixwaze li ser edebiyata kurdî (çi jinek eleqedare, mala wê ava!) Dilperîn dibêje edebiyata kurdî ya devkî dewlemende (klişe-1), lê ya nivîskî qels e. Behsa qedexeya zimanê kurdî dike. Bi hûrgilî gelek agahdariyan didê heya behsa Erebe Şemo dike, ya ecêb dibêje pirtûka wî di nav weşanên "özgürlük yolu" li Enqereyê derketiye. Ji behsa



porşehkirin û cil û kincên Erebê Şemo bigire heya kirêya xaniyê wî û heqdestê şivantiya wî dike (tabî ev herdû hevok nepixandina min in). Tu dibêjî qey jinik ji perê dinê rabûye tenê ji bo meraqa Erebê Şemo hatiye tezeke doxtorayê nizanîm çima li ser Erebê Şemo dike. Meriv çima hurgiliyeke wiha dide? Ecêb e îcar ev jina biyanî bi sedan tiştên wiha hûr ku meriv tu carî nikare bixe qutê mijarekê, di navbera xwe û biyaniyekî de daber dike. Xilas nebû behsa Swêdê dike dibêje gelek nivîskarên kurd nebaşiyên dikin karê me li vir xirab kirine nahêlin em ji xwe re pirtûkan çap bikin (kurd xayîn in hevalê!). Ji ber vê yekê derfet nîne, nizanîm çî. Yanî meriv ji van axaftinan jî têdigihêje Dilperîn an Lokman Polat dixwaze ji mere tiştêkî bibêje îcar bi vî şeklî bi vê tevnê heqeten ev yek meriv gelekî dikenîne. Belkî jî bi girî dike.

Jinik ji bo edebiyata kurdî hêviyên dewlemendî û serkeftinê dixwaze, dibêje ezê ji bo vê rewşê teqez dengê xwe bidim BDP'yê (tabî ew çax ne BDP bû) qe nebû bibim serokê komiteya nivîskaran. Piştî nivîskar behsa romanên xwe dike navê *Robîn*, *Kodnav Viyanê* dide, ev jî romanên Lokman Polat ên çapbûyî ne. (Îcar Dilperîn bi ku ve çû çî bû jê ez jî nizanîm.) Nivîskar ku panoramaya edebiyata kurdî dide berçav, xêrxwazeke delal li kurdan zêdedike bi hev re diçin dixwin, vedixwin, dans dikin û serxweş dibin. Behsa Kleopatraya Sezar dikin jinik dibêje tu bibe Sezar ez bibim Kloptra îşev. Ev yek tê qebûl kirin. Ew şev Sezar û Kleopatra bi hev şadibin. Dilperîn ji bo vê peyvê dîsa dibêje şadûmanî. Piştî dibêje "em bi awayekî modern bi hev şabûn." Şabûna awayê modern çiyê, bi kîjan pozîsyonan pêk tê, ne diyare mixabin, ya postmodern filan bêvan? Ev jî ne diyar e. Di sohbeta xwe ya piştî şadûmaniyê rexne li nivîskarên kurd dike dibêje nizanîm û nikarin erotîzmê binivîsin lê ev şadûmanî bi yek hevokê tê daber kirin. Em jî wek xwendevan bi awayekî modern şadûman dibin. Çi erotîzmeke ecêb. Piştî dibêje min ê hurgiliyê vê pevşabûnê binivîsiya lê nivîskarên kurd dê bibêjin pornografi ye. Başê jiber vê endîşeya nivîskar em ji vê bobelatê xilas dibin.

### Beş 5.

Nivîskar li ser kaniyê rûniştîye li avê dinihêre bi awayekî felsefîk bi avê re dikeve guftûgoyan. Ji avê dipirse "Ey av tu çiyî, çima ka bo min bêje?" Av bersiva wî dide: "Ez avim (Ey av û av), bingeha jiyane me, jiyane ji min pêk hatiye, toximên jiyane bi xêra min şil dibin, şîn dibin... (rp.45) Bi gotinên vî karî felsefe û ontolojiya avê piştî Feqî cardin eşkere dike. Piştî li ser nefesê radiweste bi nefesê re diaxive. Nefes dibêje "ez nebim merivên bimrin lazim e oksîjên hildin (rp.46). Çi ecêb ev gotinên ku cara yekem Dilperîn daber dikin dê çî tesîrê li ser zanyariyê bikin hûn hesab bikin. Piştî avê nefes, piştî nefesê agir piştî texte- na biborin ax diaxive. Ax tiştêkî pir balkêş ji Dilperîn re dibêje: "Di xwezayê de hertişt ji axê çêdibe. Ax nebe xweza nabe, dar û devî, gul û çiçek nabin (rp.46). Meriv gelo dikare li ser vê retorîka têr û tijî, orjînal îddîa bike ku yê ku cara yekem ontolojiya van zîndewaran tehlîl û tas-

nifkiriye Lokman Polat e. Mixabin nivîskar di heman demê de bi van gotinên xwe neheqiyê li retorîka xwe dike; ji xwe re wiha dibêje: "Divê meriv gerek hewqas kûr nefikire, tiştên felsefî pir fikrandin baş nîne serê meriv tevlihev dike, heger meriv ku meriv bikeve nav labirenta ruhî bi tiştên psîkolojîk re mijûl be, dawiya meriv nebaşê." (rp.47)

Nuha meriv dikare van hevokan bê şîrove bide, lewre hin caran hin tişt têra xwe sosret in, sînore xeyalê meriv diteqînin. Kurt û kurmancî dibêje kurê min pir nexwîne tuyê qafê xwe bixwî. Lê em nivîskar temî bikin tiştên ku wî daber kirine meriv ne bi vê felsefê ne jî bi vê edebiyatê nikare cûmê benîşt an lolîpopekê bistîne.

### Bêhempayeke Berhemî

#### Beş 10. Bê şîrove

Rojekê li derekê rastî jinekê tê jinik li ser bankekê rûniştîye pir xemgîne, hin caran di ber xwe de digirî.

Dilperîn: Min ji te pirs kir ku çima xemgîn î te bersiva min neda.

Jinik: Ha, tamam, rast e te ji min pirs kiribû. Ez ji mêrê xwe veqetiyame. Lewma xemgîn im.

- Her roj bi sedan jin û mêr ji hevdû vediqetin, hev berdidin. Tu jî ji wan yek bî. Pêwist nake ku tu ewqas xemgîn bibî.
- Du zarokên min hene. Ez naxwazim zarok bêbav mezin bibin.
- Tewe, tew! Binêr çî difikire! Piraniya zarokên vî welatî bêbav mezin dibin. Jixwe pirên wan bavê xwe qet nas nakin... Jixwe dadgehê zarokan bide te.
- Belê, dadgehê zarok dan min.
- Xanî jî date...
- Belê xanî jî da min.
- Dê mêrik her meh ji bo herdû zarokan jî pere bide te, nefeqe jî bide...
- Ê wisa ne tu çî dixwazî...
- E wisan e, lê dîsa jî gelek zehmetiyên din hene.
- Mesela çî? Zehmetiyên çawa?
- Mirov bi tenê ye. Dilê mirov mêr bixwaze, seks bixwaze, mirov nikare pêk bîne. Ev şeş meh in ku em ji hevdû veqetiyane û yanî tu fêm dikî...
- Belê ez fêm dikim. Te bi kesekî re seks nekiriye. Daxwaza vî tiştî jî tişteke normal e, tebiî ye. Lê wa ye tu hatî tam cihê ku dê miradê te bê cih.
- Yanî çawa, ev der normal parkek e.
- Na ev ne parkeke normal e. Ev park parka mêren yekşev e.

Piştî xwarin, vexwarin û şadûmanî. (rp.143-146)



### Encam

Pirtûk bi heman felsefê û şadûmanî û komkutanê didome. Jinek tê yek diçe, hemî jî delal hêja bengiyê nivîskar in. Hele jinek piştî diwanzdeh salan dertê tê dibê te carekê li otelekê ez şadûman kiribûm ji wê rojê ve ev deh sal in li pey te digirim. Nivîskar gûnehê xwe bi jinê tîne lê dibêje baş nayê bira min(gelek in ka çawa were bîra meriv), bibore ez nikarim bi te re bizewicim. Helbet sinorê fantaziyan tune.

Lokman Polat bi salan e di nava edebiyata kurdî de ye, ez bawerim ji wan kesên ku herî zêde pirtûk nivîsiye yek jî ew e (texmînî 40 pirtûk). Li ser malperên kurdî, nivîsan bi ser navê rexneyê lê dike. Di serde jî rexneyê naecibîne û li rexneyê jî rexneyan dike(bnr, kulturname "Rexnevan", "Rexnekuj"). Di edebiyata kurdî de xwe wek rexnevanekî qerase dide payekirin, navê xwe û çend navên ku min seh nekiriye rêz dike. Ya malkambax ew e navê yekî weke Remezan Alan jî encax bi dawiya hevoka xwe ve dike, vî camêrî jî bêpar nahelê(dinya tu çima xira nabî!).

Helbet meriv nikare ji kesî re bibêje tu çima dinivîsî an nenivîse. Lê ez nizanim heya nuha kesî ji vî camêrî re negotiye ku tiştên ku tu dinivîsînî tiştên sosretin. Ma qey meydana edebiyata kurdî hewqas badilhewaye. Meriv bike neke, meriv nikare bi awayekî zanistî binirxîne. An kê ev payeya rexnegiriyê dayê ku heya nuha nivîsên wî tîne weşandin.

Ji pirtûka *Kaniya Stockholmê* re em dikarin çend navên alternatîv pêşniyaz bikin:

1. Kaniya cinebetiyê
2. Gazinên libîdoyî
3. Diasporaya fantastîk.

### KURTEJIYANÊN NIVÎSKARÊN VÊ HEJMARÊ.

**'Ebdulxaliq Y'eqûbî:** Sala 1974an li Rojhilatê Kurdistanê, li bajarê Bokanê ji dayik bûye. Ji sala 1994an ve di warê edebiyatê de bi nivîsîn û wergera edebî re mijûl e. Mastera xwe ya li ser civaknasîyê di sala 2007an de li Zankoya Kurdistanê qedandiye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Başûrê Kurdistanê ye. Berhemên wî yên hatine çapkirin: *Dengî Bilûrînî Deq* (Gotarên rexneyî), *Le Kultûrewê bo Edebiyat* (Gotarên edebî), *Macbeth* (wergêran ji îngilîzî bo kurdî), *Marksîzm û Rexney Edebî*, Terry Eagleton (wergêran ji îngilîzî bo kurdî), *Rexney Edebî û Qutabxanekani*, Charles Bressler (wergêran ji îngilîzî bo kurdî), *Tojînewey Tîorîy Edebî*, Roger Webster (wergêran ji îngilîzî bo kurdî), *Diyalog û Dahênan* (hevpeyvînên edebî)

**Abdullah Çelik:** 1977 de qezayê Amedî Pasur de ameya dina. Seba ke wendişê xo dewam bikero 1984 de keyeyê înan bar kerdo û şiyê Dêrsimî. Mekteba mîyanin û lîse Dêrsim de wendo, dima 1996 de Amed de tahsîlê unîversîte kerdo û ewcade beşa bîyolojî qedêno. 2000 ra bi na het nêweşxane de xebetyeno. Serra 2013 de Ziwan û Kulturê Kurdan yê Unîversiteya Artuklu de dest bi lîsansê berzî kerd. Sera 2009 de kitabê şîir "Büyük Geçit" û Serra 2010 de kitabê çaxî "Bıçak Sirtında" vejîyo. 2010 î ra pey heni dest bi nuştîşê kirmanckî kerd. Nuştîyê ,eye hem tirkî hem zî kirmanckî Şewçîla, Mühür, Esmer Kürtür, Kitap Zamani, Birikim, Kalem, Varlık, Taraf Kitap'e de weşanîyayî.

**Amir Hassanpour:** Ji Rojhilatê Kurdistanê, Mahabadê ye. Ji sala 1986an vir de li Kanadayê dijî û li Zanîngehên Windsor, Concordia û Torontoyê dersan dide. Mijarên ku li ser dersan dide medya, îxtîlaf, demokrasî, nêrînên rexneyî yên li hember netewperweriyê, pevçûnên etnîk, qirkirin û tevgerên civakî ne.

**Ayhan Öztunç:** Di Adara 1985an de li Navenda Colemêrgê ji dayik bûye. Piştî lîseyê, li Zanîngeha Stenbolê beşa Ziman û Edebiyata Tirkî xwend. Li heman zanîngehê mastir kir û li Weşanxaneyê İletişimê dest bi edîtoriyê kir. Niha li Stenbolê mamostetîya ziman û wêjeya tirkî dike.



**Barzoo Eliassi:** Ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Barzoo Eliassi li Zanîngeha Oxfordê wek akademîsyenê lêkolîner kar dike û li Zanîngeha Linnaeusê jî dersan dide. Xebata wî ya dawî ku hatiye weşandin li ser diasporaya kurd a li Swêdê ye: *Contesting Kurdish Identities in Sweden: Quest for Belonging among Middle Eastern Youth* (2013, Palgrave Macmillan).

**Burhan Yek:** Di sala 1983yan de li Qosera Mêrdînê ji dayik bû. Ji dibistana seretayî heta lîseyê li Qoserê xwend. Li Amedê fakulteya tibê qedand. Niha li Cizîrê doxtoriyê dike û li Mêrdînê Zanîngeha Artukluyê li ser wêjeya kurdî masterê dike.

**Cebar Cemal Xerîb:** Sala 1961ê li bajarê Qeladizê ji dayik bûye. Ji bo xwendina lîsansê çûye Bexdayê. Bi kurteçîrokan dest bi nivîskariyê kiriye. Di salên nodî de di gelek kovaran de novelên wî yên wek 'Jinanî Aw' û 'Namûsî Tozûba' hatine çapkirin. Herwiha bi navê 'Dinya le Kitêbek da', 'Çinarî Şîr', 'Pêncemîn Kitêb', 'Destêk le Beheşt', 'Le Ser Baran Denûsim', 'Peykerêk le Tozî Tebaşîr', 'Romane Kurtekan', 'Netewey Zêrabekan', 'Şêxî Damûs', 'Ew Ballinde Firriwaney ke Zibill in' birrek romanên wî hene. Li ber xebatên edebî, gelek lêkolîn û cerebeyên wî jî hene ku wek berhevokekê ji aliyê Dezgey Serdem ve hatine çapkirin. Cerebeyên wî yên bi navê 'Efsaney Niştexêbûn', 'Sindûqî Reşî Wêne yan Sindûqî Reşî Nihênîyekan', 'Kurd û Koç û Menfa' (Hunerekan û Corekanî Koç), 'Rollî Ayînekan le Formûlebûnî Keltûrî Kurdî da' (Îslam, Mesîhî, Yehûdî), 'Çîrokekanî Naw Tewrat' di rojname û kovaran de hatine çapkirin.

**Ferzan Şêr:** Bi navê xwe yê fermî Taylan Şahan Tarhan, di sala 1986an de li gundê Hezyatê yê Bişêriyê çêbû. Di sala 2010an de Zanîngeha Hacettepeyê beşa "Kewandina Fizîkî û Rehabîlasyon"ê qedand. Li Zanîngeha Istanbul Bilgiyê di beşa Wêjeya Berawirdî de lîsansa bilind bi teza xwe ya bi navê "Helîm Yûsiv'in Edebi Dûnyasında Beden ve iktidar (Di Cîhana Edebî Ya Helîm Yûsiv de Beden û Desthilatî)" kuta kir. Di kovara "Ajda"yê ya ku ji aliyê hin xwendekarên Enqereyê ve dihat weşandin de edîtorî kir. Di sala 2008an de çîroka wî ya bi navê "Min bi Perrên Kevokan Bifirrinin", di pêş-baziya çîrokan a ku ji aliyê kovarên "Tîroj" û "Evrensel Kültür"ê ve hatibû organîzekirin de xelata yekemîniyê wergirt. Di 2009an de berhema wî ya ewil *Otopsiya Berbejneke* hat çapkirin. Çîrok, gotar û helbestên wî di kovarên mîna *W*, *Çirûsk*, *Ajda* û *Tîroj* ê de weşyan. Niha bi karê rexnegiriya wêjeya kurdî ve eleqedar e.

**Fexriya Adsay:** Li Dêrika Mêrdînê hatiye dinyayê. Lîsansa xwe li Enqerê li Zanîngeha Rojhilata Navîn ya Teknîkî di beşa dîrokê de qedandiye. Li Zanîngeha Dicleyê ya Diyarbekirê di beşa sosyolojiyê û li Zanîngeha Mêrdînê ya Artukluyê di beşa Ziman û Wêjeya Kurdî de master kiriye. Ji îngilîzî bo tirkî û kurdî wergeran dike. Vêga li Diyarbekirê wek mamosteya îngilîzî kar dike.

**Hesenê Dewrêş:** Di sala 1978an de li Stewra navçeya Mêrdînê li gundê Elfan ji dayik bû. Li zanîngeha Afyon Kocatepe beşa matematîkê xwend, piştî wê dest bi mamostetiya matematîkê kir. Niha li zanîngeha Bilgîyê ya li Stenbolê di beşa Edebîyata Berawirdî mastirê dike. Qederê şeş salan e ku li ser wêjeya kurdî nivîsên rexneyî dinivîse. Di *Taraf Kitap*, *Radikal Kitap*, *netkurd.com*, *kulturname.com* û kovarên mîna *Zend*, *Dîwar*, *W*, *Wenda* de nivîsî.

**Jeff Kaufman:** Jeff Kaufman li Boston Massachusettsê dijî û li ser guherînên zimanî û awayên guherandinên qestî bo feydeya civatê, dixebite.

**Joanna Bocheńska:** Di sala 1978an de li Krakovê, bajarekî Polonyayê yê kevin, ji dayik bûye. Di nav salên 1997-2002 de li Zanîngeha Yagiellonskî (Kraków) ziman û wêjeya rûsî xwend. Dema li Moskovayê dixwend kurd naskirin û dest bi fêrbûna zimane tirkî û kurdî kir. Ji sala 2004an ve dest bi nivîsandina teza doktora xwe li ser wêjeya kurdî kir (li Enstituya Rojhilatnasiye ya Zanîngeha Yagiellonski). Pirtûka wê ya bi navê *Miedzy ciemności i światłem. O kurdyjskiej tożsamości i literaturze* (Di navbena tarîfî û ronahiyê de. Li ser nasname û wêjeya kurdî) sala 2011an li Krakovê çap bû. Edîtora malpera bi navê *Frittilaria Kurdica. Bulletin of Kurdish Studies* e.

**Mihemed Şarman:** Di sala 1983yan de li navçeya Milazgira Mûşê hatiye dinyayê. Di sala 2010an de pirtûka wî ya çîrokan *Pirça Wenda* ji nav weşanên Avestayê derketiye. Niha li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê mastira xwe didomîne. Li Şirnexê wek mamoste kar dike.

**Mîrza Baran:** Di sala 1986an de li gundê Kepirê bi ser navçeya Qerqaliyê (Ozalp) ve ji dayik bû. Salên xwe yên zaroktî û naşît li ber qeraxa Behra Reşborandiye. Li zanîngehên Enqere û Stenbol û Yanyayê (Yewnanistan) yewnaniya nûjen xwend. Vêga li Zanîngeha Teknîkî ya Yıldızê (Stenbol) mamostetiya Îngilîzî dixwine, di ber re jî li Zanîngeha Bilgiyê di beşa Xebatên Çandî de mastera xwe li ser bêdengî û wendakirina zimên dike.

**Yılmaz Özdil:** Li Colemergê hatiye dinyayê. Di sala 2013an de li Parîs 3 Sorbonne Nouvelle de doktoraya ser sînemayê xilas kir. Tevî ku aktor, derhêner, montajkar û kameraman e, nivîsên wî li ser sînemayê di rojname û kovarên wek *Le Monde Diplomatique*, *Express*, *Radikal* û *Birgünê* de hatine weşandin.



## JI BO HEJMARA DUYEM MIJARA DOSYÊ

### Axaftinên Postkolonyal

Di hejmara duyem em ê cih bidin dosyayeke li ser postkolonyalîzmê jî. Çi di warê dosyê de be çî derveyî dosyê be em ê li bende nivîsên we bin.

Nivîsên hat şandin divê li ser wordê û bi stîla MLA an APAyê ben û 20.000 derbî derbas nebin. Ger nivîs danasîna pirtûkekê be divê herî zêde 4,000 derb bin.

Gotar divê zelal, birêkûpêk û xwedî nûbûnekê, fikreke nû bin, ne dubare bin. Gotarên ku di nava xwe de heqaret, nijadperestî û zayendperestiyê bi-hewînin nayên çapkirin. Lijneya weşanê biryara nivîsên ku wê bîn çapkirin, dide.

Dema dawî ji bo şandina nivîsan: 25ê Tîrmeha 2014an

Dema belavkirina hejmara duyem: 1ê Îlona 2014an

Navnîşan: zaremakurd@gmail.com

Gelî malbatên zarokên biasteng,  
Ji bo başiya zarokên we, lazim e zarokên we ji aliyê kesên pispor ve bîn dermankirin. Di tedawiya zarokan de beşeke girîng jî rehabetasyon e. Di rehabetasyonê de bijîşk nav li nexweşiyên zarokên we dikin, berê we didin fîzyoterapîstan.

Dema hûn çûn saziya rehabetasyonê heya dîplomaya fîzyoterapîstan jî bipirsin. Baş pê bawer bibin ku ew kesên ku tedawiya fîzîkî dikin bila fîzyoterapîst bin. Di rehabetasyonê de xala herî girîng jî zanîn û hişmendiya malbatê ye. Fîzyoterapîst lazim e di derbarê tedawiya zarokên we de ji alîkî jî malbatê perwerde bike. Malbat jî divê li gor rênîşandayîna fîzyoterapîstan tevbigere.

Zarok ancax bi xebata di navbera bijîşk, fîzyoterapîst û malbatê de dikare bê rehabetatekin. Lowma em kesên navên wan li jêr li ser navê fîzyoterapîstiyê ji we tika dikin ku vê xebatê bê malbat nehêlin, da ku em hemî astengiyên li ber zarokên biasteng ji holê rakin.

Bayram Karabulut, Hüseyin Kurtay, Mem Jan, Taylan Tarhan, Ruken Ekmen, Seyit Fidanten, Ahmet Tavar, İmad Bernas, Feyyaz Tüner, Suat Çıdam, Mehmet Emin Güneş, Resul But, Hasan Aydın, Yasin Şimşek, Barış Zorbozan, Nezir Şakar, Mansur Çelikel, Bunyamin Barık, Mehmet Turan, Ümit Songül, Mehmet Zeki Özyer, Fırat İş



## NAVEROK

Herokol Azîzan, Zilamek û Zimanek

Jeff Kaufman, Vejandina Zimanê Ibrani

Mihemed Şarman, Emê Tu Dikarî Di Tariyê De Bi Tirkî Biaxivî?

Amir Hassanpour, Hestiyê Zimên Tuneye Lê Dikare Hestiyên Bişkenîne

Roland Barthes, Rexne Çi Ye?

Fexriya Adsay, Fetisîna Di Nav Pirtûkan De

Hesenê Dewrêş, Di Hin Berhemên Kurdî De Şopên Çanda Devkî

Ayhan Öztunç, Di Romana Cemşîd Xan De Bîr, Melankolî û Şîn

Joanna Bocheńska, Rastiya Veşartî Ya Xwedayekî Kolonyal

Mîrza Baran, Serboriya Kêmnivîskariya Lehengekî; Êş û Azara (Ne)Nivîsandinê

Ferzan Şêr, Di Navbera Mînor û Majoriyê De û Jê Wêdetir

Mihemed Şarman-Fexriya Adsay, "Jibîrkirin Mirin Bi Xwe Ye", Hevpeyvîn Bi Mehmet Dicle Re

Yılmaz Özdil, Di Navbera Hebûn û Nebûnê De Sînemaya Kurdî

Burhan Yek, Ceribandina Nirxandinekê Li Ser Xerabiya Bekoyê Awan

Abdullah Çelik, Kalaşnikof Ser De Tarîx, Merg û Xovîrra Kerdiş

Ebdulxaliq Y'eqûbî, Rewtî Gorrankariyê Qallib û Nawerrok Le Şîirî Hacî Qadirî Koyî De

Hesenê Dewrêş, "Tenê Girî Ne Qedexe Bû" Hevpeyvîn Bi Bûbê Eser Re

Cebar Cemal Xerîb, Giryan

Barzoo Eliassî, Rewşenbîrên Çepgir û Kurd: Edward Said, Hamid Dabashi û Tariq Ali

Mihemed Şarman, Kaniya Fenteziyan

104

